K.T.
Enstîtuya Zanistên Civakî ya Zanîngeha Dîcleyê
Beşa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî

Teza Doktorayê

ROL Û STEREOTÎPÊN ZAYENDA CIVAKÎ DI DESTAN Û HIKAYEYÊN GELÊRÎ YÊN KURDÎ DA

Leyla KAPLAN
19940303

Şêwirmend
Prof. Dr. Tahirhan AYDIN

Dîyarbekir 2025

T.C.
Dicle Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü
Kürt Dili ve Kültürü Ana Bilim Dalı

Doktora Tezi

KÜRT DESTAN VE HALK HİKAYELERİNDE TOPLUMSAL CİNSİYET ROL VE KALIPYARGILARI

Leyla Kaplan
19940303

Danışman
Prof. Dr. Tahirhan AYDIN

Diyarbakır 2025

TAAHHÜTNAME

SOSYAL BİLİMLER ENSTİTÜSÜ MÜDÜRLÜĞÜNE

Dicle Üniversitesi Lisansüstü Eğitim-Öğretim ve Sınav Yönetmeliğine göre hazırlamış olduğum **"Rol û Stereotîpên Zayenda Civakî di Destan û Hikayeyên Gelêrî yên Kurdî da"** adlı tezin tamamen kendi çalışmam olduğunu ve her alıntıya kaynak gösterdiğimi ve tez yazım kılavuzuna uygun olarak hazırladığımı taahhüt eder, tezimin kâğıt ve elektronik kopyalarının Dicle Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü arşivlerinde saklanmasına izin verdiğimi onaylarım. Lisansüstü Eğitim-Öğretim yönetmeliğinin ilgili maddeleri uyarınca gereğinin yapılmasını arz ederim.

05/08/2025

Leyla KAPLAN

PÊŞGOTIN

Destan û hikayeyên gelêrî cureyên edebîyata gelêrî ne û di derheqê jîyan, çand, dîrok, bawerî û kevneşopîyên miletan da agahîyên giring didin. Di nav destan û hikayeyên gelêrî da gelek alîyên jîyanê derdikevin pêşberî me û em bi rêya wan di derbarê jîyana berî da dibin xwedî agahî. Ji ber piralîbûna destan û hikayeyên gelêrî, ew ji bo xebatên akademîk dibin çavkanîyên giring.

Zayenda civakî zayenda çêkirî ye û li gor wext û civakê rastî gelek guherînan tê. Herçiqas ji jin û mêran hêvî û daxwazên cîyawaz ên miletan hebin jî gelek hêvî û daxwazên hevpar ên miletan hene. Armanca vê xebatê dîyarkirina hêvî û daxwazên civaka kurd a ji jin û mêran e. Ji bo pêkanîna vê armancê bi tevahî hevdeh heb destan û hikayeyên gelêrî yên kurdî hatin hilbijartin. Rol û stereotîpên li jin û mêrên kurdan hatine barkirin di nav destan û hikayeyên gelêrî yên hilbijartî da hatin destnîşankirin. Di dîyarkirina rol û stereotîpên jin û mêran da pîvangên Sandra Ruth Lipsitz Bem û Inge K. Broverman hatin bikaranîn. Destan û hikayeyên gelêrî bi rêbaza tehlîla rabêjî û tehlîla rabêjî ya rexneyî hatin vekolîn û hate dîtin ku civak li ser jin û mêran rol û stereotîpan bar dike û di tevgerên jin û mêran da pir bi bandor e. Ji xeynî rol û stereotîpên bi jin û mêran ra têkildar, di xebatê da li ser zayenda mekanan jî hate sekinîn û mekanên nêrza û mêza yên di destan û hikayeyên gelêrî yên kurdî da hatin destnîşankirin.

Xebatên bi vî rengî bi ked û piştgirîya gelek kesan derdikevin holê. Di xebata min da jî keda gelek kesan heye û dixwazim lib û lib spasîya wan bikim.

Di diyarkirina babeta vê xebatê da spasîya Mehmet Şirin FİLİZ dikim. Mamoste Şirin gelek çavkanîyên hêja bi min ra parve kirin, mala wî ava be. Di mijara çavkanîyan da divê spasîya Doç. Dr. Yakup AYKAÇ jî bikim. Mamoste Yakup gelek çavkanîyên hêja yên bi babeta xebatê ve têkildar bi min ra parve kirin. Mala wî jî ava be.

Di pêvajoya nivîsandina tezê da ji bo alîkarî û pêşnîyazên wî spasîya şewirmendê xwe Prof. Dr. Tahirhan AYDIN dikim, şewirmendîya wî ji bo min şanseke gelek mezin bû. Herweha spasîya Prof. Dr. Hayreddin KIZIL, Doç. Dr. Osman ASLANOĞLU, Doç. Dr. Adnan ÇETİN û Doç. Dr. Kenan SUBAŞI dikim ku wan di parastina tezê da bi nirxandin û rexneyên xwe yên hêja teza min bi hêz kirin.

Ji bo redaksîyon û xwendina dawî ya tezê ji Zana ŞAYBAK ra spas dikim.

Spasîya malbata xwe dikim ku wan her tim bawerîya xwe bi min anî û piştgirî dane min. Baş e ku hene…

Leyla KAPLAN
Diyarbakır 2025

KURTE

Destan, di nava xwe da rabirdûya dîrokî û nirxên kolektîf ên neteweyan dihewînin û hikayeyên gelêrî jî bi rêya evîn, malbat û têkilîyên civakî kodên çandî yên serdemê nîşan didin. Armanca vê xebatê ew e ku di destan û hikayeyên gelêrî yên kurdî da kîjan rol û stereotîpên zayenda civakî hene û bi çi awayî cih digirin, dîyar bike. Bi vê mebestê ewil di derbarê babetên wekî zayenda civakî, femînîzm û pederşahî da agahîyên teorîk hatîye dayîn. Destan û hikayeyên gelêrî wekî cure hatine pênasekirin û ev herdu cure ji alîyê wekhevî û ciyawazîyên xwe ve hatine berawirdkirin. Piştî kurteya destan û hikayeyên gelêrî yên hatine bikaranîn li ser rolên jinanetî û mêranetî yên di van destan û hikayeyên gelêrî da û li ser zayenda mekanan hatîye sekînîn. Destan û hikayeyên gelêrî yên ji bo xebatê hatine hilbijartin ev in: Memê Alan, Dewrêşê Evdî, Kela Dimdimê, Zembîlfiroş, Sîyabend û Xecê, Binevşa Narîn û Cembelîyê Kurê Mîrê Hekarîya, Kerr û Kulik, Xelîl Beg, Stî û Ferx, Sêva Hecî, Evdilrehman Axayê Zorbaşî, Elo Şêxanî û Fatimê, Husên Axa Derbas, Gulperî, Mîrza Axayê Rindikî û Têlî Eyşan, Bêrîvanê, Senem Xanim û Hiseyn. Di tehlîlkirina metnan da ji rêbazên lêkolînê ya çawahînî rabêj û tehlîlkirina rabêja rexneyî hatin bikaranîn. Di encama lêkolînê da di destan û hikayeyên gelêrî yên kurdî da jin wekî hestyar, girêdayî, pasîf, sadiq, fedekar û duyemînî; mêr wekî azad, dilêr, egîd, bêtirs, xweser, têkoşer û biryarder derbas dibin. Taybetmendîyên wekî hestyarbûn (girîn) û sadiqbûn herçiqas wekî taybetmendîyên jinan bên dîtin jî di destan û hikayeyên gelêrî yên kurdî da li gelek cihan wekî taybetmendîyên mêran derbas dibin û ev jî bo guhêrbarbûna stereotîpên zayenda civakî mînakên giring in. Di destan û hikayeyên gelêrî yên kurdî da wekî mekanên nêrza dîwanxane, ode, qadên nêçîr û şerê; wekî mekanên mêza di konan da beşên ji bo jinan bi perdeyê hatine veqetîn, serkehnî, qeraxa çemê û di qesran da odeyên ji bo jinan hatine veqetîn derbas dibin. Ev rewş dide xuyakirin ku şert û mercên aborî û civakî yên serdemê di zayendkirina mekanan da xwedî bandor bûne. Çinku dema mekan tên zayendkirin cihên girtî wekî mêza yên vekirî wekî nêrza tên senifandin û di destan û hikayeyên gelêrî yên kurdî da mînakên derveyê vê qaîdeyê xuya dikin. Ev xebat bi rêya bersivdana pirsa “Rol û stereotîpên zayenda civakî bi demê ra rastî kîjan guherînan tên?” hevkarîya qadê dike.

Peyvên Sereke

Zayenda bîyolojîk, zayenda civakî, stereotîp, femînîzm, pederşahî, destan, hikayeyên gelêrî, mekanên nêrza, mekanên mêza.

ÖZET

Destanlar ulusların tarihi geçmişi ve kolektif değerlerini barındırıken; halk hikayeleri dönemin kültürel kodlarını aşk, aile ve toplumsal ilişkiler üzerinden yansıtır. Bu çalışma Kürt destan ve halk hikayelerindeki toplumsal cinsiyet rol ve kalıpyargılarının neler olduğunu ve ne şekilde yer aldıklarını bulmayı amaçlamaktadır. Bu çalışma kapsamında öncelikle toplumsal cinsiyet, feminizm ve ataerki kavramlarına dair kuramsal bilgilere yer verilmiştir. Ardından destan ve halk hikayesi türleri kuramsal açıdan ele alınarak, bu iki tür arasındaki benzerlik ve farklılıklar ortaya konmuştur. Çalışmada incelenecek destan ve halk hikayelerinin kısa özetlerine yer verildikten sonra bu metinlerdeki kadınlık ve erkeklik rolleri ile mekanların cinsiyetlendirilme biçimleri üzerinde durulmuştur. Çalışma için seçilen Kürt destan ve halk hikayeleri şunlardır: Memê Alan, Dewrêşê Evdî, Kela Dimdimê, Zembîlfiroş, Sîyabend û Xecê, Binevşa Narîn û Cembelîyê Kurê Mîrê Hekarîya, Kerr û Kulik, Xelîl Beg, Stî û Ferx, Sêva Hecî, Evdilrehman Axayê Zorbaşî, Elo Şêxanî û Fatimê, Husên Axa Derbas, Gulperî, Mîrza Axayê Rindikî û Têlî Eyşan, Bêrîvanê, Senem Xanim û Hiseyn. Metinler, nitel araştırma yöntemlerinden söylem analizi ve eleştirel söylem analizi yöntemleri ile incelenmiştir. Araştırma sonucunda kürt destan ve halk hikayelerinde kadınların duygusal, bağımlı, pasif, sadık, özverili, ikincil konumda; erkeklerin ise özgür, cesur, yiğit, korkusuz, bağımsız, mücadeleci, karar verici konumda oldukları görülmüştür. Daha çok kadınlara yakıştırılan duygusallık (ağlama) ve sadakat gibi özelliklerin erkeklerde de sıkça görülmesi toplumsal cinsiyet kalıpyargılarının değişebilir olduğunu göstermesi açısından önemlidir. Destan ve halk hikayelerindeki eril mekanlar olarak divanhane, oda, av, savaş alanları; dişil mekanlar olarak ise çadırlarda kadınlar için perdeyle ayrılan bölüm, çeşme başı, dere kenarları veya saraylarda kadınlara ayrılan odalar geçmektedir. Bu durum da mekanların cinsiyetlendirilmesinde dönemin sosyal ve ekonomik şartlarının etkili olduğunu göstermektedir. Çünkü mekanlar cinsiyetlendirilirken kapalı alanlar dişil, açık alanlar ise eril olarak sınıflandırılır ve destanlarda buna uymayan örnekler mevcuttur. Bu çalışma toplumsal cinsiyet rol ve kalıpyargılarının zamanla ne gibi değişikliklere uğradığının belirlenmesi açısından alana katkı sağlamaktadır.

Anahtar Sözcükler

Biyolojik cinsiyet, toplumsal cinsiyet, kalıpyargı, feminizm, ataerki, destan, halk hikayesi, eril mekanlar, dişil mekanlar.

ABSTRACT

While epics contain the historical past and collective values of nations, folk tales reflect the cultural codes of the period through love, family and social relations. This study aim to find out what are the gender roles and stereotypes in Kurdish epics and folk tales and how are they manifested. Within the scope of this study, theoretical informations on the consepts of gender, feminism and patriarchy are presented. Subsequently, the genres of epic and folk tale are examined from a theoretical perspective, with an emphasis on the similarities and differences between the two. Following brief summaries of the epics and folk tales examined in the study, the focus is placed on the representations of femininity and masculinity, as well as the ways in which spaces are gendered within these texts.The Kurdish epics and folk tales selected for the study are the following: Memê Alan, Dewrêşê Evdî, Kela Dimdimê, Zembîlfiroş, Sîyabend û Xecê, Binevşa Narîn û Cembelîyê Kurê Mîrê Hekarîya, Kerr û Kulik, Xelîl Beg, Stî û Ferx, Sêva Hecî, Evdilrehman Axayê Zorbaşî, Elo Şêxanî û Fatimê, Husên Axa Derbas, Gulperî, Mîrza Axayê Rindikî û Têlî Eyşan, Bêrîvanê, Senem Xanim û Hiseyn. Epics and folk tales were analyzed with discourse analysis and critical discourse analysis methods from qualitative research methods. As a result of the research, it was observed that women in Kurdish epics and folk tales are emotional, dependent, passive, loyal, self-sacrificing, secondary while men are free, brave, valiant, fearless, independent, combative and decision-making. The fact that traits such as emotionality (crying) and loyalty, which are mostly associated with women, are also frequently seen in men is important in terms of showing that gender stereotypes are changeable. In epics and folk tales, masculine spaces are represented by the council hall (divanhane), rooms, hunting grounds and battlefields; whereas feminine spaces include areas separated by curtains for women within tents, spots by the fountain, riverbanks and rooms designated for women in palaces. This shows that the social and economics conditions of the period were effective in the gendering of spaces. Because when spaces are gendered closed spaces are classified as feminine and open spaces as masculine, and there are examples in the epics that do not fit this. This study contributes to the field in terms of determining how gender roles and stereotypes change over time.

Keywords

Biological sex, gender, stereotype, feminism, patriarchy, epic, folk tale, masculine spaces, feminine spaces.

NAVEROK

Hejmara Rupelan

PÊŞGOTIN ..... **I**
KURTE ..... **III**
ÖZET ..... **IV**
ABSTRACT ..... **V**
NAVEROK ..... **VI**
KURTEBÊJE ..... **IX**
DESTPÊK **1**
METODOLOJÎYA LÊKOLÎNÊ **5**
MIJARA LÊKOLÎNÊ **5**
ARMANC Û GIRINGÎYA LÊKOLÎNÊ **5**
SÎNORÊ LÊKOLÎNÊ **6**
SEHKIRINA LÎTERATÛRÊ **7**
RÊBAZA LÊKOLÎNÊ **9**
BEŞA YEKEM **12**
1.ZAYENDA CIVAKÎ Û TEORÎYA FEMÎNÎST **12**
1.1.Zayenda Bîyolojîk Û Zayenda Cıvakî 12
1.1.1.Zayenda Bîyolojîk 12
1.1.2.Zayenda Civakî 13
1.1.3.Cudahîyên di Navbera Zayenda Bîyolojîk û Zayenda Civakî da ... 17
1.1.4.Rol û Stereotîpên Zayenda Civakî 19
1.2.Teorîyên Dı Derbarê Pêkhatına Zayenda Cıvakî Da 23
1.2.1.Teorîya Psîkanalîtîk 23
1.2.2.Teorîya Hînbûna Civakî 24
1.2.3.Teorîya Pêşveçûna Kognîtîv 26
1.3.Femînîzm 27
1.3.1.Pêlên Femînîzmê 30
1.3.1.1.Pêla Yekem a Femînîzmê 31

1.3.1.2.Pêla Duyem a Femînîzmê 32
1.3.1.3.Pêla Sêyem a Femînîzmê 34
1.3.2.Nêzîkatîyên Femînîst ên Teorîk 35
1.3.2.1.Femînîzma Lîberal 35
1.3.2.2.Femînîzma Çandî 37
1.3.2.3.Femînîzma Radîkal 39
1.3.2.4.Femînîzma Marksîst/Sosyalîst 40
1.3.2.5.Femînîzma Postmodern 42
1.3.2.6.Femînîzma Hebûnparêzî 44
1.4.Pederşahî (Patrîyarka) 45
BEŞA DUYEM 50
2.DESTAN AN HIKAYEYÊN GELÊRÎ? 50
2.1.Destan 50
2.2.Hıkayeyên Gelêrî 53
2.2.1.Taybetmendîyên Şiklî yên Hikayeyên Gelêrî 56
2.2.2.Taybetmendîyên Naverokî yên Hikayeyên Gelêrî 57
2.3.Cudahî Û Hevşıbîyên Dı Navbera Hıkayeya Gelêrî Û Destanê Da 59
2.4. Kurteya Destan Û Hıkayeyên Gelêrî 63
2.4.1.Memê Alan 63
2.4.2.Dewrêşê Evdî 67
2.4.3.Kela Dimdimê 69
2.4.4.Zembîlfiroş 71
2.4.5.Sîyabend û Xecê 73
2.4.6.Binevşa Narîn û Cembelîyê Kurê Mîrê Hekarîya 75
2.4.7.Kerr û Kulik 76
2.4.8.Xelîl Beg 78
2.4.9.Stî û Ferx 81
2.4.10.Sêva Hecî 83
2.4.11.Evdilrehman Axayê Zorbaşî 85
2.4.12.Elo Şêxanî û Fatimê 87
2.4.13.Husên Axa Derbas 90
2.4.14.Gulperî 92

2.4.15.Mîrza Axayê Rindikî û Têlî Eyşan 94
2.4.16.Bêrîvanê 96
2.4.17.Senem Xanim û Hiseyn 98
BEŞA SÊYEM 100
3.DI DESTAN Û HIKAYEYÊN GELÊRÎ YÊN KURDÎ DA ZAYENDA CIVAKÎ 100
3.1.Rolên Jınanîtîyê 100
3.1.1.Jin Wekî Hezkirîyê 100
3.1.2.Jin Wekî Hevjînê 111
3.1.3.Jin Wekî Dayikê 113
3.1.4.Têkilîya Dayik û Keçikê 117
3.1.5.Têkilîya Dayik û Kurî 118
3.1.6.Jin Wekî Zarokê (Weled) 122
3.2.Rolên Mêranîyê 125
3.2.1.Mêr Wekî Hezkirîyî 125
3.2.2.Mêr Wekî Hevjînî 138
3.2.3.Mêr Wekî Bavî 140
3.2.4.Têkilîya Bav û Kurî 145
3.2.5.Têkilîya Bav û Keçê 148
3.2.6.Kur Wekî Zarokî (Weled) 150
3.3.Zayenda Mekanî 152
3.3.1.Mekanên Nêrza 155
3.3.2.Mekanên Mêza/Femînen 158
3.3.3.Mekanên Rûbirûbûnê 160
3.4.Stereotîpên Dı Derheqê Jın Û Mêran Da 164
ENCAM 187
ÇAVKANÎ 193

KURTEBÊJE

Amd.	Amadekar
Bnr.	Binêrin
C.	Cild
Der.	Derleyen
Ed.	Edîtor
Hwd.	Her wekî din
K.T.	Komara Tirkîyeyê
Ûyd.	Û yên din
Vgh.	Veguhêzer
Wer.	Wergêr
Yay. haz.	Yayına hazırlayan

DESTPÊK

Têgiha zayendê exlebî bi du alîyên cuda ve tê kategorîzekirin: zayenda bîyolojîk û zayenda civakî. Zayenda bîyolojîk, girêdayê taybetmendîyên wekî fîzyolojîk, genetîk û anatomîk ên mirovan e û mirov van taybetmendîyan bi jidayîkbûnê ra bi dest dixe. Zayenda civakî rol, hêvî û normên civakê ne ku ji jin û mêran tên xwestin. Çêkerê zayenda civakî, civak bixwe ye û ew li ser bedena jin û mêran nasnameyekê ava dike. Li gor vê nasnameyê divê jin û mêr di tevgerên xwe da li gor rol û stereotîpên zayenda civakî tevbigerin û bijîn. Civak li ser jin û mêran van tevgeran ferz dike û ji wan îtaeteke mitleq dixwaze. Civakên pederşahî di van mijaran da gelek hişk in û bêîtaetîyê qebûl nakin. Civaka kurdan yek ji wan civakên pederşahî ye û di nav wan da jî rol û stereotîpên jin û mêran ên dîyarkirî hene. Hêvî û daxwazên civakê yên ji jinan, li gor hin qaliban teşe girtine. Çend ji wan qaliban ev in: Divê jin îtaetkar û sernerm bin. Exleb, ji jinan tê xwastin ku ji gotinên mêran (bav, bira, hevjîn) dernekevin û guhdarîya wan bikin. Divê ew serhişk nebin û li hember wan bêhurmetî nekin. "*Heger jina te sernerm be, wê şîva te ya êvarê germ be, heger jina te serhişk be, wê di hundir de wek dûpişk be.*", "*Ku jina te sernerm be xwarina te yê germ be, ku jina te serhişk be xwarina te yê dupişk be*." (Oncu, 2020: 91, 197). Ji van mînakên gotinên pêşîyan jî dîyar dibe ku ya ku ji jinan tê xwastin sernermbûna wan e, jinên serhişk hatine rexnekirin. Jinên kurdan li hember zext û zilmên mêrên xwe dengê xwe dernaxin û ji halê xwe razî ne (Bayezîdî, 2010: 186). Divê jin hestîyar û fedakar bin. Herçiqas ji jinan hestyarbûn bê xwastin jî gelek caran jin ji ber hestyarbûna xwe hatine rexnekirin. Di dayîna biryarên giring da mafê biryarê exlebî ji bo jinan nayê dayîn ji ber ku ew bi hestên xwe hereket dikin û dibe ku biryarên rast nedin. Ji jinan fedakarî tê xwastin. Ji bo saxî û silametîya bav, bira, malbat, êl û eşîrê divê ew fedakarîyên mezin bikin. Di gelek destanên kurdî da jinan ji bo silametîya warê xwe, xwe feda kirine û xwe avêtine mezadê. Destanên wekî Dewrêşê Evdî û Kerr û Kulik ji bo fedakarîya jinan mînakên giring in. Jinan ji bo nexweşên xwe yên ku jê pir hez dikin xwe feda kirine. Dema di malbatê da yekî ciwan û hêja nexweşîyeke giran derbas dike xweh, keç an jî dayika wî dibêje ku "*Min canê xwe feda û gorî vî filankesî kir, hûn şahîd bin ku bila Xwedê te'ala jiyanê bide vî nexweşî û her çi qeda û belaya wî heye bila bê min. Eger temenê min heye bila ew mirin ji min re be*." (Bayezîdî, 2010: 176). Jin bi vî awayî xwe fedayê hezkirîyên xwe dikin û civak jî vê fedakarîyê ji wan hêvî

dike. Ji jinan pasîvbûn û girêdayîbûn tê xwastin. Divê ew girêdayî malbat û zarokên xwe bin, bi karên malê ra mijûl bin, li nexweş û kal û pîrên xwe binêrin. Mezinên wan, bav û kalên wan çi bêjin a rast ew e û divê jin jî li gor daxwazên wan hereket bikin. Jin divê bêhnfireh bin, li hember astengîyan sebir bikin. Ew divê ji qadên taybetî (nava malê, cihên girtî) dernekevin û nekevin cihên vekirî wate cihên mêran. Cihên vekirî ji bo jinan cihên ewle nînin lewra divê jin di vê mijarê da baldar bin. Di civakên pederşahî da rol û stereotîpên zayenda civakî ne tenê ji bo jinan hişk in, bi heman awayî hêvî û daxwazên civakê yên ji mêran jî hene. Li gor civakê taybetmendîyên mêran: Divê mêr bihêz û dilêr bin. Ew hem ji alîyê fîzîkî ve hem jî ji alîyê psîkolojîk ve divê bihêz bin. Divê hestên xwe zêde aşkera nekin û taybetmendîyên wekî tirs û zeîfbûnê divê di wan da xuya nekin. Çinku di nav civakê da zeîfbûn wekî karê jinan tê dîtin. Dema li ser mêranîya kurdan tê sekinîn tê gotin ku ew di axiftinê da bêtirs û dilêr in, hertim heqîyê dibêjin û xwedî cesaret in. Mêrên ku tirsîyane û ji şer revîyane hatine rexnekirin. Qedrê wan mêran nemaye, jin û mêran tif kirine rûyên wan, tinazên xwe bi wan kirine, heta jinên wan kesan jî bi wan re neaxivîne (Bayezîdî, 2010: 148, 152). Tê dîtin ku mafê mêran a tirsê tune bûye, ew mecbûr mane ku hertim bihêz bin an jî wisa xuya bikin. Ev rewş berpirsyarîyeke mezin li ser milên mêran bar dike û wan mecbûr dihêle. Ew divê hestyar nebin û bimantiq hereket bikin. Eger mêr hestyar bin ew çax wekî "jinane" tê bên dîtin û ev rewş jî ji bo navê wan pir xirab e. Çawa tê zanîn di civakên pederşahî da dema jinekê karên mêrane dike û wekî mêran tê dîtin, ew rewş tê medhkirin û pesnê wê jinê didin; lê dema mêr karên jinan dikin û wekî jinan tên dîtin rewş diguhere û gelek gotinên xirab ji wan mêran ra tên gotin. Li gor civakê nabe ku mêrekî wekî jinan tevbigere, bixebite yan jî şermok be û bigirî. *"... şerm karê pîrekan e... Memo, eger te ji hinan hez kir, destê te ji te ra ye, fedî ne karê mêran e."*. "*Xwelî li serê we be ko hon jî dibêjin em peya ne/ Ma hon jî hatine û digirîne mîna jinan e."* (Lescot, 1942: 202, 352). "*Fediyokî li mêran, kenokî li jinan nayê*." "*Jina şermîn bi şarekî, mêrê şermîn bi karekî*[1]." "*Girî karê pîrekan e."* (Oncu, 2020: 77, 157, 81). Ji van mînakan jî tê dîtin ku şerm û girîn wekî karê jinan tê dîtin û mêrên şermok û yên girîyok rastî rexneyên giran hatine. Mêr divê azad û xweser bin. Ew di dayîna biryarên giring da roleke sereke dilîzîn. Çinku di nav mal da yên ku xwedî otorîte ne

[1] Di nav civakê da qedr û qîmeta jinên şermok heye lê mêrên şermok di nav civakê da bê qedr û qîmet in.

mêr in û ew çi bêjin rast ew e. Ew li ser jin û zarokan hikumranî dikin û li gor civakî, ya rast jî ew e û kes dengê xwe nake. Sîstema pederşahî bi gelek alîyan ve li ser mêran hin taybetmendîyan ferz dike û nahêle ku ew lawazîyên xwe aşkera bikin, mêr mecbûr dimînin ku hertim bihêz û bêtirs xuya bikin. Li alîyê din mêrên serleheng bi awayekî hêsan negihîştine armancên xwe. Wan ji bo gihîştina hezkirîyên xwe gelek micadele kirine, ji rêyên zor û zehmet derbas bûne û ketine nav şer û pevçûnên giran. Ew gelek caran mecbûr mane ku heft salan şivantî bikin da ku bikarin bigihîjin jina hezkirî. Ji bo mêrên leheng jina hezkirî xelat e lê ew xelat piştî berdêlên giran hatîye bidestxistin.

Destan di xwe da şopên hafizeya kolektîf a miletan dihewînin. Ew bûyerên dîrokî, evînî, lehengî bi awayekî efsanewî pêşkêşî gel dikin. Temayên wekî eşq, mirin, tênegihîştin, fedakarî, têkoşîn, berxwedan, sedaqet, girêdayîbûn di nav destanan da cih digirin û destan nifş bi nifş hebûna xwe didomînin. Destanên kurdî bûne çavkanî ji bo civaka kurdî ya demeke dirêj ji çanda nivîsê bêpar mane. Bi rêya destanan hestên wekî nasnameya neteweyî, xwemalî, berxwedana gelan zindî dimîne. Jinîtî û mêranî di destanên kurdî da li gor hin qalibên dîyarker cih digirin. Mêr exlebî di rolên lehengî û şervan, jin jî exlebî di rolên hezkirîya sadiq, dayik û zaroka fedakar da xuya dikin. Lê wekî îstîsna hin jinên bihêz ên wekî Werdeka dêya Kerr û Kulik, Ereb Zincar jî di destanan da cih digirin. Di destanên kurdî da evîn roleke sereke dilîze. Lehengên destanan exlebî evînên trajîk dijîn (Subaşı, 2024: 106) û kêm caran digihîjin miraz û meqsedên xwe. Hikayeyên gelêrî di nav çanda devkî da pêş ketine bi demê ra derbasî nivîsê bûne. Di wan da bûyerên rastî yan jî nêzî rastîyê derbas dibin. Evîn, malbat, fedakarî, nirxên civakî û dînî di hikayeyên gelêrî da hin babetên sereke ne. Herçiqas hikayeyên gelêrî yên bi encamên trajîk diqedin hebin jî exlebî evîndar digehijin hevdu.

Di nav xebatên kurdî da li ser destanên kurdî gelek xebat hatine kirin. Hin caran destanên kurdî ji vebêjerên wan hatine tomarkirin û derbasî nivîsê bûne, hin caran varyantên destanan hatine berawirdkirin û hin caran jî destan ji alîyê motîfan ve hatine tehlîlkirin. Herçiqas li ser destanên kurdî xebat hebin jî zayenda civakî û destanên kurdî bi hev ra kêm caran bûne mijara lêkolînê. Di nav xebatên kurdî da Aram Roder (2019) berê xwe daye vê mijarê û bi navê *"Li gorî Teoriya Queer û Femînîzmê Zayenda Civakî di Destana Memê Alan de"* tezeke lîsansa bilind amade kirîye. Roder, xwastîye ku destnîşan bike gelo zayenda civakî û laşî di destana Memê Alan da li gor nirxên çandî çawa derbas dibin. Cudahîya xebata me ji ya Roder ew e ku em zêdetir li

ser rol û stereotîpên zayenda civakî yên di destan û hikayeyên gelêrî yên kurdî da sekinin. Me xwast ku bi rêya destan û hikayeyên gelêrî yên kurdî destnîşan bikin gelo jin û mêr bi rolên xwe yên jinanî û mêranîyê di nav jîyanê da çawa cih girtine û derbas bûne. Bi rêya van xebatan dê destan û hikayeyên gelêrî yên kurdî ji alîyên cîyawaz ve bên tehlîlkirin û nirxandin. Tê hêvîkirin ku ev xebat ji bo xebatên berfirehtir bibin çavkanî.

Em ê di xebata xwe da bi awayekî gelemperî li ser zayenda bîyolojîk, zayenda civakî, cudahîyên di navbera zayenda bîyolojîk û zayenda civakî, rol û stereotîpên zayenda civakî û teorîyên bi çêbûna zayenda civakî ra têkildar bisekinin. Em ê di heman beşê da li ser femînîzm, pelên femînîzmê, helwestên teorik ên femînîzmê bisekinin. Piştî femînîzmê em ê li ser pederşahîyê bisekinin. Di beşeke din a xebata xwe da em ê li ser destan û hikayeyên gelêrî bisekinin û em ê van her du cureyan ji alîyê wekhevî û cudahîyên xwe ve bidin ber hev. Em ê di heman beşê da kurteya destan û hikayeyên gelêrî yên ku ji bo xebatê hatine bijartin bidin. Piştî agahîyên teorîk di beşa sereke ya xebata xwe da em ê li ser rolên jinanîtî û mêranîtîyê bisekinin. Di nav rolên jinanîtîyê da sernav dê weha bin: Jin Wekî Hezkirîyê, Jin Wekî Hevjînê, Jin Wekî Dayikê, Têkilîya Dayik-Keçikê, Têkilîya Dayik-Kurî, Jin Wekî Zarokê (Weled); sernavên rolên mêranîyê: Mêr Wekî Hezkirîyî, Mêr Wekî Hevjînî, Mêr Wekî Bavî, Têkilîya Bav-Kurî, Têkilîya Bav-Keçê, Kur Wekî Zarokî (Weled). Piştî rolên jinanîtî û mêranîyê em ê li ser zayenda mekanan bisekinin û mekanên nêrza, mêza/femînen û rûbirûbûnê dîyar bikin. Dîsa em ê li ser stereotîpên bi jin û mêran ra têkildar bisekinin û bi beşa encamê jî em ê xebata xwe biqedînin.

METODOLOJÎYA LÊKOLÎNÊ

MIJARA LÊKOLÎNÊ

Têkilîya mirovan bi stereotîpên zayendî ra hêj ew di zikê dêya xwe da ne, dest pê dike û heta hetayê berdewam e. Di dema jidayikbûnê da tiştên ku divê mirov li gor zayenda xwe bike, ji alîyê civakê ve, ji berê ve hatine dîyarkirin. Mirov çavên xwe li cîhaneke weha vedike û tê hêvîkirin ku ew xwe li gor nîzama sazkirî biguncîne. Di vir da mijara sereke ya giring zayenda mirovan e, ji ber ku rol û stereotîp li gor zayenda kesan tên dîyarkirin. Kesên ku li gor rol û stereotîpên ku ji bo wan guncaw tên dîtin tevnagerin, gelek caran tên rexnekirin û vederkirin.

Mijara xebat û lêkolîna me, di destan û hikayeyên gelêrî yên kurdî da rol û stereotîpên zayenda civakî ye. Di civaka kurdan da rol û stereotîpên zayenda civakî çi ne? Hêvî û bendewerîyên civakê ji jin û mêran çi ne? Rexneyên çawa hatine kirin li kesên ku li dijî rol û stereotîpên zayenda civakî derketine? Zayendkirin, tenê ji bo takekesan derbasdar e yan zayenda mekanan jî heye? Mekanên nêrza û mêza çi ne û di destan û hikayeyên gelêrî yên kurdî da mekan çawa hatine zayendkirin? Em di vê xebata xwe da exlebî li pey bersiva van pirsên bingehîn ketine.

ARMANC Û GIRINGÎYA LÊKOLÎNÊ

Armanca sereke ya lêkolîna me ev e: Kîjan rolên mêr û jinan di civakê da rastî me tên û bandorên stereotîpên zayenda civakî li ser jîyana mirovan çawa ye? Armanceke vê lêkolînê ew e ku dîyar bike ka jin û mêr di destan û hikayeyên gelêrî yên kurdî da kîjan reftarên li gor stereotîpên zayenda civakî yên guncaw an jî nelirê nîşan didin. Hin armancên din jî ev in:

- Dîyarkirina stereotîpên jin û mêran,
- Dîyarkirina mekanên zayendkirî,
- Di jîyana civakî û têkilîyên dualî da şopandina rêçên pederşahî.

Xebatên li ser zayenda civakî, exlebî li ser rol û statûya jinan disekine. Lêkolîna me li ser bandorên rolên zayenda civakî û stereotîpên li ser jîyana hem a jinan û hem jî ya mêran disekine. Di vê xebatê da ku destan û hikayeyên gelêrî yên kurdî bi perspektîfa

zayendî tên vekolîn, ji bo me giring e ku bi qasî ku bala me li ser rola jinbûnê ye, herweha bala me li ser rola mêrbûnê ye jî û ev lêkolîna me ji ber ku dê ji bo qada me ya xebatê bibe alîkar, giring e. Bi saya lêkolînên weha, takekes baştir tên analîzkirin û di derbarê têkilîyên takekesî û civakî da, mirov bêhtir dibin xwedî agahî û zanyarîyan.

SÎNORÊ LÊKOLÎNÊ

Wekî gelek neteweyên din kurd jî xwedîyê destan û hikayeyên gelêrî yên bi nav û deng in. Destan û hikayeyên gelêrî yên kurdan, di navbera nifşan da, bi piranî bi rêya dengbêjan hatine vegotin û hebûna xwe parastine. Destan û hikayeyên gelêrî yên kurdan gelek in, lê me di nav hemûyan da tenê hevdeh heb hilbijartin. Şertê hilbijartina wan jî ew bû ku derbasî nivîsê bûbin û varyantên wan hebin. Varyantên hin destanan bi dehan hebûn (Cindî û Evdal, 2008), lê me hemûyan bi kar neanî, çinku naveroka gelekan wekî hev bûn. Lîsteya destan û hikayeyên gelêrî yên ku ji bo vê xebatê hatine hilbijartin bi vî awayî ye: *"Memê Alan, Dewrêşê Evdî, Kela Dimdimê, Zembîlfiroş, Siyabend û Xecê, Binevşa Narîn û Cembelîyê Kurê Mîrê Hekarîya, Kerr û Kulik, Xelîl Beg, Stî û Ferx, Sêva Hecî, Evdilrehman Axayê Zorbaşî, Elo Şêxanî û Fatimê, Husên Axa Derbas, Gulperî, Mîrza Axayê Rindikî û Têlî Eyşan, Bêrîvanê, Senem Xanim û Hiseyn"*.

Di hilbijartina van destan û hikayeyên gelêrî da prensîpeke din jî naveroka wan bû û me nexwast ku hemû metn ji alîyê mijara sereke ve wekî hev bin. Di nav destanan da destanên lehengîya mêjûyî yên wekî Kela Dimdimê, Evdilrehman Axayî Zorbaşî; destanên dînî yên wekî Zembîlfiroş; destanên evînî yên mêjûyî yên wekî Memê Alan, Kerr û Kulik, Sîyabend û Xecê, Dewrêşê Evdî, Stî û Ferx Elo Şêxanî û Fatimê; destanên xwerû evînî yên wekî Xelîl Beg, Sêva Hecî, Binevşa Narîn û Cembelîyê Kurê Mîrê Hekarîya hatin hilbijartin.[2]

[2] Di derheqê senifandina destanan da ji bo agahîyên zêdetir bnr. Subaşı, 2024: 104-116.

SEHKIRINA LÎTERATÛRÊ

Xebata me xebateke multîdîsîplîner e û li Tirkîyeyê xebatên kurdî yên li ser heman mijarê gelekî kêm in. Berî ku derbasî xebatên kurdî yên di mijara me da bin em ê ewil bi awayekî giştî li ser xebatên di qadê da bisekinin.

Dema mirov li YÖKTEZê (Yükseköğretim Kurulu Ulusal Tez Merkezi/ Navenda Tezan a Licneya Perwerdeya Bilind) "toplumsal cinsiyet" (zayenda civakî) dinivîse 1804 tezên bi mijarê ra têkildar derdikevin (wextê xwegihandinê: 24.06.2025). Ev tez di mijarên cîyawaz ên wekî civaknasî, hiqûq, derûnnasî, perwerde, zanistên sîyasî, folklor, xizmetên civaknasî, spor, îqtisad, rojnamegerî, tenduristîya gel, hemşîretî, hunerên sehneyê, wergêrî, têkilîyên navneteweyî, mirovnasî, felsefe, ziman û wêjeya îngilîzî, bazirganîya navneteweyî, zanistên ragihanê, kevnarnasî, reklamkerî, avahîsazî, muzîk, dîrok, demografî, zimannasî, radyo-televîzyon, dîn, turîzm, plansazîya malbatî, pîrikî, tenduristî û nexweşîyên zarokan, erdnasî, aborîya malê, hunerên bedew, ziman û wêjeya tirkî û hwd. da hatine nivîsîn. Teza yekem a bi zayenda civakî ra têkildar di sala 1994an da ji alîyê Yeşim YASAK ve hatîye nivîsîn. Navê tezê "Role of language in relation to gender role stereotypes" (Rola zimên a bi rolên zayenda civakî ra têkildar) e û Yasak di kategorîyên zayendê da li ser giringîya zimên sekinîye.

Dema em berê xwe didin tezên bi wêjeyê ra eleqedar em dibînin ku exlebî zayenda civakî, rol û stereotîpên zayenda civakî li ser van cureyan tên analîzkirin: çîrok, hikayet, roman, hikayeyên gelêrî, destan, metelok, gotinên pêşîyan û edebîyata zarokan. Tezên rasterast li ser zayenda civakî û destan û hikayeyên gelêrî hatine nivîsîn gelekî kêm in. Di nav tezên tirkî da em rastî tezekê tenê hatin ew jî: Emine TAŞ (2018). *Kırgız Türklerinin sözlü anlatılarında (destan, masal, halk hikayesi) toplumsal cinsiyet ve kadın imajı*. Nivîskar di vê lêkolînê da li ser bingeha destan, çîrok û hikayeyên gelêrî yên tirkên qirgiz, hewl daye ku îmaj, berpirsyarî, rol û statuya jinan a di mal da destnîşan bike. Herçiqas di nav tezên tirkî da xebatên li ser destan, hikayeyên gelêrî û jinan hebin jî rasterast bi mijara me ra têkildar tenê tezeke multîdîsîplîner heye[3].

[3] Di nav pirtûkên tirkî da pirtûka Melek Özlem Sezer a bi navê *Masallar ve Toplumsal Cinsiyet* nêzî xebata me ye. Nivîskar di pirtûka xwe da li hemberî wê nêrînê derdikeve ku çîrokên klasîk wekî vebêjên besît dibîne. Li gor wê di çîrokan da bi rêya têgihên wekî pederşahî, zewac, bedewî û reqabet peyamên rolên zayenda civakî tên dayîn.

Di wêjeya kurdî da, destan û hikayeyên gelêrî yên kurdî, ji alîyê zayenda civakî ve pir kêm hatine analîzkirin. Ji bo vê mijarê mînaka herî berçav teza masterê ya Aram Roder (2019) e. Roder, di teza xwe ya bi navê *"Li gorî Teorîya Queer û Femînîzmê Zayenda Civakî di Destana Memê Alan de"* li gor teorîya Queer û femînîzmê, zayenda civakî ji alîyê zayend, ziman, nasname, çand, mekan, arezû, hest, mirin, hez, kurd û dualîzma heteroseksuel ve analîz kirîye. Roder xwastîye ku zayenda civakî û laşî di destana Memê Alan da li gor nirxên çandî, çawa teşe girtîye, destnîşan bike.

Teza lîsansa bilind a Songül Doğan (2018) a bi navê "*Bi Rêbaza Rexneya Femînîst Lênêrînek Li Romanên Jinên Kurd*" hatîye amadekirin jî ji alîyê mijara xwe ve di nav tezên mînak da cih digire. Doğan di xebata xwe da romanên jinên kurd ji alîyê zayenda civakî, pederşahî, perwerde, nasnameya neteweyî û jinanetîyê ve analîz kirîye.

Xebateke din a kurdî ya bi zayenda civakî ra têkildar ji alîyê Şeyma Orhan (2024) ve hatîye nivîsîn û sernavê tezê jî ev e: "*Zayenda Civakî û di Civaka Kurdan da Rewşa Jinan (Wek Mînak Xwendekarên Zanîngehê yên Jin*)". Orhan di teza xwe da li ser jinên kurd û statuya wan a di nav civakê da sekinîye. Xebat li gor rolên zayenda civakî hatîye amadekirin.

Dema em berê xwe didin gotarên kurdî yên bi zayenda civakî ra têkildar dîsa em dibînin ku kêm xebat hatine kirin. Li gor salan çend mînakên van xebatan:

Roder, A. (2020). "Hêmayên Homoseksuel û Karakterên Queer di Destana Memê Alan da". *Folklor û Ziman*. 1(2). 61-88.

İlbasmış, R. (2020). "Muqayesekerdişê Kitabanê Dersan yê Kirmanckî (Zazakî) yê Sinifa Pancine Hetê Zayenda Komelkî (Gender) ra". *The Journal of Mesopotamian Studies*. 5. 98-111.

Çiftçi, T. (2021). "Zayenda Civakî û Îmaja Jina Baş-Nebaş Di Gotinên Pêşîyan Yên Kurdan De". *Şarkiyat*. 13(2). 884-901.

Suvağci, İ. (2021). "Zayenda Civakî di Lorîyên Kurdî da". *Anemon Muş Alparslan Üniversitesi Sosyal Bilimler Dergisi*. 9(3). 763-770.

Kaplan, L. (2024). "Bandorên Stereotîpên Zayenda Civakî Li Ser Pêkanîna Kevneşopiya Dengbêjiyê: Mînaka Eyşe Şan". *Mukaddime*. 15(2). 502-522.

Kayran, M. (2024). “Di Gotinên Pêşiyan ên Kurdan da Fehma Zayenda Civakî”. Artuklu Kurdology. 17. 44-63.

Ji kêmbûna van mînakan jî dîyar dibe ku di kurdî da xebatên bi vî rengî zêde nehatine kirin û lewra di vê mijarê da hewcedarîya xebatên zêdetir heye.

RÊBAZA LÊKOLÎNÊ

Di tehlîlkirina destan û hikayeyên gelêrî yên kurdî da ji alîyê zayendî ve dê “rabêj û tehlîlkirina rabêja rexneyî” bê bikaranîn. Tehlîlkirina rabêjê; qadên wekî wêje, medya, bîrdozî, rêveberî û gelek qadan da tê bikaranîn. Di tehlîlkirina rabêja rexneyî da, mijarên wekî nijad, zayend, cudahîya çînî, hegemonya, hêz, serdestî, qezenc, berjewendî, cihêkarî, pêkhateya civakî û nîzama civakî derdikevin pêş. Tehlîlkirina rabêja rexneyî, rêbazek e ku li ser van mijaran wekî qadeke lêkolînê disekine (van Dijk, 2003: 352-3729).

Rabêj; formeke îfadekirinê ye ku bi armanca axiftin, nîqaşkirin, xîtabkirin, ragihandina agahîyan û beralîkirina van agahîyan e. Ev forma îfadekirinê, dikare bi awayê hunera şêwekarî yan bihîzbarî, axiftin, xîtabet, jest-mîmîk, metneke nivîskî yan jî bêdengî be. Di rabêjê da şopên rabirdûya takekes, armanc, derûdor û çanda wê heye (Güngör, 2020: 10).

Di rabêjê da xalên giring dikarin weha bên rêzkirin: naveroka peyamê çi ye, peyam ji alîyê kê ve û bi çi armancê hatîye gotin, palpişta peyamê çi ye û muxatabê wî kî ye? Rêgezên ku di nêzîkatîyên rabêjê da derbasdar in ji alîyê *Punch* ve weha hatîye rêzkirin; rabêj, bi qeyd û bend e û li gor van qeyd û bendan tê birêvebirin; rastîyên rabêjê yên wekî takekesî, civakî, sîyasî, çandî û aborî ji alîyê axiveran ve tên hilberandin û tişta ku di rabêjê da xuya dibe azmûnên takekesan e (2011: 215).

Rabêj, ne ji rêzê ye, taybetî ye. Her *rabêj* bi wate ye û di xwe da *peyamekê* dihewîne. *Rabêj*, ji ber ku di derbarê nêrîna axiver a li ser bûyeran, hişmendîya wî, nêrîna wî ya dinyayî û di derbarê şêwaza jîyana wî agahîyan dide me, *bîrdozî* ye (Doyuran, 2018: 307). Foucault*,* rabêjên cuda yên her kesî bi cudahîyên takekesî ve girê dide. Mirovahîyê, di demên cuda yên dîrokî da, rûpoşkên cuda bi kar anîne. Ji ber

vê sedemê jî rabêjên her mirovî hem ji alîyê dem û hem jî ji alîyê dîrokê ve ji hev cuda ne (ji Parker, 2002 vgh. Çelik û Ekşi: 2013: 100).

Rabêj, "*şêweyê vegotinê* ye ku xwe dispêre metnên vegotinê" (Kan, 2022: 79). Li gor Günay (2013: 25), ku dibêje rabêj dikare di derbarê her tiştî da be û her rabêjek xwedî kirdeyekê, wergirekê û mijarekê ye. Takekes di rabêjê da nirxdarazên xwe, helwest û tevgerên xwe nîşan didin. Bi vî awayî kes, di her rabêjê da xwe ji nû ve diafirîne.

Qada tehlîlkirina rabêjî gelekî berfireh e; wêje, civaknasî, psîkolojî, medya, zanistên sîyasî... çend ji qadên bikaranîna wê ye. *Yıldırım*, tîne ziman ku tehlîlkirina rabêjê, di lêkolînên çandî û civakî da rêbazek e ku tê bikaranîn (2018: 237).

Di metn û vebêjeyan da gelek caran dinyayeke bi *wate*ya dualî heye. Ji van wateyan a yekem wateya rasteqîn e û ya duyem jî nêzwate ye. Wateya yekem a darazan a ku di hişê me da xuya dike, wateya rasteqîn e; lê ya li pişt wê xeyala darazê ya birdozî û polîtîk xuya dike, nêzwate ye. Tehlîlkirina rabêjê, di aşkerakirina nêzwateyê da dibe alîkar. Bi vê rêbazê hewl tê dayîn ku armanca gotinê bi derbasbûna ji sînorên zimannasî û dîtbarî yên metnê, bê famkirin (Çetin, 2017: 68).

Doğan (2009: 28) di tehlîlkirina rabêjî da li ser giringîya wateyê disekine. Li gor wî di dema tehlîlkirina rabêjî da xala herî giring ew wate ye ku di kontekstê da pêk tê. Ji wateya peyvê ya ji *ferhengê* zêdetir, divê *wate*ya di nava rabêje da esas bê girtin. Wateyên ku bi *peyv*an nayên îfadekirin an jî nikarin bên îfadekirin, tenê di tehlîlkirina rabêjê da dikarin bên famkirin. Di vê rewşê da di metnê da, ji bo ku ya nayê gotin bê bihîstin û famkirin, pêwîst e ji metnê wêdetir here (Palmer, 2008: 302). Çinku her wateya *peyva* ferhengî û rabêjî dibe ku ne heman wate bin. Ji bo vê jî divê neyê jibîrkirin ku rabêja li gor rewş û şert û mercên ku tê da ne, dibe ku werin *wate*yên cuda (Doyuran, 2018: 308). Lewra, divê mirov ji sînorên hevoksazî û semantîk ên peyv û îfadeyan derkeve û *wate*ya ku jê wêdetir e, vekole (Çelik û Ekşi, 2013: 105).

Tehlîlkirina rabêjî ya rexneyî (Critical discourse analysis) rêbazek e ku îro di tehlîlkirina hunerên nivîskî, devkî û şêwekarî da gelek caran tê bikaranîn. Di vê rêbazê da skalaya mijaran pir berfireh e. Mijarên wekî *zayenda civakî, nasname û newekhevî, nijadperestî û medya* çend mijar in ku derdikevin pêş. Ev rêbaz, gotin û peyvên wekî *zayend, polîtîk û medya* dike navend (ji Wodak, 2001 vgh. Çetin, 2017: 76). Ligel

mijarên ku meyla tehlîlkirina rabêja rexneyî li ser dixebite, pêkan e ku hin mijarên din jî weha bê rêzkirin; bîrdozî, reklam û çanda danasînê, rabêja teorîk, rabêja aborî, xwendin-nivîsandin û perwerde. Di van qadan da li ser mêtîngerî, hevsengîyên hêzê û newekhevîyên binyadî tê rawestîn (Blommaert ve Bulcaen, 2000: 450). *Wodak* a (1997: 6) ku balê dikişîne ser alîyê civakî yê rabêjê, li gor wî rabêj, nasnameyên civakî û têkilîyên di navbera mirovan da pêk tîne. Rabêj, dihêle ku guhertin û nûkirina statûyên civakî li ser pêyan bimîne. Li gor *Wodakê,* hem rabêjên desthildarîyê û hem jî yên muxalefetê bandorê li ser pratîkên civakî dikin û di teşekirina jîyana civakî, sîyasî û çandî da, roleke giring dilîzin (Çakmak ve Bilişli, 2009: 105). Lewra, eger armanceke ku dahûrandina ji bo pirsgirêkên civakî yên wekî polîtîk û bîrdozî hebe, hewce ye tehlîlkirina rabêja rexneyî bê bikaranîn (ji Baş û Akturan, 2008 vgh. Çelik û Ekşi, 2013: 110).

Van Dijk, ku yek ji navên giring ên nêzîkatîya tehlîlkirina rabêjê ye, tehlîlkirina rabêjê bi kurtî wekî 'şêweyê gotina tiştekî' pênase dike. Dijk, li ser "*îma*"yê disekine û dibêje; di tehlîlkirina rabêjî ya rexneyî da ew, yek ji têgihên herî bihêz e. Peyamên di metnan da, hertim bi awayekî aşkera û servekirî nayên dayîn. Lewra, di peyvan û şêweyên îfadeyan da *îmayên bîrdozî* hene (2002: 113). Li gor Van Dijk (2001: 352) ê ku balê dikişîne ser binyada civakî ya rabêjê; rabêj ne tenê têkilîyên civakî nîşan dide, di heman demê da van têkilîyan jî ji nû ve hildiberîne. Di tehlîlkirina rabêja rexneyî da, li ser rêbazên aşkerakirina têkilîyên hêz û serdestîya binyada rabêjê, jinûve teşekirin û lêpirsînan disekine.

Li gor Norman Fairclough, tehlîlkirina rabêja rexneyî, şêweyekî çalakîya civakî ya zimên e. Di vê rêbaza tehlîlkirina navdîsîplînî da insûrên rabêjê yên wekî desthilatdarîya sîyasî û rabêj, tên nîqaşkirin. Fairclough bi Wodakî ra, ji bo tehlîlkirina rabêja rexneyî, hin rêgez dîyar kirine. Ev rêgez: Mebesta tehlîlkirina rabêja rexneyî û pirsgirêkên civakî ne. Rabêj, tevgereke civakî ye û di rabêjê da civak û çand tê avakirin. Rabêj, dîrokî ye û kompleks e. Rabêj, di navbera civak û metnê da têkilîyekê çê dike; tehlîlan dike û rave dike (Fairclough ve Wodak, 1997: 271-280).

BEŞA YEKEM

1. ZAYENDA CIVAKÎ Û TEORÎYA FEMÎNÎST

Di vê beşê da li ser zayenda bîyolojîk û zayenda civakî hatîye sekinîn. Zayenda bîyolojîk û zayenda civakî hatîye berawirdkirin û cudahîyên van her du zayendan hatine nivîsandin. Di derheqê rol û stereotîpên zayenda civakî da agahî hatîye dayîn û li ser pîvangên rol û stereotîpan hatîye sekinîn. Dîsa di vê beşê da li ser teorîyên di derbarê pêkhatina zayenda civakî da agahî hatîye dayîn. Bi mijarê ra têkildar li ser femînîzmê hatîye sekinîn û nêzîkatîyên femînîst ên teorîk lib û lib hatine nivîsîn. Di dawîya beşê da di derbarê pederşahîyê da agahîyên teorîk hatîye dayîn.

1.1. ZAYENDA BÎYOLOJÎK Û ZAYENDA CIVAKÎ

1.1.1. Zayenda Bîyolojîk

Nîzama heteronormatîf, têgiha zayendê bi alîyê bîyolojîk ê mêrbûn an jî jinbûnê ve girê dide (Saygılıgil, 2016: 9). Têgiha zayendê (sex), jinbûn an jî mêrbûnê ji alîyê bîyolojîk ve îfade dike û tê wateya binyada bîyolojîk. Zayend, kategorîyeke demografîk e. Dema zarok ji dayik dibin (heta berî ku ji dayik bibin) li organên wan ên zayendê tê nihêrtin û li gor wê jinbûn an jî mêrbûn tê senifandin. Zayenda ku di nasnameyan da tê nivîsandin, encama tesnîfkirina jin an jî mêrbûnê ye (Y. Dökmen, 2021: 19-21). Herweha Dökmen, li ser mijara cudahîyên bîyolojîk ên zayendî jî disekine. Girêdayî binyada bîyolojîk, di navbera jin û mêran da cudahîyên hormonal hene. Fêrbûna van cudahîyên han tuneye, berevajî ligel welidînê, mirov van taybetmendîyan bi xwe ra tîne (2009: 24-25). Dema li zayenda jin û mêran bê nihêrtin, exlebî bi nihêrtina nîşandera bîyolojîk biryar tê dayîn. Bhasin (2015: 10-11), taybetmendîyên bingehîn ên zayenda bîyolojîk weha rêz dike: Zayend, ji dayikbûnê tê. Zayend, li her derê heman e û naguhere. Zayend, nayê guhertin. Ew bal dikişîne ser cudahîyên organên zayendê ên aşkera û cudahîyên fonksîyona zêdebûnê. Lewra, têgiha zayendê hem rola zêdebûnê dide kesan hem jî taybetmendîya cudahîyên nêrza û mêza bi awayê afirandinê pênase dike (Doğan, 2005: 85).

Têgiha zayendê, li ser zanista civakî, bi du awayan e; têgiha zayenda bîyolojîk û têgiha zayenda civakî. Di van têgihan da têgiha zayenda bîyolojîk, ligel cudahîya tesnîfkirina jin û mêrbûnê, herweha pêwistî bi pênasekirina dîyarkera taybetmendîyên fîzîkî jî tîne. Di vê qonaxê da zêdebûn û organên zayendê di pênasekirina bîyolojîk da insûrên giring in. Li alîyê din têgiha zayenda civakî, tevgerên jin û mêran ên civakî

pênase dike û îşaretî rewşa wan a nêrzabûn û mêzabûnê dike (Oğuz, 2019: 17). Civaknasan, têgiha zayendê exlebî ji bo pênasekirina bedena jin an jî mêran û ji bo ravekirina cudahîya di navbera wan da anîne bikaranîn (Giddens, 2012: 505).

Têgiha zayendê ew fersend daye me ku em wesfên anatomîk, fonksîyonên bîyolojîk, liv û tevger, pêhesîn û xweşîyan, bi awayê çêkirî di nava tevahîyê da kategorîze bikin (Foucault, 1990: 154). Takekes jî bi jin û mêr di nav vê kategorîyê da cihê xwe digirin û li gor wê tevdigerin.

Mirovê ku di nava malbatekê da wekî heyîneke civakî tê dinê, li gor hejmara kromozomên ku ji dê û bavê xwe mîras girtîye, wekî keç an jî kur çavên xwe li dinê vedike. Ji ber vê sedemê, mîrasgirîya bîyolojîk, ji dayikbûnê ve tê dayîn. Çawa ku vebijêrka dîyarkirina zayendê nehatibe dayîn, herweha dayîna mafê hilbijartina nav jî nîn e. Her çendî takekes dema mezin bû nav û zayenda xwe biguherîne jî, ev yek rewşekî îstîsnayî ye. Zayend, ji alîyê bîyolojîk ve di dema dayikbûnê ve tê û ji pêvajoyeke damezrandina civakî derbasî qonaxa zayenda civakî dibe (Bayhan, 2013: 147-148). Bi sedsalan di nava civakê da taybetmendîyên cihêreng ên li ser jin û mêran dihatin qebûlkirin û ew rolên bîyolojîk ên ku hatibûn dîyarkirin, xwezayî dihatin dîtin û nabe ku bihatina guhertin. Berawirdkirina statuya jin û mêran a di nava civakê da jin di asta duyem da ne û sedema vê yekê jî bedena wan e (Saygılıgil, 2016: 12). Ev rewş îsbata nêzîkatîya zayendperest e.

Wekî ku di ravekirinan da xuya dike, têgiha "zayend"ê li gor taybetmedîyên "bîyolojîk" ên jin û mêran tê binavkirin. Jin û mêrbûn, bi awayê bîyolojîk taybetmendîyên xwe hildigirin û nîşan didin. Ev yek bi giranî bi taybetmendîyên fîzîkî û dîtbarî xwe dîyar dike. Nîşenayên zayenda bîyolojîk, gelek caran di cil û libasan da -her çendî rewşên îstînayî hebin jî- xwe dîyar dike. Ev yek, senifandina jin û mêran hêsantir dike.

1.1.2. Zayenda Civakî

Zayenda civakî, nasnameyeke zayendî ye û di cih û demên cuda da, di encama rol û berpirsyarîyên jin û mêran ên civakî da, derketîye holê. Bi vê têgihê, tê dîyarkirin ku taybetmendîyên di navbera jin û mêran da tenê ne cudahîyên biyolojîk in. Di vir da tişta tê dîyarkirin, ew cudahî ne ku çêkêrên wan nirxên civakî ne. Bi vî awayî, zayenda

civakî, di pozîsyona jinan a nav civakê da ji cudahîyên bîyolojîk zêdetir dîyardeyên zayendî li ber çavan digire (Bütün, 2010: 11).

Di sala 1962yan da cara ewil psîkanalîstê Amerîkî Robert Stoller û hevpîşeyên wî yên li Zanîngeha Californiayê "Klînîka Vekolînên Nasnameya Zayenda Civakî" (GIRC) damezrandin. Robert Stoller di sala 1968an da di pirtûka xwe ya bi navê "Sex and Gender" (Zayend û Zayenda Civakî) da pênaseya cudahîya di navbera zayend û zayenda civakî kirîye (Meyerowitz, 2014: 1354). Ji sala 1970yî bi şûn da di xebatên zayenda civakî da sê qonaxên giring hatine qeydkirin: Di qonaxa ewilî da, balê didin ser cudahîya navbera zayendan (ya jin û mêran). Di vir da tê pejirandin ku sedema cudahîyan ji ber zayenda takekesan e. Di qonaxa duyem da balê dikişînin ser rolên zayendan ên fêrbûyî û civakîbûnê. Di qonaxa dawî ango ya sêyem da jî, zayenda civakî ya di hemû pergalên civakî (pederşahî û çînî) da tê ferqkirin ku roleke wê ya navendî heye (Ecevit ûyd., 2011: 4).

Bhasin, taybetmendîyên zayenda civakî weha rêz dike; Zayenda civakî, civak-çandî ye, îcada însên e; ew destnîşan dike ku ev îcad xwedî wesfên nêrza û mêza, modelên liv û tevgerê, rol û berpirsyarîyan in. Zayenda civakî guhêrbar e. Li gor dem, çand û malbatê diguhere. Zayenda civakî dikare bê guhertin (2015: 11). Wekî ku di van taybetmendîyan da jî tê famkirin ku zayenda civakî, ne xwedî binyadeke statîk e; bi gotineke din, ew dînamîk û guhêrbar e. Di civakekê yan jî di çandekê da zagonên civakî ên zayendî dibe ku di civak û çandeke din da neyê pejirandin û ev yek jî tê wê wateyê ku ev tabûyên zayenda civakî ne gerdûnî ne. Bi demê ra em dikarin bibin şahidê guhertina van zagonan. Ev yek jî dide nîşan ku bi guhertina tiştên di nava civakê da tabûyên zayenda civakî jî dikare bi xwe ra biguherîne.

Ann Oakleyê têgiha zayenda civakî tevî civaknasîyê kirîye. Li gor wê, "zayend" di wateya bîyolojîk da cudahîyên navbera jin û mêran e; lê "zayenda civakî" bêhtir newekhevîya jinanî û mêranîya di nava civakê da dide nîşan. Em dikarin bibêjin ku zayenda civakî, bêhtir balê dikişîne ser cudahîyên jin û mêran ên di nava civakê da (Marshall, 2005: 98). Lewra di civakên cuda da zagonên nêrza û mêza yên cuda hene. Lê, hema em dikarin bibêjin ku, exlebî di gelek civakan da tê xwastin ku nêrza divê mêr be, mêza jî divê jin be (Stone, 2007: 56). Dema em li pêvajoyên dîrokî dinihêrin, em dibînin ku jin ji ber zayenda xwe gelek caran rastî cihêkarîyê hatine û ji gelek

mafan bêpar hatine hiştin. Lê ev newekhevîya zayendî, di heyamên pêşîn a dîrokê da rastî me nayê. Ji ber ku çalakîyên mîna şer, siwarî, nêçîrvanî, bikaranîna çekan, bi mêran dest pê dike. Lêbelê mirov piştî ku niştecih bûn mêr, berxwedanîya xwe ya di xwezayê da domand, lê jin di qadeke teng a taybetî da hatin sînordarkirin. Di vê rewşê da mêr ji alîyê fîzîkî ve bû remzeya hêzê, jin jî bêhtir ber bi qadeke pasîf da hate dehfdan (Turan, 2011: 19).

Androsentrîzm û mizojinizm li ser meseleya zayenda civakî gelekî bandor kirîye. Androsentrîzm, tê wê wateya 'mêrnavend". Mêr, di liv û tevgerên mirovan da zagon û model e. Di rêveberîya dewletê da di xebatên huner û zanistê da mêr, li navêndê ye û ev yek jî mînakên androsentrîzmê ne. Mizojinizm, bi yewnanî tê wateya "dijminahîya li dijî jinan" û têkildarî kêmxistina jinan, wekî amûreke cinsî, dayikbûn û kar û barên malê ve tê girêdan (Pilpil Yöney, 2013: 62-63). Simone de Beauvoir, di pirtûka xwe ya "*The Second Sex*" (Zayenda Duyem) da (1949) dibêje, "*kes jin ji dayik nabe, dibe jin" wekî* ku di vê hevokê da jî tê famkirin, taybetmendîya *jinbûnê* ne di dema dayikbûnê da dû ra tê bidestxistin (Smith, 2024: 13). Di hemû civakên tên zanîn da jin hertim wekî keseke din hatîye dîtin (Avcil, 2019: 55). Lewma Beauvoir zayenda bîyolojîk ji zayenda civakî cihê dike û li gor wê tu kes, bi zayenda civakî ji dayik nabe û zayenda civakî bi demê ra tê bidestxistin. Zayenda civakî, bi çandê hatîye damezirandin û ev pêvajoya damezrandinê jî ji ber çanda mecbûrî ye (Aytemiz, 2016: 58).

Zayenda bîyolojîk (jin û mêr) xwezayî ye, lê zayenda civakî (jinbûn û mêrbûn) bi awayê pevxistî ye ku civaka ku zayenda bîyolojîk ew deforme kirîye, hatîye çêkirin. Alîyê fîzîkî yê dîtbarî, teşeyên tevgeran, rol û berpirsyarîyên kesan ên di nava civakê da, minasibdîtinên di derbarê pîşeyan da tevahî civakî û çandî ne (Çolak, 2020: 57). Berktay, îhtimalê dide ku faktorên ku zayenda civakî dîyar dikin; çandî, civakî û dîrokî ne. Lewra, naveroka zayenda civakî bi demê ra li gor civakan diguhere (2014: 16). Bi vê ra, em dikarin bibêjin ku her civak, li gor çarçoveya taybetmendîyên civaka xwe, ji jin û mêran li benda hêvîyên cuda ne. Di nava civaka me da ji jinan hêvîyên erênî yên ku ji wan tên xwastin weha ne: cirxweş, fedakar, kubar, bisebir, rêzgir, pratîk, biterbîye, hestyar, azwer, dilsoz, zarşîrîn, nerm, narîn; ji mêran jî hêvîyên weha tên kirin: wêrek, bihêz, azwer, jixwebawer, bibiryar, merd, berxwedêr, hişk, birûmet (Y. Dökmen, 2021: 109). Zayenda civakî ne ji ber cudahîyên bîyolojîk e, bêhtir ji alîyê jinbûn û mêrbûnê

ve bi van xalan ra têkildar e: gelo em ji alîyê civakê ve çawa tên dîtin, civak ji bo me çi difikire û di tevgerên me da li hêvîya çi ye. Lewra, ev yek li gor çandan diguhere (Köşgeroğlu, 2010: 11). Di encamê da zayenda civakî qalibên jin û mêran yên ji wan tên hêvîkirin di nava xwe da dihewîne. Rolên jin û mêran, terzên wan ên tevgeran, terzên wan ên axiftinê û biryarên wan ên lixwekirina cil û libasan van qaliban dide nîşan û ev yek li gor civakan diguhere (Stone, 2007: 55). Jin û mêr van rolan di xwe da nahewînin, ev rol bi dû ra ji alîyê civakê ya ku li ser wan (jin û mêran) dide ferzkirin, peyda dibe (Aktay, 2019: 11).

Têgiha zayenda civakî, hişmendîyeke zayendî di xwe da dihewîne ku di nav civakê da li gor zayendê tevger, çalakî, pîşe bi kurtasî rolên aîdî qada civakî kijan ji wan maqûl e û kîjan ji wan nemaqûl e, dîyar dike (Uluocak ûyd., 2014: 49). Kes, piştî ji dayik bû êdî dibe berkirdeyekî pêvajoya damezrandinê. Di destpêka pêvajoyê da amûrên ji bo zarokan hatine dîyarkirin, hene. Piştî van amûran dor li cil û libasan û pêlîstokan tê. Ji bo keçikan pêlîstokên pitik tên standin; ji bo kurikan jî pêlîstokên wekî erebe, çek, leşker tên kirîn. Herweha, di vê pêvajoyê da li gor zayenda wan a bîyolojîk, li ser zarokan dîktayeke ku bê ka dê çawa rabin û rûnin, çawa tevbigerin dest pê dike. Bi vî awayî, di nava sê-pênc salên pêşîn da helwest, tevger û rolên ku ji zarok tê xwastin ku di tevahîya jîyana xwe da bi cih bîne, tê damezrandin. Dema ku zarok li dora temenê çar-pênc salî ye, pejirandina wî ya ku xwe wekî keç an kur dibîne, dest pê dike û ew tevger û kirinên li gor zayenda xwe ji hev cuda dike (Vatandaş, 2020: 758). Takekes, di temenê xwe yê pêş da êdî hewl dide ku li gorî tevgerên jê tê hêvîkirin bijî. Mînakên berevajî vê yekê helbet hene, lê hin kesên ku "kirinên ne li cih" li gor xwe wekî kirinên "li cih" dijîn, ew kes gelek caran ji alîyê civakê tên rexnekirin û ji civakê tên dûrxistin. Di vir da em dîsa dibin şahidê nêzîkatîyên zayendî. Dema jinek kirinên ku ji bo mêran hatine dîyarkirin, dike dibêjin "mîna mêran e" û vê mînakê didin, û ev mînak gelek caran di wateya pesindayinê da tê dayîn. Ji ber ku, "ê ku mînak bê dîtin mêr e," mêr; "sergewer" e û ew di pozîsyona "yekem" da ye. Di vir da em dikarin mînakeke berevajî vê jî bidin ku, dema mêrek kirinên ku ji bo jinan hatîye tayînkirin, dike dibêjin "mîna jinan e" û bi vê mînakê ew mêr tê rexnekirin û di vê gotinê da kêmxistin heye. Ji ber ku jin di pozîsyona "duyem" da ne û eger mêr xwe bişibînin wan, di vir da tiştekî pêsnê wî bê dayîn, nîn e. Mêrên ku di nava van tevgeran

da ne, ji nava civakê tên dûrxistin û di ser da dibe ku bedêlên giran jî bidin. Di vê rewşê da tê dîtin ku di civakên pederşahî da stereotîpên zayenda civakê, "zayendî" ne.

1.1.3. Cudahîyên di Navbera Zayenda Bîyolojîk û Zayenda Civakî da

Zayend, têgihîbûneke ku taybetmendî û cudahîyên fîzîkî yên ji dayikbûnê ve hene, îfade dike; lê têgihîbûna zayenda civakî (gender), bêhtir eleqedarî têgihîştina civakê ya cudahîyên di derbarê jin û mêran da dibe. Têgih, di derbarê zayenda civakî da darazên nirxî yên civakî-çandî, ji hêla zayendê ve çawanîya dabeşkirina karên civakî û kodên zayendî yên têkildarî rol û şêwazên zayendî yên civakî di xwe da vedihewîne. Meriv dikare bibêje ku têgiha zayenda civakî, di nava civakê da têkildarî zayendê; tevger, çalakî, pîşe, bi kurtasî eleqedarî hemî rolên girêdayî civakê ên bi mezhûr û ne bi mezhûr ên zayendî, dîyar dike (Uluocak ûyd., 2014: 48-49).

Di destpêkê da gotina "bîyolojî qeder e" ji bo îtiraza cudahîya di navbera zayend û zayenda civakî dihat bikaranîn. Li gor vê îtirazê, zayenda civakî, li ser esasê çandî tê damezrandin (Butler, 2014: 50-51). Girêdayî bîyolojîyê, di navbera mirovan da hin taybetmendîyên cuda hene. *"Cudahîyên zayendî" ji* cudahîyên bîyolojîk ên di navbera jin û mêran ra, tê gotin. Di hucreyan da cota 23. ya kromozoman, kromozomên zayendî ne û ev kromozoman dişibin XX û XYyê. Kromozomên XXê di jinan da, kromozomên XYyê di mêran da hene û ev kromozom, cudahîyên zayendê dîyar dikin. Cudahîyên kromozoman ên jin û mêran, cudahîyên hormonal, ji bo cudahîyên zayendî mînak in. Di pêvajoya civakîbûnê da tiştên ku zarokên kur û keç dielimin, wekî cudahîyên zayenda civakî tên binavkirin. Çand li gor zayenda wan hin tevger, hest û rolan ji bo wan guncaw dibîne. Di hişmendîya civaka zayendperest da jin bermalî ye, dikare karên wekî hemşîretî û mamostetîyê jî bike, herweha ji bo mêran jî karên wekî leşker, endezyar, bazirgan "guncaw" tê dîtin. Em dikarin vê hişmendîyê wekî cudahîyên zayendî mînak bidin, lê ev ne cudahîyên rastî ne û ev yek ji ber encama ku civak zextê li ser takekes dike, çêbûne (Y. Dökmen, 2021: 24).

Zayenda bîyolojîk çawa ku ji genetîkê pêk tê, zayenda civakî jî ji nîgaş û pêşdarazîyên jin û mêran pêk tên. Ev nîgaş û pêşdarazî ji alîyê civak û çandê ve di nav sedsalan da çê dibin (Çolak, 2020: 57). Bhasin, cudahîyên di navbera zayenda bîyolojîk û zayenda civakî weha rêz dike; Zayend, xwezayî û bîyolojîk e; zayend civakî jî civakî-çandî û îcada însên e. Zayend naguhere, li her deverê heman e, lê

zayenda civakî guhêrbar e; li gor dem, çand û malbatê diguhere. Zayend, bal dikişîne ser cudahîyên fonksîyona zêdebûnê; zayenda civakî jî balê dikişîne ser wesfên nêrza û mêza, modelên tevgerînê, rol û berpirsyarîyan (2015: 8-9). Beauvoir û Bhasin, di van xalên ku zayend nayê guhertin, lê zayenda civakî tê guhertin, digihîjin hev. Li gor Beauvoirê, zayend, bûyereke teqez e, lê zayenda civakî, tê bidestxistin (1989: 7).

Li gor Mill, zayenda jinan gelekî çêkirî ye û sedema vê yekê jî ew e ku zayenda jinan a ku di zayenda mêran da bûye bengîn, xwe digihîne. Dibe ku di her kêlîya jîyana rojane da zext û teşwîqên tên dîtin, hin wesfên jinan bihêz bikin û hinan jî lawaz bikin. Mêr, di têkilîya heyî ya bengîn da exlebî hemî jinan, taybetî jî hevjîna xwe dikin "zircahil". Di vir da ya ku esas biaxivin jin in; lê jinan, heta niha tenê ya ku ji wan tê hêvîkirin nîşanî civakê kirine. Hişmendîya ku di xwezaya jinan da hevjînbûn û dayikbûn heye, berevajî vê yekê Mill dibêje; ya ku ji bo armanceke weha zorê li jinan dike, civak e (Mill, 2017: 15).

Di ravekirina cudahîya zayenda civakî da du nêzîkatî hene; Determînîzma bîyolojîk û avahîya civakî. Determînîzma bîyolojîk; liv û tevgerên mirovan li gor bîyolojîyê yan jî karakterîstikên genetîk, rave dike. Determîstên bîyolojîk, balê dikişînin ser heman tevgerên mêrên li mekanên cuda. Ew îdia dikin ku tevgerên mêrên li mekanên cuda, ji ber cudahîya kromozoman e û hormonal e. Detemînîzma bîyolojîk, wekî "nerîna xwezayî" tê îfadekirin. Di vê çarçoveyê da di navbera jin û mêran da ji ber taybetmedîyên fîzîkî û bîyolojîk cudahî hene. Ji ber ku mêr ji alîyê fîzîkî ve ji jinan bihêztir bûn, bûn nêçîrvan û şervan û ji malê dûr ketin. Lê jin, ji alîyê fîzîkî ve lawaz bûn û ji ber taybetmendîya wan a zarokçêkirinê girêdayî malê bûn. Ji ber vê yekê mêr, bi karên derve ra mijûl bûn û jin jî bi karê malê/hundir ra mijûl bûn û karbeşîya civakî derkete holê. Yên ku avahîya civakî diparêzin, têkilîya di navbera zayenda bîyolojîk û zayenda civakî lawaz dibînin. Ji bilî zarokçêkirina jinan, êdî di her qadê da di navbera jin û mêran da tu wateya cudahîyên bîyolojîk nemaye. Bi pêşketina teknolojîyê ra, di roja me ya îro da karên giran ên bi hêza mirov tên kirin pirr kêm mane. Lewra, gelek karên ku mêr dikin, jin jî dikin. Bi heman awayî, karên ku di malê/hundir da tên kirin, mêr jî dikarin bikin. Hebûna bedena jin û mêran, bi dîyarkirina taybetmendîyên me yên civakî (biryargirtin, fikirîn, tevgerîn) ve girêdayî nîn e. Li gor vê nerînê, tevgerên mirovan zêdetir girêdayê civak û çanda mirovan e (vgh. Bayhan, 2013: 153-154).

Wisa tê fikirîn ku lêkolîner Robert Stoller yekem kes e ku têgihên zayend û zayenda civakî ji hev cuda kirîye û pênaseya wan kirîye. Stoller, di berhema xwe a "Sex and Gender" (Zayend û Zayenda Civakî) da (1968) têgihên "zayend" û "zayenda civakî" ji hev cuda kirîye û cudahîya di navbera zayenda civakî û zayenda bîyolojîk, derxistîye holê. Li gor wî, zayenda civakî, tê wateya newekhevîya di navbera jin û mêran da; têgiha zayendê jî xwe dispêre cudahîya bîyolojîk a di navbera jin û mêran da (Segal, 1992: 98). Ji ber ku civak, jin û mêran ji hev cuda dike û herweha ji van her du zayendan hêvîyên cuda dike, ev yek jî dibe sedema neyeksanîya di navbera van her du zayendan da. Di vê çarçoveyê da cihêkarîya zayendî, bêhtir li ser jinan e û jinan ji alîyê civakî, sîyasî, çandî û aborî sînordar dike. Dema weha dibe, jin li gor mêran, lawaztir dibin û dadikevin pozisyona duyem. Jin ji ber ku kesên wekî pir hestyar, şikestî, ji alîyê fîzîkî bê hêz, ji bo malê/hundir guncaw, dayik, lele tê wesfandin, ji wan tê xwastin ku li gor wê jî tevbigerin. Mêr, di her qadê da azad tevdigerin, lê divê jin li gor qalibên civakê tevbigerin. Eger jin berevajî vê yekê tevbigerin, ji civakê tên vederkirin. Di vir da jî tê famkirin ku cihêkarîya zayenda civakî teşe dide hem jîyana jinan û hem jî ya mêran. Lêbelê rewş, xwedî helwesteke li dijî jinan e (Oğuz, 2019: 99).

1.1.4. Rol û Stereotîpên Zayenda Civakî

Rolên zayenda civakî di derûdorên civakî da îfadekirina jinbûn û mêrbûnê ye. Rola zayendî ji bo jin û mêran wekî taybetmendîyên kesayetî û tevgerên guncaw tê îfadekirin. Rola zayendî, tê wateya bendewarîyên çandî. Ji bo mêran tevgerên guncaw ên mêrokî (maskulen), ji bo jinan jî tevgerên guncaw ên jinokî (femînen) wekî binavkirina rolên zayendî derbas dibe (ji Rice vgh. Yaşın Dökmen, 2021: 31). Faktorên ku bandora xwe li ser rolên zayenda civakî dikin gelek in. Em dikarin van faktoran weha rêz bikin; malbat, dibistan, komên hevaltîyê, pirtûk, kovar, pêlîstok, amûrên medyaya girseyî. Ev faktorên hanê li ser danasîn û kesibandina rolên zayendî, sazî û qadê gelekî bi bandor in (Akkaş, 2019: 106-108)

Têgiha stereotîpê, cara pêşî di sala 1992yan da ji alîyê Lippmann ve hatîye bikaranîn û bi awayê "*wêneyê di hiş da*" hatîye terîfkirin (Kayaoğlu, 2019: 40). Lippmann bi rêya berhema xwe ya *Public Opinion* (Raya Giştî) têgiha *stereotîpê* li lîteratûra zanistên civakî zêde kiriye û gotîye ku mirov cihana guhêrbar û tevlihev

rasterast îdraq nake. Li şûna têgihiştineke rasterast mirov dinyayê hêsan dike û paşê îdraq dike. Di vir da stereotîp wekî "kurterêyên zîhnî" xuya dikin (Lippmann, 1922: 81). Feldman jî stereotîpê, wekî *çarçoveya hişî* bi nav kirîye. Li gor wî, ew tişta ku stereotîpê çê dike çarçoveyên hişî ne ku ji taybetmendîyên hevpar ên endamên hemû komê pêk tên. Herweha stereotîp, di derbarê endamên komekê da ji ber ku tenê endamên wê komê ne, xwedî hin bawerî û bendewarîyan in (1998: 82-83).

Ji bo tesbîtkirina stereotîpên zayenda civakî gelek pîvang hatine bipêşxistin. Di nav van pîvangan da ya ku herî zêde tê zanîn ji alîyê Sandra Ruth Lipsitz Bem (1944-2014) ve di sala 1974an da hatîye sazkirin. Bem di envantera rola zayendî da mirovan li gor taybetmendîyên wan dike çar beş: jinane, mêrane, androjen û nedîyar. Ev pîvang di nav pîvangên herî navdar da cih digire. Li gor vê envantera rola zayendî taybetmendîyên jinanetî: dilovan, dilnerm, zarokwarî, kêfxweş, feminen, narîn, nazik, saf, sadiq, şermok, hestyar, îtaetkar, hezkera zarokan û wd. Taybetmendîyên mêranetî: hêrsokî, bêhnteng, bihêz, serdest, takekesî, xweser, zû biryar dide û wd. (Prentice û Carranza, 2002: 269). Envantereke din a rola zayendê ji alîyê Inge Broverman û yên din ve di destpêka salên 1970yan da hatîye bipêşxistin. Ev envanter digel 80 xwendekarên jin û 74 xwendekarên mêr ên zanîngehê hatîye çêkirin û xebateke gelek berfireh e. Li gor vê envanterê hin taybetmendîyên jinanetîyê dikare weha bên rêzkirin: ne bi hêrs, ne serbixwe, zehf hestyar, ji zanistên fen û matematîkê hez nake, zehf pasîf, zehf bê mantiq, ne maceraperest, bi awayekî rehet digirî, ji xwe ne bawer, oldar, zehf bêdeng, birêkûpêk, nazik, zehf girêdayî, bi huner û edebîyatê ra eleqedar. Li alîyê din hin taybetmendîyên mêranetîyê ev in: zehf bi hêrs, ne hestyar, objektîf, ji zanistên fen û matematîkê hez dike, zehf bi mantiq, zehf çalak, qet nagirî, ne zêde bawermend, zehf azad, objektîf, bihêz, despot, zehf maceraperest, materyalist, ji huner û resmê hez nake (1972: 63).

Em dikarin bibêjin ku stereotîpên zayenda civakî, ji alîyê naverokê ve wekî temsîla çar pêkhateyên civakî-hişî tên dîtin. Stereotîpên fîzîkî, stereotîpên ên li gor taybetmendîyên kesayetî, stereotîpên rolan û stereotîpên li gor pîşeyan. Di stereotîpên fîzîkî da eger jin ji alîyê fîzîkî ve xwedîyê taybetmendîyên stereotîpên "jinane" be, tê hizirkirin ku ew jin xwedî taybetmendîyên jinokî ên kesayetî ye, xwedî rolên jinokî ên zayendî ye û xwedî pîşeyekî jinokî ye. Jin ji alîyê fîzîkî ve stereotîpên wekî jinokîbûn, narîn, zirav, nerm tên şayesandin. Ji bo mêran jî; bejinbilind, zexm, qewî tên bikaranîn.

Di stereotîpên aîdî taybetmendîyên kesayetî ên ji bo mêran jî şayesên weha tên kirin: serbixwe, jixwebawer, raser, azwer, hestên xwe nade der. Ji bo jinan jî em dikarin mînakên weha bidin: hestyar, nazik, germ, dilrehm. Di stereotîpên aîdî rolên zayenda civakî da fîgura jinan bi piranî wekî jina malan/dayik tê dîtin. Di rolê bingehîn da jî mêr, wekî "karsaz", "maço" tê wesfandin. Di stereotîpên aîdî taybetmendîyên pîşeyên civakî ên zayendî da ji bo jinan, "jina malan" ji bo mêran jî "karsaz" tê bikaranîn ku ev yek jî di bingeha xwe da rolên di derbarê wan da dide nîşan. Exlebî pîşeyên wekî mamostetîya pêşdibistan, sekreterî, hemşîretî ji bo jinan "guncaw" tên dîtin, ji bo mêran jî pîşeyên wekî şoforê kamyonê, karkerê madenê û hin pîşeyên werzîşê hatîne kodkirin (ji Crawford vgh. Kayaoğlu, 2019: 105-107).

Li gor Zerrin Eren (2015: 21) du taybetmendîyên stereotîpên zayenda civakî yên wekî teswîrî û beralîkî hene. Taybetmendîyên teswîrî ew taybetmendî ne ku civak di jin û mêran da hebûna wan dixwaze. Bo mînak ji jinan lihevbûn û ji mêran jî dijîhevbûn tê hêvîkirin. Taybetmendîyên beralîkî ew taybetmendî ne ku bi helwest û tevgerên jin û mêran ra eleqedar in. Civak hêvî dike ku jin û mêr bi wî awayî tevbigerin. Bo mînak ji mêran tê xwastin ku otoriter bin û di mal da jin û zarokên wan guhdarîya wan bikin, hikmê wan di mal da derbas be. Jin divê nazik bin û divê di axiftina wan da dijûn û xeber tune be (Gökçe Zengin, 2016: 5-6).

Rolên zayenda civakî, çawa ku li gor çandan diguhere, bi demê ra hin cudahî jî di navbera wan da çê dibe. Guhertina jîyana wan a aborî û sîyasî, veguherînên teknolojîk, nêzîkatî û nerînên civakî yên li hemberî jin û mêran, tevahî bandorê li ser rolên adetî yên zayenda civakî dikin. Lewra, zayenda civakî ji qalibên neguhêrbar, netemambûyî zêdetir; bi girêdayî demê, çandê, azmûnên civakî û takekesî ra pêvajoyeke cudahîyan e (Çolak, 2020: 59).

Mêr bi piranî bihêz, wêrek, serbixwe, jixwebawer û jîr in; jin jî bengî, pasîf, bêhêz, hestyar tên pêşkêşkirin. Bi rêya van mînakan rolên zayenda adetî dixin serê zarokan (Çolak, 2020: 72). Cudahîya rolên di navbera jin û mêran da pir guhêrbar e. Mêr wekî serekê malê, xwedîyê milkê û di ol, sîyaset û jîyana xebatê da aktîf, tên qebûlkirin. Li alîyê din, ji jinan tê xwastin ku zarokan biwelidînin û mezin bikin, li nexweş û pîran binihêrin, hemî kar û barên malê bikin û ew di vê çarçoveyê da tên perwerdekirin (Bhasin, 2015: 12). Wekî civakî di derbarê jinbûn û mêranîyê da li gor

van rol û berpirsyarîyên ku di civakê da hatine hilberandin, ev rol û berpirsyarî bi awayên curbecur ji nû ve têne hilberandin. Ji ber darazên civakî ên wekî cihê jinan mala wan e û berpirsyarîya wan a esas di derbarê malbat û malê da ye, dibe sedem ku jin ji cihên xwe ên kar bên vederkirin û di pîyaseya kedê da tenê li ser hin pîşeyan kûr bibin (Saygılıgil 2016: 123). Cihêbûna amûdî ya di pîyaseya kedê da û hîyerarşîya cihê kar ya di navbera jin û mêran da têkildarî pozisyona wan e. Gelek caran jin di cihên kar ên jin û mêr têkil da rastî astengîyan tên û ev rewş dibe asteng ku jin di pozîsyona rêveberîyê da cih negirin. Dikare bê gotin ku jin di pozîsyona rêveberîyê da xuya nakin û di hîyerarşîya kar da li jêr dimînin. Sedema vê rewşê jî ew e ku stereotîp, rol û berpirsyarîyên nav malê, berpirsîyarîya terazandina jîyana xebatê dikeve ser milê jinan. Di lîteratûrê da ji vê rewşê ra "arîka cam" (glass ceiling) tê gotin. Têgih, hem di wateya astengkirina jîyana kar a jinan da ye ku jin bilind nebin pozîsyonên jor û hem jî ji bo astengîyên ne berbiçav tê bikaranîn û herweha ev yek ne qanûnî ye. Arîka cam, li cîhê kar hebûna pîvaneke pêşkeftinê ya lehê mêran nîşan dide. Dema em li pozisyonên rêveberî û venêranê dinihêrin, em dibînin ku piranîya wan ji mêran pêk tên. Hema hema di hemû welat û sektoran da mêr, li gor jinan bi hêsanî terfî dikin û di encama vê da jî bêhtir bergîdanê distînin (Saygılıgil, 2016: 143-143).

Di civakên pederşahî da stereotîpên zayendî mêran wekî raser, bihêz, kesên aîdî qada gelêrî pênase dikin, lê jinan kesên wekî di paş da ne, lawaz û exlebî kesayetên aîdî qadên teybetî ne, pênase dikin. Ev cudahîyên zayendperest ên ku ji nirxdarazîyan têne hilberandin, pirsgirêkên zayendî bi xwe ra tînin. Ev cihêkarî di çarçoveya veqetandina qada taybetî û gelêrî da çê dibe. Di navbera van her du qadan da bicihkirineke wekî jêr û jor derdikeve holê. Wate, mêr di qada gelêrî da pozisyona jor; jin jî di qada taybetî da pozisyona jêr temsîl dikin. Rewşên weha ên cihêkarî, di karbeşîya navbera jin û mêran da bi awayekî aşkera xuya dike (Erdoğan Toker, 2010: 13). Di civakên pederşahî da aqilê mêran, ji ya jinan rasertir tê dîtin. Têkilkirina jinan a bi "hest" ra û têkilkirina mêran a bi "aqil" ra dide xuyakirin ku mêr tên mezinkirin û jin jî tên kêmxistin. Di avahîya adetî da ne pêkan e ku jin bi hişê xwe tevbigere û li ser mijarekê nerîna xwe rast beyan bike (Görücü Öner, 2021: 2019).

Rolên zayendî yên adetî, stereotîp, bawerîya ku jin û mêr ji hev cuda ne û hêvîyên ku xwe dispêrin vê bawerîyê hem ji bo jinan hem jî ji bo mêran encamên neyînî derdixîn holê. Ji ber van rol û stereotîpan, takekes, xwe bi pêş ve nabin û

mehkûmî jîyaneke nebextewer û bêtendurist dibin. Veguherîna stereotîpên zayendî, gelek caran ne hêsan e. Tevî ku takekes dizanin ev stereotîp çewt in jî lê ji ber ku ji alîyê gelek kesan ve hatine pejirandin, veguherîna van stereotîpan zehmet e. Girêdayî vê takekes, di nava jîyana xwe ya civakî û taybetî da neçar dimînin ku li gor van stereotîpên çewt bijîn. Di vê rewşê da takekes, di nava jîyana ku dixwaze bijî û jîyana ku tê da dijî di nava valahîyekê da dimîne. Mînak, eger civak ji mêr hêvî bike ku ew li dijî malbata xwe hişk û serdest be, lê eger ew li dijî malbata xwe fahmdar û lihev be, ew kes wekî kesekî "*serjinik*" tê sûcdarkirin. Sedema vê yekê jî ew e ku takekes, ji sînorên stereotîpan derketîye.

1.2. TEORÎYÊN DI DERBARÊ PÊKHATINA ZAYENDA CIVAKÎ DA

Di psikolojîyê da teorî, bûyer û rewş fikrek dide ku gelo ka ew çima û bi çi awayî derketine holê. Di derbarê heman mijarê da pêkan e ku em gelek teorîyan bibînin. Ev rewş nayê wê wateyê ku ev teorî çewt in, berevajî, bi rêya teorîyan, bal tê ser alîyên cuda yên heman tevgeran. Herçiqas teorî wekî nakokî xuya bikin jî di rastîyê da gelek caran di nava fonksîyoneke hevtemamkirinê da ne (Y. Dökmen, 2021: 41). Di vê beşê da em ê li ser sê teorîyên berbelav ên di derbarê bidestxistina zayenda civakî û cudahîyên di navbera zayendan da rawestin.

1.2.1. Teorîya Psîkanalîtîk

Ya ku psîkanalîtîkê şekilandîye nerînên Freud e. Bingeha teorîya Freud a li ser zayenda civakî ji têgiha *lîbîdoyê* tê. Lîbîdo: "*Enerjîyeke cinsî yê xwedî bingeheke bîyolojîkî ye ku zayenda bîyolojîk û civakî organîze dike.*" (Vargel Pehlivan, 2017: 507). Freud, di teorîya xwe ya pêşveçûna psîkoseksuel da -ku beşek ji nêzîkatîya psîkanalîtîk pêk tê- dîyar dike ku takekes pêşveçûna xwe di pênc heyaman da temam dike: Oral, anal, fallîk, latent û genîtal. Di heyama oral da (0-18 mehî) eleqeya zarok, li derûdora devê wî ye. Di vê heyamê da zarok, bi piranî tiştan dimije û dixe nav devê xwe. Di heyama anal da (temenê di navbera 1,5- 3,5 salî da), eleqeya zarokê bi anusê ra ye û pêvajoyên ku bi terxê ve girêdayî ne di vê heyamê da giring in. Di heyama fallîk da (temenê di navbera 3-5 salî da) bal diçe li ser organê cinsî/genîtal. Di heyama latent da (di navbera 5-13 salî da) tehnên cinsî û eleqe kêm dibe, bi ser da tê asteke ku wenda bibe. Di heyama genîtal da (piştî temenê 12-13 salî) tehnên cinsî di wateya

cinsîtîya kesên gihaştî da cardin derdikevin holê; ev heyam, heyama dawî ya psîkoseksuelê ye (Y. Dökmen, 2021: 42).

Ev teori -pêşketina zayenda civakî- xwe dispêre teorîya Freud a psîkanalîtîkê. Li gor vê teorîyê, organê zayendê yê mêran di fêrbûna nasnameya zayenda civakî û cudahîyên di navbera zayenda civakî yên pitik û zarokên piçûk da rolek navendî dilîze. Di hebûn an jî tunebûna vî organî da rewşa jinbûn an jî mêrbûnê tê ravekirin (ji Giddens vgh. Karaaslan, 2019: 42). Teorîya Psîkoanalîtîk gihaştina zayendî ya zarokan, ji dayikbûnê dide destpêkirin. Xala destpêkê ya vê nerînê ew e ku pêvajoyê, bi têkilîya zarokê ya bi objeyan ra têkildar dike. Zarok ji dayikbûna xwe ve di encama ceribandinan da hewl dide ku têkilîya xwe bi amûrên zindî yan jî bêcan ên li dinyaya derve ra, deyne. Temamîya van têkilîyan, pêvajoya hewla avakirina "ego"yê ye. Ev rewş wekî hewldanek ji bo danîna hevsengîyek saxlem di navbera xwe û yên din da tê dîtin. Rola cinsî ya kur û keçan ji hev cuda dibe, ji ber ku kur û keç bi naskirina zayenda xwe ra nasnameyên xwe yên zayendî bi dest dixin û vê yekê bi rêya superegoyên dê û bavên xwe vediguhezînin xwe (Altan Arslan, 2000: 24-25).

Teorîya psîkanalîtîk, ligel guherînên bîyolojîk yên gihaştina takekesan ra, bi teşegirtina zayend û rolên zayendan ra jî eleqedar dibe. Li gor teorîyê, ji bilî taybetmendîyên fîzîkî yên takekesan, rola mêr û jinan jî ji hev cuda hatine afirandin. Ji ber ku takekes ji qonaxên cuda derbas dibin û pê dihesin ku ew jin û mêr in û di encama şerê binhişî da dibin xwedî rolên mêrbûn û jinbûnê. Dîsa jî Freud, pêşketina rolên zayenda civakî, ji cudahîyên civakîbûnê zêdetir, wekî fonksîyoneke zayenda bîyolojîk dibîne. Wate, di pêkhatina rolên zayenda civakî da balê dikişîne ser kritîkbûna heyama zû a zarokatîyê û dîyar dike ku zarok, di nasname û rolên xwe yên kur û keç da ji alîyê hestyarî ve veberhênaneke hestî ya mezin dikin (ji Fagot, Rodgers, Leinbach, 2000 vgh. Gül Ünlü, 2018: 90).

1.2.2. Teorîya Hînbûna Civakî

Teorîya hînbûna civakî ji alîyê Albert Bandura (1977) ve hatîye pêşxistin û armanca Bandurayî derêxistina holê ya bandora hînbûnên civakî bûye (Y. Dökmen 2021: 59; Yapıcı, 2016: 39). Li gor vê nerînê, mirov wekî lewheyeke vala tê dinyayê. Takekes, di tevahîya jîyana xwe da bi kesên din ra di nava têkilîyê da ye û ev lewhe bi xelat û cezayên ku di bersiva helwest û tevgerên takekes da têne dayîn, teşe digire. Di

nerîna vê nêzîkatîyê da zarok, nasnameya xwe ya zayendî bi rêya bersivdayînên ji tevgerên wî ra yên ku ji alîyê cîhana derve tên dayîn, ava dike û di temenekî pir biçûk da hînî rolên zayendî dibe (Yapıcı, 2016: 39).

Teorîya hînbûna civakî, cureyeke hînbûna nerasterast e ku di encama çavdêrîkirina tevgerên kesên din da pêk tê (Demirbaş û Yağbasan 2005: 367). Li gor vê teorîyê, di şekilgirtina cudahîyên zayendî da çavdêrîkirina tevgerên kesên din, pêkanînên xurtkirin an jî cezakirin û teqlîd faktorên giring in. Di dema hînbûna rolên zayendî da exlebî bal li ser tevgerên mirovên ji heman zayendê ne. Lêbelê, kesên ji zayendên din jî bi baldarî tên şopandin. Li vir armanc ew e ku tevgerên guncaw bên zanîn. Taybetî dê û bav, kesên gihaştî, hevsal, fîgurên bihêz model têne girtin. Ligel van fîgurên din ên di televîzyon, pirtûk û çavkanîyên din da jî dikarin model bên girtin. Di fêrbûna rolên zayendî da her çendî dê û bav, xizm, hevsal, derûdorên nas, gelekî giring bin jî, em dikarin bibêjin ku amûrên medyaya girseyî jî gelekî bi bandor in. Nexasim televîzyon, ji bo zarokan modelên giring pêşkeş dike. Di encama çavdêrîyan da hatîye dîtin ku zarokên temaşayê televîzyonê dikin, bi temaşekirina televîzyonê ra, hînî rolên zayendî bûne. Di hin civakan da bendewarîyên rolên zayendî, aşkera hatîye pênasekirin. Herweha di van civakan da bendewarîya rolên zayendî, bi awayekî hişk tên pêkanîn. Di civakên weha da di reftarên hemû modelên zayendê da hevgirtineke mezin heye. Bi vê hevgirtinê ra, rolên zayendî yên adetî, di nav nifşan da hebûna xwe didomînin (Y. Dökmen. 2021: 59-62).

Teorîya hînbûna civakî cureyeke hînbûnê ye ku dema zarok li gor zayenda xwe tevbigerin têne xelatkirin û dema li gor zayenda xwe tevnegerin têne cezakirin. Ev teorî wê fikrê diparêze ku zarok, tevgerên guncaw ên li gor zayenda xwe bi çavdêrîkirin û hilbijartina modelan hînî dibin. Li gor vê teorîyê, sedema ku hin zarok li gor zayenda xwe tevnagerin ew e ku van zarokan hînî tevgerên her du zayendan dikin û ji bo vê jî têne xelatkirin (ji Pery û Pery vgh. Kavuncu, 1987: 8).

Jîngeh, ji bo ku takekes rolên li gor zayenda xwe hînî bibin, çavkanîyeke pir dewlemend e. Zarok ji bo çavdêrîya li ser tevgerên zayendî di pêvajoya civakîbûnê da gelek caran firsendê dibînin. Dû ra, piştî ku zarok hevşibîyên aîdî zayendê ferq dikin, êdî dest bi teqlîda tevgerên kesên din dikin. Di vê xalê da zarok, bêhtir hemcînsên xwe wekî hevalê xwe yê lîstokê dibînin. Bi demê ra zarok, ji ber ku giringîya civakî ya ku

ji zayendê ra tê dayîn ferq dikin, bêhtir bala xwe didin tevgerên zayendî û li gor wê tevgerên xwe serrast dikin (Miller, 2017: 270). Bi vî awayî, zarokên ku li gor xwastekên civakê tevdigerin, aîdîyeta wan a li hemberî civakê zûtir çê dibe. Zarok, ji ber ku wekî zarokên din ên civakê tevdigerin, tên pejirandin û bi vê pejirandinê ra jî civakîbûna zarokan leztir dibe.

1.2.3. Teorîya Pêşveçûna Kognîtîv

Lawrence Kohlberg, teorîya pêşveçûna kognîtîv a Piaget, esas girtîye û bi pêş ve birîye. Li gor teorîya kognîtîv zarok ewil hînî nasnameya xwe ya zayendî dibin. Paşê dema ku hînî nasnameya zayendî ya kesên din dibin ew çax êdî hînî helwest û tevgerên qalib ên di derbarê zayenda da jî dibin. Li gor vê teorîyê, zarok ne tenê di nava reftarên rast da tevdigerin, ew di heman demê da hînî rolên zayendî û pêşdarazîyan jî dibin (Onur, 1997: 183; Vatandaş, 2011: 35).

Li gor nêzîkatîya bingehîn a kognîtîvê, pêdivîya mirovan bi hevgirtina kognîtîvê heye. Rêyeke ji bo domandina vê hevgirtinê ew e ku di zarokan da meriv divê bizane gelo ka meriv çawa dibe keça herî guncaw an jî kurê herî guncaw. Dema zarok fam dike ku ew keç e, reftarên jinokî nîşan dide; dema zarok fam dike ku ew kur e, ew ê dest bi tevgerên mêrokî bike. Ev teorî ji teorîya hînbûna civakî cudatir e; sedem ne ew e ku ew bi xelatkirinê dixwazin bibin jinokî yan jî mêrokî; sedema tevgerên wan a esas ew e ku nasnameya xwe wekî keç an jî kur dibînin (Y. Dökmen, 2021: 65). Li gor teorîya kognîtîv, zarokên ku di *hînbûna civakî* da pasîf in di şîrovekirin û avakirina dinyayê rolekî çalak dilîzin (Lindsey, 2005: 57).

Li gor Kohlberg, pêşveçûna rola zayendî ya zarokan ji sê heyaman pêk tê. Di heyama etîketkirina zayendê (gender labeling) da zarok, hêdî hêdî serwext dibin ku ew ji du zayendan aîdî yekê ne. Ev rewş, di navbera temenên nêzîkê 2-3,5 salî da tê dîtin. Di vî temenî da zarok dizanin zayenda wan keç e yan kur e. Zarok di vê heyamê da hêj ne serwext in û nizanin zayend neguhêrbar û mayînde ye. Mînak, keçek dikare bibêje, dema ez mezin bibim ez ê bibim bav. Di heyama biryardarîya zayendê (gender stability) da zarok, êdî fam dikin ku zayenda kesan domdar e. Lêbelê ew dîsa jî di bin bandora taybetmendîyên fîzîkî yên mirovan da dimînin. Mesela, dibe ku bifikirin eger porê keçekê hatibe kurrkirin, ew ê bibe kur. Ev heyam di temenê navbera 3,5-4,5 salî da tê dîtin. Di heyama neguhêrbarîya zayendê (gender consistency) da zarok, êdî dibin

xwedî wê hişmendîyê ku zayend, neguhêrbar e. Di vê heyamê da zarok têdigihêje ku zayend ji xuyangîya fîzîkî serbixwe ye û xuyangîya fîzîkî her çawa be jî, zayend nayê guhertin. Ev heyam, di temenê navbera 4,5-7 salî da tê dîtin (Y. Dökmen, 2021: 66-67).

1.3. FEMÎNÎZM

Rehê femînîzmê xwe digihîne serdema Ronîbûnê ku wê demê jinên wekî Lady Mary, Worthey Mantagu û Margius de Condorcet ji bo ku jin ji mafên xwe yên perwerdeyê sûd wergirin micadele dikirin (Akyıldız Ercan, 2014: 26). Têgiha femînîzmê ji alîyê rewşê ve gelek têgihan di xwe da dihewîne. Ji alîyê dîrokî ve ne pêkan e ku em destpêka femînîzmê ji yek xalê hilberînin. Li gor hinekan ev têgih ji peyva latînî ya "femina" tê û tê wateya mêza; ji bo hinekan jî femînîzm, mîna bîrdozîyên "îzm"ên din ên sedsala 19an e. Aşkera ye ku femînîzm ne nêrza ye. Lê mirov nikare bibêje ku jin komeke homojen in û xwedî heman peywendîyan in. Dema ku em mijara têkoşîna li dijî cihêkarîya civakî ya li ser jinan vekolin, em ê bibînin ku femînîzmên cuda hene. Tenê mirov li serdema nêz jî binêre dê bibe şahidê bizava femînîst ên cuda yên wekî femînîzma radîkal, femînîzma lîberal, postfemînîzm û femînîzma nû. Lewra, ne pêkan e ku em behsa femînîzmeke hevpar bikin. Gelek bizavên femînîst, jinan wekî qurban an jî obje nabînin, beravajî, wekî kesên çalak ên ku çalakîyan li dar dixin dibînin. Ji ber vê yekê em dikarin femînîzmê wekî hewldana teorîk û zanistî ya tevgera jinan û tevgera jinan a li dijî cihêkarîyê binirxînin. Ji ber van sedeman femînîzm, nûnertîya tevgereke civakî dike (Notz, 2012: 9-10). Armanca vê tevgerê ew e ku dawî li zayendperestîyê, mêtîngerîya zayendî û zextan bîne (Özkazanç, 2018; 249). Wekî ku ji pênaseya Arat jî tê famkirin, bizava femînîzmê, "*Tevgereke sîyasî ye ku xwe dispêre teorîya wekhevîya zayendî, daxwaza mafên wekhev ên jinan dike û di esasê xwe da dixwaze têkilîya desthilatdarîyê ya di navbera jin û mêran da biguherîne.*" (2010: 29-30). Jinan daxwaz kirin ku zext û mêtîngerîya li ser wan bê rakirin û bi mêran ra bibin xwedî mafên wekhev. Ev daxwazên hanê armanca femînîzmê ya bingehîn e.

Femînîzm bizavek e û di dema *Şoreşa Fransî* da derketîye holê; du sed sal zêdetir e ku bandora wê dewam dike. Ev bizav, di nîvê duyemîn ê sedsala 20'emîn da hîn xurttir bûye. Ji dema derketina femînîzmê ve mijara sereke ya tê nîqaşkirin

newekhevîya di navbera jin û mêran da ye, û li ser pirsgirêka çawanîya rakirina vê newekhevîyê hatîye rawestan. Bizava femînîzmê dikare weha bê pênasekirin ku ew ji alîyekê ve ji bo jinan daxwaza maf û fersendên hevpar dike lê ji alîyekê din ve jî dibêje jin ji mêran cuda ne û divê ev cudahî li ber çavan bê girtin (Güriz, 2011: 13-14). Li gor femînîzmê, heta ku pergala pederşahî (patrîyarkal) parçenebûna xwe bidomîne û heta ku jin bindestîya aborî ya navmalê bipejirînin, rizgarîya jinan ne pêkan e (Michel, 1984: 144).

"*Femînîzm, tevgereke civakî ye û di sedsala 18an da li Îngilîstanê derketîye holê, ew bi berfirehkirina mafên jinan hewl dide ku wekhevîya zayendî pêk bîne.*" (Marshall, 2005: 240). Femînîzm, tevgereke civakî ye ku hevgirtina jinan dike şert û merc, li hemberî cihêkarîya zayendî serî natewîne, di her qadê da bi zayenda dijber ra mafên wekhev daxwaz dike û li dijî nirxên nîzama pederşahî derdikeve (ji Yazıcılar 2018 vgh. Oğuz, 2019: 15). Femînîzm; aborî, çand û civaka kapîtalîst-pederşahî ya plankirî dixe navenda rexneyê û ji bo guhertina wan hewl dide ku stratejîyên çalakîyên pêwîst bibîne (Notz, 2012: 13). Serhildana femînîzmê ji bo lêpirsîna binyadên pederşahî yên di bin hemû newekhevîyan da ye. Femînîzm cîhaneke dadwer ji kesên qadên cîyawaz ên wekî çîn, pêşeroj, zayenda civakî ra ava dike (Gaag, 2018: 57).

Fikrên Hooks ên di derbarê femînîzmê da weha ne: Femînîzm tevgerek e û dixwaze dawî li zayendperestî, mêtingerîya zayendî û zextê bîne. Li vir, pirsgirêka bingehîn, "zayendperestî" ye. Ev pirsgirêk ji ber teşeyên fikr û çalakîyên zayendperest derdikeve. Kesê ku zayendperestîyê dike jin be, mêr be, zarok be yan jî mezin be ferq nake û tiştekî naguherîne. Ji bo ku mirov femînîzmê fam bike, divê pêşî zayendperestîyê fam bike. Gelek kes di mijara zayendperestîyê da ne serwext in yan jî eger serwext bin jî vê yekê ji xwe ra nakin pirsgirêk. Ramana zayendperestîyê ev yek hînî mirovan kir ku mirov hev bê rehm didarizînin û ceza dikin. Ramana femînîst bû sedem ku jin nefreta li dijî hev ji serê xwe biavêjin. Bi ramana femînîst jinan, xwe ji desthilatdarîya fikrên pederşahî rizgar kirin (2012: 12, 27).

Li gor femînîzmê, cihêkarîya di navbera jin û mêran da xwedî bingehên saxlem nîn e. Ji bo jinan di hilbijartina hemşîretîyê û nehilbijartina emlaqçitîyê da sedem ne ew e ku jin ji alîyê bîyolojîk ve ji mêran cuda ne; sedema vê yekê cudahîyên çandî yên di nava civaka serdest da ye (ji Freeman 1994 vhgzr. Güriz, 2011: 68). Rewşenbîr,

nivîskar û femînîsta fransî ya navdar Simone de Beauvoir, di pirtûka xwe ya bi navê *"The Second Sex*" (Zayenda Duyem, 1949) da -ku tê da fikrên giring ên li ser jin û jinbûnê pêşkêş kirîye- dibêje ku "*Kes jin ji dayik nabe, dibe jin."*. De Beauvoir, tevî ku jin rastî muameleyên nebaş hatibin jî bi dilgermî bawer dike ku jin bi tu awayî ji mêran ne kêmtir in (Gaag, 2018: 16). Li gor Beauvoirê, di jinbûna mirovan da zayenda wan a bîyolojîk a mêza bandor nake, jinbûn tiştekî wisa ye ku piştî avakirina civaka zayendî tê bidestxistin. Jin li gor xwastekên civakê teşe digirin. Çanda jê derketine li ser jinan bandor dike û wan vediguherîne (Von Floton, 2024: 18). Nivîskar, herweha di pirtûka xwe da bal dikişîne ser giringîya serxwebûna aborî. Li gor wê ev rewşa ku jin tê da ne, ji alîyê kevneşopîyên berê, pêşdarazî û qanûnan ve şekil girtîye (Michel, 1984: 131-132). Nivîskar, dide xuyakirin ku ji bo jinan xwenasîn, bi rêya derketina ji qadên taybetî û têketina qadên gelêrî çê dibe. Ango jin piştî ku serxwebûna xwe ya aborî bi dest dixin êdî dikarin ji hebûna xwe ya berê derkevin. Yekane rêya ku takekes hem bibe mirov û hem jî bibe jin ew e ku jin li derveyî cîhana malê xwe bide nîşan (Direk, 2012: 75).

Di derketina femînîzmê da sê faktorên bingehîn hene: 1. Femînîzm tevgereke rewşenbîrî ye ku ji rehê xwe ve Ewropî ye. Lewra sebeba yekem a di derketina femînîzmê da zext û neheqîyên li ser jinan a di dîroka Ewropayê da bû. Di nav sebebên bingehîn ên derketina femînîzmê da mirov dikare li ser van xalan bisekine: Jin ji serdema pêşîn ve ji heqê mîrasê mehrûm mane, ew bi dilê xwe nezewicîne û mêrê xwe nebijartine, nekarîbûne bibin xwedî mal û milk. 2. Sedemeke din a derketina femînîzmê jî Felsefeya Serdema Ronîbûnê ye ku jinan nikarîye di nav vê felsefeye da cih bigirin. Serdema Ronîbûnê hem di xebatên xwe da hem jî di doktrîna mafên xwezayî da ku di vê serdemê da hatîye sepandin, cih nedaye jinan. Lê di bin bandora felsefeya Humanîst û Ronîbûnê da jinan, dest bi lêpirsîn û pirsgirêkên jîyana xwe kirin. Jin, bûn rêxistin û dest bi daxwaza mafên xwe kirin. Ji ber vê yekê yek ji faktorên herî giring ên derketina femînîzmê ew e ku jin ji pêvajoya Ronahîyê û şoreşê hatin dûrxistin û ji ber ku tişta lê digerîyan nedîtin, biryar dan ku ew bi xwe li mafên xwe bigerin. 3. Di pêkhatina femînîzmê da faktora sêyemîn a bandorker, Şoreşa Pîşesazîyê ye. Ji ber ku şoreşa pîşesazîyê, ligel pêşveçûnê xulamtîya kedê bi xwe ra anî, jin jî di vê serdemê da hem bûn xulamên xwedîyên fabrîkayan û hem jî bûn xulamên malbatên xwe. Ji ber vê xulamtîya dumendî, jin pir westîyan. Bi demê ra dengê lingên femînîzmê hêdî hêdî

hate bihîstin. Êdî jinan sond xwaribû ku dê mafên xwe bi xwe biparêzin, (Öztürk, 2011: 23-42).

Femînîzm ew hewla xwerizgarkirina jinan e ku di dîrokê da her wext di pozîsyona duyemînî da hatine mehkûmkirin. Femînîzm, di bingeha xwe da li ser mafên jinan, pirsgirêkên jinan û pozîsyona duyemînî ya jinên di civakê da radiweste; li dijî pergala pederşahî, nêzîkatîyên zayendperest û her cure zext û zordarîya ku jin tê ra derbas dibin, radiweste. Herweha li gor femînîzmê divê jin di warên civakî, sîyasî, hiqûqî, aborî û çandî da wekî mêran xwedî mafên wekhev bin. Divê jin wekî kesên azad, ew bi xwe şekil bidin jîyana xwe (ji Arat, 2017 vgh. Görücü Öner, 2021: 34). Xala navendî ya femînîzmê, jin e. Ji alîyê jinan ve mijarên wekî cih û jîyana jinan a di nav civakê da, pirsgirêkên ku di malê da rû bi rû dimînin, zehmetîyên ku di pergala serdest a mêr da rû bi rû dimînin, mûçeyên ku li gor mêran kêmtir distînin an jî ji ber ku jin in nikarin di gelek karan da bixebitin, hatine rexnekirin. Di nav armancên sereke yên femînîzmê da ev hene; divê jin azad bin û bi mêran ra bibin xwedî mafên wekhev. Divê di birêkûpêkkirina qadên gelêrî da serdestîya mêran bi dawî bibe. Sernavên bingehîn ên ku femînîzm li ser disekine ev in; di mijarên wekî perwerde, kar û xwedîkirina zarokan da divê wekhevîyek di navbera jin û mêran da çê be, divê şîdeta li ser jinan bi dawî be, tacîz û destdirêjî divê ji holê rabin ûyd. (Taş, 2016: 165).

1.3.1. Pêlên Femînîzmê

Ji ber ku pênaseyeke yekane û westar a femînîzmê û teorîya femînîst tune ye, bi heman awayî di derheqê pêvajoyên dîrokî yên femînîzmê û tevgerên femînîst ên dîrokî da nêrînên cuda hene. Her çendî pêvajoyên pêşveçûna femînîzmê di nav pêlên cuda da hatibin dabeşkirin jî, lê ji van pêlan exlebî sê pêlên kronolojîk hatine pejirandin. Ev wekî pêlên femînîst I. II. III. hatine pênasekirin. Ev her sê pêlên femînîst, ji sedsala 19an heya sedsala 21an e. Pêla yekem a femînîzmê di dawîya sedsala 19an da derket holê û di destpêka sedsala 20an da bi bandor bû. Ev heyam bi piranî ji daxwazên jinan ên ji bo mafê dengdan û hilbijartinê pêk tê. Pêla duyemîn a femînîzmê, salên di navbera 1960-1980yî ye. Di vê heyamê da bûyerên sîyasî û newekhevîyên qanûnan dibe mijar. Femînîzma pêla sêyem ji salên 1990î heta roja me ya îro ye. Ev heyam ji gelek beşên cuda yên çalakî û lêkolînên femînîst pêk tê. Li jêr dê di derbarê sê pêlên femînîzmê da bi hûrgilî agahî bên dayîn.

1.3.1.1. Pêla Yekem a Femînîzmê

Tevgera femînîst, bi *femînîzma pêla yekem* ra dest pê dike û derketina wê rastî dawîya sedsala 19an û salên pêşîn ên sedsala 20an tê. Peyva femînîzmê cara yekem di salên 1880î da li Fransayê, di salên 1890î da li Brîtanyayê û di salên 1990î da li Amerîkayê derketîye holê. Têkilîya dayik-zarokê di van heyaman da di nav pêwendîya femînîst a yekemîn da, bal kişand ser xwe. Axirî, têkilîya bav-zarokê ji xwe di bin parastina qanûnan da bû. Ev rewş bi taybetî di salên 1830 û 1840an da ji alîyê sosyalîstên utopîk ên fransî ve bal li ser hatîye kişandin. Her çendî tê îdiakirin ku fîlozofên yewnanî Arîsto û Platon di cîhana kevnar da femînîst bûn jî, di vê serdemê da sehkirin û cudakirina dengên jinan pir zehmet e. Yek ji fîlozofên wê serdemê Sopho, li gor pîvanên roja me femînîst e. Di sedsala 17an da, bi pêşketina mezheba non-conformîst ra, jin bêhtir dibin xwedî gotin. Di sedsala pêş da (18), bêhtir jin derketin pêş û bi guhertina rol û perwerdeya jinan ra, wan kêfxweşîya xwe anîn ziman. Mary Astell di vê serdemê da exlebî wekî yekem nivîskara femînîst derbas dibe. Astell, di nav yekem nivîskarên ingilîz da ye û analîzên wê xîtabî roja me ya îro dike. Nivîskar dezgehên bi perwerdeya jinan ra têkildar saz kirîye. Astel û Behn, zemîna teorîya femînîst a sedsala 17an ava kirine. Mary Wollstonecraft, yekem nivîskara femînîst a di serdema Ronîbûnê da ye û ji perspektîfa femînîst ve berhema yekem nivîsîye (Oğuz, 2019: 25-26). Wollstonecraftê, di xebata xwe ya bi navê "*A Vindication of the Rights of the Women*" (Parastina Mafên Jinan, 1792) da bal kişandîye ser maf û perwerdeya jinan. Li gor wê astengîya herî mezin a li pêşîya serxwebûna jinan bê perwerdebûn e. Wollstonecraft di derheqê perwerdeyê da weha dibêje; "*Eger jin ji bo ku bibe hevrêyê mêrî bi perwerdeyê neyê mezinkirin, wê li pêşîya belavbûna zanîn û fezîletê bibe asteng; ji ber ku heqîqet, divê vekirî be û her kes karibe xwe bigihînê, wekî din di pratîkê da dê bê bandor be.*" (Wollstonecraft, 2012: 3).

Fikra ku jin bi mêran ra wekhev in, cara yekem di dema şoreşa Fransayê da hate rojevê. Yekemîn lêkolînên teorîk ên li ser mafên jinan rastî vê serdemê tên. Berhemên yekem ên teorîya femînîst dikare wekî pirtûka Olympe de Gougesê ya "*Declaration of the Rights of Woman*" (Deklarasyona Mafên Jinan) û pirtûka Mary Wollstonecraftê ya "*A Vindication of the Rights of the Women*" (Parastina Mafên Jinan) bê nîşandan. Giranîya sereke ya Wollstonecraftê ew bû ku divê ji bo jinan jî pênaseyekê di nav rêgezên bingehîn ên Şoreşa Fransî yên wekî wekhevî, azadî û

hevgirtinê da bê kirin. Têgiha ku li vir rola sereke dilîze, têgiha "hevwelatîbûn"ê ye. Ji ber ku zayend û koka etnîkî ya mirovan çi dibe bila bibe, ew di bin pênaseya hevwelatîbûnê da li pêşberî qanûnê xwedî maf û berpirsîyarîyên wekhev in. Di dawîya sedsala 19an da rêzikên qanûnî yên heyî li pêşîya wekhevîya ku ji alîyê têgiha hevwelatîbûnê ve tê dayîn, dibe asteng. Di vê serdemê da jinan ji bo hişmendîya derfetên wekhev micadele kirine. Jin di sedsalên 18 û 19an da ji gelek mafên ku îro hene, bê par mabûn. Nikaribûn bibin xwedî milk, nikaribûn bi bazirganîyê ra mijûl biban û ji mafên mîrasê nikaribûn sûd werbigirtana. Di vê serdemê da rojeva tevgera femînîst têkoşîna li ser mijarên wekî perwerde, milk, hiqûqa malbatê û mafê dengdanê bû (Ayata û Gölgelioğlu, 2011: 66; Millet, 2011: 138).

Di vê serdemê da serkeftina herî mezin a tevgera femînîst, naskirina mafên jinan ên dengdan û hilbijartinê bû ku mîna pêlê, li hemû welatên cîhanê belav bû. Ew welatên ku mafên sivîl tê da zêdetir pêşketî bûn, welatên yekem bûn ku mafê dengdana jinan dane wan. Wekî mînak di sala 1893yan da li Zelandaya Nû, di sala 1902yan da li Awustralyayê û di sala 1913an da li Norwêcê mafê dengdanê û hilbijartinê dan jinan. Fransayê heta sala 1946an jî mafê dengdan û hilbijartinê nedabû jinan. Li Tirkîyeyê jinan, di sala 1930î da dest bi dengdana hilbijartinên xwecihî/şaredarîyan kirin û di sala 1934an da mafê dengdan û hilbijartinê bi dest xistin (Ayata û Gölgelioğlu, 2011: 66-67). Herçiqas femînîstên pêla yekem di bingeha xwe da bi daxwaza "mafê dengdanê" derketibin holê jî, wan daxwazên wekî mafê milkîyetê, mafê mîrasê, mafê perwerdeyê, mafê hevberdanê, mafê kurtajê û di derbarê xwedîkirina zarokan da mafê wekhevîyê jî kirin (Görücü Öner, 2021: 37). Herçiqas pêla yekem a tevgera femînîzmê di bingeha xwe da daxwaza mafê dengdanê yê jinan kiribe jî, herweha jinan di mijarên wekî milkîyet, mîras û perwerdeyê da jî bi mêran ra mafên wekhev dixwastin. Hin rexne li tevgerên femînîst ên vê serdemê hatin kirin. Li gor van rexneyan, tevgera femînîzmê ya pêla yekem herçiqas jinan tevlî qada gelêrî kiribe jî dîsa newekhevîyên di qada taybetî da paşguh kir. Di vê serdemê da li ser gelek mijarên di derbarê malbat û xwedîkirina zarokan da nehate rawestan (Ayata û Gölgelioğlu, 2011: 67).

1.3.1.2. Pêla Duyem a Femînîzmê

Tevgera femînîzmê ya pêla duyem, exlebî di navbera salên 1960 û 1990î da ye. Em dikarin rewşên ku şekil daye femînîzma vê serdemê weha rêz bikin: zêdebûna rêjeya perwerdeyê ji bo jinan, başkirina standardên jîyanê li Ewropayê, ligel

pêşketinên tibbî zêdekirina kontrola li ser bedena mirovan, ûyd. Berhema Simone de Beauvoirê "*The Second Sex"* (Zayenda Duyemîn) û ya Betty Friedanê "*The Feminine Mystique*" (Nepenîya Jinbûnê) herî zêde bandor li tevgera femînîzmê ya vê serdemê kirine. Di van her du pirtûkan da rewşên jinbûnê û wateya jinbûnê ya di civaka pederşahî da tê pirsyarkirin (Ayata û Gölgelioğlu, 2011: 67-68). Rêxistinkirina hişmendîya femînîst bi femînîstên nifşê duyem ra xurttir bû. Betty Friedan di sala 1966an da li Dewletên Yekbûyî yên Amerikayê NOW (National Organisation of Women/Rêxistina Neteweyî ya Jinan) damezrand. NOW, bi taybetî jinên zewicî û xwedî zarok anîn cem hev û li bersiva pirsgirêkên wan gerîya (Sevim, 2005: 51).

Femînîstên pêla duyem, bi slogana "*tişta şexsî polîtîk e*" dest bi rêya xwe kirine. Femînîstên vê serdemê li dijî wê fikrê sekinîne ku mêr bi qadên gelêrî ra û jin jî bi qadên taybetî ra hatine têkildar kirin û ew li hemberî mêtîngerî û xulamtîya li ser jinan sekinîne. Jinên ji qadên gelêrî hatine vederkirin û paşguhkirin di vê serdemê da ji bo wan hewl hatîye dayîn ku ew xuya bikin û yekdestdarîya nêrza ya di hiqûqê da bê şikandin (Arat, 2010: 9).

Armanca tevgera femînîzmê ya pêla duyem ew e ku dawî li helwestên zayendperest ên di civakê da bîne. Femînîzma pêla duyem, ligel rexneyên civakî yên li ser malbatê, herweha nirxên zayendî yên ku li ser mêr û jinan tên barkirin jî rexne dike. Di vê serdemê da tê destnîşankirin ku nerîna malbatê ya ku jinan di pozîsyona duyem da dibîne, di roleke navendî da ye. Tê destnîşankirin ku eger cihêkarîya heyî ya di "qada taybet" da ji holê neyê rakirin, xebatên pêla yekem a femînîzmê yên ji bo wekhevîya jin û mêran (ên di qadên "sîyaset, perwerde û kar" da) dê bi ser nekevin. (Bora, 2005: 40). Tevgera femînîst a pêla duyem, ji bo pozîsyona duyem a jinan çareyan peyda bike, hin xebat kirine. Wan, newekhevî û ferqa pozîsyona di navbera jin û mêran da bi têgiha *hêza aborî* rave kirine. Ji bo keda jinan a ku di navmalê da nayê dîtin xuya bike, ketin nava hewldanan. Ji ber ku keda jinan a di qada taybetî da her berdewam e û ji ber ku ji bo keda wan têgiha mesaîyê nîne, keda jinan nayê dîtin. Karê malê ji ber ku qezenca aborî nade, wekî kar nayê hesibandin. Ev rewş dibe sedem ku keda jinan a di qada taybetî da dibe kedeke ji rêzê (Aktay, 2019: 24).

Yek ji mijarên ku femînîstên pêla duyem anîne rojevê, têgiha "xwişkîtî" (sisterhood) ye. Ev têgih, tê wê wateyê ku hemû jinên cîhanê ji alîyê mêran ve rastî

zextê tên û hemû pirsgirêkên wan hevpar in. Ji ber vê yekê ji bo ku jin pêwendîyeke xwişkîtî bi êkûdu ve bên girêdan, piştgirîya hev kirine. Jin hem li dijî pergala serdest a mêran hem jî li dijî ramana zayendperest a di nava xwe da micadele kirine (Görücü Öner, 2021: 41). Rehê xwişkîtîya femînîst, li ser bingeha parvekirina berpirsyarîya têkoşînê ya li dijî hemû şêweyên bêdadîya pederşahî, hatîye avakirin. Hevgirtina polîtîk a di nava jinan da hertim zayendperestîyê lawaz dike û ji bo hilweşandina pergala pederşahî, zemîneke guncaw ava dike. Jinan dizanibûn ku heta bi pirsgirêka çînî ya li dijî pederşahî ra rû bi rû nemînin, hişmendîya xwişkîtîyê ya polîtîk, wê pêk nehata. Jinan ji bo wan jinên din ên ku li ser wan zext heye dev ji desthilatdarîya xwe ya ku rê dide çewsandin û mêtingerîyê berdan û ji derveyî sînorên xwe xwişkîtîyek ava kirin (Hooks, 2012: 29, 55).

1.3.1.3. Pêla Sêyem a Femînîzmê

Tevgera femînîzmê ya pêla sêyem, di destpêka salên 1990î da derdikeve holê û qala kêmasîyên tevgera femînîst a pêla duyem dike. Wan destnîşan kirin ku ligel mijarên gerdûnî, jin divê bi serê xwe bê vekolîn. Femînîstên pêla sêyem, exlebî li ser mijarên wekî sîyaset, zayend û nijadê rawestîyane (Taş, 2016: 172). Herweha bi polîtîkayên mîkro yên wekî tundîya li ser jinan û hêzkirina jinan ra jî eleqedar bûne. Di warê naverokê da femînîzma pêla sêyem, li gor femînîzma pêla yekem û duyem, li ser mijarên cihêrengtir sekinî ye. Eleqeya wê tevgerê zêdetir bi mijarên ku jinan sînordar dike û zextê li wan dike ra bûye (Özveri, 2009: 210).

Tevgera femînîst a pêla sêyem, ji gelemperîkirina pirsgirêkên jinan zêdetir, bi pirsgirêkên takekes ên jinan ra mijûl bûne. Meyla femînîstên vê serdemê ew e ku li ser pirsgirêkên takekesî yên jinan sîyaset bikin. Di vê serdemê da jin hem wekî rola zayendî û hem jî wekî nasnameyekê hatine dîtin. Pêla sêyem a femînîst, cudahîyên têgihîştinê giring û hêja dibîne. Ji ber vê yekê jî xwastin ku tevgerên jinan ên ji bo vê armancê tên kirin li bingeheke pir berfireh berbelav bibe. Di vê xalê da giringî ji bo berbelavkirina perwerdeyê dan (ji Leslie û Drake 1997 vgh. Taş, 2016: 172).

Tevgera jinê ya pêla sêyem, di hin xalan da femînîzma pêla duyem rexne kirîye. Ji ber ku femînîzma pêla duyem azadîya jinan ji yek nerînê dinirxîne û ji bo tevgerê wekî pêşmerc spî û rojavayîbûna jinan dixwaze ji alîyê femînîzma pêla sêyem ve hatîye rexnekirin (Walters, 2009: 162; Oğuz, 2019: 28).

1.3.2. Nêzîkatîyên Femînîst ên Teorîk

Femînîzm, di pêvajoya dîrokî da rastî gelek guherînan hatîye û di bin bandora teorîyên cuda da cur bi cur bûye. Ji ber ku gelek cureyên femînîzmê hene, ne hêsan e meriv tenê pênaseyeke femînîzmê bike. Her çendî tevgera femînîst di bingeha xwe da wekî tevgerên pêla yekem, duyem û sêyem a jinan tê senifandin jî, tevgera femînîst di nava xwe da ji alîyê mijarên ku balê dikişîne ser xwe, rêbazên têkoşînê û rêgezên ku diparêze, di nava xwe da cur bi cur in. Li jêr em ê behsa şaxên femînîzmê yên wekî lîberal, çandî, radîkal, marksîst, sosyalîst, postmodern, hebûnparêzî û psîkanalîtîk bikin. Xala hevpar a van teorîyan pêşîlêgirtina li her cure cihêkarîya li ser jinan e (Oğuz, 2002: 8)

1.3.2.1. Femînîzma Lîberal

Femînîzma lîberal di dîrokê da berî nêzîkatîyên din tê. Hema hema hemû çavkanîyên di derbarê bizavên femînîst da ewil li ser femînîzma lîberal diaxivin. Sedema vê yekê jî ew e ku di dîrokê da pêşî li nêzîkatîyên din girtîye û hemû nêzîkatîyên din ên femînîzmê, di destpêkê da hewl dane ku bi tezên femînîst ên lîberal ra hesabê bikin (Sevim, 2005: 55; Ramazanoğlu, 1998: 28). Ramanwerên femînîst ên ku femînîzma lîberal teorîze kirine ev in; Marry Wollstonecraft (1759-1797), Frances Wright (1795-1852), Sarah Grimke (1792- 1873, Sojourner Truth (1795-1883), Elisabeth Candy Stanton (1815-1902), Susan B. Antony (1820-1906), Harriet Taylor (1807-1858), J. Stuart Mill (1806- 1873) (Sevim, 2005: 55; Öztürk, 2011: 64).

Di sedsala 18an da kesa herî navdar a ramanparêza femînîst a lîberal, Mary Wollstonecraft e. Berhema nivîskar a bi navê "*A Vindication of the Rights of Women*" (Parastina Mafên Jinan) ku di 3ê Çileya 1792yan da hat weşandin, di dîroka teorîya femînîst da xebata herî giring e. Ev berhem, ji bo ramana femînîst a piştî xwe, bû berhemeke bingehîn (Donovan, 2016: 21). Yek ji berhemên din ên giring ên vê serdemê li Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê xebata Judith Sargan Murrey a "*On the Equality of Sexes"* (Li Ser Wekhevîya di Navbera Zayendan de*)* û ya din jî broşûra Olympe de Gouges a bi navê "*Rights of Woman*" (Mafên Jinan) e ku di sala 1791ê da li Parîsê hatîye çapkirin (Kayhan, 199934-35). Ev bizava ku di sedsala 18an da ji alîyê jinên burjûva yên çîna navîn ên li cîhana Rojava hatîye destpêkirin, tevgereke wisa ye ku bi taybetî daxwaza perwerdeya wekhev dike. Di vê serdemê da hişmendîya

ferdperestîyê ku her kesî wekhev qebûl dikir, ji bo wê serdemê fikrekî pir radîkal bû (Öztürk, 2011: 54).

Mijara sereke ya femînîzma lîberal a di sedsala 19an da wekhevîya li pêşberî hiqûqê û ji bo jinan dayîna mafê dengdayînê bû. Herweha ji bo keç û xortan dayîna heman perwerdeyê û bêyî ku cihêkarîyê bixe navbera wan da berfirehkirina mafê perwerdeyê wekî nerîneke vê bizavê xwe dida nîşan. Divê mafê jinan a ku jin di qada gelêrî da kar bikin, bê qebûlkirin. Ev nêzîkatî, nerîna ku jin tenê dikarin pîşeyên wekî mamostetî û hemşîretîyê bikin çewt dibîne û li gor wan jin xwedî şîyana gelek pîşeyan in. Femînîstên lîberal li ser wê fikrê israr kirine ku divê jin bi awayekî çalak beşdarî jîyana aborî bibin û bi taybetî jî li dijî nerîna ku jîyana jinan bi malê sînordar dike, derketin (Güriz, 2011: 70-71).

Di sedsala 20an da femînîzma lîberal, dest bi slogana xwe ya "cuda lê wekhev" kir û wisa qebul kir ku jin wekî dayik xwedîyê erkên ji mêran cudatir in. Ango jinên karker di demên ku ducanî ne û li zarokên xwe dinihêrin, daxwaza hin îmtîyazên ku ji bo mêran nînin, kirin. Femînîzma lîberal, di vê mijarê da pêwîstîya serrastkirina qanûnî tîne zimên (Güriz, 2011: 71). Di nav daxwazên sereke yên vê tevgerê da destûrdayîna zayîn û şîrmijandinê hene û ev maf ji bo mêran ne pêwîst in (Öztürk, 2011: 52).

Mirov dikare ramanên bingehîn ên femînîstên lîberal ên ronahîbûnê weha rêz bike; 1. Ji aqilî ra bawerî. Ji bo hin bîrewerên wekî Wollstonecraftê, Xwedê û Aqil hema hema hevwate ne. Hişê mirovan çirûskeke xwedayî dihewîne û ev çirûska xwedayî jî wijdanê mirovan e. 2. Bawerîya ku jin û mêr ji alîyê ontolojîk ve dişibin hev. 3. Bawerîya ku perwerde baştirîn rê ye ji bo bandorkirina li ser guhertin û veguhertina civakî. 4. Nêrîna ku mirov hebûnek e û ji kesên din serbixwe tevdigere (Donovan, 2016: 33). Mirov dikare taybetmendîyên sereke yên femînîzma lîberal, weha rêz bike: Yekemîn taybetmendîya herî giring a femînîzma lîberal "*di perwerdeyê da wekhevîya derfetan*" e. Li gor femînîstên lîberal, rêya jiholêrakirina nehevsengîya heyî ya di navbera jin û mêran da ew e ku ji bo keç û kur ji heman derfetên perwerdeyê sûd wergirin, divê verastkirin bên kirin. Femînîstên lîberal îdia dikin ku eger jin jî wekî mêran perwerdeyê bibînin, heman karên ku mêr dikin jin jî dikarin bikin. Di encama daxwazên femînîstan ên di warê perwerdeyê da ewil tenê jinên ji çîna jor ligel birayên xwe dest bi perwerdeyê kirin. Paşê jinan hem li Ewropayê û hem jî li Amerîkayê bi

mêran ra dest bi heman perwerdeyê kir. Koleja Oberlin û Koleja Vassar di nav yekem kolejên Amerîkî da bûn ku jinan bi mêran ra dest bi heman perwerdeyê kir. Duyemîn taybetmendîya giring a femînîzma lîberal, *"wekhevîya aborî"* ye. Li gor femînîstên lîberal, azadîya tam a jinan girêdayî vê yekê ye ku divê jin ji alîyê aborî ve ji mêran serbixwe bin û bi wan ra xwedîyê mafên wekhev bin. Dema jin azadîya xwe ya aborî bi dest dixin êdî ji alîyê aborî ve girêdayî mêrê xwe nabin û ew bi xwe li ser lingên xwe disekinin. Sêyemîn taybetmendîya giring a femînîzma lîberal, wekhevîya *"sîyasî û hiqûqî"* ye. Têkoşîna femînîstên lîberal ji bo daxwaza wekhevîyê ya di mafên sivîl, perwerde, tenduristî û xebatê da ye. Armanca bingehîn ew e ku mafên sîyasî, civakî û hiqûqî ji jinan ra jî bê dayîn, çawa ku ji mêran ra hatîye dayîn. Taybetmendîya çaremîn a femînîzma lîberal, *"daxwaza ji nû ve verastkirina qada taybet"* e. Mijareke sereke ya di nav femînîstên lîberal da tê nîqaşkirin ew e ku gelo jinek li derveyê malê tamwext bixebite dê çi bibe? Ji pirsgirêkê ra wekî çareserîyek tê pêşnîyazkirin ku divê mêr karên malê yên ku li dû xwe hiştine parve bike (Demir, 1997: 49-52; Sevim, 2005: 55-60).

Femînîzma lîberal ji ber hin sedeman hatîye rexnekirin. Di serî da li şûna femînîzma zayenda civakî ya nîvendî, humanîzmeke notr ji xwe ra bingeh girtîye, hatîye rexnekirin (Ecevit, 2011: 14). Paşê, ji ber ku nikaribû bersivên têrker bide pirsên wekî jîyana di qada taybetî da û cudahîyên ontolojîk ên di navbera jin û mêran da hatîye rexnekirin. Rexneyeke din jî ew e ku mafên li ser kaxezê hatine bidestxistin, gelek caran nehatine bikaranîn (Öztürk, 2011: 69). Ji ber ku îdiayên gerdûnî yên femînîstên lîberal tenê bi pirsgirêkên jinên spî ve girêdayî ne, bal kişandîye ser xwe. Jinên reşik ên ku statûya wan a civakî xulamtî ye, bi aşkera anîn ziman ku bi karên mêran ra tên tepisandin. Ji bo van karan hêza fîzîkî hewce ye û wan jinan bi awayekî zelal dîyar kirin ku berevajî daxwazên jinên spî, ew dixwazin ku mîna jîyana xaniman bijîn. Ev rewş derdixe holê ku îdiayên tevgera femînîst a azadîxwaz ji bo hemû jinan ne derbasdar e û gerdûnî nîne (Donovan, 2016: 55-56).

1.3.2.2. Femînîzma Çandî

Margaret Fuller, bi berhema xwe ya *"Women in the 19th Century"* (Di Sedsala 19an da Jin, 1845) nûnera femînîsta çandî ye. Di edebîyatê da nûnera vê tevgerê Charlotte Perkins Gilman e ku bi berhema xwe ya bi navê "Herland" dayiksalarîyê (matrîarkal) derdixe pêş. Ev bizav di jinan da hest û hîşî derdixe pêş û fîkra cîhaneke organîk diparêze. Divê jin ne li gor rêzikên ji hundir tên, li gor rêzikên ji derve tên

tevbigerin. Ev jî tê wateya zêdebûna xwebawerîya jinan. Li gor Fuller, dema jin ji bedewî û hêza xwe haydar dibin ew çax xwezîpêanîna wan a ji bo mêran diqede (Donovan, 2016: 75-76). Li gor wê hêza rizgarbûna jinan jin bixwe ne û divê jin li taybetmendîyên xwe xwedî derkevin (Filiz, 2023: 273). Gilman (2002: 39-41), di çarçoveya femînîzma çandî da navekî din a giring e û vê rexneyê li jinan dike; jin ji bo ku mêran dilxweş bikin, enerjîyê xerc dikin. Li gor wê divê "Xweda"kirina zayend û wesfên mêran bi dawî be û bi bîrdozîya dayiksalarî xizmetek bihezkirin û berhemdar bê kirin. Gilman astengkirina jinan rexne dike û dixwaze ku di qadên wekî huner, wêje, werzîş û perwerdeyê da dawî li nerîna mêr-navendî bîne. Nivîskar bi nerîneke cuda li zewacê dinihêre û malê wekî cihê ku pêşî li takekesîyê digire, pênase dike. Bavê ku desthilatdarîya aborî di dest da ye, her tişt xistîye bin kontrola xwe û ev rewş jî li pêşîya pêşveçûna civakî dibe asteng.

Femînîzma çandî berevajî femînîzma lîberal, li şûna ku balê bikişîne ser wekhevîyên di navbera mêr û jinan da li ser cudahîyên di navbera van her du zayendan da disekine. Di bin teorîya femînîst a çandî da nerîna dayiksalarî heye. Bi gotineke din, di bingeha xwe da bi rêka bandora mêza û nirxan, bi fikra civaka jin ve tê beralîkirin. Ji bo aştîxwazî, hevkarî û bihevrejîyana cudahîyan a ji tundîyê dûr, ev pêwîst e (Donovan, 2016: 74; Sevim, 2005: 61-62). Li gor femînîstên çandî, jin û mêr ji gelek alîyan ve ji hev cuda ne û divê ev cudahî wekî xwezayî û erênî bên qebûlkirin. Taybetmendîya ku vê teorîyê ji teorîyên femînîst ên din cuda dike ew e ku cudahîya jin û mêran qebûl dike. Li gor femînîstên çandî, çavkanîya vê cudahîyê ew e ku hemû têgihên wekî hîyerarşî, reqabet, serxwebûn û têkilîyên malbatê li ser navê serdestîya mêran têne pênasekirin. Ji bo ku ev nirxên pederşahî ji holê bên rakirin, divê taybetmendîyên erênî yên jinan derkevin pêş. Jin bi nerînên wekî bawerî, hevkarî û parvekirinê dikarin tevkarîyê li guherînan bikin (Gül Ünlü, 2018: 117).

Femînîzma çandî ya ku jinan bi awayekî cuda dinirxîne; jinan wekî çavkanîya hêz, serbilindî û nûkirina gel dibîne. Ev bizav ji guherîna sîyasî zêdetir, li ser guherîna çandî disekine û dixwaze hişmendî vegere ser hîmê dayiksalarîyê (Özsöz, 2008: 53). Ji bo vê jî balê dikişîne ser taybetmendîyên jinan ên tên birûmetkirin ku ev taybetmendî hêja û nirxdar in. Çinku jin di nava sîstema pederşahî da bi qadên taybetî ra tên sînordarkirin û ev rewş jî wan pasîvîze dike. Li gor femînîstên çandî, ji bo ku zexta mêran a li ser civakê bi dawî be divê jin di nava qadên gelêrî da cih bigirin.

1.3.2.3. Femînîzma Radîkal

Teorîya femînîst a radîkal, di dawîya salên 1960an û destpêka salên 1970yan da exlebî li New York û Bostonê, ji alîyê komek "jinên ji tevgera"[4] berê ve hatîye pêşvebirin (Donovan, 2016: 265). Her çendî femînîzma radîkal bi piranî li welatên Skandînavyayê hatibe dîtin jî, piştî salên 1970yî li Amerîkayê berbelav bû. Salên 1960î ew sal in ku tevgera bertekîyî zêde bûn. Dê ne xelet be ku meriv vê heyamê wekî heyameke radîkal pênasa bike, ji ber ku serhildanên xwendekaran ên sala 1968an, tevgera dijî çekên nukleerî, hestên dijberî şer ên ji ber şerê Vîetnamê û protestoyên hawirdorê pêk dihatin. Tevgera jinan a di vê serdemê da jî, di bin bandora vê dorhêla radîkal da maye. Femînîzma radîkal, li hember gotinên lîberal û marksîst ên berî xwe wekî bertek derket holê. Çinku li gor femînîstên radîkal ev teorîyên ku me li jorê behs kiribû nikarin ji bo azadîya jinan bibin çareserî. Li gor îdiayên femînîstên radîkal, sedema sereke ya pirsgirêka jinan, pederşahî ye. Di rehê zordestîya li ser jinan da pergala çîna zayendî heye û divê ji holê bê rakirin (Demir, 1997: 63).

Yên ku beşa sereke ya vê teorîyê pêşve birin ew komên femînîstên radîkal bûn ku di salên 1967 û 1968an da hatibûn avakirin**.** Yekem weşana femînîsta radîkal *Notes from the First Year* (Nîşeyên Sala Yekem) di Pûşpera 1968an da derket. Paşê, *Notes from the Second Year* (Nîşeyên Sala Duyem, 1970) û *Notes from the Third Year* (Nîşeyên Sala Sêyem, 1971) hatin weşandin. Gotinên herî giring ên teorîya femînîsta radîkal di van weşanan da ne (Donovan, 2016: 269). Mimkin e ku berhemên bingehîn ên teorîya femînîsta radîkal weha bên rêzkirin: Nivîsa Kate Millett, *Sexual Politics* (Polîtîkaya Zayendî, 1970) û lêkolîna Shulamith Firestone ya *The Dialectic of Sex: The Case for Feminist Revolution* (Dîyalektîka Zayendî: Meseleya Şoreşa Femînîst, 1971). Firestone di vê xebatê da balê dikişîne ser cudahîyên bîyolojîk ên di navbera jin û mêran da û îdia dike ku nakokîya herî bingehîn a di navbera mirovan da nakokîya zayendî ye. Li gor nivîskarê, jin tenê bi şoreşa femînîst dikarin bigihêjin rizgarîya xwe ya bêkêmasî. Berhemên din ên giring a teorîya femînîsta radîkal ev in: *Amazon Odyssey* (1974) a Ti-Grace Atkinsonê û Gyn Ecology: *The Metaethics of Radical*

[4] Jinên ji tevgerê ew jin in ku di salên 1960an da beşdarê çalakîyên polîtîk ên ji bo dijberîya şerê û mafên medenî bûne (Donovan, 2016: 265).

Feminism (Meta-Etîka Femînîzma Radîkal a Ekolojîya Jinê, 1978) ya Mary Dalyê (Donovan, 2016: 272).

Li gor femînîstên radîkal di her civakê da du çand hene; Yek, çanda mêran a neteweyî -ya xuya ye- û ya din jî çanda jinan a gerdûnî -ya nexuya ye- ye. Di her civakê da miheqeq çanda jinan heye. Rexneya femînîstên radîkal bo femînîstên lîberal û marksîst ew e ku di hundirê xwe da çanda mêran dipejirînin û dixwazin ku jin, li gor standardên mêran bijîn. Çinku li gor femînîstên radîkal rizgarîya jinan, bi rêya cudabûna jin û mêran çê dibe. Ji ber vê sedemê, femînîstên radîkal li dijî çanda mêran serê xwe radikin û dibêjin ku divê jin neşibin mêran. Ew dixwazin ku di bin serwerîya çanda jinan da civakekê ava bikin. Ji ber ku jin "mezin" e û divê bê mezinkirin (Demir, 1997: 68-69). Eger pederşahî ji holê rabe dê jin êdî di pozîsyona duyem da nemîne û cihêkarîya zayendî jî dê bi dawî bibe. Jin bi rêya karên wekî zewac, zayîn û mezinkirina zarokan ra girêdayî mêran dibin. Jin bi rêbazên kontrolkirina welidînê dikarin ji van erkan xilas bin û ji alîyê bîyolojîk ve azad bin (Oğuz, 2002: 13-14; Güriz, 2011: 72-73). Dikare bê gotin ku femînîstên radîkal ji ber ku pederşahîyê bi bîyolojîya jinan ve girê dane lewma alîgirê zewac û dayiktîyê nebûne. Li gor wan zewac û dayikbûn sedemên bingehîn in ku jin girêdayî mêran dijîn; divê jin ji van bendikan rizgar bin. Ji ber vê sedemê piranîya femînîstên radîkal li dijî zewacê bûne.

1.3.2.4. Femînîzma Marksîst/Sosyalîst

Piştî nîveka sedsala 19an, li ser tezên femînîzma lîberal hate fikirîn û nîqaş li ser wê yekê dest pê kir gelo çareserîya ku femînîstên lîberal ji pirsgirêka jinan ra anîne (wekhevîya fersendê ya jin û mêran) dikare bê pêkanîn an na. Ev nîqaş bûn sedema derketina femînîzma marksîst. Femînîstên marksîst, ji bersivên femînîstên lîberal ên ji bo pirsa jinan, qanî nebûn. Li gor marksîstan, sedema bingehîn a çewisandina li ser jinan kapîtalîzm e (ku sedema hevpar a çewisandina hemû çînan e). Dema derbasî pergala sosyalîst bûn wê demê jin dê azadîya xwe ya aborî bi dest bixin û bi vî rengî dê bi mêran ra bibin wekhev. Ji ber vê yekê femînîzma marksîst herî zêde li ser têgihên wekî kapîtalîzm, aborî û civaka çînî disekine (Sevim, 2005: 63-64).

Marksîst dibêjin ku sedema sereke ya çewisandina jinan ji cudahîya zayendî zêdetir, cudahîya çînî ye. Li gor wan eger di civakekê da cihêkarîya çînî hebe ne pêkan e ku li wir wekhevîya fersandan çêbe, ew kapîtalîzmê wekî sedema çewisandina jinan

dibînin. Eger jin jî wekî hemû gelên bindest ji vê pergalê rizgar bin û derbasî pergala sosyalîst bin, ew çax ji alîyê aborî ve dê girêdayî tu kesî nebin. Ev jî tê wê watayê ku ew ê girêdayî mêran nebin (Demir, 1997: 56). Li gor femînîstên marksîst, di nava pergala mêtingerîyê da ji mêran zêdetir jin tên çewisandin. Yek ji sedemên giring ên vê yekê, di encama kapîtalîzmê da bîyanîbûn (alienation/alînasyon) e. Bîyanîbûn ew e ku mirov jîyana xwe bêwate bibîne. Ligel vê bêwatebûnê mirov ji ber ku nikare ji bo karên xwe têgihîştineke tam bike xwe wekî qetbûyî hîs dike. Di encama kapîtalîzmê da bi zêdebûna pisporî û karbeşîyê ra mirov ji keda xwe, ji mirovan û ji pergala ku tê da dijî ra bîyanî dibe (Demir û Acar, 1992: 377; Sevim, 2005: 67).

Marx, bi taybetî li ser pirsgirêka jinan nesekinîye. Nîqaşên li ser nêrînên wî yên di mijara jinan da û hin teorîyên wî yên ku bi mijarên jinan ra hatine adaptekirin bûne sedem ku marksîzm bandor li ser teorîya femînîst kirîye. Engels, mêtîngerîya li ser jinan a di pergala pederşahî da bi rêya teorîyên ku ji alîyê Marx ve di *Kapîtalê* da hatine pêşvebirin, analîz kirîye. Di vê xalê da berhema Engels a bi navê *Der Ursprung der Familie, Des Privateigentums und des Staats, 1884* (Rehê Malbat, Milkê Taybetî û Dewletê) di pêla yekem a Marksîzmê da hatîye hilberandin û têkildarî teorîya femînîzmê ye. Di vê berhemê da teza bingehîn a Engels li ser wê yekê ye ku dayiksalarîya komunîst a pêşdîrok ji alîyê pederşahîyê ve çawa hatîye berevajîkirin. Engels, ji femînîstên dayiksalarî cudatir, vê derbasbûnê bi geşedanên aborî, damezrandina milkîyeta taybetî û peydabûna metayên berjewendîparêz ve girê dide. Çareserîya Engels a ji bo pirsgirêka çewisandina jinan ew e ku karê malê divê veguhere pîşesazîyeke civakî. Bi vî awayî asêmayîna jinan a di nav karên malê da dê bê astengkirin û ew ê ji bo beşdarbûna karên civakî bên teşwîqkirin. Engels "hilweşandina malbata yekhevser a wekî yekeya aborî ya civakê" teşwîq dike (Donovan, 2016: 146-149).

Tevgera jinê ya nûjen bû sebeb ku kesên marksîst pirsgirêka jinan ji nû ve bifikirin. Armanc ew e ku di derbarê çewisandina jinan da teorîyeke têrker a marksîst bê pêşxistin. Armanca vê hewldanê ew e ku sedema stûxwarkirina jinan bibîne û têkilîya di navbera kapîtalîzm û rewşa jinan da dahûrîne. Ji ber vê sedemê, di civaka kapîtalîst da mijara bingehîn a ku femînîzma sosyalîsta nûjen pê ra eleqedar dibe, dîyarkirina rola malê ye. Analîza herî berfireh li ser pirsgirêka keda navmalî û bandora

wê ya li ser kapîtalîzmê bûye. Awayên hilberînê yên jinên ku biheq dixebitin bûye qada nîqaşê. Qadeke din a nîqaşê, têkilîya di navbera jin û çînê da ye (Donovan, 2016: 151).

Femînîstên Marksîst ji bo ku xebatên jinan ji pozîsyona wan a duyemîn rizgar bikin, du çareserîyên cuda pêşkêş kirine. Çareserîya ewil, civakîkirina karên malê ye ku Engels jî vê yekê diparêze. Xebata jinan a li derveyî malê, bi tena serê xwe ne çareserî ye. Ji ber ku jin hem li derve û hem jî li malê dixebite, ev dibe wekî ku du vardîyan dixebite. Ji bo pêşîgirtina vê yekê, divê karên wekî temaşekirina zarokan, paqijî û xwarinçêkirin ji alîyê dewletê ve bên civakîkirin. Fikra duyemîn jî ew e ku heqdestê karê malê divê ji alîyê dewletê ve bê dayîn. Divê jin di vê pêvajoya heqdestîyê da çalak bin. Wekî mînak, eger heqdestê jinan kêm bê dayîn û têra wan neke, divê mafê wan ê grevê hebe (Sevim, 2005: 69-70). Di nav sedemên sereke yên ku jin daxwaza mafekî weha dikin yek ew e ku kesên keda malê hildiberînin jin in û ev yek ji alîyê nirxê aborî ve pir kêm tê dîtin û dibe sebeba bêqîmetkirina jinan. Ji ber van sedeman, femînîstên marksîst hewl dane ku çareserîyên cuda hilberînin.

Di salên 1960î da bandora tevgera femînîzma sosyalîst ku wekî berdewamîya femînîzma marksîst dihat dîtin, dest pê kir. Ev tevger, wekî "pêla nû ya femînîzma marksîst" jî hatîye pênasekirin (Ramazanoğlu, 1998: 33). Femînîstên sosyalîst, bala xwe dabûn wê mijarê gelo jin ji kîjan çînê ne. Ew di wê bawerîyê da ne ku jin xwedîyê statûyeke dumend-çîn in. Jin dikarin li gor çîna mêrên ku di warê aborî da pê ve girêdayî ne bêne nirxandin, lêbelê eger di qada gelêrî da bixebitin, pêkan e li gor statûya heqdestê xwe jî bên nirxandin (Donovan, 2016: 163).

Ligel hebûna alîyên bihêz a femînîzma sosyalîst, herweha alîyên wê yên ku nikare têrê bike jî hene. Mirov dikare alîyên bihêz ên vê nêzîkatîyê weha rêz bike: mêtingerîya aborî ya li ser jinan rave dike, rastîya ku jin li gor mêran di bin şert û mercên xerabtir da dixebitin radixîne ber çavan, tîne ziman ku di binyada pederşahîyê da têkilîyên aborî dibe sedema newekhevîyê û wd. Herweha kêmasîyên vê nêzîkatîyê ev in ku newekhevîya di navbera zayendan da rasterast bi aborîyê ve girê dide û zêde guh nade alîyên civakî, çandî û sîyasî yên newekhevîyê (Oğuz, 2002: 12).

1.3.2.5. Femînîzma Postmodern

Postmodernîzm, ramana rojavayî û pratîkên bi vê ramanê ve girêdayî pirsyar dike. Ji ber ku femînîzm jî meyla rexnekirina ramana rojavayî dike, lewma di navbera

van her du alîyên ramanê da paralelî heye (Güriz, 2011: 75-76). Piştî sala 1980an bi postmodernîzmê ra femînîzm jî wekî bizaveke sîyasî û çandî xwe nîşan da. Di pêkhatina femînîzma postmodern da mirov dikare sê tevgerên bibandor nîşan bide: Tevgera yekem postmodernîzm e. Tevgera duyem, femînîzma hebûnparêzî ya Simone de Beauvouirê ye û tevgera sêyem a dawî jî femînîzma linguistik/zimanî ya femînîzma fransî ye (Demir, 1997: 92).

Femînîstên postmodern, pênaseyên giştî yên jinan ên femînîstên lîberal, radîkal û marksîstan rexne kirine û bal kişandine ser prualîzm, cudahî û cihêrengîyê. Wan dîyar kir ku ji heqîqetekê zêdetir heqîqet hene û ji rastîyekê zêdetir rastî hene û divê jin li gor rastîyên xwe yên olî, etnîkî û aborî bi awayekî ji hev cuda bên şîrovekirin (Başak, 2013: 232). Di lêkolînên femînîst ên salên 1980yî da bal kişandin ser wê yekê ku jinbûneke yekane nîne û ew li ser giringîya serpêhatîyên cuda yên jinbûnê, guhêrbarên wekî çîna civakî, etnîsîte û temen sekinîn (Sancar, 2016: 27). Femînîzma postmodern, xwedî taybetmendîyeke pragmatîst e. Çinku di vir da ne fîgurek, fîgurên cuda yên jinan têne rojevê. Ji ber vê sedemê, dibe ku ne tenê pirsgirêkek, gelek pirsgirêkên jinan ên ji hev cuda hebin. Di vê wateyê da femînîzma postmodern, teorîyeke pluralîst e. Herweha femînîzma postmodern nêzîkatîyeke îzafî (rolatîf) diparêze û di vê nêzîkatîyê da tê destnîşankirin ku di derbarê pirsgirêkên jinan da tu heqîqetên mutleq û gerdûnî nînin. Di vê xalê da femînîstên postmodern, gerdûnîbûna razber dişibînin tuneleke tarî û dîyar dikin ku rastîya objektîf ji xeyalekê pê ve ne tiştekî din e. Pergala pederşahî di her heyama dîrokê da wekî sembola rasyonalîteyê hatîye dîtin, lê ev nêzîkatî ne rast e. Ya esil ne ew e ku rastîyên razber werin dîtin, ya esil ji bo rewşên şênber dîtina çareserîyên guncaw in (Güriz, 2011: 78- 80).

Taybetmendîyên nêzîkatîya femînîsta postmodern dikare weha bê rêzkirin; *Redkirina Xwebûnê:* Hişmendîya postmodern, li dijî dîyarkerîya kategorîyên civakî yên wekî zayend, nijad û çînê derdikeve. Ev bi heman awayî ji bo femînîzma postmodern xala destpêkê ye. Di civakê da gelek kategorî hene ku jin bandorê li wan dikin an jî di bin bandora wan da dimînin. *Dijberîya Gerdûnparêzîyê:* Teorîya femînîsta postmodern, li dijî nêzîkatîyên gerdûnparêzîyê ye. Di hişmendîya femînîst a postmodern da li ser jineka gerdûnî zêdetir, qalkirina jinên dîyarkirî watedartir e. Di xwezaya postmodernîzmê da nêrîneke gumanbar a ji bo îdîayên femînîst ên gerdûnî û darazên giştî heye. *Pragmatîzm û Xapînî:* Ev teorî, li gor xwesertîya karê di dest da

rêbaz û kategorîyên xwe dişekilîne û dema wext hat kategorîyên pirjimarî bi kar tîne û pişta xwe bide rêbazên sabît. Lewma jî di lîteratûra postmodern da femînîsteke sabît nîne, femînîst hene. Mirov dikare taybetmendîyên din ên femînîzma postmodern wekî *Piranîparêzî, Herêmîbûnî, Xwebûnî, Redkirina Vegotinên Meta, Redkirina Dualîzmê* bihejmêre.[5]

Rexneya herî tund a li femînîzma postmodern tê kirin ew e ku nikare li ser pirsgirêkên jinan teorîyan hilberîne û razberkirin û gelemperîkirinan nake (Güriz, 2011: 77).

1.3.2.6. Femînîzma Hebûnparêzî

Hebûnparêzî, wekî lêgerîneke di nav wêranîya madî û manewî ya piştî rûdana Şerê Cîhanê ya Duyem derketîye holê û bi sûdwergirtina hin alîyên ateîzmê û hin alîyên xiristîyanî ve teşe girtîye. Di van salan da alîyên neyînî yên hebûnê êş, nexweşî, dilêşî û mirin bûne taybetmendîyên bingehîn ên rastîya mirov. Hebûnparêzî, di derbirîna vê xemê da roleke giring lîstîye û heta salên 1960î hebûna xwe dewam kirîye û bi lez belav bûye. Hebûnparêzî, exlebî bi mijarên ku hebûna mirovan di bin xetereyeke mezin da ye û mirov neçar in ku di cîhaneke bêîstîqrar da bijîn ra mijûl bûye. Ramanwerên hebûnparêz hertim parastina wê fikrê kirine ku "hebûn tekane û şexsî" ye. Ew, li dijî her cure îdealîzmê derketin ku ji bîr, ruh, aqil û ramanê ra pêşengî dike (ji Tong, 1989 vgh. Demir, 1997: 93). Hebûna mirov, pêşîya hemû cewheran e ku li mirov hatine barkirin. Cewhereke mirovan ku hatîye dayîn, tune ye. Her mirov, cewhera xwe bi xwe diafirîne. Ango mirov bi tercîhên xwe, bi biryarên xwe, cewhera xwe ava dike (Donovan, 2016: 227-229).

Du xebatên herî giring ên teorîya femînîst a nûjen hene ku yek jê ya Simone de Beauvoirê ya bi navê *The Second Sex* (Zayenda Duyem, 1949) û ya din jî ya Mary Dalyê ya bi navê *Beyond God the Father* (Bav ji Xwedê Wêdetir, 1973) e ku ev her du xebat çarçoveya femînîzma hebûnparêzîyê xêz kirine. Bi taybetî jî berhema Simone de Beauvoirê ya bi navê "Zayendê Duyem", bingeha femînîzma hebûnparêzîyê ava kirîye. Li gor de Beauvoir ji bo famkirina pirsgirêka jinan hewcedarîya bîyolojî û psîkolojîyê tune ye. Dema De Beauvoirê vê dibêje, ew cudahîya bîyolojîk û psîkolojîk

[5] Ji bo agahîyên zêdetir ên di derbarê mijarê da li (Demir, 1996) binêrin.

a di navbera jin û mêran da înkar nake; tişta ku ew rexne dike, cudahîya ferqa ravekirina di navbera têgihên jin û mêran da ye. Li gor wê, sedema rastî ya ku mêr wekî "xwe" û jinê jî wekî "ya din" tê wesfandin, ji vê yekê wêdetir e. Li gor nivîskarê, bîyolojî tenê têra ravekirina çima jin "ya din" e nake. Ya divê bê kirin ew e ku divê nirxên ku jinan dike *ya din an jî kesek din* bên guhertin. Di vir da çareserî dikeve ser milê jinan, ji ber ku çavkanîya rastî ya pirsgirêkê qebûlkirina serdestîya mêran a ji alîyê jinan ve ye. Jinan ev rewş pejirandîye. De Beauvoir di berhema xwe ya *Zayenda Duyem* da balê dikişîne ser pêvajoya dîrokî ya vê pejirandinê û mîtên li ser xweza û gîyanê jinan a ku mêran ji bo kontrolkirina jinan derdixin pêş, rave dike. Nivîskar, di vir da dîyar dike ku dijminê sereke yê jinan ji astengîyên derve zêdetir, astengîyên hundirîn ango ên di mejîyê wan da ne (Sevim, 2005: 71-74). Helwesta nîzama pederşahî ya ku mêran wekî kirde û mutleq û jinan jî dehfî pozîsyona *ya din* dike, ji alîyê nîvîskar ve tê rexnekirin. Li gor wê jin, bi bicihanîna kar û barên xwe yên malê û berpirsyarîyên xwe (!) ra nasnameya xwe ya din ji nû ve hildiberînin. Bi vî awayî jin xwe di jîyaneke wisa da dibînin ku mêr bi zorî "*ya din"*bûnê li wan dane pejirandin. (Özsöz, 2008: 53). Di çanda pederşahî da mêrbûn an jî nêrzabûn wekî tiştekî erênî tê dîtin; jinbûn an jî mêzabûn wekî neyînî, ne ya esas, derveyî qeydan, an jî ya din tê dîtin (Donovan, 2016: 232).

Trajedîya heyî ya jinan bi wê yekê ve girêdayî ye ku rolên li wan hatine barkirin li derveyî tercîhên wan in û li ser wan tên ferzkirin. Ji ber vê sedemê jin, xwedîyê wê azadîyê ne ku hemû rolên ku li ser wan hatine ferzkirin red bikin û wan ji nû ve pênase bikin. Wekî encam Beauvoir, rizgarîya jinan li ser bingeha hişmendîya hebûnparêzîyê, bi "hebûna ji bo xwe" ve girê dide. Lewma, divê hemû hebûnên farazî yên li ser jinan bên terikandin û hemû rolên civakî ji nû ve bên avakirin. Her çendî ev yek ne hêsan be jî, aşkera ye ku ji bo jinan tu rêyeke din a rizgarîyê nîne (Demir, 1996: 84).

1.4. PEDERŞAHÎ (PATRÎYARKA)

Antropologan di encama lêkolînên cihêreng da derxistin holê ku berî civaka pederşahî ya şaristanî, rêxistineke civakî ya *dêbinyad* hebûye (Reed, 2012: 109). Jin, di pêvajoya derbasbûna ji dayiksalarî bo pederşahîyê da di asta qebîleyan da bi mêran ra xwedîyê mafên wekhev bûn. Ev wekhevî bi demê ra têk çû, ji ber ku mêr ji nêçîrê derbasî cotkarî û şivantîyê bûn û jin bi karê malê ve hatin sînordar û kolekirin. Di vê

pêvajoya koletîyê da peywira jinan a wekî amûra zêdebûnê dest pê kir. Di nîzama dayiksalarîyê da mêr di mala jinan da bi cih bûne lê di serdema pederşahî da rewş guherîye û jin neçar mane ku di qebîleya mêrê xwe da bi cih bin. Di vê avahîya malbatê da mêr, li ser jina xwe xwedîyê mafên bêsînor bûn û kengî bixwastana dikaribûn hevjîna xwe berdin. Destpêka bilindbûna çînî ya mêran a li hember jinan, bi geşedana nîzama pederşahî dest pê kir û ev rewş bi demê ra bû gerdûnî. Kevneperestan rewşa jina bindest wekî rewşeke gerdûnî, dayîna Xwedê û neguhêrbar dîtin. Ji ber vê sedemê li gor dîtina wan pir ne pêwist e ku mirov vê yekê zêde bipirse (Oğuz, 2019: 105- 107). Shulamith Firestone, di berhema xwe ya bi navê *The Dialectic of Sex* (Dîyalektîka Zayendê) da dibêje ku taybetmendîyên bîyolojîk ên jinan dibe sebeba duyemîntîya wan. Li gor wê, zarok anîn û xweyîkirin sedema bingehîn a çewisandina jinan e (1993: 84).

Pederşahî di ferhengê da tê wateya desthildarîya bavî. Ev têgih, wekî serdestîya mêran a li ser hemû jinan an jî serdestîya kal û pîran a li ser hemû jin û ciwanan dikare bê pênasekirin (Hughes, 2002: 114). Özçatal, pederşahîyê wekî komek têkilîyên civakî yên ku bingeheke wan a madî heye û tê da têkilîyên hîyerarşîk û hevgirtina mêran heye ku mêr dikarin li ser beden û keda jinan desthilatdarîyê bikin, pênase kirîye. Ev têkilî serdestîyê dide mêran û mêr bi rêya pederşahîyê bihêz dibin (2011: 25). Demez jî pênaseyeke bi heman rengî dike û dibêje ku pederşahî wekî berdewamîya neslê ya di nav civakê da, hêza aborî ya di dest da, dewrkirina mîrasê tê kodkirin. Pederşahî tê wateya desthilatdarîyeke tam a li ser jin û zarokan. Li gor wê, şêwaza jîyana pederşahî yekane şêwaza jîyanê ye ku ji bo piranîya mirovan alternatîfeke wê ya din tune ye (2005: 61). Insûrên bingehîn ên pederşahîya ku em niha dijîn ev in: zewaca adetî, karê malê û mezinkirina zarokan ku weku karên jinan tên dîtin, girêdayîbûna aborî ya jinan a bi mêran ra, dewlet, tesîsên werzîşê, sendîka, pîşe, zanîngeh, sazîyên olî, şîrket, artêş... (Connel, 1998: 12).

Li gor Maria Miesê, pederşahî tê wateya "rêveberîya bavan". Lêbelê, îro serdestîya mêran, ji "rêveberîya bavan" wêdetir ji bo rêveberîya mêran, rêveberîya patronên mêr, sazîyên civakî, aborî û sîyaset tê bikaranîn; bi kurtasî ji bo cihên ku jê ra "lîga mêran" an jî "meclîsa mêran" dibêjin tê bikaranîn. Pederşahî, di asta dîrokî û civakî da têkildarî mêtingerî û çewisandina jinan e. Di dîrokê da pergala pederşahîyê, di hin dem û erdnigarîyên dîyar da ji alîyê hin neteweyên dîyar ve hatîye pêşxistin.

Pergalên pederşahîyê ne pergalên ebedî û gerdûnî ne ku hertim domdar bin. Lewra, eger di dîrokê da destpêkeke pederşahîyê hebe, ew çax dibe ku dawîyeke wê jî dê hebe (Mies, 2011: 94-95).

Civaknas Sylvia Walby pederşahîyê wekî *"pergaleke avahîyên civakî ye ku tê da mêr serdest e û li ser jinê mêtinger e"* pênase dike. Welby, li vir behsa şeş avahîyan dike ku jin tê da têne çewisandin û mêtin. Binyada yekemîn a ku pê ra mijûl dibe, têkilîyên hilberîna pederşahî ya di nav malê da ye. Ev nêzîkatî li ser wê bingehê ye ku keda jinan a navmalê ji alîyê mêrên ku pê ra dijîn ve tê desteserkirin. Bi taybetî jinên ku di tu karekî da naxebitin, keda xwe ji bo jîyanê bi hev diguherînin. Di vê wateyê da jinên malê ji çîna heqdest, hevjînên wan jî ji çîna desteserker in. Walby, binyada pederşahî ya duyemîn a di warê aborî da wekî têkilîyên pederşahî yên di xebata heqdestîyê da dinirxîne. Di karên heqdest da jin ji karên baştir tên vederkirin û mehkûmî karên bêkalîte dibin û rastê cihêkarîyê tên. Nivîskar, dewletê wekî binyadeke din a pederşahîyê dibîne. Li gor wê dewlet, ligel kapîtalîst û nijadperestîyê bi awayekî sîstematîk meyla wî ber bi berjewendîyên pederşahî ve diçe. Binyada çaremîn tundîya mêran e. Tevgerên rûtîn ên mêran ku nîşanî jinan didin û bertekên wan ên li hember kiryarên jinan, di vê kategorîyê da ne. Binyadeke din a pederşahîyê, têkilîyên cinsî ne. Binyada pederşahîyê ya şeşemîn û dawîn, sazîyên çandî yên pederşahîyê ne. Ev sazî ji ol, perwerde û medyayê pêk tên (Walby, 2016: 39-41).

Têgiha pederşahîyê ya ku tê wateya serdestîya mêran ji gelek faktoran pêk tê: cudahîyên fîzyolojîk ên di navbera jin û mêran da, cihêkarîya zayendî, kevneşopî û adet, aborî, çand, sîyaset, eqrebatî, ol... Sînorên di navbera jin û mêran da ji alîyê van faktoran ve hatine xêzkirin (Arsoy, 2011: 6). Di nav sedemên çêbûna avahîya pederşahî da sedemek ew e ku dema jin bi karê rêncberîyê ve mijûl dibûn mêr ligel nêçîrvanî û şervantîyê bi karê rêncberîyê ra jî mijûl dibûn. Ev rewş di eleyhê jinan da bû û hişt ku jin di nav sînorên malê da bimînin. Piştî demek bi şûn da jin, bi tevahî ketin bin desthilatdarîya mêran. Ji ber vê yekê, jinên ku ji jîyana aborî hatin dûrxistin, li malan hatin hepskirin (Reed, 1982: 182). Di vê pergala serdestîya mêran da hemû desthilatdarî û serwerî di çarçoveya hişmendîya serdestîyê da teşe girtîye. Nîzama pederşahîyê şekl daye avahîyên wekî aborî, sîyasî, civakî û çandî. Di vê pergala ku xwe dispêre veguheztina mal û milkê ji bav bo kur, serxwebûn û desthilatdarî di pawana bavan da bû. Ev derbasbûn di heman demê da bûye sebeba hişmendîya

“serdestîya mêran” û fersend daye civakan ku li ser vê hişmendîyê hin tiştan zêde bikin (Gölcük, 2011: 5). Wate, jin bûn parçeyek ji bo derbaskirina hişmendîya “serdestîya mêran” û peywira anîna zarokên kur ên berdewamîya milkîyetê li ser milê jinan hate barkirin. Bi gotineke din di binyada pederşahî da zarokên di malbatê da wekî ji nesla bavan tên hesibandin – bi taybetî jî kur – û wekî berdewamîya nesla bavan tên pejirandin (Kurt Topuz, 2019: 30).

Pierre Bourdieu, di pênaseya xwe ya di derbarê malbatên pederşahî da dibêje ku di malbatên pederşahî da serdestîya mutleq a mêran li ser jinan; serdestîya mezinan jî li ser zarokan e (2015: 11). Pergala pederşahî, serdestîya mêran îfade dike. Peyva pederşahî jî ji bo terîfkirina cureyê “malbata mêrserdest” hatîye bikaranîn. Di bin desthilatdarîya mêrê serdest da jin, xort, zarok, xulam û xizmetkarên malê hene. Di roja me ya îro da serdestîya mêran exlebî ji bo ravekirina têkilîyên desthilatdarîyê yên ku mêr serdestîya jinan dikin û jin di pozîsyona duyem da tên girtin, tê bikaranîn. Ev pozîsyona duyem a ku jin di jîyana rojane da dijîn, di nav malbat, kargeh û civakê da bi awayên cuda xwe dide der: wekî tundî, zextî, mêtîngerî, cihêkarî, kêmxistin... Pergala pederşahî, di demên cuda yên dîrokê da û di civakên cuda da bi awayekî cîyawaz xwe dide der. Mînak, pergala pederşahîyê ya ku dapîrên me tê da dijîyan, ne wekî pergala îro ye. Awayê xebatê ya pergala pederşahîyê, di her pergaleke civakî da yan jî serdemeke dîrokî da cuda ye. Tevî vê jî, rêgezên gelemperî, heman dimîne. Ango; piranîya çavkanîyên aborî, sazîyên sîyasî, aborî û civakî hemû di bin kontrola mêran da ne. “Serdestîya bavan” pênaseya herî guncaw a ji bo danasîna kontrola mêran a li ser jinan e. Serdestî heye û aîdî bavan e. Ev serdestî jinan ji mirovên derve diparêze û derfeta hewirîn û ewlehîyê dide wan. Herçiqas serdestîya bavan tehdekar be jî, ev yek gelek caran wekî tehde nayê dîtin. Lewra ew faktora ku têkoşîna li dijî vê rewşê zehmet dike jî ev e (Bhasin, 2015: 26-28).

Li gor Engels, civaka çîna pederşahî li ser hîmê malbat, milkîyeta taybetî û dewletê hatîye avakirin. Di navbera malbat û milkê taybetî da têkilîyeke xurt heye. Di rêya milkîyeta taybetî da pêwîstî bi naskirina malbata yek-bav û ji holêrakirina parçebûna dayik-malbatê heye. Di vê wateyê da divê dev ji nîzama civakî ya kevin bê berdan. Milkîyeta taybetî ji bo pêkanîna pederşahîyeke nû û pergaleke civakî ya ku xwe dispêre civakên sinifdar, amûreke giring e. Dewleta ku paşê derket holê, bi rêgezên milkîyeta taybet, xêza neslê, qeyd û bendên mafên mîrasê ra “malbata-bav”

xurt û legal kirîye. Di pederşahîyê da hewcedarîya nesla bav û kuran çê bûye ku malbata bavî û berdewamîya sermayeyê ya bi rêya nesla bavan qewî be. Ji ber vê sedemê, mêran serî li kuştina keçên xwe dane ku pêşî li geşedana hevrikên *meyîldê*[6] bigirin û bikarin milkê xwe ji kurên xwe ra bihêlin an jî eger kurên wan tune bin ji birayên xwe ra bihêlin. Lêbelê vê yekê zêde dewam nekir çinku qîmeta zarokên keç ji bo standina "qelen"ê zêde bû (Reed, 1995: 171-175).

Di pergala kevneperest a pederşahî da erka dayikan lênêrîna mal û zarokan; erka bavan jî debara malbatê ye (Orhan, 2024: 36; Önal, 2019: 67). Çinku bav sermîyanê malbatê ne. Di nav civaka kurdan da jî rewş heman e û mêr û bav wekî reîsên malê derbas dibin (Aslan, 2009: 81). Di gelek civakan da zarokên keç wekî dayikên xwe tên mezinkirin. Lewra dema ew bi xwe jî malbatek ava dikin li gor zanîn û tecrubeyên xwe yên zayenda civakî hereket dikin. Li alîyê din zarokên kur wekî sermîyanên malê tên mezinkirin û peywîra debara malê li wan tê barkirin (Telsiz, 1996: 121-122). Hevnasîna zarokan a bi stereotîpên guncaw ên pergala pederşahîyê ra di temeneke piçûk da dest pê dike. Ev pêvajo bi demê ra dewam dike û zarok bi vî awayî mezin dibin. Di dawîyê da zarok dibin parçeyekî vê pergalê. Ew bi xwe jî di berdewamîya vê pergalê da cih digirin û ji bo mayîndebûna avahîya pederşahîyê piştgirî didin.

Pederşahî, navê pergala desthilatdarîya mêran e ku di civakê da pozîsyoneke bilind dide mêran. Astengên bingehîn ên li hember pirsyarkirina vê avahîyê ev in: binyada civakî, gerdîş, çand, hînbûnî û wd. Di nav vê avahîyê da wisa tê qebûlkirin ku nesl bi rêya mêran tê dewamkirin; ev jî dibe sedem ku mêr bi taybetî jî bav bên bilindkirin û jin jî bikevin asta duyemîntîyê. Desthilatdarî û hêz di destê mêran -bi taybetî bavan- da maye, ev yek bi sedsalan dewam kirîye û hatîye normalîzekirin. Di vê pergalê da jin hertim li pişt mane û neçar mane ku tiştên ji wan tên xwastin bikin. Ji van neçarîyan a herî bingehîn qebûlkirina serdestîya mêran e û tevgerîna li gor wê ye. Jin bi sedsalan neçar mane ku vê rewşê bipejirînin û li gor vê pejirandinê bijîn.

[6] Meyilde (Anayanlı); matrilinieal: Di têkilîyên irsî, sazîyên eqrebatî, mijara cihê jîyanê ya piştî zewacê da meyla nêzikatîya dê. Ji bo agahîyên zêdetir li (Reed, 1995: 89-108) binêrin.

BEŞA DUYEM

2. DESTAN AN HIKAYEYÊN GELÊRÎ?

2.1. DESTAN

Destan berhemên neteweyan ên serdema berî nivîsê ne. Ew di wan serdeman da çê bûne û nifş bi nifş hatine veguheztin û di vê sedsala dawî da hatine tomarkirin. Di wan dewran da agahîyên derheqê pêşeroja civakan û hebûnên derasayî bi rêya destanan dihate dayîn. Di destanan da kesên îdeal ên ku civakê idare dikin bi hêzên derve û hebûnên derasayî ra şer dikin. Di destanan da civak bi awayekî tevahî tê dîtin. Leheng ser navê vê tevahîyê şixul dike. Ew bûyerên ku di destanê da derbas dibin ji alîyê civakê ve herwekî "di rastîyê da jî çêbûne" tên qebûlkirin (Boratav, 1988: 35-37; Çobanoğlu, 2015: 17).

Aristo di Yewnana Antîk da destanê wekî vegotineke ku çîrokên xwe yên lehengîyê bi şiklekî bipîvan pêşkêş dike, pênase dike. Li gor Hegel destan ronahîyê dide serdemên kevnar ên civakan. Ev cure li ser lehengî û şerên bi dijmin ra disekine (Reichl, 2002: 127). Atlı (2024, 491) pênaseyeke weha ji bo destanê dike:

> Vegotineke kevnar a gelêrî ye, yanî anonîm e ku di heqê dîroka civakan da, di heqê bûyerên giring ku hatine serê wan da, an jî di heqê hin şexsîyetên ne ji rêzê da, ji alîyê dengbêjan ve bi rengek klamkî têne gotin. Ew dibe ku di xwezaya xwe da hemî miletî eleqedar nekin, herêmî an jî şexsî bin lê bi rengekî, bi taybetî jî bi rêya dengbêjan di nava hemî miletî da belav dibin û dibin insûreke giring ya çanda civakî.

Destan ji gotinên muzikahengî û lihevhatî pêk tên. Herçiqas di destanan da mînakên pexşan hebin jî ji alîyê teşeyê ve bi piranî menzûm in û ji rêzên bipîvan pêk tên. Nasnameyeke neteweyî di destanan da heye û bi saya destanan neteweyên modern tarîxa xwe dinivîsin. Ev destan ji bo hebûna neteweyan dibin bingeh. Mijarên destanan evîn, qehremanî û hemaset e (Keskin, 2019: 187-188). Têkilîyeke gelek xurt di navbera dîrok û destanê da heye. Mirov dikare bi rêya destanan dîrokê hîn bibe û bi vî awayî ruhê serdemekê kêm zêde fêm bike (Filiz û Aykaç, 2022: 547). Lê divê destan rasterast wekî "dîrok"ê neyê dîtin. Dema destan wekî "dîrok bi xwe be" bê dîtin û ji

bo lêkolînên dîrokî wekî dokument bê bikaranîn ew çax dibe ku hin şaşitî çêbin. Çinku mimkin e ku di navbera dîrok û destanê da hin caran lihevnekirin çêbe. Wê çaxê jî hin şaşitî li destanan tên barkirin û ev helwesteke nerast e (Çobanoğlu, 2015: 21-22). Di destanan da nasnameyeke neteweyî heye. Celîlê Celîl di vê mijarê da weha dibêje:

> Her gelek xweyê eposekê ye. Eposa gel li ser bûyerên giring ên dîrokî tê hûnandin, ên di dîroka gel da dibin çarenûsî. Gel bûyerên dîrokê bi motîvên mîtolojîyê perwerde dike, giringîya wan bûyeran dike efsûn û nîşan ji xwe ra û pê nifşên dahatû, zarokên xwe bi zanîna wan bûyeran mezin dike, rih û bîra wan li ser armanc û şopa wan bûyeran xurt dike (ji Celîl vgh. Keskin, 2019: 180).

Destan, di wê wextê da ku hêj çanda nivîskî ya neteweyan çênebûye di nav kevneşopîya devkî da çê dibe û bi pêş dikeve. Ev rewşa destanê heta ku nivîs di nav hemû gel da bi giştî belav nebe û di bin imtîyaza kêmanîyê da be dewam dike (Boratav, 1988: 39). Ji bo derketina meydanê ya destanan sê merheleyên sereke hene: kakila bûyerê, merheleya bûyînê û merheleya tesbîtê (Kaya, 2007: 222). Wekî merheleya yekem *derketina destanê* dikare bê gotin. Di vê merheleyê da hin rûdanên dîrokî û civakî diqewimin û ev rûdan di şiûra neteweyê ya hevpar da teşe digire. Lehengên di van rûdanan da cih girtine di heman demê da di hişê civakê da jî cihekî muhîm digirin. Merheleya din *belavbûn* e. Destan bi dewlemendkirina rûdan û lehengan di nav gel da belav dibe û di nav nifşan da tê veguhastin. Merheleya sêyem û dawî *tomarkirin* e. Di vê merheleyê da destan ji alîyê kesên pispor û hunermend ve tê nivîsîn û tomarkirin (ji Yetiş vgh. Kaplan, 2019: 12-13).

Fonksîyonên destanan gelek in: xurtkirina hesta yekîtîya civakê, di derbarê dîrokê da agahîdan, pîrozkirina serfirazîyekê, civaknasî, jîyannasî, ajelnasî. Destan di derheqê behr, nêçîr û dîn da zanyarî dide (Ong, 2020: 189). Vegotina destanekê yan jî guhdarkirina destanekê wesîleya civakîbûnê ye. Ew ji bo nasnameyên şexsî, neteweyî, civakî, herêmî roleke giring dilîzin. Ew kesên ku heman êşê jîyane yan jî bi heman serfirazîyê bextewar bûne; rastî heman pirsgirêkê hatine yan jî berxwedaneke tevahî nîşan dane destanan ji xwe ra dikin amûr û hişmendîyeke neteweyî ava dikin. Ji ber van û gelek sedemên din destan hişmendîya neteweyî da roleke giring dilîze.

Destan di serî da herçiqas menzûm hatibin îcrakirin jî bi demê ra pexşan jî têkelî nav bûye û êdî menzûm-pexşan têkel tên îcrakirin (Subaşı, 2024: 109). Yanî eger îro berhemeke zargotinî bi temamî menzûm nebe jî nayê wê wateyê ku ew destan nîn e. Çinku destanên ku heta îro di nav civakê da mane exlebî nezm û nesir têkilhev in (Attı, 2013: 11-12). Di destanan da insûra vegêranê tenê li ser beşên menzûm ava nabe. Di destanên kurdî da pasajên pexşan jî cih digirin û ev taybetîyeke destanên kurdî ye. Ji ber dirêjbûna destanan zehmet bûye ku dengbêj hemû destanê bi kilamkî neqil bikin. Lewra di pasajên destpêkê da û di beşa geşedan û encamê da vegêrana pexşankî xuya dike. Destan ji alîyê dengbêjan ve tên gotin. Lê li vir divê bê zanîn ku îcrakerên destanan tenê dengbêj nîn in, çîrokbêj jî destanan dibêjin. Yên ku destanan dibêjin hertim kesên profesyonel nîn in û lewra jî ew hin caran dibin sedema xerabbûna forma destanan. Destan dema ji alîyê dengbêjan ve bên îcrakirin ew exlebî menzûm û muzîkal in; lê dema ji alîyê kesên ji rêzê bên îcrakirin ew çax exlebî destan dibe pexşan û beşên muzîkal pir kêm dibin (Atlı, 2024: 490-491). Dengbêjên hoste di bin bandora bûyerên rojane û derûdora xwe da dimînin; ew ji guhdêran xeberdar in û dizanin gelo çi bala wan dikişîne. Ew bi terza xwe ya vegotinê bala guhdêran dikişînin û li ser vegotina destanê hin tiştan zêde dikin. Destan di dest û zimanê vebêjerên weha da bi pêş dikeve (Boratav, 1988: 38). Di îcrakirina destanan da çend xalên giring hene ku bi saya wan xalan îcrakirineke serkeftî çê dibe. Xala ewil, destanbêj divê bûyerên di çîrokê da derbas dibin baş bizane û lehengên çîrokê baş nas bike. Divê ew xwedîyê hafizeyeke xurt be. Di wextê îcrakirina destanê da divê melodîyên adetî bi kar bîne. Xaleke giring a din jî ew e ku di wextê îcrakirina destanê da divê guhdêrên ji destanê fêm dikin hebin. Piştî hebûna van şertan destan bi awayekî serkeftî dikare bê îcrakirin (Yıldırım, 2000: 153).

Di destanan da mijar exlebî lehengî û evîn e. Lê ji xeynî van mijaran mijarên wekî şer, koçberî, hin bûyerên xwezayî, xela jî dikarin bên rêzkirin (Attı, 2013: 12). Çend mijarên din ên destanan dikarin weha bên rêzkirin: bûyerên giring ên di paşeroja neteweyan da qewimîne, şerên pêşengên mezin ên li hindur û derve bi dijminên civakê ra, hewildanên jîyaneke aramtir ji bo civakê (Boratav, 1988: 36).

Ji alîyê avabûnê ve du cure destan hene: destanên xwedî nivîskar û destanên gelêrî. Destanên xwedî nivîskar wekî destanên çêkirî yan jî destanên wêjeyî jî tên binavkirin. Li vir armanc ew e ku ji bo van destanan navê kesekî dîyar wekî referans

tê dayîn, herçiqas dibe ku wî kesî ew destan nenivîsandibe jî. Homeros wekî nivîskarê destanên yewnanîyan ên navdar *Ilyada û Odysseia* tê zanîn. *Kilama Roland* di nav destanên fransî da derbas dibe û di dawîya destanê da jî navê Turoldos dinivîse. *Os Lusidas* destana portugalîyan e û ji alîyê Luis Vaz de Camoens ve hatîye nivîsîn. *Komedyaya Îlahî* yek ji destanên îtalîyan e û ji alîyê Dante ve hatîye nivîsîn. Destana *Antere* destana ereban e û ji alîyê El Asmaî ve hatîye nivîsîn. Destana farisan a herî navdar *Şahname* ji alîyê Fîrdewsî ve hatîye nivîsîn. *Ramayana û Mahabarata* destanên navdar ên hîndîyan in. Nivîskarê Ramayana wekî Valmiki; yê Mahabarata jî Vyasa derbas dibe. Destanên gelêrî wekî destanên siruştî yan jî destanên devkî derbas dibin. Nivîskarê van destanan tune ne lewra wekî "gelêrî" derbas dibin. Mînakên van destanan dikarin weha bên rêzkirin: *El Cîd* (destana spanîyan), *Beowulf, Dîwana Arthur, Robin Hood* (destanên gravên brîtanî), *Nibelungenlied* (destana almanan), *Kalevala* (destana fînîyan), *Gilgamiş*, *Antra-hasîs* (destanên sumerîyan) (Keskin, 2019: 181- 186; Samur, 2012: 6-12).

Di destanan da leheng kesên esilzade (Boratav, 1988: 36) ne û ew mirovên ne ji rêzê ne. Ev nayê wê wateyê ku divê ew xwedîyê taybetîyên derasayî bin. Kirinên wan û ew wekî şexs ne ji ne ji rêzê ne. Ew bandoreke wisa li ser civakê dikin ku ew bandor dibe sedema nejirêzêbûna wan (Atlı, 2024: 490). Di vegotina destanan da qaîdeya herî mezin balkişandina ser serleheng e. Di destanê da bûyerên derbas dibin çi yên rastî çi yên dîrokî bin dîsa bal li ser lehengan kom dibe. Qaîdeyeke din a destanan ew e ku dema di destanan da du leheng derbas dibin jî dîsa bal li ser serlehengî bixwe ye. Herçiqas du leheng derbas bin jî dîsa hertim yek ji wan lehengan rastî ye û lewra destan her wekî jînenîgarî û çîroka jîyana serlehengê ye (Çobanoğlu, 2015: 18-19). Di nav destanên kurdî da jî rewş bi heman awayî ye. Di destana Sîyabend û Xecê da herçiqas em rastî destebirayê Sîyabend Qedegêtran/Qeregêtran bên jî dîsa serleheng Sîyabend bixwe ye. Dîsa di destana Kerr û Kulikî da herçiqas du leheng xuya bikin jî lehengê sereke Kulik e û dîqet li ser wî ye. Subaşı (2022, 140-146) ji vî kesayetê duyem ra dibêje biramak, piştgir, destebirak, birayê axretî yê lehengê.

2.2. HIKAYEYÊN GELÊRÎ

Hikayeyên gelêrî, ji gencîneyên giring ên civak û çandê ne. Bi vê gencîneyê ra li ser gelek nirx, kevneşopî, gerdîş, bawerî û di derbarê awayên jîyana civaka me ya ji

berê heta niha agahî hatine veguhestin. Di derbarê hikayeya gelêrî da ji alîyê gelek lêkolîneran ve pênase hatine kirin. Ali Berat Alptekin, hikayeya gelêrî weha pênase kirîye: *"*Ev yek ji berhemên pêşîn ên derbasbûna ji koçerîyê ber bi jîyana nişteciihbûyînê ve ye; mijarên wekî evîn, lehengî û hwd. dihewîne, çavkanîya wan ji tirk, ereb-îslam û ji hind-îranîyan e ku piranî ji alîyê aşiq û meddahan ve tên vegotin û ev vegotinên hanê ji nezm û pexşanên tevlihev pêk tên.*"* (ji Alptekin vgh. Alptekin, 2011: 18). Yek ji taybetîya herî cîyawaz a hikayeya gelêrî ku wê ji cureyên din cihê dike ew e ku ji beşên *nezm û pexşan* pêk tê. Boratav, Şimşek û Artun jî di vê mijarê da bi Alptekin ra di heman fikrê da ne (Boratav, 2012: 33; Şimşek, 1987: 2; Artun, 2004: 35). Di beşa pexşan/nesîr da çîrokbêj an jî vebêjer (aşiq), bi serbestî diaxive. Ew, firehîya ku dixwaze bide hikayeyê, bi şertê ku ji xetên sereke yên bûyerê dernekeve, dikare pêk bîne. Divê vebêjer di beşa pexşanê da dia, nifir, mecazên klîşe û teşbîhan da ti guhertinan neke, lê di beşên ku bûyeran vedibêje da dikare hin guhertinan bike. Di vir da ya herî giring ew e ku divê di mijara esas da ti guhertin neyê kirin. Çinku guhdêr di mijara esas da ti guhertin naxwaze. Beşên hikayeya gelêrî yên ku divê neyên guhertin, beşên nezmê ne. Eger di van beşan da guhertin bêne kirin dê ji alîyê guhdêrên ku haya wan ji bûyerê heye ve bê dîtin û ev yek dê zirarê bide navûdengê vebêjerê hikayeyê (Boratav, 2012: 33).

Têgiha hikayeya gelêrî ew metn in ku piştî destanên lehengîyê derketine holê, ji destanan kurt û realîsttir in, ji nezm û pexşanê pêk tên û berhemên li ser jîyana bicihbûyî ne (Aça, 1998: 3). Ev cure, exlebî mijarên wekî evîn û serpêhatîyan vedibêje. Hikayeyên gelêrî, ku yek ji cureyên vegotinê yên piştî destanan e, hem bi awayê anonîm û hem jî ji alîyê çîrokbêjan ve bi ferdî hatine vegotin. Hikayeyên gelêrî yên wekî Kerem û Aslı, Tahir û Zuhre, Aşık Garip û Şahsenem ji hikayeyên gelêrî yên ku mijara xwe ji evînê digirin ra wekî mînak dikarin bên dayîn. Her çendî hikayeyên gelêrî exlebî li ser evînê bin jî ligel wan, hikayeyên gelêrî yên li ser mijara lehengîyê yan jî evîn-lehengî bi hevre hatine honandin, hene.

Li gor Baba, hikayeyên gelêrî, cureyekî vegotinê ye ku piştî heyama destanan derketîye holê, xwedî bandoreke destanî ye û di nav gel da bi kevneşopîya devkî hatîye afirandin. Mînakên ewil hikayeyên destanî ne (2001: 37). Ji alîyê Akman ve jî pênaseyeke berfireh a hikayeyên gelêrî, hatîye kirin:

> Hikayeyên gelêrî ji alîyê çîrokbêjên taybet (aşiq, meddah, kissahan) ve bi sazê yan jî bêyî sazê tên vegotin; binyadeke wan a ku ji nezm û pexşanê pêk tê yan jî piştî ku beşên helbestkî hatine jibîrkirin tenê bi pexşanê hatine vegotin heye; bûyer, di nava jîyana civakeke bicihbûyî da diqewimin; exlebî li ser evînê tên honandin; mijarên xwe ji bûyerên di jîyanê da pêk tên an jî dê pêk werin, ji çîrçîrokan an jî wêjeya nivîskî (mesnewî) digirin; ji destanan kurttir û realîsttir in; bi vegotinên wekî efsane, destan û çîrçîrokan ra têkilîya wan heye; cureyekî di navbera destan û romanê da ye (2009: 1).

Wekî xalên hevpar ên van pênaseyan, mirov dikare van taybetîyên hikayeyên gelêrî yên jêrîn rêz bike: hikayeyên gelêrî xwedî binyadeke têkel a nezm-pexşanî ne, hikayeyên gelêrî cureyekî ku piştî destanan derketîye holê ye û ji destanan kurttir in, hikayeyên gelêrî berhemên jîyana bicihbbûyî ne, hikayeyên gelêrî xwedî vebêjerên taybetî ne, bûyerên di hikayeyên gelêrî da dibe ku rastî yan jî xeyalî bin.

Ji alîyê Baki Bora Hança ve di bin pênaseyên lêkolînerên ku di vî warî da dixebitin, pênaseyeke ku hemû taybetmendîyên hikayeyên gelêrî vedihewîne hatîye kirin. Pênaseya Hança ya di derbarê hikayeya gelêrî da weha ye:

> Di zeman û mekanekî dîyarkirî da exlebî ji alîyê vebêjerên pispor ve bi amûreke muzîkê ra tê îcrakirin; bi mijarên lehengîyê, evînê yan jî her du mijar bi hevre tên honandin, di xwe da unsûrên wekî dîrok, ol, jîyana civakî û kevneşopîyan dihewînin û di warê encamê da bi takekes ra eleqedar; di hawîrdoreke çanda devkî da, bi nezm û pexşan têkilhev tê afirandin, demdirêj û bi hunerî hatîye formulekirin; herçiqas bi mebesta ku gel demeke xweş derbas bike hatibe vegotin jî, ligel wê fonksîyona fêrbûn û îbretgirtinê jî hilgirtîye ser xwe (2012: 698).

Sedsalên 15 û 16an wekî dîroka ku hikayeyên gelêrî derketine holê, tê destnîşankirin (Türkmen, 2018: 12; Çobanoğlu, 2004: 179; Makas, 2002: 11). Hikayeyên gelêrî, şûna valahîya destanê dagirt. Van berheman pêdivîya romanê ya mirovan pêk anîne û bi demê ra ji berhemên wekî efsane, çîrçîrok, menqîbe û destanan sûd wergirtine û di bin bandora bûyerên olî, civakî û dîrokî da derketine holê (Şimşek, 1987: 1). Herçiqas ev cure di bingeha xwe da ji bo ku gel bi kêf û xweşî wext derbas bike hatibin vegotin jî, di heman demê da fonksîyonên wekî fêrbûn û îbretgirtinê jî

digirin ser milê xwe. Îbretên ku ji hin bûyerên civakî tên girtin, di hikayeyên gelêrî da tên honandin û ji nifşên siberojê ra tên veguhestin. Peyamên wekî gihandina mirazan ji bo kesên ku sebir û dilsozîyê nîşan didin, xelatkirina başan û cezakirina nebaşan, xerabîya derew û dek û dolaban bi rêya van hikayeyan tên dayîn.

2.2.1. Taybetmendîyên Şiklî yên Hikayeyên Gelêrî

Mirov dikare taybetmendîyên şiklî yên hikayeyên gelêrî weha rêz bike;

1. Hikayeyên gelêrî, bi awayekî têkilhev ji nezm û pexşanê pêk tên. Ev taybetmendî pirî caran di cureyên wekî çîrçîrok, efsane û meselokan da nayê dîtin. Di hikayeyên gelêrî da beşên vegotin û şayesandinê, bi pexşan in; beşên esil ên ku hest û kelecanê îfade dikin jî bi nezm in. Vebêjer, li gor daxwaza xwe, dikare di beşên pexşanê da guhertinan bike. Di van beşan da vebêjer, dikare li mijarê zêde bike yan jî kêm bike. Çîrokbêj, bi şertê ku ji mijara navendî dûr nekeve, dikare beşên hikayeyê yên ku jê hez nake jê derxe yan jî li hikayeyê zêde bike. Ev rewş, ji bo beşên hikayeyê yên helbestkî derbasdar nîne. Li vir vebêjer mecbûr e helbestê wekî ku heye bide. Di beşên helbestkî da ti guhertin nikare bê kirin. Yên ku di hikayeyê da helbestan dibêjin, bi piranî lehengên bingehîn in, ango lehengên ku hikaye bi navê wan e. Leheng; evîn, êş û derdên xwe bi helbestê tînin ziman. Di hin rewşan da lehengên duyemîn ên wekî dê, bav, xwişk, heval jî helbestan dibêjin (Alptekin, 2011: 23-24; Boratav, 2012: 33-36; Şimşek, 1987: 2; Keskin, 2019: 193). Ligel ku leheng, pêşî mîna lehengên destanan wêrek û şervan in, paşê vediguherin mirovên ji bo evînê şer dikin. Jinên ku di destanan da exlebî di rola dayikê da têne dîtin, di hikayeyên gelêrî da zehfî di rola "meşûqê" da têne dîtin. Jina ku pirî caran navê wê di destanan da derbas nabe, di hikayeyên gelêrî da navê wê bi lehengê mêr ra derbas dibe (Duymaz, 2014: 5).
2. Di destpêka hikayeyan da jî mîna ên çîrçîrokan, îfadeyên qalibgirtî hene. Lêbelê, di destpêka hikayeyên devkî ên hatine berhevkirin û destpêka guhertoyên/varyantên nivîskî da ji hev cuda ne. Dawîya hikayeyê bi diayan diqede (Alptekin, 2011: 24; Şimşek, 1987: 5). "Berê serê civatê ji me re xweş bî" (Amêdî, 2013: 234), "Ew diçin mirazê xwe şa dibin, tu jî herî mirazê xwe şa bî" (Celîl û Celîl, 1978: 450).
3. Zimanê hikayeyê di guhertoyên devkî da sade û fambar; di guhertoyên nivîskî da hinekî giran e (Alptekin, 2011: 28).

4. Bi taybetî di beşa destpêka hikayeyan da mimkin e ku mirov rastî beşên nezmê bê ku di eslê hikayeyê da tune ne, lê paşê ji alîyê vebêjer ve hatine zêdekirin. Ev rewş exlebî li hikayeyên ku vebêjerên wan xwedî şîyana helbestgotinê ne tê dîtin (Alptekin, 2011: 28).
5. Teswîrên xweşikan û yên nexweşikan, mîna îfadeyên qalibgirtî yên çîrçîrokan, tên dayîn (Alptekin, 2011: 29).
6. Di hikayeyên gelêrî da mirov dikare rastî mînakên wekî çîrçîrok, efsane, meselok, dia, nifir, gotinên pêşîyan, biwêj û tiştanokan bê. Vebêjer, hikayeyên ku vedibêje bi tiştên herêma xwe, bi çand û bawerîya xwe dixemilînin. Li ser da jî carinan hikayeyê bi jîyana xwe ve girê didin û vedibêjin. Di encamê vê rewşê da mimkin e ku mirov di hikayeyan da rastî hin taybetmendîyên çandî, urf û edetên girêdayî herêma vebêjer, bê (Alptekin, 2011: 31-32; Şimşek, 1987: 4; Keskin, 2019: 193).
7. Cureyên wekî çîrçîrok, efsane û meselokan pir kurt in lê, hikayeyên gelêrî pir dirêj in (Şimşek, 1987: 4).

2.2.2. Taybetmendîyên Naverokî yên Hikayeyên Gelêrî

1. Mijarên hikayeyên gelêrî exlebî evîn (Arzu û Kamber, Tahir û Zühre, Bêrîvanê) û lehengî (Köroğlu) ye. Carinan ev her du mijar bi hevre tên honandin (Kirmanşah, Şah İsmail) (Alptekin, 2011: 32).
2. Bûyerên ku hikayeyên gelêrî pêk tînin rast in yan jî nêzî rastîyê ne. Ji ber vê sedemê, bûyerên dîrokî yên serdemê ku diqewimin, carna bi heman rengî û carna jî di nava rastîya hikayeyê da derbas dibin (Alptekin, 2011: 32; Şimşek, 1987: 3).
3. Bûyerên derasayî di nav gelek bûyerên ku leheng jîyaye da derbas dibin. Di hikayeyan da hin caran rastî hebûnên derasayî yên wekî perî û dêwan tên. Em di gelek hikayeyan da rastî sêva bisêhr tên. Bi saya vê sêva bisêhr, dê û bavên bêzarok dikarin bi sêva ku ji destê Derwêş, Xizir an jî kalê rîspî girtine, bibin xwedî zarok. Lehengên hikayeyan exlebî yek in û di dayikbûna wan da insûrên derasayî hene. Karakterê piştgir, yê ku dibe alîkar ku leheng ji dayik bibe piştre, di rewşên ku ji leheng ra navek bê dayîn, ji bo perwerdeya lehengî, ji bo evîndarbûna wî û ji bo dîtina evîndara xwe çûyîna xerîbîyê rastî me tên. Lehêngên jin ên hikayeyê, exlebî ji derûdora qesrê ne û dewlemend in; zilam xizan in û di nav gel da mezin dibin (Alptekin, 2011: 32-33; Şimşek, 1987: 3). Lehengê mêr "kurê yekane" ye, lehenga jin "keça yekane" ye (Spies, 1941:52).

4. Leheng exlebî bi çar awayan dil dikevin hev: bi vexwarina badeyê, dema lehengên ku di heman malê da mezin bûne û êdî dizanin ku ew ne xwişk û bira ne, evîndarbûna bi nihêrîna wêneyê, evîndarbûna di nihêrîn û hevdîtina ewilî da. Lehengê ku li goristanekê, li ber avê yan jî li cihekî tenha dikeve xew di xewna wî da bade dirêjî destî wî dikin. Leheng piştî ku badeyê vedixwe bi rojan bêhiş radikeve. Di hikayeyên wekî Köroğlu û Ercişli Emrah da motîfa evîndarbûnê, bi awayê ku di xewnê da bi vexwarina badeyê hatîye honandin. Lehengên ku di heman malê da mezin bûne, gava dizanin ku ew ne xwişk û bira ne êdî bi evînî ji hev hez dikin. Di hikayeyên wekî Arzu û Kamber, Tahir û Zühre da leheng bi vî awayî evîndar bûne. Lehengê mêr, carna evîndarê wê lehenga ku wêneyê wê li cihekî dîtîye, dibe. Du lehengên ku hev nas nakin, gava yekem car li deverekê rastî hev tên, evîndarî hev dibin (Alptekin, 2011: 33-39; Şimşek, 1987: 4-5).
5. Hikayeyên gelêrî xwedî vebêjerên taybetî ne û vebêjerên hikayeyên gelêrî exlebî mêr in. Heman tişt ji bo çîrçîrokan ne derbasdar e. Ji ber ku vebêjerên çîrçîrokan, exlebî jin in (Alptekin, 2011: 39).
6. Di hikayeyan da alîkarê leheng ê herî mezin Hz. Xizir e û piştre jî hesp e. Carinan jî ev hesp dibin xwedîyê taybetmedîya firînê (Alptekin, 2011: 40; Şimşek, 1987: 4).
7. Leheng carinan bi hebûnên ne-mirovî ra diaxivin (Alptekin, 2011: 40; Şimşek, 1987: 3).
8. Hikayeyên gelêrî, exlebî bi bextewerîyê bi dawî dibin. Evîndar ji gelek pêvajoyên dijwar ra derbas dibin, lê ew di dawîyê da digihîjin hev. Ligel vê yekê jî hin evîndar hene ku tê gotin dema digihin hev, dimirin. Wekî Kerem û Aslı, Tahir û Zühre. Evîndar nikarin bigihîjin hev çinku li ser gorên wan şitlên gulan şîn dibin (Alptekin, 2011: 40; Spies, 1941: 20).
9. Dia û nifirên ku ji alîyê lehengan ve tên kirin, teqez pêk tên (Alptekin, 2011: 41).
10. Hikayeyên gelêrî, piştî jîyana bicihbûyî derketine holê. Di hikayeyan da cihê ku bûyer lê diqewimin exlebî dîyar in (Hança, 2012: 696). Di hikayeyên gelêrî da mekan dinya ye. Ev mekan carna pir teng e û carna jî li qadeke erdnîgarî ya berfireh belav dibe (Alptekin, 2011: 41; Şimşek, 1987: 3).
11. Di hikayeyên gelêrî da ji bilî lehengên esil, derûdora nas a leheng, fîgurên wekî (dayik, bav, bira), rêveber (padîşah, wezîr, beg), fîgurên wekî alîkar (Xizir, Derwêş, kalê

rihspî), fîgurên fesad ên wekî (dêmar, pîrejin), fîgurên ne-mirov yên wekî (hesp) tên dîtin (Alptekin, 2011: 42).

2.3. CUDAHÎ Û HEVŞIBÎYÊN DI NAVBERA HIKAYEYA GELÊRÎ Û DESTANÊ DA

Meseleya pênasekirina cureyên edebî wekî di wêjeya gelek neteweyan da di wêjeya kurdî da jî mijareke minaqeşeyê ye. Em gelek caran ji bo cureyên vebêjê li herêmên cuda rastî navên cuda tên. Faktorên cuda bûne sedema vê rewşê, berî her tiştî cureyên edebî li pey hev derdikevin û gelek taybetmendîyên wan ên hevpar hene ku ev yek di nav sedemên sereke yên vê kaosê da ye. Cureyên wekî mît, efsane, destan, hikayeyên gelêrî û çîrçîrok li pey hev ketine jîyana mirovan û ji ber ku hin taybetmedîyên hevpar di xwe da dihewînin lewra mirov di mijara jihevcihêkirina van cureyan da gelek caran zehmetîyan dikişîne. Mirov dikare "Zembilfiroş"ê wekî mînak bide ku li ser evînê ye û motîfên olî di xwe da dihewîne, herweha em texmîn dikin ku destanek e, lê ji alîyê piranîya mirovan ve wekî *"Çîrçîroka Zembîlfiroş"* hatîye pênasekirin. Her çendî dîyar e ku ev cure ne çîrçîrok be jî, em gelek caran rastî mînakên bi vî rengî yên pênaskirinê tên. Pirsgirêkeke bi vî rengî ya pênasekirin û senifandinê di navbera cureya "Hikayeya Gelêrî" û "Destan"ê da jî heye. Di vê xebatê da yek ji mebestên me ew e ku em hewl bidin da ku vê mijarê zelal bikin. Em ê hewl bidin ku dîyar bikin gelo kîjan cure destan e, kîjan hikayeya gelêrî ye. Ji ber ku ji alîyê demê ve cureya hikayeya gelêrî piştî cureya destanê derketîye holê, gelek taybetmendîyên wan ên hevpar hene. Ev yek pênasekirina cureyan zehmet dike lêbelê, em ê li vir taybetmendîyên bingehîn ber çav bigirin û bi vî awayî em ê hewl bidin ku van cureyan ji hev derxin. Ev tevlihevîya têgihî ya di cihêkirina cureyên edebî da di wêjeya tirkî da jî tê dîtin. Ali Berat Alptekinê ku li ser hikayeyên gelêrî xwedî lêkolînên giring e, ew jî dîyar dike ku gelek hevpîşeyên wî pêşnîyaz kirine ku li şûna *hikayeya gelêrî* peyva *destanê* bê bikaranîn. Tê dîtin ku li cîhana tirkan da li şûna *hikayeya gelêrî* bi piranî têgiha *destanê* hatîye bikaranîn; li Azerbaycanê (dastan) li Turkmenistanê (dassan, dassana gelêrî, epos) li Uzbekistanê (dastan) li Qezexistanê (epos) tirkên li Iraqê (destan)... (Alptekin, 2011: 20). Ev mînak nîşan didin ku pirsgirêkeke bi vî rengî ya pênasekirinê di nav tirkan da jî tê dîtin. Pertev Naili Boratav di berhema xwe ya bi navê *Halk Hikâyeleri ve Halk Hikâyeciliği* (Hikayeyên Gelêrî û Çîrokbêjîya Gelêrî) da li ser taybetmendîyên cureya destanê weha gotîye:

> Taybetmendîya herî giring a ku epopê şert dike ew e ku ew berhema heyamekê ye ku di nav civakê da pevçûnên tund çênebûne û têkoşîn tenê ji derve ra hatiye meşandin. Lehengên destanan ew kes in ku ji bo têkoşînê temsîlîyeta herî baş dikin, karên mezin dikin û reîs in. Dikare bê gotin ku destan, cureyekî edebî ya çîna arîstokratan e. Zimanê helbestkî, amûreke serdest a vegotina vî cureyî ye. Nivîskarê destanê, di nava civakê de xwedî hişmendîya vê nîzamê ye. Li hemberî leheng û bûyerên berhemê objektîv e (2012, 39-40).

Boratav, li vir dema taybetmendîyên bingehîn ên destanê rêz dike, bal dikişîne ser taybetmendîyên lehengan. Lehengên destanê ji lehengên rêzê û asayî zêdetir, ji lehengên ku dikarin di têkoşîneke wisa dijwar da bi ser bikevin, tên hilbijartin. Taybetmendîyeke din a giring a destanê zimanê wê yê helbestkî ye. Ligel van xalan vebêjerên destanê mirovên objektîv ên xwedî hişmendîya neteweyî ne.

Yek ji cudahîyên di navbera destan û hikayeya gelêrî da unsûrên fantastîk ên di navbera van cureyan da ye. Destan, ji alîyê unsûrên fantastîk ve ji hikayeyên gelêrî dewlemendtir in (Attı, 2013: 20). Di destana Stî û Ferx da Ferx, ligel kurxalên xwe diçe nêçîrê. Herçiqas di nêçîrê da çûna wan a Çîyayê Reş hatibe qedexekirin jî Ferx, guhdarîya xal û kurxalên xwe nake û berê xwe dide Çîyayê Reş. Ferx, li wir rastî perîyeke bi navê *Gulemdam Xatûn* tê. Ev perî xulama Silêman Pêxemberî bûye û piştî mirina Silêman Pêxember li wî çîyayî li benda Ferxî maye ku bê û wê mehr bike (Kaplan, 2019: 201-205). Perî, insûreke fantastîk e û di wê destanê da derbas dibe. Dîsa insûreke fantastîk a din, cin e. Di destana Sêva Hecîya da Gulçîçeka Dila wekî qîza mîrê cinan derbas dibe (Celîl û Celîl, 1978: 149). Hikayeyên gelêrî, di vegotina şexs û bûyeran da zêdetir cih dide xêzên realîst (Türkmen, 2018: 11). Ev taybetmendî di mijara cihêkirina di navbera destan û hikayeya gelêrî da xelake giring e. Hikayeyên gelêrî, bi taybetî ji xêzên realîst sûdê werdigirin û ew ji serpêhatîyên lehengî zêdetir giranîyê didin serpêhatîyên evînê. Di hikayeya Gulperî da Narinc û hevjînê wê mirovên ji rêzê ne û di hikayeyê da em rastî serpêhatîyên lehengî nayên (Amêdî, 2013: 376-387). Dîsa di Senem Xanim û Hiseyn da (Kaplan, 2018: 141-144) em rastî serpêhatîyên lehengî nayên û Hiseyn ji bo Senem Xanimê nakeve nav şerên mezin û dijwar.

Cudahîyeke din a di navbera destan û hikayeya gelêrî da leheng in. Di nav taybetmendîyên serlehengên destanan da bihêz û wêrekbûna wan derbas dibe; ew li hemberî neheqîyan serê xwe natewînin, di rewşên dijwar da piştgirîyê didin gelê xwe û tirsê dixin nav dilê dijmin. Serleheng xwedîyê hesp û amûrên şer ên baş e. Li dora wî mêrxasên bihêz û dilsoz hene. Ew bi piranî erkên wekî parastina gelê xwe, têkbirina dijminan û berfirehkirina xaka xwe tîne cih. Di hikayeyên gelêrî da serleheng hinekî cuda ye. Alîyê wî yê şervanî hatîye kêmkirin û wî bêhtir berê xwe daye dinyaya xwe ya hundirîn. Di serleheng da li şûna fîzîkeke bihêz û xurt, hêza derûnî û manewî derketîye pêş. Di hikayeyên gelêrî da serleheng, ji berjewendîyên civakê zêdetir pêşî giringîyê dide hestên xwe. Meyla wî bêhtir ew e ku bûyer û pirsgirêkan bi aqilane çareser bike. Di hikayeyên gelêrî da ew bi rengekî evîndar xuya dike û dikeve pêy evîna xwe ku bigihîje wê. Serleheng, di destan û hikayeya gelêrî da bi du awayên cuda derdikevin pêşberî me, di vir da jîyana civak-çandî û pêdivîyên serdemê roleke giring dilîze (Çelikten, 2021: 110-111).

Hikayeyên gelêrî berhemên *heyama derbasbûnê* ne. Ev heyam ji bo destanê dawî ye lê ji bo hikayeya gelêrî destpêk e. Serpêhatîyên destanê li hemû civakê bandor dikin, lê serpêhatîyên hikayeya gelêrî şexsî ne. Bi awayekî xwezayî em dikarin vê rewşê weha binirxînin ku ji serpehatîyên civakî derbasî serpêhatîyên şexsî bûne. Bi vî awayî hem mijar hem jî lehengên hikayeyan guherî ne. Herçiqas bûyerên ku di destanê da derbas dibin li derdora lehengî biqewimin jî ji ber ku bi tevahîya civakê ra eleqedar in, kûr in. Li alîyê din, di hikayeyên gelêrî da evîn û micadeleya jîyanê ya lehengan bi awayekî ji civakê xweser derbas dibe. Li vir dikare bê gotin ku derbasbûneke ji giştî ber bi taybetî ve heye.

Di vegotinê da hebûna awaz û sazê, dirêjbûna vegotinê, têkilîya vebêjer û guhdêr; taybetmendîyên hevpar ên destan û hikayeyên gelêrî ne. Taybetmendîya herî giring a ku destan û hikayeya gelêrî ji hev cuda dike "mijar û rola wan a civakî" ye. Di destanan da leheng; xwedî temsîlîyeteke giştî ne û bi giştî nûnertîya civaka xwe dikin. Şer û pevçûnên wan, xwastek û tevgerên wan ji bo berjewendîyên hemû civakê ne. Lê di hikayeyên gelêrî da bûyer, bi piranî di nava civakê da diqewime. Rûdanên di hikayeyê da di navbera çînên civakê da derbas dibin (Keskin, 2019: 192-193). Di destanê da leheng, nûnertîya civaka xwe dike, bûyer jî tevahîya civakê eleqedar dike. Lê di hikayeya gelêrî da roleke wî ya ku nûnertîya hemû civakê dike, nîn e.

Hikayeyên gelêrî hêj jî gelek taybetmendîyên destanê dihewînin. Lê ev taybetmendî ne ew taybetmendîyên karakterîstîk in. Şert û mercên civakî yên ku karakterên eslî yên destanê pêk tînin guherîne û ev jî bûye sedem ku kevneşopîya destanê lawaz bibe (Boratav, 2012: 46).

Xala ku hikayeya gelêrî ji destanê cuda dike ew e ku hikayeya gelêrî jîyana kesên ji rêzê ji xwe ra dike mijar (Boratav, 1945: 307). Lê dema em li mînakên destanên xwe dinêrin em dibînin ku lehengên destanên me kesên ji rêzê nînin. Ew gelek caran xwedîyê taybetmendîyên derasayî ne. Di destana Memê Alan da serleheng Mem e û ew jî xwedîyê taybetmendîyên derasayî ye. Ew rêya şeş mehan di panzdeh rojan da diçe, digel hespê xwe diaxive û jê ra ayan dibe ku dê Zîna hezkirî digel hinara jehrkirî bê û piştî wê hinarê ew ê bimire. Dîsa di varyanteke (Cindî, 2016: 21-22) destanê da Mem, bi awayekî derasayî ji dayik dibe. Rojekê sê siwar ji ser behrê ra tên û xwe wekî delîlê bext û mirazan didin nîşan. Ew qîzekê îqna dikin û bi xwe ra dibin. Dema ji ser behrê ra derbas dibin, qîzik ava behrê vedixwe û kefa behrê dikeve nav dilê qîzikê û qîzik bi wê kefê, ducanî dibe. Piştî neh meh, neh roj û neh seetan kurekî jê ra çê dibe û ew kurik, Mem bixwe ye. Em dibînin ku lehengê vê destanê kesekî ji rêzê nîn e û di jidayikbûna wî da insûrên derasayî hene. Dîsa di destana Stî û Ferx da lehengê destanê Ferx, ne yekî ji rêzê ye. Ji dayikbûnê heta mirina wî hemû jîyana wî bi insûrên derasayî derbas dibe. Ew çawa ji dayik dibe, digel dapîrokan diaxive û navika xwe ew bixwe dibire. Piştî navikbirînê, ji bo her mehê xwe bendekê dibêje. Ferx diavêjin hewşa dewaran, ew li wir bi heywanan ra diaxive û bi şev radibe û diçe nav dergûşa Stîyê. Ew dema hinek mezin dibe ji bo mirina dê û bavê xwe dia dike û diayên wî diqebilin, dê û bavê wî rehmet dikin. Bi vî awayî di jîyana lehengê me da gelek mînak hene û ev mînak xuya dikin ku lehengê me ne kesekî ji rêzê ye. Di destana Kela Dimdimê da Xanê Lepzêrîn, kesekî ne ji rêzê ye û bê tirs diçe ji bo Şahî bi şêrekî ra şer dike û bi ser dikeve (Kaplan, 2019: 24). Di destana Dewrêşê Evdî da Dewrêş, bi sedan siwarên ereb û tirkomanan ra şer dike, wan dikuje û ji herêma Milan derdixîne. Herçiqas di dawîyê da bê kuştin jî ew ji bo Kurdan dibe lehengekî neteweyî (Cizîrî, 2020: 275). Di destana Cembelî û Binevşa Narîn da Cembelî, dema dibîne ku sed siwar bi birayê Binevşê ra şer dikin vê yekê qebûl nake û ew jî digel birayê Binevşê bi wan siwaran ra şer dike û pêncî siwaran dikujîne (Celîl û Celîl, 1978: 182). Di destana Sîyabend û Xecê da Sîyabend, dikeve nav koma siwarên dawetê û nîvê wan bi tena

serê xwe dikuje û yên mayî jî direvin û diçin (Aras, 2023: 45). Xuya dike ku Sîyabendê leheng; mirovekî ne ji rêzê ye û ew bê tirs dikeve nav siwaran. Di destana Kerr û Kulikî da Kulik; bê tirs ji bo Cancana hespa xalê xwe Elîsarê Gêsî bi rê dikeve û şer dike. Di destana Sêva Hecî da Mîr Mehmûd, kurê paşê ye lê ji bo Sêva Hecî ya ku di xewna şevan da dîtîye mal û milkên xwe berdide û dikeve pey hezkirîya xwe. Di destana Evdilrehmanê Zorbaşî da navê lehengî di nav gel da wekî yekî efsanewî belav dibe. Dema behsa wî dikin dibêjin, mirovan dixwe, guhekî wî mesîl e yek doşek, per û baskên wî hene (Cizîrî, 2020: 112). Di destana Zembîlfiroş da Zembîlfiroş kurê mîrî ye û tekane weledê dê û bavê ew bûye. Zembîlfiroş mal û milkên xwe, selteneta xwe diterikîne û bi keda destê xwe jîyana xwe didomîne. Ew çi wextê bikeve tengasîyê hawara xwe digehîne Xwedê û Xwedê jî diayên wî qebûl dike. Ew dema xwe ji bircê diavêje xwarê, milyaket digihêjin hawara wî û pozê wî jî xwîn nabe. Dema Xatûn dikeve nav cihê wî û Zembîlfiroş wê ferq dike dîsa hawara xwe digehîne Xwedê û Xwedê alîkarîya wî dike û Zembîlfiroş dibe teyrekî spî û ji kulekê ra difire û diçe (Celîl û Celîl, 1978: 189-194). Ev mînakên hatine dayîn, destanbûna wan piştrast dikin. Di mînakên ji bo vê xebatê hatine hilbijartin da kêm zêde insûrên derasayî xuya dikin, lewra binavkirineke wekî destan ji bo Memê Alan, Dewrêşê Evdî, Kela Dimdimê, Zembîlfiroş, Sîyabend û Xecê, Binevşa Narîn û Cembelîyê Kurê Mîrê Hekarîya, Kerr û Kulik, Xelîl Beg, Stî û Ferx, Sêva Hecî, Evdilrehman Axayê Zorbaşî, Elo Şêxanî û Fatimê, Husên Axa Derbas li gor me rasttir e. Ji bo hikayeyên gelêrî jî mînakên wekî Gulperî, Mîrza Axayê Rindikî û Têlî Eyşan, Bêrîvanê, Senem Xanim û Hiseyn hatine hilbijartin. Ji xwe tê zanîn ku di hikayeyên gelêrî da insûrên derasayî gelek kêm in, bûyer û leheng ji rêzê ne û meyla "*rastbîni*"yê tê dîtin (Boratav, 1988: 52). Mînakên hikayeyên gelêrî yên ji bo vê xebatê hatine hilbijartin vê rewşê piştrast dikin.

2.4. KURTEYA DESTAN Û HIKAYEYÊN GELÊRÎ

2.4.1.Memê Alan

(Kurteya vê destanê ji varyantên Cindî û Evdal, 2008: 307-342; Celîl û Celîl, 1987: 45-65; Cindî, 2016: 21-63 hatîye amadekirin.)

Mem kurê Al Paşa ye û tekane zarokê dê û bavê xwe ye. Bavê wî Al Paşa paşayê Mixribîyan e. Zîn xwişka Mîr Zeydîn û Mîr Zeydîn jî mîrê Cizîra Botan e. Xwişkeke Zînê ya bi navê Sitî heye û Sitî digel kurmamê xwe Qeretajdîn zewicandî

ye. Zîn jî dergistîya Çekan e. Bedewî û sipehîtîya Mem û Zînê di nav gel da belav bûye, yên ku ew dîtine li ber bedewîya wan heyran mane.

Rojekê sê kevok li ser bedewîya Zînê diaxivin û dibêjin Xwedê kes layiqê wê nedaye. Li wir kevokek dibêje na, Mem heye layiqê Zînê ye. Ew di bedewbûnê da ji Zînê zêdetir e. Li wir di navbera kevokan da nîqaş çê dibe û dibêjin em ê wan herdûyan bibin ba hev. Kevok ji Xwedê ra dia dikin ku ji wan ra postekî kevokan bişîne û ew jî li Zînê bikin û Zînê bigirin bibin ba Memî. Diayên wan kevokan diqebile û postê kevokan li Zînê dikin û wê bi şev digel texta wê dihingirin û dibin ba Memî. Mem ji xew radibe û dinihêre ku yeke bîyanî di odeya wî da ye. Zîn jî radibe û şaş dimîne dibêje ev xortê xerîb çawa hatîye odeya min. Li wir di navbera wan da nîqaş çê dibe û her du jî dibêjin tu hatîyî odeya min. Paşê rêyekê dibînin û dibêjin em her du jî gazî xulamên xwe bikin, xulamên kê bên demek kî ya/ê din hatîye odeya wê/î. Ewil Zîn gazî qewraşa xwe ya bi navê Guleyîşan dike lê kes bersiva wê nade. Piştî Zînê Mem jî gazî xulamê xwe Bengîn dike û Bengîn bersiva wî dide. Ew çax êdî dizanin ku ew der cihê Memî ye. Li wir diaxivin û dibêjin ev bûyer bûyereke îlahî ye û soz didin hev ku ji xeynî hev bi tu kes ra nezewicin. Ji bo nîşaneya vê bûyerê jî gustîlkên xwe diguherînin. Li ser gustîlka Memî "Memê Alan", li ser a Zînê "Zîna Zêdan" dinivîse. Wê şevê sohbet dikin û paşê xew dikeve çavên wan, radizên. Dema ew radizên her sê kevok radibin texta Zînê dihingirin û dibin Cizîra Botan li qesra Mîr Zeydînî.

Roja din Mem ji xew radibe lê bê hal e û nizane gelo ya ku duh bi şev qewimî xewn e yan rast e. Mem ji nav cihê xwe dernakeve û ji bo taştê naçe dîwanê. Dema Mir dibîne ku Mem nehatîye dişîne pey wî. Bengîn tê ba Mem û dibîne ku halê Memî tune ye û bê hal ketîye. Bi alîkarîya Bengîn, Mem radibe û dest û rûyê xwe dişo. Dema destê xwe dişo gustîlka Zînê dibîne û ew çax ferq dike ku ya bi şev qewimîye ne xewn e. Mem bi vî awayî çend rojan derbas dike, naçe dîwanê û reng di rûyê wî da namîne. Rûspîyên bajêr tên lê dinêrin û ji Al Paşa ra dibêjin nexweşîya Memî derdê dilan e. Al Paşa radibe delêl dişîne nav bajêr û dibêje bila hemû keç û bûkên bajêr xwe bixemilînin û bên Baxçeya Keyfê dê Mem ji xwe ra yekê ji wan biecibîne. Hemû keç û bûkên bajêr xwe dixemilînin diçin Baxçeya Keyfê û li pêşîya Memî derbas dibin lê Mem serê xwe ranake û li wan nanêre. Dema sedema vê rewşê dipirsin Mem dibêje min soz daye Zîna Zêdan û keç û bûk tev belav dibin. Mem biryara xwe ya çûnê dide û ji bo hespê xwe Bozê Rewan zîneke bi micewher dide çêkirin. Herçiqas dê û bavê wî nexwazin jî Mem

biryara xwe dide û bi rê dikeve, berê xwe dide Cizîra Botan ku di berî da navê vî bajarî hîç seh nekirîye.

Piştî şeva hevdîtinê Zîn jî bê hal e, nexweş dibe û dikeve nav cihan. Ew jî nizane gelo ew xewn bû yan rast lê dema ku gustîlka di tilîyê xwe da dibîne ferq dike ku ew ne xewn bû. Zîn piştî wê rojê ji nav cihan dernakeve, xwarin naxwe, kincên xweşik ji xwe dike û yên carîyeyan li xwe dike û reng di rûyê wê da namîne. Rojên Zînê bi vî awayî li benda Memî derbas dibin.

Bozê Rewan hespekî wisan e ku rêya şeş mehan di nava panzdeh rojan da diçe. Mem di rê da rastî şivanekî tê û pirsa wî welatî dike. Şivan jê ra dibêje ev welat Cizîra Botan e, eger tu bixwazî biçî, mala Mîr qesra mîr li wir e, eger bixwazî xwe bigehînî mala mêrxas û egîdan mala Qeretajdîn, Çekan û Hesen jî li wir e, lê eger tu bixwazî biçî mala fesadan mala Bekoyê Ewan jî li wir e. Mem kumek zêr dide şivên û ber bi mala her sê bira Qeretajdîn, Çekan û Hesen ve diçe. Zîna keça Beko remildar e û ji hatina Mem xeberdar bûye. Zîna remildar diçe ser rêya Memî disekine û dema Mem ji wir derbas dibe dixwaze wî bixapîne (Ji Lescot, 1942 vgh. Subaşı, 2022: 195, 198). Ji Mem ra dibêje ez Zîn im û behsa wê şevê dike. Lê ji ber ku Zîna keça Beko yeka ne rind bûye Mem şaş dimîne û di dilê xwe da dibêje min ji bo vê keçê welatê xwe, dê û bavê xwe terikand, gelek keçên ji vê bedewtir hebûn li welatê min. Hespê Memî pê dihese ku Mem poşman bûye ji Mem ra dibêje ev ne ew Zîn e ku te wê şevê dîtibû, ev Zîna keça Bekoyê Ewan e. Li wir Mem dixwaze xwe ji destê keça Beko xilas bike lê ew nahêle. Mem jî soz dide dibêje eger ez bigihijime Zînê ez ê te jî wekî qerwaş digel xwe bibim û bi van gotinên xwe Zîna keça Beko îqna dike.

Mem diçe li mala her sê birayan û dibe mêvanê wan. Mem ewqas qeşeng bûye ku hemû bajarî hatine bo dîtina Memî. Wan her sê birayan ji Mem ewqas hez kirine ku gotine tu jî êdî birayê me yê çaran î. Piştî hatina Mem, Qeretajdîn sê rojan neçûye dîwana Mîrî. Mîr jî ecêpmayî maye gelo mêvanê wan yekî çawa ye ku nikarin ji ba wî rabin û bên dîwanê. Mîr Zeydîn dişîne pey Qeretajdîn û mêvanê wî. Dema diçine dîwanê, Mîr ji bedewîya Memî radibe ser pêyan û şaş dimîne. Mem hem gelek bedew bûye hem jî rabûn û rûniştina wî wekî padîşahan bûye.

Xebera Zîna hezkirî ji hatina Mem çê dibe. Zîn ji Mem ra nameyek dinivîse û dide xwişka xwe Sitî. Sitî jî wê nameyê digehîne Memî. Zîn digel carîyeyên xwe diçe

Kanîya Qestelê û Mem jî pê ve diçe û li wir hev dibînin. Ji ber ku Çekan dergistîyê Zînê bûye di serî da ji vê rewşê gelek aciz dibe lê di dawîyê da dizanin ku wan hev di xewna şevan da dîtîye û ev tiştekî îlahî ye êdî Çekan tiştekî nabêje. Di vê navberê da Bekoyê Ewan pê dihese ku Mem ji bo çi hatîye û naxwaze ew bigihîjin miraz û meqseda xwe.

Piştî çend rojan Mîr Zeydîn, her sê bira û siwarên Mîr diçin nêçîrê. Mîr Zeydîn dibêje bila Mem jî bê. Lê Mem ji wan ra dibêje ez nexweş im û nikarim bêm. Nîyeta Mem ew e ku dema her kes ji bo nêçîrê çû ew jî biçe ba hezkirîya xwe û hev bibînin. Dema hemû ji bo nêçîrê bi rê dikevin Mem diçe dîwanxaneyê û ew û Zîn li wir dikevin nav henek û laqirdîyan. Bekoyê Ewan dema dibîne ku Mem nehatîye dizane di vê îşê da tiştekî heye. Piştî çûna wan hinek şilî dibare û biryara vegerê didin. Dema vedigerin û tên qesrê Mem û Zîn di dîwanxaneyê da bûne. Dengê hatina wan seh dikin û Zîn nikare bireve û xwe di bin kurka Memî da vedişêre. Dema Mîr dikeve hundir û Mem li ber wî ranabe û Mîr gelek hêrs dibe. Beko jî hin gotinan dike lê Mem dibêje ez ewqas nexweş im ku nikarim rabim ser pêyan. Li wir Qeretajdîn dizane ku Mem di tengasîyê da ye. Mem bi xef gulîyên Zînê dide nîşanê Qeretajdîn. Qeretajdîn ji bo xilasbûna wan diçe qesra xwe û ji jina xwe Sitî ra meseleyê dibêje. Qeretajdîn ji bo xelasîya Memî mala xwe dide ber agir ku her kes ji bo alîkarîya wan biçin. Xeber digîhîje Mîr û dibêjin mala Qeretajdîn dişewite. Hemû ber bi mala Qeretajdîn ve diçin lê Beko xwe li cihekî xef dike. Dema dîwanxane vala dibe Zîn ji bin kurka Memî derdikeve, direve û diçe odeya xwe. Dema Zîn diçe Beko wê dibîne. Mem jî ji bo alîkarîyê diçe mala Qeretajdîn lê dibîne ku qesra wî hemû şewitîye. Çend roj li ser vê bûyerê derbas dibin û Mîr ji bo seferekê her sê birayan digel siwarên xwe dişîne. Di wê navberê da Beko diçe ba Mîr û fesadî dike, dibêje roja ku mala Qeretajdîn şewitî yekê ji bin kurka Memî derket û rewî, nizanim ew jina te bû yan keça te Zîn bû. Mîr pir hêrs dibe û dixwaze Memî biavêje zîndanê lê ji Qeretajdîn, Çekan û Hesen ditirse. Bekoyê Ewan dibêje Mîrê min, hûn setrenç bilîzin eger te zora wî bir tu dikarî wî biavêjî zindanê. Mîr qebul dike û gazî Memî dikin. Di dîwanxaneyê da rûdinin û Beko dibêje weha wext derbas nabe, setrenç bilîzîn ku wext derbas be. Ew jî qebûl dikin û dest bi setrencê dikin. Her du jî şertê xwe dibêjin. Mem dibêje eger ez qezenç bikim Zîna xwişka te dixwazim, Mîr jî dibêje eger ez qezenç bikim ez ê te biavêjim zindanê. Du dest dileyîzin û her duyan jî Mem qezenç dike. Dimîne destekê tenê. Beko lê dinêre dibîne ku Mîr qezenç nake

radibe diçe ba Zînê û jê ra dibêje Mem û Mîr setrenç dilîzîn. Eger Mem vê carê jî qezenç bike dê hûn bigihîjin hev, rabe kincên xwe yên xweşik li xwe bike û temaşê wan bike. Zîn pir şah dibe, xwe dixemilîne û diçe li ber kulekê disekine. Beko jî dîsa fesadîyê dike û ji Mîr ra dibêje cihên xwe biguherînin, belkî çêtir be. Dema cihên xwe diguherînin berê Memî dikeve Zînê û êdî hiş di serî da namîne, bala xwe nade setrencê û Mîr qezenç dike. Dema Mîr qezenç dike dibêje şerta min ew e ez ê te biavêjim zîndanê. Mem diavêjin zindana kevirî û li wir birçî û tî dihêlin. Çend roj derbas dibin Zîn radibe nameyek dinivîse û ji Qeretajdîn ra dişine, dibêje Mem di zindana kevirî da ye û eger hûn neyên ew ê bimire. Xeber digehişe Qeretajdîn, Qeretajdîn pir hêrs dibe û digel bira û siwaran vedigerin û tên. Heta ew tên Mem rihê xwe teslîm dike. Mem sibê dimire êvarê jî Zîn. Gora wan her duyan li ba hev çê dikin. Qeretajdîn dizane sebebê wan Bekoyê Ewan e, li ser qebra wan şûra xwe derdixîne û serê Bekoyî jê dike. Çipikek xûna Beko dikeve ser qebra wan, di navbera her duyan da dibe dirî.

2.4.2.Dewrêşê Evdî

(Kurteya vê destanê ji varyantên Celîl û Celîl, 1978: 279-290; Filiz, 2021: 43-46 û Cizîrî, 2020: 267-275 hatîye amadekirin.)

Dewrêşê Evdî kurê Evdî Milhim, şervanê eşîra Milan, egîdê Şerqîyan, evîndarê Edûlê ye. Di nav eşîra Milan da kesek tune ye ku nav û dengê wî, egîdî û lehengîya wî seh nekiribe. Dewrêş di nav eşîra Milan da bi mêrxasî û lehengîya xwe, bi qeşengbûna xwe navdar bûye. Bavê wî Evdî Milhim û eşîra Şerqîyan jî bi şervanîya xwe hatine nasîn. Ev eşîr ji Şengalê hatine û êzidî ne. Dewrêş û bavê wî Evdî Milhim heman qederê jîyane, evîndarê keçên Milan ên misilman bûne lê ji ber êzdîbûna wan negihane mirazên xwe.

Li devera Rihayê gelek eşîr hebûne. Yek ji van eşîran eşîra Milan e û serokê eşîrê jî Zor Temir Paşa ye. Gelek eşîrên din dikevin nav konfederasyona Milan. Yek ji van eşîran eşîra Şerqîyan e. Şerqîyan digel Milan li hember êrîşên talanker şer kirine û ji alîyê lehengîyê ve navdar bûne. Serokê Şerqîyan Evdî Milhim bûye û Evdî û Zor Temir Paşa destebirayê hev bûne û hertim bi hev ra çûne nêçîr û seyranê. Evdî Milhim rojekê Rahmê ya xwişka Zor Temir Paşa dibîne û dilê wî dikeve Rahmê. Rahmê jî ji Evdî hez dike lê haya kesî jê tune bûye. Evdî Milhim dixwaze bi Rahmê ra bizewice lê ji ber ku êzidî ye Rahmê nadin wî û didin yekî misilman. Piştî çend salan Evdî

Milhim jî bi Eyşê Welet a êzîdî ra dizewice û ji zewaca wan du kurên wan çê dibin. Navê kurên wan Dewrêş û Sêhdûn e. Dewrêş mîna bavê xwe yekî egîd û qehreman e. Ciwanî û mêranîya wî li her derê belav bûye. Qîzên eşîrê çav berdidin wî û dixwazin pê ra bizewicin lê dilê Dewrêş ketîye Edûlê û ji xeynî wê çavê wî tu kesî nabîne. Dewrêş û Edule ji hev hez dikin û dixwazin bizewicin. Dewrêş nîyeta xwe ji dê û bavê xwe ra dibêje. Bavê wî Evdî herçiqas dizane ku Zor Temir Paşa keça xwe Edûlê nade kurê wî lê dîsa jî ji bo xatirê Dewrêş diçe û Edûlê dixwaze. Zor Temir Paşa hêrs dibe û keça xwe nade Dewrêş, dibêje hûn êzidî ne em misilman, ez ê çawa keça xwe bidim we, ez ê ji eşîra xwe ra çi bêjim? Piştî vê bûyerê Evdî Milhim digel malbata xwe koç dikin û diçin Çîyayê Şengalê.

Ereb û tirkmen li hember Zor Temir Paşa serî hildidin û amadehîya şerî dikin. Zor Temir Paşa dizane ku eger Dewrêş û egîdên Şerqîyan neyên ew ê têk biçin lewra Zor Temir Paşa ji Dewrêş ra nameyekê dişîne. Dema Evdî nameyê dibîne ji Dewrêş ra dibêje, kurê min wextekê ez jî evîndarê xwişka Zor Temir Paşa bûm, wî soz dabû min ku eger di şer da bi ser kevim dê xwişka xwe bidaya min. Lê ew li ser soza xwe nesekinî û gote min hûn êzidî ne em misilman, ez xwişka xwe nadim te. Niha heman tiştê ji te dixwaze û ew ê keça xwe nede te.

Zor Temir Paşa ji bo serdarîya şerî keça xwe Edûlê diavêje mazatê û dibêje her kî qehweya di fîncana ferfurî da vexwe ew ê bibe serdarê leşkeran û ez ê keça xwe bidim wî. Dewrêş dema vê gotinê seh dike kelecanek mezin dikeve nava dilê wî û berê xwe dide eşîra Milan û diçe dîwana Paşê. Dewrêş tê û dibîne ku kes cesaret nake ku qehwê vexwe. Dewrêş fîncanê radike û di yek carê da qehwê vedixwe û wê barê giran hildigire ser milên xwe. Zor Temir Paşa di dîwanê da di nava her kesî da soz dide Dewrêş û dibêje ez ê Edûlê bidim te. Lê ev gotin Edûlê kêfxweş nake ji ber ku Edûlê dizane ev şer şerê man û nemanê ye, çûn û nehatinê ye. Dewrêş duwazdeh hevalên xwe yên şerê hildibijêre, siwarê Hedbanê dibe û bi rê dikevin. Li girê Etşanê di navbera wan da şereke mezin diqewime. Hevalên Dewrêş bi mêrxasî şer dikin lê lib û lib tên kuştin. Dewrêş bi tenê dimîne, ber xwe dide û şerê didomîne. Kes nikare wî zevt bike. Dewrêş li ser pişta Hedbanê wan yek bi yek dikuje. Dema dibînin ku nikarine Dewrêş ew çax berê xwe didin fêl û dolaban. Kose Weys dibêje eger bi hîleyek nebe em nikarin Dewrêş bikujînin. Kose Weys dibêje em ê wî ber bajarê mişkan ve bikêşin, li wir dê lingên hespê bişkê û Dewrêş bikeve erdê, paşê em ê wî bikujin. Dewrêş ber bi bajarê

mişkan ve dibin û li wir lingên Hedbanê dişkê û Dewrêş ji ser pişta Hedbanê dikeve xwarê. Li wir Dewrêşî dikujin û Dewrêş û Edûlê nagehijin miraz û meqseda xwe.

2.4.3.Kela Dimdimê

(Kurteya vê destanê ji varyantên Cizîrî, 2020: 174-185 û Kaplan, 2019: 19-118 hatîye amadekirin.)

Emîr Xan rojekê xewnekê dibîne û ji dêya xwe ya Le'lîxan ra behsa xewna xwe dike. Ew di xewnê da dibîne ku roj û heyv bi hev ra têne mala wî. Xan gelek di bin bandora wê xewnê da dimîne û roja din digel dayika xwe diçin ba alîmekî ku xewna wî şîrove bike. Alim ji wî ra dibêje ku tu yê xezîneyeke gelek mezin bibînî. Tu yê saya wê xezînê heft salan bi dewletê ra şer bikî. Tu yê bibî yekî bi nav û deng, dê gelek mêrxas û egîd li derûdora te kom bin, piştî şer tu yê bimirî lê nav û dengê te dê hertim li dinyayê bimîne. Piştî van şîroveyan Xan Emîr jin û zarokên xwe, dêya xwe hildigire û berê xwe dide ba Şahê Ecem. Piştî çend salan Şah egîdî û mêrxasîya Xan dibîne û pê ra hevaltî dike. Ew êdî dibin destebirayên hev. Rojekê Xan û Şah bi hev ra diçin nêçîrê û di rê da rastî şêrekî tên. Xan xwe diavêje pêşîya şêrî û destê xwe yê çepê dixe nav devê şêrî û bi destê rastê jî şêrî dikujîne. Di wê navberê da şêr destê Xan jê dike û xwîn jê diherike. Dema Şah ferq dike ku şêr destê Xan qet kirîye emir dide ku ji bo Xan destekê zêrîn çêkin. Ji bo Xan destekê zêrîn tê çêkirin û Xwedê Teala rih dide wê destê û ew destê zêrîn ji destê wî yê berî çêtir dibe. Êdî ji Xan ra dibêjin Xanê Çengzêrîn. Piştî vê bûyerê Şah zêdetir ji Xanê Çengzêrîn hez dike û wî ji ba xwe dûr nake.

Rojekê Xan û Şah bi hev ra diçin Seyranê û rastî şivanekî tên. Şivan ji wan ra şîr didoşe û bi nanê xwe şîr vedixwin. Paşê xewa Şahî tê û radizê. Şah xewnekê dibîne û dema hişyar dibe behsa xewna xwe dike, dibêje min di xewnê da dît ez ji ser pireke xirab ra derbas dibûm û rastî xezîneyeke pir mezin dihatim. Xezîneyeke wisa bû ku bi salan welatek pê tê xweyîkirin. Ev xewn xewna Xanî anî bîra wî û Xan biryar da ku êdî ji bo gelê xwe bixebite, ji wan ra pêşengîyê bike û wan ji destê zordaran rizgar bike. Dema Xan û Şah vedigerin Xan ji Şah ra dibêje min gustîlka xwe li ser kanîyê ji bîr kir û divê biçim û bînim. Xan vedigere diçe cihê ku şîr vexwaribûn. Li wir kevirek mezin hebûye û Xan ji bin wî kevirî hin kaxezan dibîne û derdixe. Dema wan kaxezan bi melayekî dide xwendin mela dibêje ev behsa xezîneyeke mezin dike, eger tu nîvê

xezîneyê bidî min ez ê ji te ra cihê xezîneyê bêjim. Li ser van gotinan Xanê Çengzêrîn hêrs dibe û wî melayî dikuje. Xan meseleyê ji dêya xwe Le'lîxan ra dibêje û dêya wî jî jê ra dibêje ku here erdekî bi qasî çermê gayekî ji Şah bixwaze û bila ew erd jî cihê xezîneyê be. Xan diçe ba Şah û xwasteka xwe jê ra dibêje û Şah jî bi qasî çermê gayekî erd dide wî.

Xan dixwaze li ser wî erdî keleyek ava bike. Diçe ji Şah daxwaza paleyan dike û Şah jî pêncsed pale jê ra dişîne. Xan digel paleyan xîmê keleyê dikole û dest bi çêkirina kelê dikin. Dema kele nîvî dibe cihê avê dîyar dikin. Ji bo ku pale cihê avê aşkera nekin Xan serê hemûyan jê dike. Tenê Mehmûdkê Alekanî nakuje. Xan dîsa ji Şah daxwaza paleyan dike û Şah pêncsed paleyên din ji Xanî ra dişîne. Xan bi alîkarîya wan paleyan kelê diqedîne. Ji bo ceribandina saxlembûna kelê sê roj û sê şevan top diavêjin kelê lê tiştek jê ra nabe û pê bawer dibin ku zehf saxlem e. Xan êdî mala xwe tîne kelê û li wir dijî. Şah piştî çêkirina kelê wekî dîyarî keça xwe Xan Perî dide Evdal Begê kurê Xanê Çengzêrîn. Xan pir kêfxweş dibe û daweta wan çê dikin. Xan Ebdalê Mukrî mirovekî feqîr e û piştî daweta Xan Perî û Evdal Beg landikek darîn çê dike û wekî dîyarî ji Xanî ra dibe. Nîyeta wî ew e ku Xan ji bo landikê şabaşekê bide wî. Xan dema Xanê Mukrî dibîne wî diceribîne û têdigihîje ku ew yekî egîd û mêrxas e û wî dike destebirayê xwe.

Xan êdî ji bo şer amadehîyê dike û hemû mêr û mêrxasên kurdan li ba xwe kom dike. Xwarinên ku zû bi zû xirab nabin hînî dibe û embarên kelê bi wan xwarinan tije dike. Xan leşkerên xwe dişîne ku karwanên Şahî bişelînin. Xelîfe dema seh dike diçe ba Şah û jê ra dibêje ku Xan bûye dijminê me û çavê wî li cihê te ye. Şah ewil red dike lê paşê ew jî dibîne ku Xan bûye dijmin û emir dide ku Xelîfe ordîyekî bibe û Kela Dimdimê xirab bike. Xelîfe ordîyek amade dike û ordî Kela Dimdimê dorpêç dike. Di navbera wan da şer diqewime û ji xeynî Xelîfe kes ji ordîya Şahî namîne. Şah emir dide dîsa Xelîfe ordîyek amade dike û kelê dorpêç dikin. Sê sal bê navber şer dikin lê dîsa jî nikarin kelê bistînin. Şer heta heft salan dewam dike lê Şah bi ser nakeve. Rojekê Mehmûdkê Alekanî ji Xan ra xayîntî dike û diçe ba Şah û jê ra serekanîya ava kelê nîşan dide. Li hemberî xayîntîya xwe ji Şah keça wî Xan Perî ya jina Ebdal Beg dixwaze. Şah dema van gotinan seh dike pir hêrs dibe û wî dide kuştin. Ecem radibin diçin serekanîyê û ava Kela Dimdimê pîs dikin. Xan piştî pîsbûna avê hawara xwe digîhîne Xwedê ku baran bibare. Piştî diayê Xan baran dibare û ava wan hinek paqij

dibe. Lê di demeke şun da av dîsa qirêj dibe û bêhêz dikevin. Xan dibêje em ê bi mêranî şer bikin û digel leşkerên xwe ji kelê derdikevin. Li wir di navbera wan da şereke mezin diqewime. Batinî û ewlîya tên alîkarîya Xan û leşkerên Ecem ji alîyê kesên nedîyar ve tên kuştin. Leşkerên Ecem gelek ditirsin ji ber ku serê wan dihate jêkirin lê wan tu kesî ku serê wan jê dikir nedidîtin. Dema Şahê Ecem dibîne ku kurd û batinî ordîya wî xilas dikin ew jî ji topçîyan ra dibêje barûtê li deştê reşînin û biteqînin. Bi vî awayî hemû leşkerên meydanê hem Kurd hem jî Ecem hemû dimirin. Dema dêya Xanê Çengzêrîn dibîne ku şer xelas bûye û Kurd hemû hatine kuştin ew jî ji bo ku nekevin li ber destê Eceman agir berdide barûtan, barût diteqin û hemû kele serûbin dibe. Dêya Xan û jinên kurd bi vî awayî xwe dikujin da ku nekevin destê neyaran.

2.4.4.Zembîlfiroş

(Kurteya vê destanê ji varyantên Cindî û Evdal, 2008: 388-393; Sadinî, 2011: 399-413; Gernas, 1995: 83-90 hatîye amadekirin.)

Zembîlfiroş kurê mîrekî ye. Ji ber ku zarokê mîrî tenê ew bûye Zembîlfiroş bi dil û delalî hatîye mezinkirin. Zembîlfiroş di nav jîyaneke dewlemend da ji derd û kulên dinyayê bêxeber jîyaye. Ew hertim ligel wezîrê bavê xwe çûye nêçîr û seyranê. Rojekê dîsa Zembîlfiroş û wezîr diçin nêçîrê û di vegera nêçîrê da bûyerek diqewime. Piştî wê bûyerê jîyana Zembîlfiroşî bi temamî diguhere. Ew di vegerê da ji ber goristanekê derbas dibin û li wir li ser jîyan û mirinê diaxivin. Wezîr jê ra dibêje ku dawîya me hemû zindîyan ev der e. Zembîlfiroş heta wê çaxê li ser mirinê nefikirîye û di bin bandora gotinên wezîrî da dimîne, biryar dide ku dê dev ji mal û milkên dinyayê berde û bi keda destê xwe ji bo dinyaya din bixebite. Zembîlfiroş tobe dike û biryara xwe ya çûyînê bi hevjîna xwe ra parve dike. Hevjîna wî jî piştgirîyê dide wî û bi rê dikevin, tên li Farqînê bi cih dibin. Zembîlfiroş li wir selikan, zembîlan çê dike û bi navê Zembîlfiroş tê nasîn. Piştî jîyana wan a nû çend zarokên wan çê dibin û ew bi çêkirina zembîlan debara xwe dikin.

Zembîlfiroş kolan bi kolan digere û zembîlên xwe difiroşe. Rojekê dîsa dema li kolanan digere Xatuna jina mîr ji kulekê Zembîlfiroş dibîne û ne bi dilekî bi hezar dilan wî dihebîne. Zembîlfiroş di bedewîyê da mîna Yûsif Pêxember bûye, husneke zehf rind pê ra hebûye. Xatun bang li carîyeyên xwe dike û ji wan ra dibêje bila ji Zembîlfiroş ra bêjin ku mîr dixwaze zembîlan bistîne û bila hin zembîlan çêke û sibê

bîne qonaxê. Zembîlfiroş diçe mala xwe û ji bo mîr amadehîya zembîlan dike. Roja din zembîlên xweşik çê dike û ber bi qonaxa mîrî ve diçe. Dema diçe ber qonaxê carîye derî vedikin û ew dibin ba Xatunê. Dema diçe ba Xatunê dizane ku bi Xatunê ra nikare bazarîyê bike, divê mîr li wir bûya lê dîsa jî nikare tiştekî bibêje. Xatun li wir nîyeta xwe aşkera dike û dibêje min ji bo standina zembîlan gazî te nekir, min ji bo evîna dilê xwe gazî te kir. Xatun dibêje ku min tu pir ecibandîye û daxwaza pev ra bûnê jê dike. Zembîlfiroş daxwaza Xatunê qebûl nake û tobedarbûn, zewicandîbûn û xwedî zarokbûna xwe tîne zimên. Lê çi jî bike Xatun îqna nabe. Xatun mal û milk, zêr û pere teklîf dike lê Zembîlfiroş qebûl nake. Zembîlfiroş dibîne ku xilasbûna ji destê Xatûnê ne minkin e daxwaza derketina kelhê dike. Ji bo destnimêjê ji carîyeyan avê dixwaze û Xatun bixwe mesîna avê dide destê wî. Xatun hêvî dike ku Zembîlfiroş ji kelhê vegere û daxwaza Xatunê bi cih bê.

Zembîlfiroş derdikeve ser kelhê û bi awayekî bêçare hewara xwe digihîne Xwedê. Ew şûna gunehkarîyê avêtina xwe ya ji kelhê hildibijêre û xwe ji kelhê berdide xwarê. Li wir diaya wî tê qebûlkirin û Xwedê ji bo alîkarîyê melekê Cebraîl dîşîne. Cebraîl bi awayekî wisa nerm Zembîlfiroş datîne erdê ku tu derê wî naêşe. Zembîlfiroş berê xwe dide malê lê li malê jin û zarokên wî li bendê ne ku Zembîlfiroş tiştekî xwarinê ji wan ra bîne. Dema hevjîna wî Elê dibîne ku Zembîlfiroş bi awayekî destvala tê hêrs dibe û dibêje zarok birçî ne û li benda te ne. Zembîlfiroş ji Elê ra dibêje wekî her caran beroşan dane li ser agirê, Xwedê mezin e. Elê piştî demekê diçe li beroşên ser êgir dinêre û dibîne ku hemû beroş tijî xwarin in û zikê xwe û zarokan têr dike.

Xatun dema ferq dike ku Zembîlfiroş revîyaye pir xemgîn dibe. Radibe kincên xwe yên xweşik li xwe dike, zêr û pereyan digire û dikeve pêy şopa Zembîlfiroşî. Diçe ba mala wan û hal û meseleya xwe ji Elê ra dibêje. Xatun dibêje tenê şevekê ligel Zembîlfiroş razêm bes e bila hemû zêr û pereyên min ji te ra bin. Malê dinê li Elê kar dike û Elê daxwaza Xatunê qebûl dike. Xatûn hemû zêr û pereyên xwe dide wê û di ser da kincên xwe yên zêrîn jî dide Elê. Xatûn kincên Elê yên kevin li xwe dike û dikeve nav cîyê Zembîlfiroşî. Dema dibe şev Zembîlfiroş tê û wekî her caran dikeve nav cîyê xwe, xebera wî ji tu tiştê tune bûye. Xatun dema di nav cîyan da dizivire ji xirxalên wê deng derdikeve û Zembîlfiroş ferq dike ku ew ne jina wî ye. Ji ber ku xirxalên jina wî tune bûye û Xatûnê jî ji bîr kirîye ku xirxalan derxîne. Zembîlfiroş ji nav cîyan derdikeve û direve. Zembîlfiroş dema ferq dike ku xilasî ji destê Xatûnê tune

ye dia dike ku Xwedê rihê wî bistîne. Xwedê Teala diayê wî qebûl dike û Zembîlfiroş rihê xwe teslîm dike. Piştî mirina Zembîlfiroş Xatûn pir diqehire û zêde derbas nabe ew jî rihê xwe teslîm dike.

2.4.5.Sîyabend û Xecê

(Kurteya vê destanê ji varyantên Celîl û Celîl, 1978: 118-148 û Aras, 2023: 7-59 hatîye amadekirin.)

Sîyabend zarokekî sêwî bûye û li ber destê mam û jinmama xwe mezin bûye. Ew zarokekî pir delal bûye lê porê wî tune bûye. Lewra navê "Gurî" lê danîne. Mamê wî mixtarê gund bûye û Sîyabend jî ji zarokên gund ra gotîye, çawa ku mamê min mixtarê gund e ez jî wisa mixtarê we me. Sîyabend tirsa xwe xistîye nav dilê zarokan û rehetî nedaye zarok û gundîyan. Gundî ji wî gelek aciz bûne û ji mamê wî xwastine ku wî bişîne cihekî din. Ji ber ku zerara Sîyabend daye gundîyan zehf bûye mamê wî jî gelek aciz dibe û wî ji gund dike der. Sîyabend bi rê dikeve û diçe cihekî din. Di rê da rastî qesrekê tê. Ew qesra Hesen Axayî ye. Sîyabend diçe cem Hesen Axa û jê daxwaza karekî dike. Sîyabend ji ber ku gelek qeşeng bûye Hesen Axa xwastîye karekî bide wî, lê kîjan karê gotibe Sîyabend gotîye ez nikarim wî karî bikim. Hesen Axa ji ber ku zehf jê hez kirîye di qesrê da odeyekî ji bo wî daye amadekirin. Sîyabend di qesrê da rastî keça Hesen Axayî tê. Gulperîya keça Hesen Axa ewqas rind bûye ku çawa çavê Sîyabend pê ketîye jê hez kirîye. Sîyabend ji Gulperîyê taseke av xwastîye lê Gulperîyê av nedayê û di ser da jî tinazên xwe bi gurîbûna wî kirîye. Sîyabend ji gotinên Gulperîyê pir aciz dibe û lê dixe. Hesen Axa ji kirinên Sîyabendî pir aciz dibe lê dîsa jî wî efû dike. Di ser da çend roj derbas dibin rojekê Sîyabend di xewna xwe da destebirayê xwe yê Qereqêtran dibîne. Sîyabend li ba Hesen Axa jî zêde namîne û siwarê hespê bi navê Deybilqiran dibe, xurceke zêr hildigire û bi rê dikeve. Di rê da di nav berfê da reşeyek dibîne. Ew reşe Qereqêtran e û li wir her du jî ji hev ra behsa xewnên xwe dikin û dibin destebirayên hev. Her du destebira bi rê dikevin û diçin, di rê da rastî mêrgekê tên û li wir konê xwe vedidin. Di mêrgê da qesrek hebûye. Ereb Zincar ji qesrê derdikeve û ber bi wan ve tê. Li wir di navbera wan da şer derdikeve. 3 roj û 3 şev bê navber şer dikin û di dawîyê da Sîyabend kêra xwe derdixîne ku serê Ereb Zincar jê bike. Ereb Zincar kezîyên xwe derdixîne û nîşanê wî dide, ew çax Sîyabend dizane ku ew ne mêr e. Ereb Zincar dibêje ez qîza mîrê cinan im, min sozek

dabû, her kî min bavêje erdê ez ê jê ra bim. Sîyabend dibêje tu wekî xwişka min î û daxwaza Ereb Zincar bi cih nayne. Axir ew her sê dibin destebirayên hev û dikevin rê, berê xwe didin welatê xeribîyê. Diçin li cihekî disekinin, li wir konekî bi çardeh sitûnî dibînin. Di wê konê da keçekê mîna çardehê heyvê hebûye. Sîyabend di dîtina ewil da evîndarê keçikê dibe. Dilê Sîyabendê bi hezar dilî dikeve wê keçikê û dibêje eger sax be ji canê min ra, eger bimire ji erdê ra ye. Navê keçikê Xecê ye û dê û bavên wê mirîne lê heft birayên wê hene. Her sê destebira li konê wan dibin mêvan. Dema birayên Xecê têne konê Sîyabend nîyeta xwe aşkera dike û daxwaza xwişka wan dike û ew jî dibêjin eger xwişka me bêje erê bo me jî erê ye. Ew çax Sîyabend jî gustîlka nîşaneyê dixe tilîyê Xecê. Sîyabend ji bo amadehîya dawetê bi rê dikeve lê berî çûyînê qîma wî bi destebirayê wî yê Qereqêtran nayê. Dest û pîyê Qereqêtranê bi zincîrê girê dide, paşê bi rê dikeve û diçe. Dilê kurê mîrê Şikakîyan jî ketîye Xecê. Dema dibihîze ku yekî nîşanî daye ser Xecê radibe diçe ser konê wan û her heft birayên Xecê dikujîne, serê Qereqêtranê jê dike û Xecê direvîne, dibe. Sîyabend dema vedigere û tê dibîne ku her heft birayên Xecê û destebirayê wî hatine kuştin. Sîyabend qebra wan çê dike û dikeve pêy Xecê. Sîyabend diçe û xwe digehîne cihê kurê mîrê Şikakîyan. Li wir di mala pîrekê da dimîne û bi rêya pîrê gustîlka xwe ji Xecê ra dişine. Sîyabend ji Xecê ra nameyekê dinivîse û gustîlkê jî dixe di nav qedeheke şîr da. Dema pîrê xwe digehîne ba Xecê, Xecê gustîlkê dibîne û nameyê dixwîne. Seet dibe donzdehê nîvê şevê û Sîyabend, Xecê direvîne. Siwarên kurê mîrê Şikakîyan pê wan ve tên û di navbera wan da şer çê dibe lê Sîyabend wan hemûyan dikûje û heyfa birayên Xecê û ya destebirayê xwe hiltîne. Sîyabend û Xecê berê xwe didin Çîyayê Sîpanê û diçin li wir bi cih dibin. Li serê Çîyayê Sîpanê xewa Sîyabend tê û serê xwe dide ser çokê Xecê û dikeve xewê. Xecê lê temaşe dike, dibîne ku donzdeh pezkûvî ji alîyê wê ve tên. Yek ji wan bizin e yên din jî nêrî. Xecê dibîne ku nêrîyekî girover, qelew, giloçê xwe li deh nêrîyên din dixe û ji ser bizinê vedigerîne. Xecê wî nêrîyî dişibîne Sîyabendê xwe û dibêje ew jî wekî Sîyabendê min xwedîyê tîr û kevanê zîvîn e. Li wir kelogirî dibe û digirî. Dilopek hêstirê wê dikeve rûyê Sîyabend. Sîyabend hişyar dibe û dibîne ku Xecê digirî, ji Xecê ra dibêje eger tu poşman bûyî ji min ra bibêje ez ê te bibim mala te. Xecê jî behsa wî nêrîyî dike û dibêje ku min ew nêrî şibande te, birayên min hate bîra min lewra girîyam. Ew çax Sîyabend jî soz dide Xecê ku wê pezkûvîyê bikuje û goştê wê ji Xecê ra bîne. Sîyabend radibe, tîr û kevanê xwe hildigire û dikeve pey pezkûvîyê. Sîyabend tîrê xwe

berdide û pezkûvî birîndar dike. Sîyabend dema diçe ba pezkûvîyê ku serê wê jê ke qiloçên pezkûvîyê dikeve ranê Sîyabendî û Sîyabend ji Sîpanê Xelatê dikeve nav newalê. Dema dikeve newalê çiqilê darekî ji pişta wî dikeve û ji singê wî derdikeve. Dibe nalîna Sîyabend. Xecê li pey Sîyabend ve diçe û laşê pezkûvîyê dibîne. Li wir nalîna Sîyabend seh dike û li newalê dinihêre. Xecê dema halê Sîyabendê xwe dibîne dike hawar û digirî. Ji bo ku Sîyabend ji wê halê bifilite Xecê dikeve rê û ji heft gundan werîs berhev dike. Wan werîsan bi hev ve gire dide lê dîsa jî werîs nagehije Sîyabend. Sîyabend dema dibîne ku çare tune êdî ji Xecê ra dibêje siwarê hespê min bibe û here, ji xwe ra xortekî ji min çêtir bibîne û pê ra bizewice, navê min û navê Qereqêtran li zarokên xwe deyne. Xecê dibêje ez piştî te tu kesî nahewînim û ew jî xwe ji serê Sîpanê berdide xwarê. Axir Sîyabend û Xecê nagehijin mirazên xwe û her du jî li wir ruhê xwe teslîm dikin.

2.4.6.Binevşa Narîn û Cembelîyê Kurê Mîrê Hekarîya

(Kurteya vê destanê ji varyantên Celîl û Celîl, 1978: 177-189 û Cindî, 2016: 67-85 hatîye amadekirin.)

Binevşa Narîn keça Fariz Beg e. Ji xeynî Binevşê heft kurên Fariz Beg jî hebûne. Binevşa Narîn bi sipehîtî û delalîya xwe navdar bûye. Dilê Derwêş Axayê kurmamê Binevşê dikeve wê lê Derwêş Axa yekî extîyar bûye. Derwêş Axa ji Fariz Begî daxwaza keça wê dike. Fariz Beg herçiqas naxwaze jî dîsa dibêje ez ê ji Binevş û birayên wê bipirsim eger ew qebûl bikin ez ê keça xwe bidim te. Fariz Beg dema daxwaza Derwêş Axa ji kurên xwe ra dibêje, kurên wî qebûl nakin û dibêjin xwişka me çardeh salî ye lê Derwêş Axa heftê û pênç. Dibêjin em xwişka xwe nadin wî û ji xwe Binevş jî naxwaze pê ra bizewice. Derwêş Axa yekî bi hêz e û dibêje eger hûn Binevşê nedine min ez ê we hemûyan bikujîm û Binevşê ji xwe ra bibim. Bav û birayên Binevşê ji tirsa Derwêş Axa bi şev rê dikevin û berê xwe didin Hekarîyê, diçin li cihê Cembelîyê kurê Mîrê Hekarîya konê xwe vedidin. Roj derbas dibin, rojekê Cembelîyê kurê Mîrê Hekarîyê ji nêçîrê vedigere û di rê da diçe ser kanîyekê. Li wir rastî Binevşa Narîn tê û ne bi dilekî bi hezar dilan Binevşê dihebîne. Ji ber ku Cembelî jî xortekî pir qeşeng bûye dema çavê Binevşê li bejn û bala wî dikeve hişê wê diçe û di dîtina ewil da dibin evîndarên hev. Cembelî vedigere malê û ji xulamên xwe pirs û pirsyar dike gelo ew kî ye û ji ku hatîye. Jê ra dibêjin ew Binevşa Narîn e, keça Fariz Beg e û hatine

wir xwe bi me girtine û bi cih bûne. Cembelî berê xwe dide mala Fariz Begî û keça wî ji xwe ra dixwaze. Ji ber ku bi dilê Binevşê bûye birayên wê jî qebûl kirine û Fariz Beg keça xwe daye Cembelîyê kurê Mîrê Hekarîya. Fariz Beg wekî nîşaneya keçdayînê xencera xwe dide Cembelî. Cembelî ji bo amadehîya dawetê vedigere mala xwe.

Dema Derwêş Axa dibihîze ku Fariz Beg keça xwe daye Cembelîyê kurê Mîrê Hekarîya dîn û har dibe, çend xulamên xwe hildigire û li ser wan ve tê. Derwêş Axa digel heft birayên Binevşê bavê wê jî dikuje û Binevşê direvîne û dibe ji xwe ra mehr dike. Dema xeber digehîje Cembelî hiş di serê wî da namîne, dev ji mal û milkê xwe berdide û dikeve pey evîna xwe. Cembelî bi rê dikeve dawîya dawî digihîje Qerecdaxê û dibe şivanê mala Derwêş Axa. Heft sal ji wan ra şivantî dike. Di wê navberê da kurekî ji Binevşa Narîn ra çê dibe û navê wî jî dikin Cembelî. Di nav edetên wan da heta heft salên bûkê temam nebe bûk nikare biçe bêrîyê. Dema heft salên Binevşê temam dibe rojekî diçe bêrîyê. Dema çavê Cembelîyê kurê Mîrê Hekarîya lê dikeve Binevşê nas dike lê ji ber ku rih û porê wî dirêj bûne, kincên peritî yên şivantîyê li ser bûye Binevşê ew nas nekirîye. Cembelî dema Binevş dibîne dixwaze wê hembêz bike lê Binevş nahêle ku yekî bîyanî wê hembêz bike. Binevş xencera Cembelî dikişine û li ser dilê wî dide. Wê çaxê çavê wê li destika xencerê dikeve û xencera bavê xwe ya ku dîyarî dabû Cembelî nas dike. Ew çax dizane ku ew Cembelîyê evîndarê wî ye lê êdî pir dereng e. Dike qîrîn dike hewar lê bê feyde ye. Binevş xencera li ser dilê Cembelî dikişine û li ser dilê xwe dide. Her du jî li wir can didin.

2.4.7.Kerr û Kulik

(Kurteya vê destanê ji varyantên Cizîrî, 2020: 186-202 û Cindî û Evdal, 2008: 109-113 hatîye amadekirin.)

Silêmanê Madî yekî çalak û jêhatî ye. Ji êla xwe vediqete û berê xwe dide Deşta Sirûcê. Li wir rastî êla Gêsîya tê. Ev êl ela Ereban e û axayê êlê Hesê Dûdê ye. Ev êl ji heft hezar malan pêk tê û li wê deştê ji wê mezintir êl tune ye. Silêman li ba axê disekine û dibe rençberê axê, pezên wî diçêrîne.

Bi navê Werdek keçekê Hesê Dûdê hebûye. Werdek keçeke mêranî û pir jêhatî bûye, ehd kirîye kî di gulaşê da pişta wê li erdê bixe dê pê ra bizewice. Werdek rojekê rastî Silêman tê, quweta wî dibîne û jê ra dibêje em gulaşê bigrin eger tu bi ser bikevî

ez ê te bistînim; eger ez bi ser bikevim ez çi bixwazim ez ê wî bikim. Ez ê yan çavê te derêxînim yan jî guhê te jêkim êdî ew li gor xwastina min e. Silêman qebûl dike gulaşê digrin, demeke dirêj hev dibin û tînin di dawîyê da Silêman Werdekê bilind dike û diavêje erdê. Werdek li ser soza xwe disekine û Silêman distîne. Du heb zarokên wan çê dibin. Navê zarokên wan Kerr û Kulik e. Piştî çend salan Silêman dimire û Werdek ligel zarokên xwe dimîne. Ji ber ku birayên Werdekê ji zarokên wê ra baş nebûne Werdek ji nav êla xwe derdikeve û diçe Girê Amûdê û li ba Elî Emer Axa bi cih dibe.

Elî Emer Axa axayê heft eşîrên kurdan ên bi navê Milan, Zîlan, Kîkan, Zirikan, Takorîya, Hevêdîya û Pencînarîya bûye. Ew rojekê navê Bilîcana Elîsarê Gêsî seh dike û gazî hemû êl û eşîra xwe dike û dibêje kî here û Bilîcana Elîsarê Gêsî ji bo min bîne ez ê keça xwe Perîşanê bidim wî. Elî Emer Axa keça xwe Perîşanê diavêje mezadê. Xulam fîncana ferfûrî di nav civatê da digerîne lê kes newêre qehwê vexwe. Elî Emer Axa bangî xulaman dike û dibêje kes maye ku nehatîye dîwanê. Jê ra dibêjin Kerr û Kulik hene, xebera wan jê tune ye. Elî Emer Axa emir dike û diçin ji wan ra jî dibêjin. Kerro naçe lê Kulik berê xwe dide qonaxa axê. Kulik diçe dîwana Elî Emer Axa û fîncana ferfûrî hildigire û vedixwe. Kulik wê barê giran hildigire ser milên xwe. Dema birayê Kulik Kerr dibihîse pir xemgîn dibe lê nikarin Kulik ji rê vegerînin. Ker û Kulik hespên xwe yên Sosik û Nijdî zîn dikin, şûr û rimên xwe amade dikin û ligel henekçîyê Kulik Brahîmê Cibiltînî, mirtibê wî Lekoyê Mirtib û dûrbînçîyê wî Keleşê Qûbêt bi rê dikevin. Herçiqas dêya wan Werdek nexwaze jî guhdarîya dêya xwe nakin û bi rê dikevin. Hespa Bilîcan hespa xalê wan e û Werdek naxwaze di navbera xal û xwarzîyan da şer biqewime. Dema Werdek dinihêre ku nikare Kulik ji rê vegerîne hin şîretan li kurên xwe dike û dibêje bila Sosik ji ava golegenîya venexwe, eger vexwe ew ê bimire.

Kerr û Kulik digel Brahîmê Cibiltînî, Lekoyê Mirtib û Keleşê Qûbêt bi rê dikevin û xwe digehînin golegenîyê. Li wir xewa Kulik tê û dixwaze hinek razê. Kulik ji birayê xwe Kerr ra dibêje ez ê hinek razêm lê tu hişyar be bila Sosik ava golegenîya venexwe. Piştî Kulik radizê xewa Kerro jî tê û ew jî ji xew ra diçe. Kerr dema çavê xwe vedike dibîne ku Sosik çûye ser golegenîyê û avê vexwarîye, zikê Sosikê ewqas werimîye ku dike biteqe. Kulik dema radibe û halê Sosik dibîne pir hêrs dibe lê nikare tiştekî bike.

Kulik ji Kerr û yên din ra dibêje hûn li vir bimînin ez ê herim Bilîcanê bînim. Kulik diçe xwe digehîne kanîyekê. Li ser kanîyê dibîne ku yekî hespekê anîye û hesp av dide. Kulik dema pirs dike hîn dibe ku ew Bilîcan e, bi darê zorê Bilîcanê hildigire û dibe ba Kerro û yên din. Li wir Kerro dibêje em êdî vegerin lê Kulik qebûl nake û dibêje heta ez şereke mezin nekim ez ji van deran naçim, eger ez biçim dê bêjin Kulik bi xef hat û Bilîcanê revand, ev gotin ji bo navê min nebaş e. Xeber digihîje nav êlê û dibêjin yekî hatîye û Bilîcanê revandîye. Her heft xalên Kerr û Kulik digel siwaran tên û di navbera wan da şereke mezin diqewime. Kulik siwarê Sosik dibe lê ji ber ku Sosik ava golegenîya vexwarîye wekî berê nîne. Xalên wî Kulik birîndar dikin. Kerr jî gelek kesan dikuje û êrîşê xalên xwe dike. Kerr 6 xalên xwe dikûje û dimîne xalê wî yê piçûk tenê. Kulik naxwaze ew jî bê kuştin û dibêje bila zurryeta mala dêya me neqede. Piştî şer diqede Kulik gazî Kerro dike û dibêje ez ê bimirim, Perîşan bila li te helal be. Piştî ez mirim çardarekê çêkin, min bidin ser û bibin. Milê min ê rastê di kêleka çardarê da berdin. Milê min dê biheje, biçe û bê. Dema Werdeka dêya min milê min bibîne wê bibêje "*dinya wisa hatîye dê wisa jî biçe*". Kulik piştî van gotinan rihê xwe teslîm dike, jê ra çardarekî çê dikin û bi rê dikevin. Dema dêya wan Werdek dibîne ku ew tên diçe pêşîya wan û çardarî dibîne. Li ser çardarî milê Kulik derketîye û diheje. Werdek dike qêrîn û gazî û dibêje "*dinya wisa hatîye dê wisa jî biçe*".

Heft roj şîna Kulik digirin û piştî heft rojan Bilîcanê teslîmê Emer Axa dikin û Perîşanê li Kerr mehr dikin. Daweta Kerr û Perîşanê heft rojan dewam dike.

2.4.8.Xelîl Beg

(Kurteya vê destanê ji varyantên Kaplan, 2018: 126-132 û Celîl û Celîl, 1978: 222-234hatîye amadekirin.)

Xelîl Beg birayê Ehmed Beg, birazîyê Me'mud Paşa ye û yekî bi nav û deng e. Xeloyê mirtip jî xulamê Xelîl Begî ye. Ew di dîwana Xelîl Begî da xizmet dike û qehwê belav dike. Rojekê mêvanên Xelîl Begî tên lê dinihêrin ku qehwe û şekir qedîyaye. Xelîl Beg ji bo standina qehwe û şekirê Xeloyê xulamê xwe dişîne sûkê. Ji ber ku Xelo tu car neçûye sûkê dema diçe şaş û heyran dimîne. Herçiqas Xelîl Beg ji bo zû hatinê tembîh kiribe jî dîsa Xeloyê xulam dereng vedigere qonaxê. Xelîl Beg dema Xelo dibîne hêrs dibe û dibêje hemû mêvanên me bê qehwe çûn. Xeloyê xulam jî dibêje cara ewil e ku ez ji qonaxê derdikevim, dinyayê dibinim. Xelo biryar dide û

dibêje ez ê jî xwe ra bikevim rêyan, hinek dinyayê bibinim. Destûra xwe ji Xelîl Begî dixwaze û Xelîl Beg jî xurcekî zêr dide wî. Xelîl Beg du meh molet dide Xeloyê mirtip û dibêje here hinek dinyayê bibîne û dîsa vegere were.

Xeloyê mirtip bi rê dikeve, digere, rastî mala bavê Tîlî Eyşanê tê. Dilê Xeloyê mirtip dikeve Tîlî Eyşanê lê dizane ku Eyşanê nadine wî. Ew jî xwe wekî Xelîl Beg dide nasîn da ku Tîlî Eyşanê bidine wî. Xeloyê mirtip diçe ba Emer Axayî bavê Tîlî Eyşanê û daxwaza keça wî dike. Emer Axa jî dibêje çawa yekî wekî Xelîl Beg daxwaza keça min bike û em nedinê. Dibe şev Emer Axa ji xanima xwe ra dibêje Xelîl Beg hatîye daxwazîya keça me, ka tu çi dibêjî? Dêya Tîlî Eyşanê ji mêrê xwe ra dibêje ku Xelîl Beg ji bo keçxwastinê nayê mala me, ew bibe nebe Xeloyê mirtip e. Em ê wî biceribînin û jê ra bêjin bila heft sal ji me ra şivantî û gavantî bike paşê em ê Tîlî Eyşanê bidin wî. Eger Xelîl Beg be dê bibêje ez axa me û kurê axê me, min heta niha şivantî û gavantî nekirîye û ji niha û pê ve jî nakim lê eger Xeloyê mirtip be ew ê daxwaza me qebul bike. Roja din Emer Axa diçe ba Xeloyê mirtip û dibêje, dêya Tîlî Eyşanê ehd kirîye û gotîye ku ew kesî keça me bixwaze heta heft sal şivantî û gavantîya mala me neke em keça xwe nadinê. Xeloyê mirtip jî melheze dike, difikire û dibêje ez ê keçek mîna Tîlî Eyşanê ji ku bibînim, wele ez ê daxwaza wan qebûl bikim û bibim şivan û gavanê mala wan. Dema Xeloyê mirtip daxwaza Emer Axayî qebûl dike Emer Axa êdî ferq dike ku ew ne Xelîl Beg e.

Roja din Xeloyê mirtip cilên şivantîyê li xwe dike, gopala xwe hildigire û dikeve pêy heywanan. Salek, du sal, sê sal heta heft salan şivantîya wan dike. Dema ku êdî wext dê temam bibe naxwazin Tîlî Eyşanê bidine wî û Emer Axa planek çê dike. Emer Axa ji jinên bêrîvan ra dibêje bi şivanê me ra şer bikin da ku bila van deran biterikîne û here. Jinên bêrîvan êvarê bi şivên ra şer dikin û Xeloyê mirtip jî hêrs dibe gopalê xwe diavêje erdê û diçe. Xeloyê mirtip vedigere tê ba Xelîl Begî. Xelîl Beg dema xulamê xwe dibîne dibêje min du meh molet dabû te lê va heft sal e tu çûyî û venegerîyayî. Xelo jî dibêje min ji xwe ra yekê dîtîye ez dixwazim tu wê bo min bixwazî. Xelîl Beg lê dinihêre kesî Xelo tune ye, guneh e dibêje temam ez ê bo te bêm û wê keçê bixwazim. Berî ku Xelîl Beg û Xelo ji bo keçxwastinê bi rê kevin şevekê Xelîl Beg û Tîlî Eyşan di xew da hev dibînin û gustîlkên xwe diguherînin. Dema ji xew radibin dibînin ku li ser gustîlka Tîlî Eyşanê Xelîl Beg dinivîse; li ser gustîlka Xelîl Beg jî Tîlî Eyşan.

Xelîl Beg û Xeloyê mirtip bi rê dikevin û ber bi mala Tîlî Eyşanê ve diçin. Tîlî Eyşan jî wê rojê ligel carîyeyên xwe derketîye seyranê û ji xwe ra digerin. Tîlî Eyşan ji dûr ve Xelîl Begî dibîne û nas dike. Tîlî Eyşan xwe li cihekî vedişêre û kilaman diavêje ser Xelîl Beg. Xelîl Beg dema dixwaze lê binêre Xeloyê mirtip nahêle û dibêje ew yeke keçel e, mirtip e li ser rêyan disekine û ji xelkê pere dixwaze. Xelo dizane eger çavê Xelîl Begî li Tîlî Eyşanê bikeve dê aşiqê wê bibe lewra çiqas ji destê wî tê nahêle Xelîl Beg wê bibîne. Hinek wext derbas dibe û Tîlî Eyşan dîsa li ser Xelîl Beg kilam dibêje, di dawîyê da Xelîl Beg nikare xwe û diçe li Tîlî Eyşanê dinihêre. Çava ku çavê wî li Tîlî Eyşanê dikeve ji spehîtîya Tîlî Eyşanê hişê wî diçe û bi hezar dilan ew dihebîne. Tîlî Eyşan rêya mala bavê xwe te'rîfê Xelîl Beg dike û vedigere mala xwe. Xelîl Beg diçe mala Emer Axa û Tîlî Eyşanê ji bo xwe dixwaze. Piştî ku Tîlî Eyşanê didine Xelîl Beg, Tîlî Eyşan û Xeloyê mirtip vedigerin bajarê xwe.

Dema vedigerin bajarê xwe li wir daweta xwe didanin. Xeloyê mirtip pir hêrs dibe û diçe ba Me'mud Paşayê mamê Xelîl Begî. Li wir bêbextîyê dike û ji Me'mud Paşa ra dibêje Xelîl Beg çû li ser navê te keçekê xwast û Emer Axa jî keça xwe pêşkêşî te kir lê Xelîl Beg Tîlî Eyşanê ji bo te neanî û niha jî daweta wan heye. Me'mud Paşa pir hêrs dibe û dibêje birazîyê min çawa tiştekî weha dike. Me'mud Paşa ligel çil xulamên xwe û Xeloyê mirtip diçin dawetê. Di rê da planekê çê dikin û dibêjin em ê Xelîl Beg bikujin û Tîlî Eyşan jî bidin Me'mud Paşa. Dema diçin dawetê Xelîl Beg û birayê wî Ehmed Beg pir kêfxweş dibin û dibêjin mamê me hatîye daweta me. Dibe derengê şevê Xelîl Beg ji birayê xwe Ehmed Beg ra dibêje tu here istireheta xwe bike ez ê îşev di dîwana mamê xwe da rûnim. Ehmed Beg ji bo istirehetê diçe û di dîwanê da Xelîl Beg, Me'mud Paşa, Xeloyê mirtip û xulam dimînin. Me'mud Paşa çav li Xeloyê mirtip dike û Xelîl Beg ji bo govendê radikin. Dema Xelîl Beg radibe govendê dest û pîyê wî digirin û bi stunê ve girê didin. Serê her du milên wî diqelişînin û mum datînin ser. Lê dinêrin ku Xelîl Beg dê bi vî awayî dereng bimire dibêjin herin Tîlî Eyşanê bînin bila Me'mud Paşa li ber çavê wî Tîlî Eyşanê maç bike, dê ew jî ji qehran zûtir bimire. Xeloyê mirtip diçe ba Tîlî Eyşanê wê dixapîne û jê ra dibêje dê Me'mud Paşa dîyarîya xwe bide û biçe, daxwaza dîtina te dike. Tîlî Eyşan naxwaze biçe dîwana mêran lê bi mecbûrî dikeve pêy Xeloyê mirtip û diçe dîwanê. Dema diçe dibîne ku Xelîl Beg bi stûnê ve hatîye girêdan û li ser milên wî mum danîne li wir dike hewar û direve, diçe. Tîlî Eyşan diçe xwe ji serê qonaxê davêje erdê û dimire. Ew çax Me'mud

Paşa û Xeloyê mirtip jî ditirsin dibêjin eger Ehmed Beg pê bihese dê me hemûyan bikûje û direvin, diçin. Sibê dema Ehmed Beg radibe û diçe dîwanê halê birayê xwe dibîne, ehd dike û dibêje ez ê serê wan hemûyan jê bikim. Dema derdikeve derve melayê gundê wan Ehmed Beg dibîne û dibeje bûka we xwe ji serê qonaxê avêtîye xwarê û mirîye. Li wir Ehmed Beg ji mela ra dibêje cilên zavabûne li birayê min bikin, yên bûkanîyê jî li bûka me bikin û wan bidin ba hev heta ez têm. Ehmed Beg siwarê hespa xwe dibe û rê dikeve. Kurterê diçe û xwe digehîne wan. Lib û lib serê wan jê dike û wan hemûyan dikujîne. Paşê Ehmed Beg vedigere û tê, bûk û zavayê bi hev ra defin dikin.

2.4.9.Stî û Ferx

(Kurteya vê destanê ji varyantên Amêdî, 2013: 52-83; Celîl û Celîl, 1978: 203-213; Kaplan, 2019: 181-211hatîye amadekirin.)

Xelîfe û Hadî du bira ne û her du jî mîr in. Du keçên Xelîfe hebûne, Naz û Nazdar lê Hadî bê weled bûye. Ev her du bira hertim dia dikin ku Xwedê kurekî bide wan. Rojekê her du bira diçine nêçîrê. Di rê da rastî derwêşekî tên. Derwêş ji xwastina wan xeberdar e û du sêv dide wan. Derwêş ji wan ra dibêje nîvekî sêvê hûn bixwin nîvê din bila xanima we bixwe û bi îzna Xwedê dê zarokên we çêbin. Her du bira gotina Derwêş dikin û xanima her du birayan jî ducanî dibin. Dema xanimên wan ducanî dibin soz didin hev û dibêjin eger ji zarokên me yek kur û yek keç be em ê wan bidin hev û bi vî awayî qerar didin. Piştî 3 mehan Hadî rehmet dike. 9 mehê jina Xelîfe temam dibe û Xwedê keçekê dide wan. Sê roj paşê xanima Hadî jî dikeve ber êşa zayînê, dapîrok li derûdorê kom dibin û kurek jê ra çê dibe lê ew zarok ji zarokên din gelek cuda bûye. Kurik dema ji dayik dibe navika xwe bi xwe dibire û li ser her neh mehên xwe kilamek dibêje. Her kes şaş dimîne û dibêjin ev ne insan e ev cin e û ditirsin, direvin û diçin. Jina Hadî piştî jidayikbûna zarokê bêhiş dikeve. Jina Xelîfe dema seh dike ku zarok wekî cinan e dibêje mêrê min soz daye birayê xwe dê keça min bide wî zarokî û naxwaze ew zarok bijî. Jina Xelîfe qerwaşekê xwe dişîne û dibêje here wî zarokî bigire û bibe deyne di nav çar lingên hespê Hadî da bila hesp pê lê bike û zarok bimire. Qerwaş diçe zarok hildigire û dibe dixe di nav çar lingên hespê da. Li wir zarok dibêje eger ez kilamekê ji hesp ra nebêjim ew ê pê li min bike û ez ê bimirim. Li wir zarok kilamek dibêje û hesp pê lê nake û dewarên li wir bi hilma devê xwe zarok

germ dikin û tiştekî jê ra nabe. Rojek ser ra derbas dibe û bi şev jina Xelîfe radibe ku keça xwe bimêjîne li wir dibîne ku zarokekî din jî di nav landikê da ye. Dema lê dinerin dibînin ku ew zarokê Hadî ye. Xelîfe û jina wî hêrs dibin û diçin mala Hadî. Ji jina Hadîyî ra dibêjin te çima kurê xwe anîye û danîye di nav landika keça me da. Jina Hadî jî dibêje xebera min jê tune ye. Roja din Xelîfe çend kesan wezîfedar dike ku nobet bigirin. Dibe şev dîsa lê dinêrin ku di nav landika keçikê da kürek heye. Ji nobedaran dipirsin lê nobedar dibêjin ku me kes nedîtîye. Ew çax Xelîfe fam dike ku di vî karî da destekî îlahî heye û ew zarokekî welî û pîroz e.

Navê zaroka keç Stî û yê kur jî Ferx didanin. Zêde wext li ser derbas nabe û dêya Ferxî jî rehmet dike û Ferx li ber destê mamê xwe û li kêleka Stîyê mezin dibe. Ferx û Stî yek deqîqe ji hev dûr nasekinin hertim pev ra ne. Stî û Ferx dibin heft heşt salî. Rojekê yekî bi navê Çîkal tê û dixwaze bibe şivanê mala Xelîfeyî. Çikal ji Xelîfe ra dibêje eger ez bibim şivanê we dê gîska mê bibe wekî tiştîr, tiştîr dê bibe wekî bizina sitewr, berxa mê dê bibe wekî belendir, belendir dê bibe wekî mihê; lê li hemberî şivantîya min a heft salan ez daxwaza keça te Stî dikim. Xelîfe dibêje Stî na lê ji Naz û Nazdar tu kîjan bixwazî ez ê bidim te. Çîkal qebûl nake û dibêje eger Stîyê nedî min ez şivantîyê ji te ra nakim. Xelîfe qebul dike lê di dilê xwe da dibêje dema heft salên wî temam bûn ez ê heqê wî bidim û wî bişînim. Çîkal dest bi şivantîyê dike. Meh derbas dibin û Çîkal dibîne ku Stî û Ferx yek deqîqe ji hev dûr nasekinin. Rojekê Xelîfe ji Ferx ra dibêje here ji bo eydê ji ba şivên pezekî zexim bîne. Ferx diçe û dixwaze pezekî qelew û baş bîne lê şivan kîjan xirab be ew lib dide nişanê Ferxî. Li wir di navbera wan da pevçûn çê dibe û şivan birîndar dibe. Şivan radibe diçe ji Xelîfe ra dibêje ez êdî ji we ra şivantî nakim. Xelîfe pir hêrs dibe û dibêje ez ê Ferxî bikujim. Stî dema van gotinan seh dike, ditirse û sê heb morik bi benekî ve girê dide û li ber derîyê dîwanê dialiqîne da ku dema Ferx hat bibîne û nekeve hundur. Ferx dema tê dibîne ku 3 heb morik li wir aliqandî ne dibêje ya sor xwîna min e ya spî kefena min e û ya şîn jî şîna Stî ye. Ferx ditirse û nakeve hundur, direve û diçe. Ferx siwarê hespa babê xwe dibe û ber bi mala xalê xwe Ûsiv ve diçe. Dema diçe û digihîje mala xalê xwe xalê wî Ferxî nas nake. Xalê wî bi çend awayan Ferxî diceribîne û her carê jî Ferx bi ser dikeve, ew çax dizane ku ew xwarzîyê wî ye. Du heb kurxalên Ferxî hebûne: Merz û Merzeban. Rojekê dema kurxalên wî diçin nêçîrê ew jî bi wan ra diçe lê xalê wî dibêje wan, neçinê Çîyayê Reş, tenê herin Çîyayê Spî. Dema bi rê dikevin ewil ji

ber Çîyayê Reş ra derbas dibin. Ferx dibêje ez ê li vir nêçîrê bikim, herçiqas jê ra dibêjin ew der cihê çûnûnehatinê ye, kî çûbe venegerîyaye jî dîsa Ferx diçe. Ferx li Çîyayê Reş rastî perîyekê tê. Navê perîyê Gulendam Xatun bûye. Li wir Ferx û Gulendam Xatun diavêjin ber hev û Ferx bi ser dikeve. Gulendam Xatun jî dibêje eger tu bi ser neketîya min ê serê te jê bikira lê ji ber ku tu bi ser ketî divê tu min mehr bikî. Ferx dibêje min soz daye Stîya keçmama xwe. Ez evîndarê wê me. Heta ku em xeberê nedin wê te mehr nakim. Li wê derê Ferx nameyekê ji Stî ra dinivîse û bi rêya teyran ji Stî ra dişîne. Dema Stî nameyê dixwîne ji Xwedê dixwaze ku bask û perên wê çêbin û biçe ba Ferx. Xwedê diayê Stî qebûl dike û Stî dibe teyr û diçe ba Ferx. Ferx dema Stîyê dibîne pirsekî jê dike, dibêje xwezî min bizanibûya gelo tu keç î yan jin. Li wir Stî pir aciz dibe û vedigere mala xwe. Paşê Ferx ji gotina xwe pir poşman dibe, hişê wî diçe. Stî dema tê mala xwe hewara xwe digehîne Xwedê û di demeke nêz da dimire. Sê roj li ser derbas dibin hişê Ferx tê serê wî lê êdî rih û porê wî spî bûne, Ferx bûye wekî kalekî heftê salî. Ferx dikeve rê û diçe gundê Stîyê. Li wir ji zarokên gundî dipirse û ew jî dibêjin Stî rehmet kirîye. Ferx bi alîkarîya zarokekî diçe ser qebra Stî û li wir ew jî hawara xwe digehîne Xwedê û canê xwe teslîm dike. Qebra wî jî li kêleka qebra Stîyê çê dikin.

2.4.10.Sêva Hecî

(Kurteya vê destanê ji varyantên Cindî, 2016: 89-95 û Celîl û Celîl, 1978: 166-172 hatîye amadekirin.)

Mehmûd Beg kurê mîrê Beraza ye, şevekî di xewna xwe da Sêva Hecî dibîne. Sêva Hecî ewqas bedew û rind bûye ku dilê wî dikeve Sêvê. Di heman şevê da Sêva Hecî jî di xewna xwe da Mehmûd Begî dibîne û dilê wê jî dikeve Megmûd Begî. Ew di xewnê da gustîlkên xwe diguherînin. Sibê dema Mehmûd Beg hişyar dibe û dest û rûyê xwe dişû gustîlka di tilîya xwe da dibîne. Li ser gustîlka wî Sêva Hecî dinivîse. Bi heman awayî roja din dema Sêvê jî ji xew şîyar dibe û dest û rûyê xwe dişû, ew jî gustîlka ku li ser Mehmûd Beg dinivîse dibîne.

Mehmûd Beg êdî nikare li welatê xwe bisekine û dikeve pey Sêva Hecî. Sê meh diborin lê hêj jî Mehmûd Beg salixê Sêva Hecî nade. Rojekê Mehmûd Beg li ser rê rastî şivanekî tê, ew şivan şivanê mala bavê Sêva Hecî ye û heft sal e ji bo wan şivantî dike ku Sêva Hecî bidin wî. Bavê Sêvê ji bo dayîna Sêvê şertekî danîye û gotîye

kî qeytana me'mûdî bîne ez ê keça xwe bidim wî. Bi salan kesî nekarîye qeytana me'mûdî bîne û ew çax jî bavê Sêvê qerara xwe guherandîye û gotîye kî heft sal şivantîya mala me bike ez ê keça xwe bidim wî. Heft rojên wî şivanî mane ku heft salên wî temam bin û Sêva Hecî bistîne. Xebera Mehmûd Begî ji tiştekî tune ye û ji şivên dipirse û dibêje gelo ev kîjan welat e. Şivan pê dihese ku yekî bîyanî ye jê ra dibêje ev welatê bavê Sêva Hecî ye. Dema ku Mehmûd Beg navê Sêva Hecî dibihîze ji kêfa difire û pirsa konê mala bavê Sêva Hecî dike. Şivan rê nîşanê wî dide û Mehmûd Beg ber bi mala wan ve diçe. Mehmûd Beg digihîje ber konê mala bavê Sêva Hecî û bi kilamkî tasekê av jê dixwaze. Sêva Hecî avê nade wî û dibêje li vir kes xulamê te û bavê te nîne. Mehmûd Beg vedigere diçe cihekî din bêhna xwe dide û radizê. Di xewnê da kalemêrekî ji Mehmûd Beg ra dibêje gustîlka xwe nîşanê Sêva Hecî bide. Roja din Mehmûd Beg dîsa diçe ber konê Sêva Hecî, daxwaza tasekê avê dike û bi kilamkî behsa xewn û gustîlkê dike. Li wir Sêva Hecî gustîlka di tilîya Mehmûd Beg da dibîne û ew nas dike. Sêva Hecî qerara bavê xwe ji Mehmûd Beg ra dibêje û dibêje ku heta tu qeytana me'mûdî neynî bavê min min nade te.

Mehmûd Beg bi rê dikeve ku qeytana me'mûdî bibîne. Di rê da rastî qesrekê tê. Di wê qesrê da keçekê remildar û heft birayên keçikê yen talanker hebûne. Keçik remil diavêje û dizane ku Mehmûd Beg ji bo derdê dilan ketîye rê. Keçik ji Mehmûd Beg ra dibêje kerem ke were rûne, bêhna xwe bide paşê here lê Mehmûd Beg naxwaze bisekine. Dema keçik dibêje tişta ku tu pê digerî li ba min heye ew çax Mehmûd Beg disekine û diçe qesrê. Birayên keçikê bazirganekî talan kirine û di nav barê deveyekî da qeytanê me'mûdî dîtine. Keçik qeytana me'mûdî tîne û difroşe Mehmûd Begî. Mehmûd Beg heqê qeytanê dide û vedigere ba Sêva Hecî. Sêva Hecî şaş dimîne ji ber ku heta wê çaxê kesî qeytana me'mûdî peyda nekirîye lê Mehmûd Beg di nav çar rojan da wê qeytanê anîye. Qeytana me'mûdî teslîmê bavê Sêvê dikin û bi rê dikevin. Di rê da şivan tê bîra Sêva Hecî û ji Mehmûd Beg ra dibêje ew şivanê mala me ye û va heft sal e ji me ra şivantî dike. Maye 3 rojên wî ku wextê wî temam be. Sêvê ji Mehmûd Beg ra dibêje destûra min bide ez ji şivên xatir bixwazim û carekê wî maç bikim. Mehmûd Beg qebûl dike û diçin ba şivên. Sêva Hecî meseleya qeytana me'mûdî ji şivên ra dibêje û carekê ew maç dike. Şivan jî dibêje êdî tu wekî xwişka min î. Li wir şivan jî di gel wan diçe û Mehmûd Beg xwişka xwe ya bi qasî Sêva Hecî bedew dide şivên.

2.4.11.Evdilrehman Axayê Zorbaşî

(Kurteya vê destanê ji varyantên Amêdî, 2013: 333-349 û Cizîrî, 2020: 100-137 hatîye amadekirin.)

Evdilrehman Axayê Zorbaşî axayê Milan e. Rojekê pismamên wî tên û daxwaza axatîyê jê dikin. Jê ra dibêjin bi salan e tu axatîyê dikî, heqê me jî di axatîyê da heye. Mêranî û egidîya Evdilrehman Axa li her deverê belav bûye û Evdilrehman Axa jî li ser xwe ra axatîya tu kesî qebûl nake. Evdilrehman Axa ji pismamên xwe ra dibêje temam ez ê axatîyê teslîmê we bikim lê ez dizanim hûn nikarin vî karî bikin, ez ê ji van deran herim da ku hûn nebêjin Evdilrehman Axa fesadî dike û nahêle em karê xwe bikin. Dibêje dema ez vegerîyam eger we malê me zêde kiribe baş e lê eger kêmasî çêbûbe ez ê serê we hemûyan jê bikim. Bi vî awayî qerara xwe didin û roja din Evdilrehman Axa jin û zarokên xwe Ehmed û Mihemed teslîmê pismamên xwe dike, xatir ji wan dixwaze û bi rê dikeve diçe.

Evdilrehman Axa bi rojan digere û dixwaze biçe li ba malmezinekî bi cih be. Rojekê rastê şivanekî tê û pirsa xwedîyê kon dike. Şivan dibêje ku ev konê Osman Axayê Deqorî ye. Evdilrehman Axa biryar dide û diçe di dîwana Osman Axa da rûdine. Osman Axa pirsa wî dike û dibêje tu çi kes î û çi dixwazî? Evdilrehman Axa jî dibêje ku ez xulamê xulaman im, dixwazim li vir li ba we karekî bikim û bimînim. Osman Axa kîjan karî gotibe Evdilrehman Axa gotîye ew kar ji min nayê û ez nikarim bikim. Di dawîyê da Evdilrehman Axa dibêje dixwazim li ber destê jinan bixebitim, alîkarîya agir û nanê wan bikim. Osman Axa daxwaza wî qebûl dike û Evdilrehman Axa li wir dest bi kar dike. Dema navê wî jê dipirsin Evdilrehman Axa dibêje navê min Evdo ye. Evdo li wir dest bi kar dike û li ber destê jinên axê dixebite. Roj derbas dibin çend caran eşîrên din êrîşê Deqorîyan dikin û Evdo jî dişinin ji bo şer. Dema Osman Axa dibîne ku Evdo siwarekî baş e, egîd e êdî nahêle ku li ba jinan bixebite û ew dixe nav siwaran. Roj bi roj nav û dengê Evdo belav dibe û êdî jê ra dibêjin Evdilrehman Axayê Zorbaşî. Osman Axa, Evdilrehman Axayê Zorbaşî dike serokê xulaman. Çil xulamên Osman Axayî hebûne û van xulaman hesûdîya Evdilrehman Axa kirine û gotine eger em bêbextîyekê nekin em nikarin ji destê Evdilrehman Axayî xilas bin. Di nav xwe da qerar dane û gotine em ê ji Osman Axa ra bêjin Evdilrehman Axa vê sibê ji nav cihê jina te derketîye. Bi vî awayî gotina xwe dikin yek û diçin cem Osman Axa. Ji Osman

Axa ra dibêjin Osman Axa êdî em nema dikarin li vir bimînin, heqê xwe helal bike em ê herin. Osman Axa jî dibêje çi bûye, çi kêmasîya we heye ku hûn dixwazin herin. Ew jî dibêjin tu kêmasîyên me tune lê ev meseleya namûsê ye, me dîtîye vê sibê Evdilrehman Axa ji odeya jina te ya piçûk derketîye, em vê yekê qebûl nakin û em ê herin. Osman Axa dizane ku fesadîyê dikin lê ji wan ra dibêje eger em niha wî bikujin em ê ji xelkê ra çi bêjin, ez ê rêyekê jê ra bibinim û xulaman dişîne mala wan. Roja din Osman Axa gazî Evdilrehman Axa dike û dibêje ez ê ji te tiştekî bixwazim heger te anî, anî heger te neanî ez ê serê te jêkim. Evdilrehman Axa jî dibêje kerem ke Osman Axa eger tiştekî ku bikaribim bikim, ez ê bikim. Osman Axa dibêje, tu yê herî Kelha Heranê nava Xanê Çursî. Tu yê Hespê Sor û Feyrûz Xatûna keça Xanê Çursî ji min ra bînî. Evdilrehman Axa dibêje eger ev be ev kar hêsan e lê divê çil xulamên te jî bi min ra werin. Osman Axa ewil qebûl nake lê Evdilrehman Axa israr dike û dixwaze ew çil xulam jî mêrxasîya wî bibînin û bibin şahîd. Evdilrehman Axa digel çil xulaman bi rê dikeve û diçe xwe digehîne Kelha Heranê. Li wir rastî şivanekî tê û pirsa Xanê Çursî dike, şivan dibêje dema ku roj çû ava derîyên kelhê tên girtin lewra divê tu zû bikevî hundir. Evdilrehman Axa dibêje çima derîyê kelhê tê girtin şivan jî dibêje te navê Evdilrehman Axayê Zorbaşî seh nekirîye qey, ji tirsa wî derî tên girtin. Evdilrehman Axa dibêje na min seh nekirîye, yekî çawa ye? Şivan jî dibêje, min bi çavê serê xwe nedîtîye lê dibêjin yekî mirovxwer e, du serî ye, guhekî wî doşek e yek jî lihêf. Evdilrehman Axa ji ba şivên diçe ba xulaman û ji wan ra dibêje li vê deştê li benda min bisekinin, xwe ji cihê xwe tev nedin, eger hûn xwe tev bidin ez ê serê we hemûyan jê bikim.

Dibe şev û Evdilrehman Axayê Zorbaşî bi xef dikeve nav kelhê, xwe digehîne Hespê Sor lê dibîne ku hesp bi zîncîrê ve hatîye girêdan. Li pey zîncîrê diçe û dibîne ku serê zîncîrê bi lingê textekî ve girêdayî ye. Dema diçe ba textê dibîne ku keçekê li ser textê razayî ye û ewqas sipehî ye ku mîna heyva çardeh şevî ronahî dide. Evdilrehman Axa nikare xwe û rûyê keçikê maç dike û xwe di bin textê da xef dike. Keçik keça Xanê Çursî ye û navê wê Feyrûz Xatûn e. Feyrûz Xatûn ji xew radibe, li derûdorê dinêre ku kes tune dibêje dibe ku xulamekî bavê min hat û ez maç kirim. Lê derî dadayî ye û kes li odê tune ye, dîsa radizê û dikeve xewê. Evdilrehman Axa carekê din ew maç dike û dîsa Feyrûz Xatûn ji xew radibe û hêrs dibe. Feyrûz Xatûn dibêje tu kî yî, eger Evdilrehman Axa jî bî bextê min ji te ra, ez dengê xwe nakim ka derkeve.

Dema wisa dibêje Evdilrehman Axa ji binê textê derdikeve û çavê wê dikeve Feyrûz Xatûnê. Çawa wê dibîne ne bi dilekî bi hezar dilî wê dihebîne. Feyrûz Xatûn dibêje tu kî yî, ew jî dibêje ez Evdilrehman Axayê Zorbaşî me. Feyrûz Xatûn bawer nake dibêje Xwedê neke tu Evdilrehman Axayê Zorbaşî bî. Dibêje çima, Feyrûz Xanim dibêje ew yekî heftserî ye, mirovxwer e, baskên wî hene. Evdilrehman Axa dibêje ew ez im û baskên min li derve mane. Feyrûz xatûn bawer nake û dibêje Evdilrehman Axa çawa yekî ev qas xweşik e, şaş dimîne û dilê wê jî dikeve Evdilrehman Axayî. Evdilrehman Axayê Zorbaşî Feyrûz Xatûnê hildigire û Hespê Sor jî ji tewlê derdixîne û ji kelhê derdikevin. Evdilrehman Axa û Feyrûz Xatûn diçin li Mêrga Şivana disekinin û Evdilrehman Axa hinek radizê. Wextê ku tav derdikeve Feyrûz Xatûn Evdilrehman Axa radike û dibêje hêj ku bavê min pê nehesîyaye em herin. Evdilrehman Axa dibêje heta em şer nekin ez naçim, bila her kes bibîne ka mêrxas çawa ne. Evdilrehman Axa şivanekî ji Xanê Çursî ra dişîne û li benda şer disekine. Xanê Çursî gazî hemû xulam û siwaran dike û dibêje ev meseleya namûsê ye, giran e. Ebûzêdê birayê Feyrûz Xatûnê dikeve pêşîya siwaran û ji bo şer diçin Mêrga Şivanan. Di navbera wan û Evdilrehman Axa da şer diqewime û Evdilrehman Axa bi dorê ve serê wan jê dike û Ebûzêdê jî digire û bi cihekî ve girê dide. Şer bi çend rojan dewam dike û Feyrûz Xatûn digirî û ji Evdilrehman Axa ra dibêje eger tiştekî bête serê te ez ê çi bikim. Evdilrehman Axa dibêje eger tu naxwazî ez birayê te nakujim lê Feyrûz Xatûn birayê xwe dide kuştin. Xeber ji Osman Axa ra diçe û dibêjin Evdilrehman Axa Hespê Sor û Feyrûz Xatûn hingirtîye û ketîye nav şer. Osman Axa digel siwarên xwe tê ku Hespê Sor û Feyrûz Xatûnê ji Evdilrehman Axa bistîne. Di wextê şer da eşîra Milan jî şer seh dikin û pismamên Evdilrehman Axa tên alikarîya wî. Şer bi dawî dibe Osman Axa bi awayekî destvala vedigere û diçe. Evdilrehman Axa Hespê Sor û Feyrûz Xatûnê hildigire û digel pismamên xwe vedigere nav eşîra xwe.

2.4.12.Elo Şêxanî û Fatimê

(Kurteya vê destanê ji varyanta Celîl û Celîl, 1978: 213-221 hatîye amadekirin.)

Di bajarê Şamê da du bira hebûne. Ev bira ji malmezinan bûne û paşa bûne. Navê birayê mezin Hesen navê yê piçûk jî Şêxanî bûye. Jinê her du birayan jî ducanî bûne. Rojekê birayê piçûk diçe ba birayê mezin û jê ra dibêje jinên me her duyan jî

ducanî ne. Eger a min keç û ya te jî kur be ez ê keça xwe bidim kurê te, eger a te keç û ya min kur be ew çax tu yê keça xwe bidî kurê min. Ev gotin xweşê birayê mezin diçe û bi vî awayî soz didin hev û êvarê jî şîranîya xwe ligel cemeatê dixwin. Piştî çend mehan ji xanima Hesen Paşa ra keçekê çê dibe û navê wê dikin Fatime; ji xanima Şêxanî ra jî kurekî çê dibe û navê Elo lê dadinin. Salek di ser ra derbas dibe û Şêxanî rehmet dike. Hesen Paşa li birazîyê xwe xwedî derdikeve û wî dibe mala xwe xweyî dike. Elo û Fatime bi hev ra mezin dibin diçin medreseyê lê wekî xwişk û bira ne. Rojekê pîremêrekî rastî Elo tê û jê ra dibêje Fatime xwişka te nîne ew dotmama te ye û destgirtîya te ye. Elo şaş dimîne û diçe ba Fatimê ji Fatime ra jî dibêje û her du jî kêfxweş dibin ji ber ku ji hev gelek hez dikin. Elo û Fatime bûne 18 salî û Hesen Paşa dibêje ez ê daweta wan bikim. Hesen Paşa amadehîya dawetê dike. Heseynê Gizîr û Miho Qeysanî du xulamên Hesen Paşa ne. Ew her du jî xayîn in û dixwazin mala Hesen Paşa xirab bikin. Dema ku dibihîzin Hesen Paşa dê daweta wan çêke zêdetir hêrs dibin û dibêjin em êdî nikarin li van deran bimînin. Her du planên xwe çê dikin û dibêjin em ê wisa bikin ku ew negehîjine hev û daweta wan çênebe. Roja din diçin cem Hesen Paşa û jê ra dibêjin xelkê bajêr hemû dibêjin dema Elo û Fatime ji mektebê derdikevin destê hev digirin, hev maç dikin û bûne jin û mêrê hev, ne hewce ye êdî daweta wan bê çêkirin, ji xwe ew bûne jin û mêr. Hesen Paşa dema van gotinan seh dike pir hêrs dibe, dibêje kes vê tiştê qebûl nake, ev meseleya namûsê ye. Hesen Paşa di cih da dimîne sekinandî, çavên wî sor dibin. Hesen Paşa, Miho dişîne pêy Elo. Elo û Fatime jî li mektebê ne û li benda mamosteyên xwe ne. Fatime naxwaze ku Elo biçe lê Elo dibêje mamê min amadehîya dawetê dike ka ez biçim ez ê di nava 5 deqîqeyan da vegerim. Bi vî awayî soz dide Fatimê û diçe cem mamê xwe. Hesen Paşa jî di wê navberê da 40 şivikên hinara amade kirîye ku li Elo bide. Hesen Paşa çav dike Heseynê Gizîrî û Miho Qeysanî, her du Elo digirin û dest û pîyê wî girê didin. Hesen Paşa dest bi lêdanê dike û wan her çil şivikên hinarê li ser bedena Elo dişkîne. Elo tê ber mirinê, laşê wî di nav xûnê da dimîne û hişê wî diçe. Heseynê Gizîrî û Miho Qeysanî laşê Elo digirin û diavêjin nav axura dewaran û zibilê. Fatimê li hêvîya Elo disekine, seetek du seet derbas dibin lê Elo nayê. Fatimê bi rê dikeve diçe mal lê di rê da rastî pîremêrekî tê û pirsa Elo dike dibêje te kurmamê min Elo nedîtîye? Pîremêr dibêje bavê te çil şivkên hinarê li ser pişta Elo şikînandîye û Elo avêtine nav axurê. Fatime qêrîn dike û diçe nav koşkê dibîne ku xûna Elo hêj li erdê ye. Heseynê Gizîrî û Miho Qeysanî ji

Hesen Paşa ra dibêjin em Elo ji axurê derêxînin û çil şivkên din jî lêxin belkî êdî li ber çavê Fatime reş be. Elo derdixînin û çil şivkên hinarê dîsa li ser pişta wî dîşkînin. Êdî hal di Elo da namîne. Fatime xwe diavêje li ser laşe wî, dike qêrin û zarîn û jê ra dilorîne. Heseynê Gizîrî û Miho Qeysanî dibêjin em ê Elo bi rê bikin bişînin welatê Tosun Paşa ew ê li wir çend rojan bimîne û bimire. Hesen Paşa jî vê yekê qebûl dike û laşê Elo li ser pişta hêstirekê bar dikin û berê wî didin welatê Tosun Paşa. Elo ji bo 7 salan dişinin. Elo li ser hêstirê diçe, Fatime xwe digehîne û sozek dide Elo, dibêje ez ê li benda te bisekinim heta tu vegerî. Elo dibin û diavêjin wî welatî. Li wir xwedanxêrek li Elo xwedî derdikeve, birînên wî derman dike û Elo sax be. Elo dikeve nav bajêr, ji ber ku yekî xwenda ye bi ser dikeve û dibe destebirayê kurê Tosun Paşa. Kurê Tosun Paşa û Elo gelek ji hev hez dikin, bi hev ra diçin her derê. Dema diçin dawetan hertim Elo behsa Fatimê dike û destebirayê wî jî meraq dike gelo Fatime yekê çawa ye. 7 sal derbas dibin emrê tayîna kurê Tosun Paşa ji Dîyarbekirê ra derdikeve. Dê biçe û bibe paşayê Dîyarbekirê. Di demek nêz da ji bo Elo jî emr tê û dê Elo bibe paşayê Şamê. Elo gelek kêfxweş dibe ji ber ku dergistîya wî Fatime li Şamê ye. Elo û destebirayê wî bi rê dikevin, li ser rêya Hîcazê rastî hecîyan tên û ew hecî jî dê ji Şamê derbas bibin. Li wir Elo ji Fatimê ra nameyekê dinivîse û bi wan hecîyan ra dişine. Elo di mektûbê da dibêje ez bûme paşayê Şamê, ez û destebirayê xwe kurê Tosun Paşa em tên Şamê. Piştî ku Elo çûye Fatime dîn û har bûye û ketîye kolanan. 7 salên wê temam bûne serê xwe neşûştîye, kincên xwe neguhertîye. Dema hecî digihîjin Şamê rastî Fatimê tên û nameya Elo didin wê. Fatime nameyê dixwîne û pir şa dibe. Hesen Paşa dema dibîne ku di destê keça wî da nameyek heye ew jî diçe, dixwîne û gelek ditirse. Di nameyê da paşabûna Elo dinivîse û Elo digel leşkerên xwe tê Şamê. Hesen Paşa ji tirsa Elo sê şev û sê rojan xwarin naxwe. Heseynê Gizîrî û Miho Qeysanî jî seh dikin ku Elo tê ditirsin, direvin û diçin. Çend roj paşê dibînin ku li nav Şamê çadirên nû hatine vekirîn û Elo û destebirayê wî kurê Tosun Paşa hatine Şamê. Vê şevê Fatimê diçe ba wan lê ji ber ku por û kincên Fatimê qirêj bûne, 7 sal e serê xwe neşûştîye Elo dibêje ez êdî te naxwazim, ev çi halê te ye, êdî tu xwişka min î dêya min î. Destebirayê wî jî dibêje Elo te ewqas digot Fatime Fatime, ev keçeke çawa ye. Destebirayê wî delîl dişine nav gund ji bo dawetê û dibêje dê paşayê Şamê di dawetê da keçekê biecibîne û pê ra bizewice. Elo jî qebûl dike. Roja din hemû keçên bajêr xemla xwe dikin, kincên xweşik li xwe dikin û tên dawetê ku Elo wan biecibîne. Fatime dema qelebalixê dibîne

pirs dike û dibêjin dê kurmamê te bizewice. Fatime jî digel qerwaşên xwe diçe hemamê serê xwe dişû, kincên xwe yên xweşik li xwe dike û diçe daweta kurmamê xwe. Fatime ewqas xweşik bûye ku bûye wekî hurîyan. Di dawetê da destebirayê Elo Fatimê dibîne û pir diecibîne. Pirsa Fatimê dike ji Elo û Elo jî dibêje ew keçmama min Fatime ye. Ji Elo ra dibêje ji xwe niha ev daweta te ye, bila Fatime jî ji min ra be. Li wir nîqaş dikin û kurê Tosun Paşa dixeyîde û diçe konê xwe. Fatime jî digel carîyeyên xwe berê xwe dide mala xwe û diçe derîyê oda xwe digire. Dibe şev û Elo li pey Fatimê tê ber derîyê odê lê Fatime jê ra derîyê venake. Elo vedigere diçe konê xwe û li benda Fatimê disekine lê Fatime naçe ba Elo. Vê şevê Elo dimire, sibê dema tên lê dinêrin Elo mirîye. Serê sibê Fatime radibe û dibihîze ku Elo mirîye. Fatime dike qirîn û hewar berê xwe dide konê Elo û diçe ber serê Elo dinale. Elo dibin goristanê, li wir Fatime dîsa li ser Elo kilaman dibêje û dinale. Dibînin ku Elo radibe ser xwe û her kes ditirse, direve û diçe. Elo û Fatime dîsa digehin hev, dawet dikin Elo cilê zavatîyê li xwe dike, Fatime jî cilên bûkanîyê. Kurê Tosun Paşa mehra wan dibire û diçe ser Dîyarbekirê ji bo paşatîya xwe.

Elo pişti dawetê diçe ba mamê xwe Hesen Paşa û dibêje Heseynê Gizîrî û Miho Qeysanî li kû ye? Hesen Paşa jî dibêje roja ku nameya te hatîye heta niha ew winda ne û em nizanin bi ku ve çûne. Elo dikeve pêy wan û hînî dibe ku li deşta Sirûcê ne. Elo wan tîne Şamê û bi seyan dide kuştin.

2.4.13.Husên Axa Derbas

(Kurteya vê destanê ji varyanta Amêdî, 2013: 250-261 hatîye amadekirin.)

Heft kur û keçekê Husên Axayî Derbas hebûne. Navê kurê wî yê mezin Mistefa Beg, keça wî jî Narinc bûye. Narinc keçeke ewqas rind û bedew bûye ku sipehitîyê ji kesî ra nehiştîye. Mîr Mehmûdê Kulavanî çav berdide Narincê, heft salan dikeve pey lê ne bi xweşî ne jî bo zorî Narincê nadine wî. Piştî heft salan di sala heştemîn da nangiranîyeke mezin bi ser wan da tê û Husên Axa digel êl û eşîrên xwe berê xwe didin bajarê Rihayê û li wir di mêrgekê da konê xwe vedidin. Roja din Tahir Beg ji qesra xwe dinêre û konên wan dibîne. Tahir Beg gazî berdestê xwe dike û dibêje here bipirse gelo ew çi kes in û ji bo çi hatine bajarê me. Berdest diçe ji şivan û gavanan dipirse û hîn dibe ku ew konên Husên Axayî Derbas in û ji ber giranîyê hatine û ketine ber bextê Tahir Begî. Tahir Beg dibêje ser seran û ser çavan, ciwanmêrekî wisa hatîye bajarê me

em ê çawa li wan xwedî dernekevin. Tahir Beg radibe û digel siwarên xwe diçe serdana Husên Axayî. Ji Husên Axa ra dibêje ji xeynî namûsê wekî din tu çi bixwazî ya te ye. Husên Axa dibêje em ê çar mehan li van deran bisekinin û paşê dîsa vegerin. Li wir xwarin didin erdê û bi hev ra xwarina xwe dixwin. Narinc li ber derê kon bûye û Tahir Beg wê dibîne. Gava çavê Tahir Begî lê dikeve ne bi dilekî bi hezar dilan Narinc dihebîne. Tahir Beg ji berdevkê xwe pirsa wê dike dibêje gelo ev jin e, bûk e yan keç e. Eger keç be ez ê bo xwe bixwazim. Berdevk jî dibêje ew Narinca keça Husên Axayî ye. Tahir Beg pir şah dibe û dibêje "*heger bimire ji axê ra, heger bimîne ji vî canî re*". Tahir Beg li wir daxwaza keça Husên Axayî dike. Husên Axa dibêje ez tenê nikarim vê biryarê bidim, heft birayên Narincê hene ez ê ji wan jî bipirsim eger ew jî qebûl bikin ser sera û ser çava, ji xwe ez ê yekî ji te çêtir ji ku bibînim. Husên Axa ji kurên xwe jî dipirse û birayê mezin Mistefa Beg dibêje tu çawa bêjî bo me jî wisa ye. Husên Axa vedigere diçe ba Tahir Beg û dibêje were destê min, min keça xwe daye te. Tahir Beg dibêje bi vî awayî nabe, barek ji min bixwaze. Eger bikarim bikim ew çax Narincê bide min. Husên Axa jî piştî vê xeberdanê xwastinên xwe weha rêz dike: Heft birayên Narincê hene, heft jin û hesp û şûr û mertal û rim ji bo wan, heftê gamêş ji malê ra, heftsed hêstir ji barkirina koçê re, heft hezar lukê deva ji bavê wê re, heftê barên xurma ji bo şîranîyê, heft ser kîsê peran ji bo berdest û qewraşan, sê caran keça min li ber zêran bikî wekî din tiştek ji te naxwazim. Tahir Beg rabû çû destê Husên Axayî û got ev tiştên ku tu dixwazî hemû jî ji min tê. Mistefa Beg ji Tahir Beg ra dibêje xwe li me bigire heta ku em vegerine welatên xwe paşê were destgirtîya xwe bibe û bi vî awayî li hev tên.

Bihar derbas dibe, Husên Axa konên xwe bar dikin û berê xwe didin welatê xwe. Mehmûdê Kulavanî seh dike ku Tahir Beg keça Husên Axa xwastîye. Mîr Mehmûd ligel heft hezar siwarên xwe berê xwe didin nav êla Derbasa. Li wir sê şev û sê rojan şer dikin û Mîr Mehmûd diçe konê Narincê û Narincê digire û direvîne paşê berê xwe dide welatê Kulavanê. Mistefa Beg dema pê dihese ew jî berê xwe dide welatê Kulavanî û di rê da digihîje wan. Mistefa Beg Narinca xwişka xwe ji Mîr Mehmûd distîne û vedigere diçe welatê xwe. Dema digihîjin welatê xwe nameyekê dinivîsin û ji Tahir Begî ra dişinin, dibêjin eger tu neyî negehî Narincê dê Mîr Mehmûd wê bibe û êdî tu hew wê dibînî.

Mîr Mehmûdê Kulavanî bi heft def û zurneyê û bi siwarên xwe ve dîsa berê xwe dide Derbasa û dibêje hûn ê Narincê bidin min, yan bi kêfxweşî yan jî bi darê zorê. Di vê navberê da xulam nameyê ji bo Tahir Begî dibe lê Tahir Beg ne li Rihayê bûye. Şûna Tahir Begî birayê wî Zeynel Beg nameyê dibîne. Dibejin Tahir Beg çûye Keleha Humanî ba xalê xwe. Xulam jî berê xwe dide Keleha Humanî. Zeynel Beg bajarî ye di emrê xwe da ne şer ne jî siwarbûn dîtîye. Dema diçe digihîje şer dibêje ev çi qelebalix e. Li alîyê din xulam nameyê digehînin Tahir Begî. Tahir Beg amadehîya şer dike, bi hezar siwar û xalê xwe ve ber bi Derbasê ve diçin. Di şer da serê Mîr Mehmûdê Kulavanî jê dikin û dîyarîyê Narincê dikin.

Mistefa Beg heft şev û heft rojan daweta Tahir Beg û Narincê dike û roja heştan berê wan dide Rihayê.

2.4.14.Gulperî

(Ev kurte ji varyantên Amêdî, 2013: 376-387 û Kaplan, 2018: 96-101 hatîye amadekirin.)

Narinca delal keça Ehmed Begê mîrê Cizîrê bûye. Ehmed Beg nîyet dike ku biçe Mala Xwedê û keça xwe ya Narincê emanetê seyda dike û jê ra dibêje seyda tu wekî bavê wê yî, keça min emanetê te ye, wê hînî xwendina Qur'anê bike. Seyda jî daxwaza Mîr qebûl dike û dibêje Narinc wekî keça min e bila dilê te rehet be. Ehmed Beg ligel çend kesan bi rê dikevin û diçin Mala Xwedê.

Piştî Mîr bi rê dikeve Narinc dest bi xwendinê dike û diçe ba seyda. Dema çavê seydayî bi Narincê dikeve agirê evînê dikeve dilê wî û dibêje ez ê hêdî hêdî xwe nêzikê wê bikim û wê ji bo xwe bixwazim. Seyda li ser van fikr û ramanan disekine û rojekê ji Narincê ra dibêje dema zarok çûn tu bimîne, dersa te hêj maye em ê careke din li ser bixebitin. Haya Narincê ji tiştekî tune ye û Narinc jî li benda seyda disekine. Dema seyda û Narinc bi tenê dimînin seyda destê xwe dirêjî Narincê dike û dixwaze wê maç bike. Narinc bi zor û bela xwe ji destê seydayî xelas dike û bi sertazî û pêxas direve diçe mala xwe. Dema dêya Narincê keça xwe di wê halê da dibîne dibêje çi bûye, ev çi hal e? Narinc jî dibêje kurê seydayî ji min nasekine ez jî revîyam û hatim. Roja din Narinc dîsa diçe xwendinê û dîsa seyda jê ra dibêje tu bisekine û neçe, hin xwendina te neqedîyaye û em ê bi hev ra dîsa bixwînin. Narinc ditirse lê nikare tiştekî bike. Hemû zarok diçin mala xwe û seyda û Narinc bi tenê dimînin. Seyda dîsa destê xwe dirêjê

Narincê dike û dixwaze wê himbêz bike. Narinc di nav destê wî da dilepite û bi zor û bela xwe xilas dike û diçe mala xwe. Dêya Narincê dîsa hêrs dibe û dibêje ev çi hal e, tu şerm nakî weha sertazî û pêxas li derve digerî? Narinc sond dixwe û dibêje kurê seydayî belayê xwe ji min venake û ez êdî hew diçim xwendinê. Dêya Narincê dike û nake nikare wê îqna bike. Çend roj li ser derbas dibin û Narinc naçe xwendinê. Seyda jî ji kirinên xwe poşman dibe û dibêje ew keça Mîrê Cizîrê ye ma ez dîn bûme tiştekî weha dikim. Dibêje eger belav be û gel pê bihese dê min teqez bikujin û biryar dide ku careke din destdirêjî neke. Seyda radibe diçe mala Mîr û ji Narinc û dêya wê ra dibêje bila Narinc ji bo xwendinê dîsa bê, ez nahêlim kurê min wê aciz bike. Narinc dibêje belê ez ê werim lê eger careke din dîsa wisa bike êdî ez hew têm. Roja din Narinc berê xwe dide xwendingehê û xwendina xwe didomîne. Seyda dîsa nikare xwe û dibêje bi zorê jî be ez ê daxwaza xwe pêk bînim, ji bo wê bême kuştin jî dîsa ez dev jê bernadim. Seyda di dema belavbûna zarokan da bang li Narincê dike û dibêje hêj xwendina te neqedîyaye û bisekine. Dema seyda û Narinc bi tenê dimînin seyda bi her du destên xwe Narincê digire û ew himbêz dike. Narinc bi zorî ji nav destên wî xwe xelas dike û tif dike rihê wî û direve û diçe. Roja din dêya Narincê jê ra dibêje tu çima naçî xwendinê Narinc dibêje tu min bikujî jî ez êdî naçim.

Piştî çend rojan Ehmed Begê Mîrê Cizîrê ji Mala Xwedê vedigere û tê. Seyda xwe digehîne Ehmed Beg û pirsa rêwitîya wan dike. Ehmed Beg jî pirsa Narincê dike û mereq dike gelo keça wî bi ser ketîye yan na. Seyda jî bêbextîyê li Narincê dike û ji Mîr ra dibêje keça te xirabîyan dike û heta serê sibehê ligel xortan e. Çawa ku Ehmed Beg van gotinan seh dike ferman derdixîne û gazîyê du xulamên xwe dike û ji wan ra dibêje herin Narincê bibin çolê û wê bikujin hinek xwîna wê bînin ez ê vexwim. Her du xulam diçin Narincê hildigirin û dibin çolê lê dilê wan qebûl nake ku wê keçikê bikujin şûna wê heywanek dikujin û xwîna wî heywanî ji Mîr ra dibin.

Narinc bi çolê dikeve, tî û birçî rojên wê derbas dibin. Rojekê axayê Behdînan di nêçîrê da ye û rastî Narincê tê. Narinc ewqas bedew e ku dilê axayî dikeve wê û dibêje eger jina yekî nebe ez ê bo xwe bibim. Ji Narincê dipirse tu kî yî, ji ku hatîyî, bi ku ve diçî lê Narinc tu bersivê nade. Axa, Narincê hildigire û dibe, piştî çend rojan dawet didane û pê ra dizewice. Piştî vê zewacê gelek kes rexneyan dikin û dibêjin axayê me çûye yeke wisa anîye ku em nizanin kî ye jî. Dibêjin keçên axayan, began layiqê wî ne. Sal derbas dibin û du kur û keçekê wan çê dibin. Rojekê axa destê Narincê

digire û dibêje ji bo xatirê Xwedê û van zarokan ka ji min ra bêje tu keça kê yî? Narinc êdî bersiva vê pirse dide û dibêje ez keça Ehmed Begê Mîrê Cizîrî me lê serpêhatîya xwe jê ra nabêje. Axa gelek kêfxweş dibe ku jina wê jî keça mîrî ye û ji nû ve şahîyeke mezin çê dike. Çend roj şûnde mezinên wan dibêjin keça Mîrê Cizîrî bêxwedî nabe, gerek em hin dîyarîyan ji malbata wan ra bişînin. Axa jin û zarokên xwe emanetî seyda dike û dibêje tu wekî bavê min î ji xeynî te bawerîya min bi tu kesî nayê. Seyda, du xulam, Narinc û zarokên wê li gel dîyarîyên xwe berê xwe didin Cizîrê. Di rê da seyda nîyeta xwe xerab dike û bi şev diçe ba Narincê û doza namûsa wê dike. Narinc xwastina wî qebûl nake û seyda jî dibêje eger tu ligel min nebî ez ê kurê te bikujim. Narinc daxwaza seydayî qebûl nake û seyda kurekî wê wê şevê dikuje û sibê ji xulaman ra dibêje kurik mirîye. Narinc dengê xwe nake û ji xulaman ra tiştekî nabêje. Dibe şev dîsa seyda diçe nav konê Narincê û dixwaze pê ra razê. Narinc dibêje ev meseleya namûsê ye û dîsa qebûl nake û seyda vê carê kurê wê yê din jî dikujîne. Seyda şeva din dîsa diçe ba Narincê û Narinc qebûl nake û seyda keça wê jî dikujîne û bi vî awayî hemû zarokên Narincê bi destê seydayî têne kuştin. Çend roj derbas dibin û digehêjin Mêrga Westanîyê. Narinc ji seyda ra dibêje ev der paytextê bavê min e here jê ra bêje keça te hatîye. Seyda ber bi dîwana Mîrî ve diçe. Narinc rastî keçelokê ku li ber qazên mala Mîrî sekinîye tê. Narinc jê ra hemû serpêhatîya xwe dibêje û ew dişîne ba bavê xwe ku mizgînîya hatina wê bide. Keçelok diçe dîwana Mîr. Di dîwanê da her du seyda jî hebûne. Keçelok dibêje ez ê ji we ra çîrokek bêjim û dest bi serborîya Narincê dike û bi awayekî çîrokî vedibêje. Dema seyda pê dihesin ku di çîrokê da behsa wan jî tê kirin dixwazin ji dîwanê derkevin lê Mîr nahêle û dibêje heta çîrok neqede kes ji vir dernakeve. Keçelok çîroka xwe diqedîne û dibêje ev çîroka keça te ye eger bawer nakî va keça te li mêrgê ye em ê gazî bikin bila bê û rastîyê bêje. Keçelok dibêje ew her du seyda jî ev in. Mîr pir xemgîn dibe radibe ferman dide, gazî xulaman dike ku serê her du seydayan jê bikin. Mîr dişîne pey keç û zavayê xwe û ji nû ve daweta wan çê dike.

2.4.15.Mîrza Axayê Rindikî û Têlî Eyşan

(Ev kurte ji varyanta Amêdî, 2013: 221-234 hatîye amadekirin.)

Mîrza Axa axayê sê hezar malê Rindika bûye. Sê jinên wî hebûne her sê jî keçên axa, beg û paşayan bûne. Mîrza Axa bi husna xwe ve yekî pir qeşeng bûye. Dengbêjekî wî yê bi navê Omo hebûye. Bi navê Olo jî berdevkekî wî hebûye. Rojekê

Omo kemançeya xwe hildigire û ji axayî xwe ra distre. Dema Omo distre axîn ji Mîrza Axa diçe û Omo sedema axîna wî dipirse. Mîrza Axa dibêje ku sê jinên min hene, her sê jî keçên axa û began in lê ez dixwazim jineke din ji xwe ra bînim ku ji van hersêyan çêtir be. Omo dibêje axa ez yekê dizanim ji her sê jinên te çêtir e. Navê wê Têlî Eyşan e û keça Ebdulhey Begê Mirdasî ye. Mîrza Axa pir bi kelecan dibe lê dîsa bawerîya xwe pê nayne. Dibêje Omo yekî dengbêj e Xwedê zanê li cihekî stran gotîye, kemançe lêxistîye û baxşîşeke baş danê û lewra ew jî medhê wan dike. Dilê Mîrza Axa rehet nabe û gazî berdevkê xwe Olo dike. Ji Oloyî ra dibêje Omoyî ji min ra behsa yekê kirîye navê wê Têlî Eyşan e û keça Ebdulhey Begê Mirdasî ye, tu yê herî wê keçikê bibînî gelo yekê çawa ye tu yê ji min ra bibêjî. Olo derwêş bûye, defa xwe helgirtîye, bi rê ketîye û piştî heft roj û heft şevan gihiştîye Welatê Mirdîsî. Olo xwe digehîne mala Têlî Eyşanê û ji wan ra dibêje ez hatime ba xatûna xwe Têlî Eyşanê ku çend qewlan jê ra bejim. Têlî Eyşan ne li malê bûye û Olo ji dêya wê Mîrdîs Xatûnê ra qasîdeyek xwendîye. Paşê Têlî Eyşan tê û çavê Olo lê dikeve û sipehîtîya wê dibîne nikare çavên xwe ji sipehîtîya wê bizivirîne. Li wir çend qewlan jî dibêje, sedeqeya xwe distîne û bi rê dikeve, vedigere.

Jinên Mîrza Axa pê dihesin ku Olo ji bo çi çûye. Dema Olo vedigere rêya wî digirin û dibêjin tu ji kû tê? Olo jî dibêje ez li ser daxwaza Mîrza Axa çûbûm dîtina yekê. Her sê jinên Mîrza Axa jê dipirsin û dibêjin yekê çawa bû? Olo jî dibêje eger çavê Mîrza Axa pê bikeve dê we her sêyan jî berde, ewqas rind û bedew e. Jinên Mîrza Axa xemgîn dibin û dibêjin gelo em çi bikin ku Olo bi vî awayî ji Mîrza Axa ra behsa Têlî Eyşanê neke. Biryar didin û dibêjin Olo her yek ji me dê sed heb zêr bide te û tu yê jî ji Mîrza Axa ra nebêjî yekê zehf rind e. Olo îqna dikin û dibêjin ji Mîrza Axa ra bêje yeke kêrnehatî ye, ne rind e, zexm e û ser keçel e. Olo diçe dîwana Mîrza Axa û jê ra dibêje Têlî Eyşan yeke pir zexm e bi sîtilên mezin xwarinê dixwe, ne rind e û kêrî te nayê. Mîrza Axa pir hêrs dibe û dibêje Omo te çima ez xapandim û te got yekê mîna wê rind û bedew tune ye. Omo ji Mîrza Axa ra dibêje destekincên aşiqan li xwe bike, tenbûrek biavêje ser milê xwe em ê herin welatê Mirdasî. Li wir tu yê Têlî Eyşanê bibînî eger ne bi dilê te be serê min jê bike. Mîrza Axa daxwaza Omo qebûl dike û tenbûrek diavêje milê xwe, Omo jî kemançeya xwe digire û berê xwe didin Mirdasî û piştî heft roj û heft şevan xwe digehînin Mirdasî. Li ber konê gavanê gund rûdinin û keçikên gundî tên derûdora wan disekinin ku guhdarîya wan bikin. Li wir dêya Têlî

Eyşanê Mîrdîs Xatûn jî tê û Mîrza Axa wê dibîne û ji Omo dipirse ma ne ev e? Omo dibêje ev dêya wê ye. Mîrza Axa dêya wê pir diecibîne û dibêje bila hema ev e. Omo dibêje Têlî Eyşan ji dêya xwe rindtir e. Carîyeya Têlî Eyşanê tê ba wan û ji wan ra dibêje Têlî Eyşan dixwaze we mêvan bike. Ew jî radibin diçin mala Têlî Eyşanê. Dema Têlî Eyşan derî vedike û çavên wan li hev dikevin aqil ji serê wan diçe ne bi dilekî bi hezar dilî hev dihebînîn. Mîrza Axa jê ra dibêje ez Mîrza Axa me û ez hatime ku te ji xwe ra bibim. Li wir Mîrza Axa û Têlî Eyşan dikevin nav kêf û laqirdîyan. Ebdulhey Begê bavê Têlî Eyşanê wê şevê digel 2, 3 hezar siwarên xwe ji şer vedigerin û tên. Dema dêya Têlî Eyşanê dibîne ku bavê wê hatîye diçe ba keça xwe û dibîne ku ew û Mîrza Axa bi hev ra razane. Dêya Têlî Eyşanê wê radike û dibêje bavê te hat eger we di vî halî da bibîne dê we her duyan jî bikujîne. Têlî Eyşan radibe û Mîrza Axa hişyar dike, dibêje bavê min hatîye dê me bikujîne, rabe min birevîne. Mîrza Axa jî dibêje heta ez û bavê te em şer nekin ez te nabim. Têlî Eyşan ji Mîrza Axa ra dibêje ez ê bav û bira û pismam û êlê tev da bikim qurbana serê te. Şer çê dibe Mîrza Axa mêr dikujîne eskerê ji hev belav dike û Têlî Eyşanê direvîne û diçe. Mîrza Axa digihîje welatê Rindikî li wir ji nû ve dengbêjan tîne, bi def û zurne govend didane, Têlî Eyşanê li xwe mehr dike û her sê jinên xwe yên din berdide.

2.4.16.Bêrîvanê

(Ev kurte ji varyanta Celîl û Celîl, 1978: 447-450 hatîye amadekirin.)

Perîşan xuşka heft birayan e. Dilê şêxê Surmanîyê dikeve Perîşanê, tê dixwaze lê birayên Perîşanê xuşka xwe nadin şêxî. Paşê Cewze Begê Mîrê êla Hekarîya tê Perîşanê dixwaze û Perîşanê didin wî. Cewze Beg Perîşan Xanimê nîşan dike û diçe. Dema xebera nîşankirinê digîhîje şêxê Surmanî şêx radibe ligel çend siwarên xwe êrişê mala Perîşanê dike, sê birayên wê dikuje, du birayên wê birîndar dike û du birayên wê jî sax dihêle. Perîşan dibîne ku çareya xelasbûnê tune ye gazîyê jinbira xwe dike û gustîlka xwe teslîmê wê dike û jê ra dibêje ku ew ê min bi zorê bibin, gustîlka min teslîmê destgirtîyê min bike, ez ê çil roj û çil şevan li benda wî bisekinim, eger hat hat eger nehat bila êdî dev ji min berde. Şêx bi zorê Perîşanê direvîne û dibe. Xebera revandinê digihîje Cewze Begî, ew jî radibe diçe mala Perîşan Xanimê dibîne ku sê birayên Perîşanê hatine kuştin, du heb birîndar in û du heb jî sax mane. Li mala wan taseke av dixwaze û jinbiraya Perîşanê gustîlka wê dixe nav tasa avê û Cewze Beg jî

gustîlkê dibîne. Ji jinbira Perîşan Xanimê dipirse û dibêje Perîşan çi got. Jinbira wê jî dibêje ew ê çil roj û çil şevan li benda te bisekine. Cewze Beg melheze dike û rêyekê ji xwe ra dibîne, dibêje ez ê xwe bigihînim nav êla şêxî, belkî destgirtîya xwe bibînim. Cewze Beg kincên şivanan li xwe dike û diçe ba Şêx, ji Şêx ra dibêje ez mirovekî kesîb im, dixwazim bibim rençber, şivan û gavan. Şêx jê ra dibêje eger tu heft sal ji min ra rençberîyê bikî ez ê te li ba xwe bigirim û edetê me weha ye. Cewze Beg jî qebûl dike û dibêje ne tenê heft sal ez ê çardeh sal rençberîya we bikim. Şêx dibêje temam lê ji me ra rençber na dûajoyek hewce ye û Cewze Beg jî qebûl dike. Cewze Beg radibe xwarina xwe dixwe û nanê şivanan jî hildigire û diçe ba şivanan. Du sê roj li ba şivanan dixebite û roja çaran nanê şivanan xilas dibe û wî dişînin mala şêx ku ji wan ra nan bîne. Cewze Beg ber bi mala şêx ve diçe lê di rê da rastî dawetekî tê, dibêje ez ê herim dawetê belkî destgirtîya min jî li wir be û wê bibinim. Cewze Beg diçe dawetê lê Perîşanê nabîne, ji wir derbasî mala şêxî dibe. Cewze Beg ji dêya Şêxî dipirse gelo keçên ezeb û bûkên teze naçin dawetan. Dema Cewze Beg vê pirsê dike Perîşan Xanim jî seh dike û dibêje dibe ku Cewze Beg yekî şandîye bo min. Cewze Beg nanê şivanan hildigire û dizivire. Perîşan Xanim ji xesûya xwe ra dibêje ez ê herim bêrîyê, xesûya wê şaş dimîne ji ber ku Perîşan Xanimê gotîye heta çil roj û çil şevên min temam nebin ez ji mal dernakevim. Lê xesûya wê kêfxweş dibe, amadehîya wê dike û wê dişîne bêrîyê. Perîşan Xanim dema diçe bêrîyê Cewze Beg wê dibîne û nas dike lê Perîşan Xanim Cewze Begî nas nake, ji ber ku Cewze Beg kincên rênçberan li xwe kirîye. Cewze Beg kilam diavêje ser Perîşan Xanimê û Perîşan Xanim wisa pê dihese ku ew Cewze Beg e. Li wir diaxivin û plana reva xwe çê dikin. Perîşan Xanim dibêje êvarê dema şêx ji bo şîvê ji mal derket ez ê bikevime tewlê du heb hesp gem bikim, zîn bikim paşê em ê siwar bibin û herin. Dibe şev Perîşan Xanim hespan amade dike û gazî Cewze Begî dike. Li hespên xwe siwar dibin lê Cewze Beg naçe. Perîşan Xanim dibêje çima nayê, Cewze Beg jî dibêje weha nabe, her wekî ev dibe bêbextî û ez te bi xef dibim, dê xelk bêje hat û bi xef Perîşan Xanimê bir. Cewze Beg dibêje ez ê ji şêx ra bêjim va ez destgirtîya xwe dibim eger mêr î were ji min bistîne. Cewze Beg diçe û ji şêxî ra dibêje. Şêx heta ku radibe û amadehîya xwe dike Cewze Beg û Perîşan bi rê dikevin. Şêx dikeve pey wan û li cihekî rastî hev tên. Di navbera Cewze Beg û şêx da şer diqewîme û Cewze Beg serê şêxî difirîne, hespê wî jê distîne, Perîşan Xanimê siwar dike û ber bi welatê xwe ve diçin.

2.4.17. Senem Xanim û Hiseyn

(Ev kurte ji varyanta Kaplan, 2018: 141-144 hatîye amadekirin.)

Mendul Axa û Qehreman Axa du destebirayên hev in. Mendul Axa axayê gundekî ye Qehreman Axa jî axayê gundekî ye. Heft kurên Qehreman Axa hene lê tenê kurekî Mendul Axayî heye. Navê kurê Mendul Axayî Hiseyn e. Hiseyn mezin dibe, tê ber dawetê û Mendul Axa ji kurê xwe ra Senem Xanimê dixwaze. Heft roj û heft şevan daweta wan çê dikin. Li ser daweta wan heft sal derbas dibin lê zarokên wan çênabin. Hiseyn nemêr e û mêranîyê ji Senem Xanim ra nake. Hiseyn û Senem Xanim soz didin hev ku vê rewşê ji tu kesî ra nebêjin. Hiseyn ji Senem Xanim ra dibêje roja ku min seh kir ku te rewşa min ji yekî ra gotîye êdî çavên te li min nakevin.

Rojekê li ber derîyê mala Mendul Axa zarok kom bûne û dileyîzin. Senem Xanim jî diçe ba wan zarokan disekine. Mendul Axa dema Senem dibîne jê ra dibêje bûka min, dêya van zarokan bi te ra bûne jin, niha zarokên hemûyan çêbûne çima zarokên te çênebûne. Senem Xanim serê xwe ditewîne û dibêje gazindan ji min nekin ji kurê xwe bikin. Mendul Axa radibe diçe ba kurê xwe û jê ra dibêje kurê min, va heft sal e tu di derîyê tengasîyê da yî, te çima tu car ji me ra negot. Xwedê derd dane derman jî dane. Hiseyn dema van gotinan seh dike pir hêrs dibe, radibe saza xwe diavêje ser milê xwe, bi rê dikeve û diçe. Li ser çûna Hiseyn heft sal derbas dibin. Hiseyn rojekê gundîyên xwe dibîne û lê xwe bi wan nade nasîn. Hiseyn ji wan pirsa Senem Xanimê dike gelo ka Senem Xanim çûye mala bavê xwe yan hêj li benda Hiseyn e. Gundî jê ra dibêjin ku Senem Xanim terka xesû û xezûrê xwe nekirîye û li ba wan e, li benda Hîseynê xwe ye. Dema Hiseyn van gotinan seh dike nameyekê dinivîse û ji malbata xwe ra dişine. Di nameyê da dibêje Hiseyn heta niha sax bû lê êdî çûye rehma Xwedê. Dema dê û bavê Hiseyn vê xeberê seh dikin diqehirin, dikin hawar û digirîn. Senem Xanim jî pir xemgîn dibe û digirî. Dêya Hiseyn piştî vê xeberê nexweş dikeve û di demeke nêz da dimire.

Rojekê Qehreman Axa diçe serdana Mendul Axa û jê ra dibêje Mendul Axa va heft sal e Hiseyn çûye, me digot belkî vegere lê meh seh kir ku çûye rehma Xwedê. Niha kesekî te nema, ez ê bûka te ji kurê xwe ra bixwazim. Em daweta wan çêkin paşê bila kurê min bê li ser malê te bisekine û bila bibe wekî kurê te. Mendul Axa bi mecburî qebûl dike. Roja din xêl ji bo Senem Xanimê bi rê dikeve. Di vê navberê da rojekê

Hiseyn rastî Xizirî tê û Xizir jê ra dibêje kurê min, here Çîyayê Dêrika Mazî li wir avek heye xwe bixe nav wê avê înşela tu yê bibî mêr. Hiseyn radibe û diçe xwe dixe nava wê avê û dibe mêr. Hiseyn biryar dide û dibêje ez ê vegerim gundê xwe gelo halê dê û bavê min çi ye, Senem Xanim çûye mala bavê xwe yan na. Hiseyn dikeve rê û berê xwe dide gundê xwe. Di heman rojê da xêla Senem Xanimê jî bi rê ketîye û gundî ber bi gundê Qehreman Axayî ve diçin. Hiseyn ji dûr ve xêlê dibîne û ji du merivan pirsa xêlê dike. Dema seh dike ku ew dawet daweta kurê Qehreman Axa û Senem Xanimê ye ji wan ra dibêje herin ji xêl ra bêjin bila belav bibin û Senem Xanimê bişînin mala Mendul Axayî, wekî din eger ez biçim ez ê wan hemûyan bikujînim. Hiseyn saza xwe lê dixe û Senem Xanim jî dengê sazê seh dike û dibêje hebe tune be ev Hiseynê min e. Senem Xanim xwe ji pişta hespê diavêje xwarê, kincên bûkanîyê ji xwe dike û dibêje ev dengê saza Hiseynê min e. Jê ra dibêjin Hiseyn mirî ye lê nikarine wê, Senem Xanim berê xwe dide mala Mendul Axayî.

Hiseyn kurterê diçe û xwe digehîne mala bavê xwe. Li wir saza xwe lê dixe ku bavê wî wî nas dike lê Mendul Axa ew nas nake, jê ra dibêje tu çi kes î, li ber derîyê mala min sazê lênexe, jina min û kurê min mirine, Qehreman Axa bûka min birîye, here ji vir. Mendul Axayê bavê wî ewil kurê xwe nas nake lê dema li nişana li ser milê wî dinihêre dizane ku ew kurê wî Hiseyn e. Mendul Axa li wir bi kilamkî gilî û gazindên xwe ji kurê xwe dike. Paşê Senem Xanim jî tê û digehişe Hiseynê xwe.

BEŞA SÊYEM

3. DI DESTAN Û HIKAYEYÊN GELÊRÎ YÊN KURDÎ DA ZAYENDA CIVAKÎ

3.1. ROLÊN JINANÎTÎYÊ

3.1.1. Jin Wekî Hezkirîyê

Di destan û hikayeyên gelêrî da leheng bi çar awayan evîndar dibin: bi temaşekirina resmê, vexwarina meyê, di hevdîtina ewil da, lehengên di heman malê da dijîn dema hîn dibin ku ne xwişk û bira ne (Alptekin, 2011: 33-39). Di destanên kurdî da leheng bi piranî di dîtina ewil da ji hev hez dikin. Sîyabend dema Xecê dibîne di dîtina ewil da jê hez dike, gava çavê Qedîmxasê li Zembîlfiroşî dikeve dibe evîndara wî, di destanên wekî Binefşa Narîn û Cembelîyê Kurê Mîrê Hekarîya, Evdilrehman Axayê Zorbaşî, Kerr û Kulik da jî leheng di dîtina ewil da ji hev hez dikin. Leheng hin caran jî hezkirîyên xwe di xewnê da dibînin û bi wî awayî dibin evîndar û dikevin pey evîna xwe. Di destana Sêva Hecîya da Mîr Mehmûdê Cindî Sêva Hecîya di xewna xwe da dibîne û wê bi hezar dilî dihebîne, di destana Xelîl Beg da Xelîl Beg û Perîşan Xanim jî cara ewil di xewnê da hev dibînin û ji hev hez dikin. Ji bo cureyê evindarbûnê ya lehengên di heman malê da dijîn hîn dibin ku ne xwişk û bira ne, destana Elo Şêxanî û Fatimê dikare bê dayîn. Ev her du leheng di heman malê da dijîn û Fatimê keçmama Eloyî ye. Piştî ku kalemêrekî ji wan ra dibêje hûn ne xwişk û bira ne û dergistî ne gelek kêfxweş dibin çinku ji hev hez dikin.

Di destanên kurdî da jina evîndar hertim wekî kesa ku gihîştina wê tê armanckirin, derbas dibe. Ew hezkirîyeke wisa ye ku lehengê mêr ji bo wê, ji bo gihîştina wê xwe dide ber gelek zehmetîyan û ji mirinê natirse. Ew hezkirî bi bedewî û delalîya xwe di nav gel da navdar bûye. Jina ku di destanan da di rola hezkirîyê da ye dixwaze ku lehengê mêr li hember reqîbên din bi ser bikeve û xwe bigehîne jina evîndar. Ew yek û tekane ye. Ew yeke wisa ye ku lehengê mêr ji bo wê welat bi welat digere, dikeve şerên dijwar û ji bo malbata wê şivantîya heft salan dike. Li hember ked û micadeleya lehengê mêr li alîyê din jina hezkirî di nav wê micadeleyê da gelek caran bi awayekî pasîv cih digire.

Di destanên evînî da mijar exlebî micadeleya ji bo gihîştina jina hezkirî ye. Evîn û lehengî di nav van destanan da têkel in. Lehengê mêr bi awayekî hêsan nikare xwe bigehîne lehenga jin. Li pêşîya gihîştina wan astengên mezin hertim hene. Astengên herî mezin rakîbên din in ku ew jî dixwazin digel lehenga jin bizewicin. Di destana Cembelîyê Kurê Mîrê Hekarîya da rakîbê Cembelî Dewrêş Axa, di destana Sitî û Ferx da rakîbê Ferx şivanê mala bavê Sitî, di destana Sêva Hecî da rakîbê Mîr Mehmûd şivan Ahmed, di destana Xelîl Beg da rakîbê Xelîl Beg Xeloyê xulam an jî Xeloyê mitirb, di destana Sîyabend û Xecê da rakîbê Sîyabend kurê mîrê Şikakîyan, di destana Husên Axayê Derbas da rakîbê Tahir Beg Mîr Mehmûdê Kulavanî, di Bêrîvanê da rakîbê Cewze Beg Şêxê Surmanî ye. Li alîyê din hin caran jî rakibên jin hene ku dixwazin digel lehengê mêr bizewicin. Di destana Memê Alan da rakîbê Zîna Zêdan Zîna Bekoyê Ewan e û ew jî dixwaze ligel Mem bizewice, di destana Sîyabend û Xecê da ji xeynî Xecê Gulperî û Ereb Zincar jî dixwazin bi Sîyabend ra bizewicin, di destana Sitî û Ferx da rakîbê Sitî Gulendam Xatûn e û ew jî dixwaze bi Ferx ra bizewice.

Di nav piranîya destan û hikayeyên gelêrî yên ji bo xebatê hatine bijartin da jin wekî hezkirîyê derbas dibin. Di nava van destan û hikayeyên gelêrî da roleke giring a jina hezkirî heye: Memê Alan, Dewrêşê Evdî, Siyabend û Xecê, Kerr û Kulik, Binevşa Narîn, Sêva Hecî, Stî û Ferx, Elo Şêxanî û Fatimê, Zembîlfiroş, Xelîl Beg, Husên Axa Derbas, Bêrîvanê, Mîrza Axayê Rindikî.

Di destanan da jinên evîndar bi bedewî, nazdarî û nazenînbûna xwe navdar bûne. Ew ewqas spehî ne mêrên ku wan dibînin di dîtina ewil da dibin evîndarê wan. Mem cara ewil dema Zînê dibîne ne bi dilekî bi hezar dilî wê dihebîne û ji bo bedewîya wê "*ximşeke xezala, horiyeke cinetê*" (Celîl û Celîl, 1987: 92) dibêje. Ew di xweşikbûnê da ji gulê zêdetir e. Mem dema di xasbaxçê da rastî gulekê tê ji gulê ra weha dibêje: "*Gulê tu çima wa nazik, nazan î/ Tu rojê xwe rengekî da dibînî/ Dîsa tu reng û rûbar da Zînê nînî.*" (Cindî û Evdal, 2008: 326). Gul herçiqas bi bedewîya xwe bê zanîn jî dîsa eger berawirdkirinek bê çêkirin ew di çavê Memî da bi qasî Zînê ne bedew e. Zîn wekî rojê dibiriqe, ew mîna hurîyeke behiştê ye (Cindî, 2016: 23).

Piştî hevdîtina Mem û Zînê, Zîn kincên xweşik ji ber xwe derdixîne û yên carîyeyan li xwe dike. Dernakeve derve û di nav çar dîwaran da dimîne. Şeş meh bi vî awayî derbas dibe û rojekê Zîn gilî û gazindan dike û xwe rexne dike. Dibêje:

> Mala min bişewite, ji bona xewneke şevan, min xwe kire cihê bodelane.
> Min cilê xwe avêtin û di histîyê xwe da danî kirasekî erebane.
> Xwe hepîs kirîye di nava çar dîwarane.
> Ev giştik ji bona Memê Alan, padîşahê bajarê Mixribîyane.
> Ma gelo niha qet ez bi bîra wî dikevim?
> Belkî jî niha ji xwe re eciband keçek ji keçên mezinên Mixribîyane.
> Belkî ez nakevim bîra wî di xewnane (Lescot, 1942: 124).

Piştî van gotinan Zîn dibêje min ew ji seetek zêdetir nedîtîye û dibe ku çawa xuya dikir wisa nebe jî. Eger yekî camêr bûya ew ê heta niha bihataya ba min. Zîn biryar dide ku êdî xwe ji bo wî neêşîne. Em dibînin ku jina dildar wextekî dirêj bi hêvîya hezkirîyê xwe dimîne lê paşê wisa difikire ku ev bendemayîn vala ye û poşman dibe.

Jinên evîndar li ser soza xwe ne û ji xeynî evîndarê xwe tu kesî naxwazin. Ew ewqasî gîrêdayî hezkirîyê xwe ne ku dema hezkirîyê wan dimirin ew jî daxwaza mirinê dikin û di demeke nêz da ew jî rihê xwe teslîm dikin. Piştî mirina Memî êdî Zîn nikare bijî û ji Xwedê ra dia dike ku Xwedê rihê wê bistîne. Xwedê diayê wê qebûl dike û piştî mirina Memî Zîn jî di heman rojê da rehmet dike (Cindî û Evdal, 2008: 340; Celîl û Celîl, 1978:117; Cindî, 2016: 59-60). Evîndar jîyaneke bêyî evîndarê xwe naxwazin. Ew wisa ji evîndarê xwe hez dikin ku piştî wî naxwazin bijîn. Di destanên kurdî da evînên trajîk zêde ne û exlebî evîndar nagîhîjin hezkirîyên xwe (Subaşı, 2024: 106; Subaşı, 2023: 170). Mem û Zîn jî nagîhîjin mirazên xwe. Piştî mirina Mem Mîr ji Zînê ra dibêje:

> "Ez dê ev şev bikeme dîwane
> Ez dê gazî bikem hindî cindî û êkanêd Botane
> Ji qencan û xirabane, ji beg û beglerane
> Bo xwe lawekî qebûl bike cihê Memê Alane" Xatûn Zînê got:

"Keko, ji koçkê bigire hetake baxê
Ez dê kodkêd heşê bavême digel şînê, digel zaxê
Piştî Memê Alan min heram bît mehra mêran dinyayê
Min ne xulam divên ne jî axê." (Kaplan, 2019: 178).

Piştî van gotinan Zîn ji Xwedê ra dia dike ku piştî Memî sax nemîne. Diayê wê diqebile û ew jî rehmet dike. Evîndar ji xeynî hezkirîyê xwe kesekî din naxwazin û girêdayê hezkirîyên xwe ne.

Di destana Dewrêşê Evdî da dema Zor Temir Paşa ji bo hilbijartina serdarîya şerî keça xwe Edûlêyê diavêje mazatê Dewrêş tê û dixwaze bibe serdarê ordîya Milan. Kî qehwa di destê Edûlêyê da vexwe serdar jî ew e destgirtîyê Edûlêyê jî ew. Dewrêş qehwê vedixwe lê Edûlê naxwaze ew biçe şer. Ev şer şerê man û nemanê ye (Filiz, 2021: 46). Edûlê nikare Dewrêş îqna bike ku neçe şer. Dema xebera mirina Dewrêş tê Edûle pir xemgîn dibe û digirî. Edûle li bendê ye ku Dewrêş ji şer bi awayekî serkeftî vegere û ew bigihîjin hev. Lê bi wî awayî nabe û Edûlê kilam diavêje ser hezkirîyê xwe:

"Gelî kîkan û gelî milano,
H'eç'î kesê, ko cûaba Dewrêşê E'vdî, sûare Hidman, lawkê êzîdî, delalê malê, xêmê binê berîyê, ji nava h'ezar û pênsid sûarê gêsa ji mira bîne,
Ezê bidimê çar aşê bavê min li ber ava Misêrbînê,
Hege bi herçar aşa qayîl nebe, ezê bidimê da h'eb canîyêbavê min hene, kihê'lin, e'slîne, ezê bidim bi rih'înê,
Çar qesr û qonaxê bavê min hene, ezê bidimê li bajarê Misêrbînê,
Eger her çar qesr û qonaxa qayîl nebe,
Ez ê di serda bidimê h'ezar û pênsid zêrê osmanî ji xizînê" (Celîl û Celîl, 1978: 288).

Edûle dixwaze bigihîje Dewrêşê xwe. Ew dibêje ez ê hemû mal û milkên bavê xwe bidim, tenê hûn xebera Dewrêşê min ji min ra bînin. Lê Dewrêş mirîye û êdî gihîştin ne mimkin e. Dema Edûle jî vê yekê ferq dike kêrekî li zikê xwe dide û xwe dikuje. Ji bo hezkirîyan eger gihîştin tune be mirin ji jîyanê çêtir e. Ew naxwazin piştî

hezkirîyên xwe bijîn. Yan ji Xwedê daxwaza mirina xwe dikin yan jî ew bi xwe xwe dikujin.

Xecê gelekî girêdayî Sîyabend e û ji mêrxasîya wî bawer e. Tenê daxwaza wê ew e ku Sîyabend sax bimîne, wê biparêze û ew nekeve destê Hesen Axayî. Ew dema şerê Sîyabend a bi Hesen Axa ra dibîne pir kêfxweş dibe. Çinku Sîyabend serê Hesen Axa jê dike û hemû siwaran dikuje. Êdî tirs di dilê Xecê da namîne. Ew dibêje ku: "*Ya Rebî, tu hevza vî egîdî bikî! Egîdekî mîna Siyabend ku mêrê min e êdî xêncî Xwedê mineta ji tiştekî tune*." Paşê ew ji Sîyabend vedigere û jê re: "*Ezîzê dilê min, bi we'da Xwedê, êdî ji vir şunda ez nagirîm û hêsran ji çavên xwe naynim. Min heft bira û donzde pismam kirin qurbana te. Qedê jî bi ser da. Êdî li dara dunê xêncî te tiştek nayê ber çavê min…*" (Aras, 2023:48). Xecê piştî ewqas êşê dîsa bi hebûna Sîyabend bextewar e û dibêje min wan hemûyan qurbana te kirin. Tenê bila ji te ra tiştekî nebe bes e. Xecê jî yek ji wan lehengan e ku piştî hezkirîyê xwe naxwaze bijî û ew jî xwe dikujîne. Ew ji bo xelasîya Sîyabend çi ji destê wê bê dike lê bê feyde ye. Dema Sîyabend ji Sîpanê Xelatê dikeve jêr û birîndar dibe ji Xecê ra dibêje here werîsê heft gundan bîne bi hev ve girê bide belkî bigihîje min û ez ji vî halî xilas bim. Xecê diçe ji heft gundan werîsan tîne lê dîsa jî werîs nagîhîje Sîyabend û ew xilas nabe. Gundî ji Xecê ra dibêjin xilasbûna wî tune ye lê dikin nakin nikarin Xecê ji wir bibin. Xecê dema dibîne ku xelasîya Sîyabend tune ye ew jî xwe berdide ba wî û her du li wir dimirin (Celîl û Celîl, 1978: 146-147; Cindî û Evdal, 2008: 566; Serhedî, 2018: 60). Em dibînin ku lehenga jin piştî mirina hezkirîyê xwe naxwaze bijî. Ew girêdayê evîndarê xwe ye û ji xeynî wî kesî naxwaze. Herçiqas Sîyabend jê ra dibêje here yekî ji min çêtir bibîne û pê ra bixewice lê Xecê bi tu awayî qebûl nake û dibêje: "*Ez t'u dila di ser dilê te da nah'ebînim.", "Bê te êdî dinya li min heram e, mirin ji min ra baştir û xêr e*." (Celîl û Celîl, 1978: 148; Aras, 2023: 155). Heman rewş di destana Xelîl Beg da jî heye. Piştî mirina Xelîl Beg, Perîşan Xanim naxwaze digel yekî din bizewice û wiha dibêje: "*Êdî piştî Xelîl Begê xwe serê xwe dananim li ser cî û balîyê tu camêran*" (Kaplan, 2018: 131). Perîşan Xanim diçe ser banê serayê û xwe diavêje erdê û dimire.

Di destanan da lehengên jin ewqas bedew û delal in ku dema lehengên mêr wan dibînin hişê wan diçe, dibin evîndar û dikevin erdê. Hiş û aqil di serê mêran da namîne ji delalîya jinan. Binefşa Narîn jî yek ji wan lehengan e ku dema Derwêş Axa wê dibîne

hişê wî diçe û aqil di serî da namîne. Derwêş Axa serê sibê li ber derîyê konekî Binefşê dibîne û sipehîtîya Binefşê bi vî awayî tîne zimên:

"Sûretê wê bîna sûretê Zelîxêye,
Li devê dergê Stembolê ye,
Rojê sê cara a'lem êvarê diçe t'emaşêye,
E'nîya wêna ji k'ok'ebê hîvêye,
Şewqa xwe dide çar t'erefê dinêye,
Ç'e'v û birûyê wê reş in, h'ubra ser k'axatêye,
P'ozê wê nukulê kewê ye,
Sipî dike, bîna p'ela berfa serê ç'îyêye
Dev û lêvê wê tenik in, mîna p'elek ji p'elê quranêye,
Diranê wê sipî ne, ji birincê Qerecdaxê ye,
Çil û çar kezî li nava milê wêne,
Serê kezîya di'eve ser pe'nîya qonderêye,
Fistanekî melese lêye,
Fistan nexşandîye ji p'elgê gulêye,
Çar buhust û çar t'ilîya fistan dik'eve rûyê e'rdêye,
Meşa wêna, bînaye meşa werdeka, ku dertê ji golê ye,
Dertê ser mêrgê, diçe û têye,
P'er û baskê xwe dadwaşîne ji xunavê, ji avîyêye,
Derwêş-axa, -k'es weke wê, nedîtîye li nava dinêye-" (Celîl û Celîl, 1978: 178).

Xecê jî yek ji wan jinan e ku serleheng çawa wî dibîne jê hez dike. Ji bedewîya Xecê hişê Sîyabendî diçe û Sîyabend di dîtina ewil da evîndar dibe. Ew bedewîya Xecê bi van gotinan tîne zimên:

"Ev qîza hanê bînaye hîva çarde şevî,
Ko di serê ç'îyayê Qafda derdik'evî,
Tu t'ilîpantkê li e'nîya wê didî, heta binê pe'nîyê reş û şîn dike
Avê dixo, di gerdena wêda xuya dike,
Binaya p'elekî berfa serê ç'îya sor û spî dike
Nexşê k'erge ji hervîşim bi destê xwe çê dike" (Celîl û Celîl, 1978: 135-136).

Bedewîya Xecê li her derê belav dibe. Hertim xwazginîyên wê tên lê Xecê kesê nastîne. Dozdeh pismamên wê hene û hemû jî Xecê dixwazin lê ew qebûl nake. Axayê êla şikakîyan Hesen Axa xwazgînîyan dişîne lê Xecê wan jî destvala dişîne. Di dawîyê da dibînin ku çare tune konê xwe bar dikin û diçin li etegê Sîpanê, li perê Mêrga Gulîstanê bi cih dibin (Aras, 2023: 28). Lehenga jin ewqas bedew e ku her kes dixwaze pê ra bizewice lê ew qayîl nabe. Ew li benda yekî din e ku dema wî dibîne di dîtina ewil da jê hez dike û dixwaze pê ra bizewice.

Di destanan da bedewîya jinan hertim bi awayekî mibalaxakirî hatîye gotin. Di destana Kerr û Kulikî da dema behs tête ser Şemsîxanê em rastî mibalaxayê tên. Nav û dengê wê li oda kurê bavan, ciwanmêran, li der û dinyayê belav bûye:

"…
Çavên xwe ji xezalê dizî ne.
Bi rojê şewq û şemala wêna diavêje çol û çîyan
Di avêje ser behrê, ser pişta Gamasîyan,
Wekî mewîjekê di qirikê heta navikê xûya dike,
Mirov dibêje; ya Rebî Xwedê ez bixwim û vexwim,
Li vê xibşa xezala temaşe bikim!.." (Cizîrî, 2020: 188-189).

Şemsîxan dema xwe diavêje mazatê, Kulik tê fîncanê ji destê wê digire ku biçe Cancana Elîsarê Gêsî bîne û Şemsîxanê bistîne. Şemsîxan naxwaze Kulik biçe ji ber ku bawerîya wê bi bavê wî Emerê Simayîl Axayê Milî nayê. Şemsîxan naxwaze Kulik bikeve tengasîyê yan jî tiştekî xirab bê serê wî. Dibêje neçe pey hespê ve were û min birevîne lê Kulik qebûl nake û diçe (Cizîrî, 2020: 191-192).

Di varyanta Aras da dema Kulik cara yekem Perîşanê dibîne hişê wî diçe û dikeve erdê. Perîşan ewqas bedew e ku dişibe horî-melekan her wekî nû ji ezman hatibe rûyê erdê (2022: 30). Dema mijar bedewîya Perîşanê be tê gotin ku qîzeke bedew û li ser xwe ye, dema mewîja reş dixwe di gewrîya wê da xuya dike (Aras, 2022: 21).

Di destana Sêva Hecî da dema şivan behsa bedewîya Sêva Hecî dike bi awayekî mibalaxakirî behs dike. Dibêje piştî ku min rûyê wê dît min heft sal nedîtîya besê min

bû, ewqas rind bû. Careke din dîsa dibêje min serê tilîya wê dît, min heft salên din nedîtîya dîsa têra min bû. Dema çavê Mîr Mehmûdê kurê mîrê Beraza li Sêva Hecî dikeve aqil di serê wî da namîne, dîn dibe û li çolan dikeve. Mîr Mehmûd ji eşqa Sêvê bê hiş dikeve (Cindî, 2016: 91-94). Tu kesî qîzeke wekî wê bedew di nav insanan da û cinan da nedîtîye (Celîl û Celîl, 1978: 155).

Di destana Evdilrehmanê Zorbaşî da dema Evdilrehman Feyrûz Xatûnê dibîne ne bi dilekî bi pênchezar dilan wê dihebîne. Feyrûz Xatûn ewqas bedew e ku di nav ecem, tirk û rûsan da yekê wekî wê bedew tune ye. Mirov li heft dewletên bîyanî bigere jî dîsa yeke wekî wê nabîne. Di nava horîyên cinetê da yên wekî wê tune ne. Bejna wê zirav e wekî dara darqelûnê. Dema Evdilrehman wê dibîne êdî hiş di serê wî da namîne. Şer, kuştin, xulam her tiştî ji bîr dike. Dixwaze carekê wê ramûse. Evdilrehman carekê radimûse û xwe di bin textê wê da vedişêre (Cizîrî, 2020: 116- 118; Amêdî, 2013: 339). Dema çavê Feyrûzê li Evdilrehman dikeve ew jî jê hez dike û soz didin hev. Feyrûz Xatûn xwe û bavê xwe qurbanê Evdilrehmanê Zorbaşî dike. Dema Evdilrehman û Xanûmanê Çirsî şer dikin Feyrûz Xatûn alikarîya Evdilrehman dike û serê bavê wê jê dikin (Cizîrî, 2020: 119-123). Em dibînin ku jinên hezkirî ji bo saxîya hezkirîyên xwe hin caran bavê xwe jî qurban kirine.

Jinên evîndar hertim başî û saxîya hezkirîyên xwe xwestine. Wan naxwastîye ku tu qeda û bela bê serê dergistîyê wan. Di destana Sitî û Ferx da piştî şivanê mala Xelîfe gazindan ji Ferx dike Xelîfe pir hêrs dibe. Şivan dibêje eger weha be ez êdî ji we ra şivantî nakim û ez ê biçim. Ji ber ku Xelîfe zehf jê memnûn bûye nexwastîye şivan biçe û Xelîfe emir dide ku Ferxî bikujin. Dema Sitî van gotinên bavê xwe seh dike pir xemgîn dibe û sê morikên sor, spî û şîn li benekî ve girê dide û li ba derê dîwanxanê vedişêre. Ferx dema diçe qesrê li ber derîyê dîwanxanê wan her sê morikan dibîne û dibêje ya sor xwîna min e, ya spî kefena min e, ya şîn jî nihara min e. Ferx fêm dike ku mamê wî qesta mirina wî dike, radibe xatirê xwe ji Sitî dixwaze, berê xwe dide welatekî din û wan deran diterikîne (Kaplan, 2019: 195-196). Piştî çûna Ferx qidûmên Sitî dişkên. Wisa dibe ku êdî nikare rabe ser pêyan. Ew encax bi alîkarîya xwişkên xwe dikare biçe cihekî (Kaplan, 2019: 205). Sitî dikeve nav cihan, derîyê xwe digire, şev û roj digirî. Çend roj şûnde êdî bê Ferx nikare îdare bike û ji xwişkên xwe ra dibêje em herin ser kanîyê belkî Ferxî bibînim. Sitî digel xwişkên xwe diçe ser kanîyê. Ferx ji dûr ve wan dibîne. Ew li ser kanîyê tên cem hev û paşê dîsa Sitî û

xwişkên wê vedigerin mal û dîsa Sitî dikeve pişt derîyan, bi tu kesî ra naaxive û hertim digirî (Cindî, 2016:127-128)

Di destana Sitî û Ferx da wekî hezkirî Sitî yeke pir bi xurûr e. Piştî daweta wê û Ferx, Ferx jê dipirse û dibêje: "*Stîyê, dilê şivanê me heqa teda hebû, gelo, rojkî te ramûsa yan na*?" (Celîl û Celîl, 1978: 212). Li ser van gotinan Sitî pir hêrs dibe û Ferx ditekirîne û diçe. Careke din jî venagere. Di varyanteke din da Ferx dema Sitî dibîne jê dipirse gelo tu keç î yan jin? Sitî ji van gotinan pir aciz dibe û dîsa Ferxî diterikîne, diçe. Jê ra dibêje tu êdî min nabînî. Sitî piştî gotinên Ferxî ewqas xemgîn dibe ku naxwaze bijî. Hewara xwe digehîne Xwedê ku rihê wê bistîne. Xwedê diayê wê qebûl dike û Sitî rihê xwe teslîm dike (Kaplan, 2019: 208).

Di destana Sêva Hecî da Sêva Hecî hezkirîya Mîr Mehmûd e. Ew di xewnên şevan da bûne hezkirîyên hev. Sêva Hecî ji bo gihîştina hezkirîyê xwe dixwaze hemû asteng ji holê rabin. Sêva Hecî digel şivanê wan ê extîyar dergistî bûye lê dema Mîr Mehmûd tê jê ra dibêje serê şivanê me jê bike (Celîl û Celîl, 1978: 160). Sêva Hecî bi vî awayî xwe ji şivanê asteng xilas dike.

Di destana Elo Şêxanî da Elo û Fatimê piştî bêbextîya li wan hatîye kirin soz didin hev ku ji xeynî hev bi tu kesî ra nezewicin. Fatimê bi vî awayî soz dide:

"Nemao, lo E'lo,
Baxçê û bostanê bavê min bi darê bîye,
Mi we'dekê li ber rebbê xwe dayîye,
Hayî, ko li ser min û te bû bextreşîyê,
H'eta ez sax bim li dinîyayê, ji te pêva,
Ez t'i kesî nastînim, ji tera bûme weke mîye" (Celîl û Celîl: 1978: 216).

Fatime deh salan ji Elo xeber nastîne. Piştî deh salan Elo jê ra nameyekê dişîne, Fatimê pir şah dibe û ew jî nameyek jê ra dişîne û dibêje ez li ser soza xwe me û li benda te me. Lê name nagehije destê Elo û başbazirganê destebirayê Elo di rê da mektûbê dişewitîne. Li ser şandina nameyê sê meh derbas dibin lê tu xeber ji Elo nayê. Fatimê radibe qesta bajarê Şamê dike û dibêje gelo Elo sax e yan mirî ye. Di rê da seh dike ku Elo Şêxanî nexweş ketîye. Fatime kincê mêran li xwe dike û xwe wekî tixtor dide nasîn

û bi vî awayî xwe digehîne Elo (Celîl û Celîl: 1978: 218-220). Em dibînin ku di vê destanê da jina evîndar ji bo gihîştina hezkirîyê xwe zêdetir ked dide. Ew bi rê dikeve, kincên mêran li xwe dike ku bikabe xwe bigehîne sozdarê xwe.

Di destana Zembîlfiroş da dema çavê Qedîmxasê li Zembîlfiroş dikeve ne bi dilekî bi hezar dilî wî dihebîne. Qedîmxas jineke ji xwe bawer e. Ew dema Zembîlfiroşî dibîne û jê hez dike bi awayekî bêtirs xwastina xwe aşkera dike. Ew ji Zembîlfiroş selikan dixwaze lê dema Zembîlfiroş tê jê ra dibêje min ji bo eşqa dila gazî te kir. Ew gelek tiştan pêşnîyaz dike wekî mal, milk, zêr, pere lê Zembîlfiroş naxwaze û daxwaza Xatûnê ya bihevrebûnê red dike. Dema Qedîmxas dibîne ku nikare Zembîlfiroş îqna bike ew çax wî bi Abasê xulamê xwe tehdît dike (Celîl û Celîl: 1978: 190-192). Ew bi hemû serwet û bedewîya xwe xwe pêşkêşî Zembîlfiroşî dike lê Zembîlfiroş dîsa jî ji rê dernakeve (Gernas, 1995:87). Ew li hember bedewîya Xatûnê sebreke mezin dide nîşan. Ji ber ku Zembîlfiroş kesekî bawermend e û naxwaze ji ber emrê Xwedê derkeve (Yılmaz, 2016: 70-71; Xendekî, 2018: 112). Lê dîsa jî jina evîndar ji bo gihîştina armanca xwe hemû rêyan diceribîne û bes nake. Dema Xatûn pê dihese ku Zembîlfiroş çûye mala xwe palekî digire ku lexmek di nav hewşa qesra wê da bikole. Xatûn bi vî awayî ji binê erdê ra xwe digehîne mala Zembilfiroşî (Amêdî, 2013: 188). Xatûn diçe ba jina Zembîlfiroşî û jê ra weha dibêje: "*Bila ev şeve mêrê xwe bide min, ev taxma libasê min bila bo te bit. Ev sed zêrên Osmanlî bila ev jî bo te bin, hema ev şeve bi tinê mêrê xwe bide min.*" (Amêdî, 2013: 194). Jina evîndar ji bo gihîştina hezkirîyê xwe kinc û zêrên xwe dide jina Zembîlfiroşî ji bo ku tenê şevekê bikare ligel wî razê. Di varyanta Cindî û Evdal da Xatûn digihîje mirazê xwe û şevekê digel Zembîlfiroş radizê (2008: 392). Mîr pê dihese ku Xatûn tiştekî nebaş kirîye, carîyeyan dide axiftin û meseleyê hîn dibe. Ew çend xulaman dişîne pey Zembîlfiroşî û Zembîlfiroş û Xatûnê diavêje zîndanê. Di zîndanê da kêrê diavêje ranê Zembîlfiroşî û wî birîndar dike. Xatûn ji nişka ve kêr ji destê Mîrî distîne û zikê Mîrî diqelişîne. Ew digel Zembîlfiroşî û jin û zarokên wî berê xwe didin welatekî din (Cindî û Evdal, 2008: 392-393). Xatûn ji bo eşqa Zembîlfiroşî xwe diavêje talûkê.

Di destana Xelîl Begî da wekî jina evîndar Perîşan Xanim derdikeve pêşberî me. Ew ji Xelîl Begê ku di xewna şevan da dîtîye hez dike û ji bo gihîştinê ked dide. Dema di rêya seyranê da rastî Xelîl Begî tê bi awayekî kilamkî xwe dide nasîn. Ew behsa dewlemendîya bavê xwe, kon û porê xwe dike û dibêje porê min şêst û şeş gulî

ne. Bi vî awayî medhê xwe dide ku bala Xelîl Begî bikişîne (Celîl û Celîl, 1978: 223-225). Dema çavê Xelîl Begî lê dikeve ji sipehîtîya wê hişê wî diçe (Kaplan, 2018: 129). Li vir lehenga jin bi awayekî pasîf xuya nake. Ew ji bo ku bala hezkirîyê xewna şevê bikişîne kilaman dibêje û wî ji xwe xeberdar dike. Diçe mal û ji bo wî amadehî dike, dema ew tê pêşwazîya wî ew bi xwe dike. Ew girêdayî hezkirîyê xwe ye. Dema Xeloyê xulamê wan dixwaze nêzikê wê be û wê maç bike Perîşan Xanim wî dixapîne û sik'ek nav çavê wî dide û hişê wî diçe (Celîl û Celîl, 1978: 230). Xeloyê xulam Mehmud Paşa dixapîne û dibe sebebê mirina Xelîl Begî. Dema Xelîl Beg dimire Mehmud Paşa dixwaze Perîşan Xanimê bibe jina wî lê Perîşan Xanim naxwaze û dibêje hinek wext bide min. Bi vî awayî Perîşan Xanim çend rojan derbas dike û rojekê dibêje bêhna min dernakeve û derdikeve serê banê koşk serayê. Ew li wir ji bo Xelîl Begî kilaman dibêje û xwe ji banê koşk serayê diavêje erdê (Celîl û Celîl, 1978: 233-234; Cindî, 2016: 105). Berî ku xwe biavêje dibêje: "*Êdî piştî Xelîl Begê xwe serê xwe dananim li ser cî û baliyê tu camêran*." (Kaplan, 2018: 131). Perîşan Xanim piştî mirina Xelîl Begî naxwaze bijî û xwe dikuje. Xwekuştina Perîşan Xanimê hem bi tirsê ra eleqedar e hem jî bi sedaqetê ra. Tirsa wê ew e ku Mehmud Paşa wê bike jina xwe û ew jê ra bimîne; sedaqeta wê jî ew e ku ew girêdayê hezkirîyê xwe ye û naxwaze jîyaneke bê wî bijî.

Di destana Xelîl Begî da xalek heye ku divê li ser bê sekinîn. Di hemû varyantan da navê lehengê mêr wekî Xelîl Beg derbas dibe lê navê lehenga jin diguhere. Navê jinê wekî Perîşan, Perîşan Xanim (Celîl û Celîl, 1978: 222-234); Gozel Xanim (Celîl û Celîl, 1978: 234-235; Cindî, 2016: 99-105); Tîlî Eyşan (Kaplan, 2018: 126-132) derbas dibe. Ev rewş di gelek destanên kurdî da derdikeve pêşberî me. Di destana Zembîlfiroşî da navê lehengê mêr Zembîlfiroş e lê ya jin wekî Xatûn, Qedîmxas, Xatun-Perî, Benî Xatun, Gulxatûn derbas dibe.

Di destana Husên Axa Derbas da dema behsa bedewîya Narincê tê kirin tê gotin ku ew yeke bejinzirav û lihevhatî bûye. Narincê bedewî û ciwanî ji tu kesî ra nehêştîye (Amêdî, 2013: 250). Dema Mehmûdê Kulavanî tê ku Narincê birevîne birayên Narincê digel siwarên Mehmûdê Kulavanî şer dikin lê hejmara wan siwaran gelek e. Narinc dibîne ku birayê wê Mistefa birîndar dibe radibe ji Tahir Beg ra nameyekê dişîne. Narinc, Tahir Begî ji rewşê agahdar dike û dixwaze were û bigihîje hewara wan (Amêdî, 2013: 256). Ji ber ku Narinc naxwaze Mehmûdê Kulavanî wê birevîne ji dergistîyê xwe alîkarî dixwaze.

Di Bêrîvanê da dema Perîşan pê dihese ku dergistîyê wê Cewze Beg hatîye radibe amadehîya bêrîyê dike û diçe bêrîyê. Perîşan li wir Cewze Begî dibîne û plana reva xwe çê dikin. Perîşan dibêje bi şev dema şêx çû ser xwarina xwe ez ê bikevim tewlê du hespan gem bikim, zîn bikim û em ê siwar bin û herin (Celîl û Celîl: 1978: 450). Lehenga jin bi vî awayî alîkarîya dergistîyê xwe dike ku bigihîjin hev.

Di hikayeya Mîrza Axayê Rindikî û Têlî Eyşan da lehenga jin Têlî Eyşan ewqas bedew e ku dema berdevkê Mîrza Axayî wê dibîne xwarin di gewrîya wî da dimîne (Amêdî, 2013: 224). Dema dêya Têlî Eyşanê keça xwe li ba Mîrza Axa dibîne jê ra dibêje eger bavê te we di vî halî da bibîne dê we bikuje. Li wir Têlî Eyşan bav, bira, pismam û hemû êlê qurbana Mîrza Axa dike (Amêdî, 2013: 228). Mîrza Axa Têlî Eyşanê direvîne. Di rê da di navbera wan da nîqaş çê dibe. Têlî Eyşan ji Mîrza Axa ra dibêje tu li pey min hatî, Mîrza Axa ji Têlî Eyşan ra dibêje tu li pey min hatî. Piştî van axiftinan Têlî Eyşan dibêje: "*Bi serê bavê xwe kim ji vir û ha de ji te re nabim jin e*." (Amêdî, 2013: 231). Têlî Eyşan jineke bixurûr e û qebûl nake ku her wekî ew li pey mêrekî çûbe. Lê li alîyê din jî dibêje ev tişta ku min kirîye rûreşîyekê ye û ez ê çawa vegerim û biçim mala bavê xwe. Têlî Eyşan dudilî dibe lê paşê ew û Mîrza Axa li hev tên (Amêdî, 2013: 231).

3.1.2. Jin Wekî Hevjînê

Jin di nav civakê da bi hin taybetmendîyên xwe cih digire. Yek ji van taybetmendîyan "hevjîn"bûna wê ye. Di nav civakên pederşahî da jin ewil di bin hîmayeya bavê xwe da paşê jî bi zewacê ra dikeve bin hîmayeya hevjînê xwe. Li gor stereotîpên zayenda civakî jin bi rêya zewacê xwe dide nasîn. Sîfetên wekî hevjîn û dayiktî piştî zewacê li jinan tên barkirin. Di nav civakên pederşahî da zewac ji bo jinan pîleyek e lê ji bo mêran tê wateya zêdebûna berpirsîyarîyan. Rolên zayenda civakî hêj di emreke piçûk da bi rêya lîstik, çîrok û hikayeyan zarokan ji hevjînbûnê ra amade dike. Ev rewş di lîstikên zarokan da bi awayekî aşkera xwe dide der. Di lîstikan da zarokên keç di rolên dayiktîyê da bi lîstokên bebek ra dileyîzin lê zarokên kur di rola bavtî da ne û diçin kar. Çinku di sîstema pederşahî da dema jin bi karên malê ra eleqedar dibin mêr jî li derve dixebitin (Görücü Öner, 2021: 111-112).

Di destanan da lehengên ji hev gelek hez dikin exlebî nagehijin hev, eger bigihîjin hev jî piştî demeke nêz lehengek an jî her du leheng dimirin. Lewra di destanên kurdî da jin wekî hevjîn zêde derbas nabe.

Di nav destanan da jin wekî hevjîn di destana Zembîlfiroşî da derbas dibe; di nav hikayeyên gelêrî da hevjînbûna jinê di Gulperî, Mîrza Axayê Rindikî û Têlî Eyşan, Senem Xanim û Hiseyn da derbas dibe.

Di destana Zembîlfiroşî da Zembîlfiroş kurê mîr e û gelek dewlemend e. Zembîlfiroş rojekê li ber qebrekê ra derbas dibe û rastîya mirinê tê bîra wî. Ew biryar dide ku êdî di rêya Xwedê da bi keda destê xwe bixebite, lewra dev ji mal û milkên xwe berdide, jîyana xwe yê dewlemend diterikîne. Biryara xwe bi jina xwe ra parve dike û dibêje eger tu bixwazî bibî şirîkê jîyana min a feqîr li ba min bisekine wekî din eger tu nexwazî dev ji dewlemendîyê berdî ew çax em ê veqetin. Jina wî dibêje çawa ku di rojên xweş da digel te bûme ez ê di rojên zehmet da jî digel te bibim (Gernas, 1995: 849; ji Bayezîdî vgh. Samur, 2012: 130). Jina Zembîlfiroşî bi vî awayî wî tenê nahêle û bi hev ra dest bi jîyaneke nû dikin. Di jîyana wan a zor û zehmet da rojekê Qedîmxas Xatûna jina mîr Zembîlfiroş dibîne û jê hez dike. Ew dikeve pey Zembîlfiroşî lê Zembîlfiroş wê red dike. Qedîmxas Xatûn dixwaze digel Zembîlfiroşî razê û diçe ba jina Zembîlfiroş û pê ra diaxive. Qedîmxas: "*Elê, were ezê van k'incê xwe, zêr-zebelê xwe bidime te, lê tu îşev bihêl, ez herim, t'ev mêrê te razêm.*" (Celîl û Celîl: 1978: 193-194). Elê teklîfa Xatûnê qebûl dike û kincên xwe diguherînin. Tê zanîn ku Zembîlfiroş selikan çê dike û difroşe, bi vî awayî debara mala xwe dike. Yanî rewşa wan a aborî nebaş e. Dema Xatûn teklîfeke wisa dike timaya dinê li Elê kar dike û ew jî qebûl dike.

Di Gulperîyê da Narinc jina Axayê Behdînanê ye. Ew girêdayê mêrê xwe ye. Dema Axa Narincê digel seydayî dişîne Cizîra Botan seyda di rê da destdirêjîya Narincê dike lê Narinc bi tu awayî qebûl nake û nahêle ku daxwaza seydayî pêk bê. Seyda Narincê bi kuştina her sê zarokên wê tehdit dike lê dîsa jî Narinc îqna nake. Seyda her şev zarokekî/ê Narincê dikuje lê Narinc dîsa jî xwastina seydayî qebûl nake û dibêje ez namûsa xwe nalewitînim (Amêdî, 2013: 382-385). Em dibînin ku jina zewicandî di vê destanê da girêdayî mêrê xwe û namûsa xwe ye; ew herçiqas mecbûr

mabe ku berdêlên giran bide jî dîsa li ser qerara xwe sekinîye û teklîfa seydayî qebûl nekirîye.

Di Mîrza Axayê Rindikî û Têlî Eyşanê da sê heb jinên Mîrza Axa hene. Lê ew dikeve pey jineke din. Dema jinên wê vê rewşê seh dikin ji berdevkê axê ra dibêjin em ê dozdeh kîs pere bidin te eger tu ji axê ra bêjî ew jin pîs e (Amêdî, 2013: 224). Her sê jinên axê pere didin berdevkê ku ji axa ra di derheqê Têlî Eyşanê da tiştên xirab bêje. Di heman destanê da jineke din jî heye. Mîrdîs Xatun. Ew jina Ebdulhey Begê Mirdasî ye. Dema dengbêj diçin mala wê ew wekî dîyarî hespekî navdar û çar kîs pere telkîfê dengbêjan dike lê dengbêj qebûl nakin. Mîrdîs Xatun li ber xwe dikeve û ji bo navê mêrê xwe xemgîn dibe. Ew dibêje ditirsim ji bo Ebdulhey Beg gotinên nebaş bêjin û di odê kurê bavan da bi neqencî pesnê wî bidin (Amêdî, 2013: 227). Li vir Mîrdîs Xatun ji bo navê mêrê xwe xemgîn dibe. Ew ditirse ku dengbêj biçin welatên din û di derheqê mêrê wê da gotinên nebaş bêjin.

Di Senem Xanim û Hiseynî da wekî hevjîn Senem Xanim derbas dibe. Ew girêdayî hevjînê xwe ye û piştî çûyîna wî bi salan li benda wî disekine. Senem Xanim ji rewşa xwe gilî û gazindan nake û ji halê xwe razî ye (Kaplan, 2018: 141-144).

3.1.3. Jin Wekî Dayikê

Dayiktî di civakên pederşahî da erka sereke ya jinan e. Jin encax piştî bûyîna hevjîn û dayiktîyê dikarin di nav civakê da cih bigirin û xwe destnîşan bikin. Dayiktî di nav van civakan da di “xweza”ya jinan da heye. Di her serdemê da ji bo dayiktîyê pênaseyên cuda hatine kirin û bi vî awayî dayiktî wateyên nû bi dest xistîye. Jin çawa ji dayik dibin ji bo dayiktîyê bi rolên zayenda civakî tên amadekirin. Lewra dayiktî dîyardeyeke wisa ye ku di wateya çandî û civakî da bi awayekî dubare tê avakirin. Jin bi taybetî piştî dayikbûnê di nav civakê da rêzbartir û xwedî statû dibin. Statûya wan dayikên ku zarokên kur anîne zêdetir e. Çinku zarokên kur garantîya paşerojê ne. Berdewamîya neslê di destê wan da ye. Eksê wê jinên bêzarok an jî yên ku zarokên kur neanîne ji alîyê civakê ve tên vederkirin. Ev jî dibe sedem ku jin xwe bê qîmet û kêm hîs dikin. Lewra anîna zarokan û dîtina rêzê ji bo jinan du tiştên pev ve girêdayî ne. Di malbatên kevneşoparêz da tê xwastin ku jin bi rola dayiktîyê ji bo hevjîn û zarokên xwe fedakarîyê bike (Görücü Öner, 2021: 92-109; Kılıçoğlu, 2016: 23).

Di nav destan û hikayeyên gelêrî yên ji bo xebatê hatine bijartin da jin wekî dayikê kêm cihan derbas dibin. Em di nav van destan û hikayeyên gelêrî da rastî dayikbûna jinê tên: Kela Dimdimê, Binefşa Narîn, Kerr û Kulik, Stî û Ferx, Elo Şêxanî û Fatimê, Zelbîlfiroş, Gulperî, Senem Xanim û Hiseyn, Mîrza Axayê Rindikî û Têlî Eyşan.

Di destanan da karaktera dayikê bi du awayan derdikeve pêşîya me. Ew hem dayika lehenga jin e hem ji dayika lehengê mêr. Di destanan da dayik bi piranî bi awayekî pasîv cih digirin. Di gelek destanan da behsa dayika lehengê/î nayê kirin an jî eger behs bê kirin jî navê dayikê derbas nabe. Eger em ji alîyê dayik-keç an jî dayik-kur lê binêrin em ê bibînin ku di navbera wan da pêwendîyên bihêz tune ye. Lê dîsa jî hin mînakên destanên wisa hene ku dayikên lehengan di dayîna biryarên giring ên bi lehengê ra eleqedar da cih digirin. Di destana Kela Dimdimê da Xanê Çengzêrin di çêkirina kelhê da bi dayika xwe dişêwire û li gor gotina dêya xwe hereket dike. Dîsa di destana Xelîl Begî da dêya Tîlî Eyşanê di dayina keça xwe da xwedî gotin e. Dema bavê Tîlî Eyşanê ji Xeloyê xulam bawer dike ku ew Xelîl Beg e dêya Tîlî Eyşanê Xeloyê xulam diceribîne û bi saya dayikê dizanin ku ew ne Xelîl Beg e. Em ji van mînakan jî dibînin ku dayik di dayîna biryarên giring da hin caran rol leyîstine.

Di destanan da dayik bi awayekî biaqil, zana, jîr, rêber û fedakar derdikevin pêşberî me. Dayik xetereyan hîs dikin lewra zarokên xwe hişyar dikin û şîretan li wan dikin. Di destana Kerr û Kulikî da dema Werdeka dêya lehengan seh dike ku Kerr û Kulik ji bo Bilêcana Elîsarê Gêsî çûne û eger Bilêcanê bînin dê Emer Axa keça xwe ya bi navê Perîşanê bide Kulik dixwaze zarokên xwe ji rê vegerîne. Lê Kerr û Kulik bi biryar in û dê herin. Ew çax Werdek şîretan li zarokên xwe dike û ji wan ra dibêje li ser rêya we karxezal hene wan nekujin, nêçîra wan ji bo we nebaş e; hespên we bila ava golegenîya venexwin. Dayik bi vî awayî şîretan li zarokên xwe dike ku tiştekî xirab neyê serê wan. Ew dizane di rê da dê çi derkeve pêşîya zarokên wê û lewra bi şîretan dixwaze zarokên xwe biparêze.

Di destana Kela Dimdimê da dêya Xanê Lepzêrîn Le'lîxan hertim alîkarîya kurê xwe dike û rêya rastî nîşanê wî dide. Dema di navbera Xan û Şah da şer diqewîme û leşkerên Kurd hemû dimirin dêya Xanî di nav kelê da bûye. Leşkerên Ecem diçin nav kelê û li kelê dinêrin. Di wê navberê da dêya Xanî agir berdide barûtan û Kela

Dimdimê li ser serê Eceman hildiweşe û hemû leşkerên Ecem dimirin (Kaplan, 2019: 117). Em dibînin ku dayik fedakarîyeke gelek mezin dike û ew jî digel leşkerên Ecem rihê xwe teslîm dike.

Di destana Binefşa Narîn da Derwêş Axa bav û birayên Binefşê dikuje û bi darê zorê Binefşê mehr dike. Salekê derbas dibe û kurek ji Binefşê ra çê dibe. Binefş navê kurê xwe dike "Cembelîyê kurê mîrê Hekarîya" (Celîl û Celîl, 1978: 184). Em dibînin ku hezkirina Binefşê di dilê wê da dimîne. Herçiqas nagîhîjin hev jî Binefş navê hezkirîyê xwe li kurê xwe didane û wî ji bîr nake.

Di destana Kerr û Kulikî da navê dayika wan wekî Werdek, Werdê derbas dibe. Dema Silêmînê mêrê wî rehmet dike Werdek digel her du kurên xwe Kerr û Kulik dimîne. Piştî mirina bavê Werdekê birayê mezin Elîsar dibe axayê êlê û birayên Werdekê êdî bi awayekî baş li zarokên wê nanêrin û Werdek ji wê rewşê pir aciz dibe. Dibêje ya baş ew e ku em van deran biterikînin û biçin nav êl û eşîra bavê zarokan. Werdek ditirse ku piştî salan di navbera bira û kurên wê da bûyerên nexweş biqewimin. Ew zarokên xwe hildigire û berê xwe dide nav eşîra Silêmîn û diçe ba Emer Axa bi cih dibe. Çavên Werdekê hertim li ser zarokên wê bûne (Aras, 2022: 15-17). Em dibînin ku dayik ji bo zarokên xwe fedakarîyên mezin dikin û êl û eşîra xwe diterikînin. Werdek dayikeke pir dilsoz e û ew naxwaze tu xirabî bê serê zarokên wî. Dema kurê wê Kulik biryara çûnê ya ji bo hespa Cancan/Bêcan dide ew naxwaze lê nikare wî ji rêya wî vegerîne. Ew dema dibîne ku Kulik bi biryar e û dê digel Kerr biçe ew çax şîretan li zarokên xwe dike û rêya rast dide ber wan ku tiştên xirab neyê serê wan (Cindî û Evdal, 2008: 109-113). Ew ji zarokên xwe ra hem dayiktî hem jî bavtî dike. Werdek dema çûna kurên xwe dibihîse radibe çekên mêran li xwe dike, li hespê siwar dibe û berê xwe dide konê Emer Axa. Ew bê tirs û bê destûr dikeve konê Emer Axa. Ev bi awayekî hêrs ji Emer Axa ra dibêje te çima kurên min şandin? Min êtimên xwe anî ba te, tu pismamê bavê wan î, divê wan biparêzî lê tu wan dişînî şerê hatin-nehatinê (Aras, 2022: 33-34). Em dibînin ku dema mijar dibe zarok dayik bê tirs derdikevin pêşîya axayan û gazindên xwe dikin. Werdek diçe mala xwe lê tebata wê nabe. Radibe dîsa çekên mêran li xwe dike û siwarê hespê dibe û dikeve pey kurên xwe. Werdek li ser rê li cihekî rastî wan tê û li wir hêvî û lava dike ku kurên wî vegerin lê ew bi tu awayî îqna nabin. Werdek dibîne ku çare tune radibe hin şîretan li wan dike û vedigere diçe mala xwe. Hişê wê dimîne ser kurên wê. Werdek radibe ji birayên xwe ra

nameyekê dinivîse ku xwarzîyên xwe nekujin. Elîsarê Gêsî birayê Werdekê ye û ev şer şerê xal û xwarzîyan e (Aras, 2022: 42-59). Dayik ji bo xelasbûna zarokên xwe hemû rêyan diceribîne.

Di destana Sitî û Ferxî da dema jina Silêman Beg dibihîze ku Ferx çawa ji dayik dibe li ser Sitî kilaman dibêje pir hêrs dibe. Dibêje Ferx mezin be ew ê bikeve pey keça min. Ji ber ku bavê Ferxî rehmet kirîye jina Silêman Beg dibêje ew sêwî ye, kesî wî tune ye dê çawa li keça min binêre. Lewra radibe ji qerwaşa xwe ra dibêje here Ferx biavêje cihekî, bila winda be (Celîl û Celîl, 1978: 204). Li vir armanca dêya Sitî ew e ku keça xwe ji Ferx biparêze. Lê li alîyekî keça xwe diparêze û li alîyê din jî dixwaze zirarê bide zarokekî din.

Di destana Sitî û Ferx da navê dêya lehengan derbas nabe. Ew wekî jina Silêman Beg, jina Mistefa Beg, jina Xelîfe û jina Hadî (Celîl û Celîl, 1978: 203-213; Amêdî, 2013: 52-83), jina Adîyan, jina mîr, jina mîrê Bexdayê (Cindî, 2016: 117), jina Hadî, dayka Sitîyê (Kaplan, 2019: 182, 186, 210) derbas dibin.

Di destana Elo Şêxanî û Fatimê da wekî dayik jina Hesen Efendî Fatimê derbas dibe. Dema Hesen Efendî ji xulamên xwe bawer dike ku Elo çûye rûyê keça wî Fatime sî heb şivê bîya dixwaze û li ser bedena Elo wan şivê bîyan dişkîne û Elo diavêje zîndanê. Jina Hesen Efendî vê neheqî û bêbextîyê qebûl nake û ji Hesen Efendî ra dibêje eger tu Elo ji zîndanê dernexî êdî ez li ba te nasekinim û ez ê herim mala bavê xwe. Hesen Efendî ewil guhdarîya jina xwe nake. Fatimê zarokên xwe dihêle û diçe mala bavê xwe. Paşê Hesen Efendî poşman dibe û Elo ji zîndanê derdixe (Celîl û Celîl: 1978: 214-216). Em dibînin herçiqas Fatimê dêya Elo Şêxanî nebe jî dîsa dilê wê pê diêşe û li hember bêbextîya xulaman û Hesen Efendî disekine.

Di destana Zembîlfiroşî da Elê jina Zembîlfiroşî ye û zarokên wan hene. Dema Zembîlfiroş ji bo firotina zembîlan diçe û xwarin nayne Elê digirî û dibêje zarokên me dê ji birçîbûnê bimirin (Cindî û Evdal, 2008: 391). Dayik girêdayî zarokên xwe ye û ji bo razana wan a birçî digirî.

Di Gulperî da du jin wekî dayik derdikevin pêşîya me. Ewil em ê li ser dêya Narincê bisekinin. Di destanê da navê dayikê derbas nabe. Ew wekî “dêya wê/dêya Narincê” derbas dibe. Dema seyda destdirêjî li Narincê dike û Narinc naxwaze biçe ba seydayî ew hertim keça xwe sucdar dibîne û dibêje bavê te te emanetê seyda kirîye,

ew çi jî ji te ra bike ez dengê xwe nakim (Amêdî, 2013: 377-379). Lê li vir divê ev xal bê destnîşankirin. Dêya Narincê ji kirinên seyda xeberdar nîne. Narinc dema dibêje ez naxwazim biçim ba seydayî wekî sedem kurê seydayî dide nîşan û dibêje ew ji min nasekine û nahêle ez dersa xwe bixwînim. Ji ber ku dêya Narincê rastîyê nizane ji keça xwe ra dibêje divê tu herî ba seyda û dersa xwe bixwînî. Li alîyê din em Narincê piştî zewaca wê ya ligel axayê Behdînan û çêbûna sê zarokan wekî dayik dibînin. Azmûna Narincê ya dayiktîyê hinek cuda ye. Ew dema digel seyda û du xulaman ji bo dîtina bavê xwe bi rê dikeve di rê da bûyerên xirab diqewimin. Seyda çav berdide namûsa wê û dixwaze Narincê xwe teslîmê seyda bike lê Narinc bi tu awayî xwastinên seydayî qebûl nake. Seyda her şev ji bo kuştina zarokekî/ê wê Narincê tehdit dike lê dîsa jî Narinc ber xwe dide û teslîmê seydayî nabe. Seyda her şev zarokekê/î Narincê dikujîne û bi vi awayî her sê zarokên Narincê tên kuştin (Amêdî, 2013: 382-385). Berdêla parastina namûsa Narincê dibe sebeba kuştina hersê zarokên xwe.

Di hikayeya Senem Xanim û Hiseyn da Hiseyn malbata xwe diterikîne û diçe. Piştî heft salan mektûbek digihîje destê malbatê û di mektûbê da tê nivîsîn ku Hiseyn rehmet kirîye. Dema dêya Hiseyn vê xeberê seh dike ji kerba kurê xwe nexweş dikeve û di demeke nêz da dimire (Kaplan, 2018: 142). Herçiqas Hiseyn rehmet nekiribe jî di nameyê da wisa hatîye nivîsîn û dayika wî rastîyê nizane. Di vê destanê da navê bavê lehengî wekî Mendul Axa derbas dibe lê navê dêya lehengî derbas nabe.

Di Mîrza Axayê Rindikî û Têlî Eyşanê da navê dêya Têlî Eyşanê Mîrdîs Xatûn e. Ew başî û saxîya keça xwe dixwaze. Dema dibîne ku keça wê û Mîrza Axa bi hev ra ne hişyarîyê dide keça xwe ku ji ba Mîrza Axa rabe. Ew dibêje eger bavê te we di vî halî da bibîne dê we her duyan jî bikuje (Amêdî, 2013: 228).

3.1.4. Têkilîya Dayik û Keçikê

Di destanan da têkilîya dayik û keçikê zêde derbas nabe. Dema behsa lehenga jin tê kirin exlebî bavê wê yê li ser navê keça xwe biryarê dide derdikeve pêşîya me. Dayik di dayîna biryaran da zêde xwedî bandor nîne.

Di destana Binefşa Narîn û Cembelîyê Kurê Mîrê Hekarîyê da navê dêya Binefşê derbas nabe. Tenê li cihekî wekî “dêya Binefşê” derbas dibe (Celîl û Celîl, 1978: 180) ewqas. Wekî din di nav destanê da li tu cihê behsa dêya Binefşê nehatîye kirin. Bavê wê wekî Fariz Beg derbas dibe û lê dêya wê pasîv e û di nav bûyerê da rol

nagire. Di varyanta Hecîyê Cindî da (Cindî, 2016) jî ne navê dêya Binefşê derbas dibe ne jî behsa wê tê kirin.

Di destana Sîyabend û Xecê da navê dêya Xecê derbas nabe. Dema behsa Xecê tê kirin wekî ku dê û bavê wê tune ye lê heft birayên wê hene derbas dibe (Celîl û Celîl, 1978:136). Di varyanta Cindî û Evdal da dêya Xecê heye lê navê wê derbas nabe. Tenê wekî "dya Xecê" derbas dibe (2008: 568).

Di destana Xelîl Begî da Perîşan Xanim dixwaze biçe mêrg û çîmanê Sibhangolê hinek bigere. Ji dêya xwe ra dibêje hinek qîz-bûkên pak jî bila digel min bên. Dêya wê: "*P'erîşan-xanim, serê min qurbana serê te be, êla bavê teda t'une ne qîz yan bûk? Kîjan dilê te dixwaze, rabe hilde, here*" (Celîl û Celîl, 1978: 223) dibêje. Dayik daxwaza keça xwe bi cih tîne û xwe dike qurbana keça xwe. Ev jî hezkirina dayikê dide nîşan.

Di destanan da zehfî caran navê dêya lehengan derbas nabe. Di destana Xelîl Begî da jî navê dêya Perîşan Xanimê derbas nabe lê navê bavê wê wekî Emer Axa derbas dibe (Celîl û Celîl, 1978: 223, 226).

Di destana Husên Axa Derbas da di derheqê dêya Narincê da tu agahî nehatîye dayîn. Navê bavê Narincê Husên Axa ye û heft birayên wê hene. Navê birayê mezin Mistefa Beg e, navê birayên din û dêya wê nehatîye nivîsandin (Amêdî, 2013: 250-261).

Di destan û hikayeyên gelêrî yên ku em li ser xebitîn da yan behsa dayikan hîç nehatîye kirin an jî di derheqê têkilîya keç û dayikê da tu agahî nehatîye dayîn.

3.1.5. Têkilîya Dayik û Kurî

Herçiqas di destanan da têkilîya dayik û kurî wekî mijareke sereke derbas nebe jî dîsa di hin destanên kurdî da mînakên vê têkilîyê hene. Dayik exlebî ji bo bextewarîya zarokên xwe ked didin û dixwazin ku zarokên xwe ji talûkeyan biparêzin. Di navbera kur û dayikê da hezkirin û hurmeteke beramber heye. Kur dixwazin guhdarîya gotinên dêya xwe bikin lê hin caran ji bo nîşandana lehengîya xwe li hember dayika xwe derdikevin û diçin şer. Ya ku dibe sebeba xirabbûna navbera kur û dayikan jinên din in. Lehengên kur ji bo jina hezkirî navbera xwe û dêya xwe xirab dikin.

Di nav kêm destanan da em rastî têkilîya dayik û kurî tên. Di destanên wekî Kerr û Kulik û Kela Dimdimê da li ser têkilîya dayik û kurî hatîye sekinîn lê di destanên wekî Memê Alan, Sêva Hecî û Binefşa Narîn û Cembelîyê Kurê Mîrê Hekarîya da pir kêm li ser vê têkilîyê hatîye sekinîn.

Dema dêya Mem xebera çûyîna wî dibihîze pir xemgîn dibe. Ji ber ku dizane eger Mem biçe ew êdî venagere. Dayik ji bo çûna Mem weha dibêje: (Celîl û Celîl, 1978: 97).

"Memo lao, dilê minê p'ir bi k'îne,
P'or û rûyê dê-babê te spine,
Erke tu me herdu extîyara li vêderê bihêlî herî,
Ji îro pêştir emê bimrin, t'ext û Tacê Yemenê wê bimîne bêxudîne.
Erke tu me herdu extîyara li vêderê bihêlî herî,
Xudê bike, nebe miradê te û qîzê hakimê di Botîne."

Dêya Mem naxwaze Mem here, dibêje ji xwe em extîyar in û em ê bimirin lê ev qesr û qonaxa me dê ji xelkê ra bimîne, eger tu me bihêlî û herî hêvî dikim tu negehî miraz û meqseda xwe. Em dibînin ku dema dayik pir aciz dibin çiqas ji zarokên xwe hez bikin jî dîsa nifiran li wan dikin. Ya rastî li vir mirov dikare şîroveyeke weha jî bike. Mem ji bo jinekê dixwaze welatê xwe, qesr û qonaxa xwe, dê û bavê xwe biterikîne û here. Dibe ku li ber çavê dêya Memî jineke ku layiqê van dev jê berdanan tune be û lewra jî gotinên ewqas giran dibêje.

Di destanan da dema behsa dêya lehengan dikin gelek caran navê dayikê derbas nabe. Di destana Memê Alan da dema behsa dêya Memî dikin tenê wekî "*Dya Memê*", "*Diya Memo*", "*Diya Pîr*" (Cindî û Evdal, 2008: 310; Celîl û Celîl, 1978: 97; Lescot, 1942: 62) behs dikin. Navê dayikê derbas nabe. Bi vî awayî tê dîtin ku dayik di vê destanê da zêde xwedî bandor nîne. Lê di destana Kela Dimdimê da navê dêya serleheng Xanê Lepzêrîn/Çengzêrîn wekî Le'lîxan derbas dibe. Bavê lehengê hêj di piçûkatîya lehengî da dimire û lewra navê sermîyana wî dayika wî derbas dibe (Kaplan, 2019: 21). Xan gelek girêdayê dayika xwe ye û di dayîna biryarên giring da bi dêya xwe dişêwire. Xan dema amadehîya şer dike dêya wî Le'lîxan jê ra dibêje:

"*Kurê min here nik Şahî û hindî çermê gayî erdî ji dera hûn çûne rav û seyranê jê bixwaze."* (Kaplan, 2019: 33). Xan jî guhdarîya dêya xwe dike û diçe ba Şah û jê bi qasî çermê gayekî erd dixwaze ku ji xwe ra avahîyekê çêke. Şah jî cihê ku dixwaze dide wî. Xan li wir avahîyekê çê dike û diqedîne. Dêya wî dibêje: "*Kurê min! Divêt berê tu kela xwe biceribînî. Kanê kela te qahîm e an ne.*" (Kaplan, 2019: 43). Xan guhdarîya dêya xwe dike û diçe ji ba Şah top tîne û sê şev û sê roj bê navber top diteqînin lê ji kelhê ra tiştekî nabe. Ew çax ji saxlembûna kelhê bawer dikin. Paşê di navbera Xan û Şahî da şer derdikeve û heft salan dewam dike. Di dawîyê da êdî Xan bê hêz dikeve û mîrên kurdan jî ji bo alîkarîyê nayên hewara wî. Xan bi dêya xwe dişêwire gelo divê çi bike. Dêya Xan Le'lîxan dibêje: "*Kurê min! Destê xwe bide şîrê xwe û tu û laşkera xwe dakevin meydanê. Bi mêranî şerê xwe biken da nav û dengê mêraniya we li dinyayê belav bibît.*" (Kaplan, 2019: 82). Xan jî wisa dike û ew bi mêranî şer dikin û dimirin.

Di destana Cembelîyê kurê Mîrê Hekarîya da Derwêş Axa Binefşê direvîne û pê ra dizewice. Kurek ji Binefşê ra çê dibe û navê wî dikin Cembelî. Binefş ji bo ku Cembelîyê hezkirîyê xwe ji bîr neke û sebra xwe bîne navê kurê xwe jî dike Cembelî. Dema Cembelî tê û xwe digehîne Binefşê binefş kurê xwe yê yek salî di nav dergûşê da dihêle û ligel Cembelîyê hezkirî direve. Heta dema Cembelîyê kurê wê di nav dergûşê da digirî jê ra dibêje: "*Ezê Cembelîyê kurê mîrê hikarîya birevînim/ Bila Cembelîyê biç'ûk bişewite û bip'erite, di dergûşê da bimîne*." (Celîl û Celîl, 1978: 187). Em dibînin ku çavê evîndarê ji xeynî hezkirîyê xwe tu kesî nabîne û dergûşa xwe di wî halî da dihêle û diçe.

Di destana Sîyabend û Xecê da navê dêya Sîyabend derbas nabe. Di varyanta Celîlan da dêya wî wekî "*jina Ah'med*" derbas dibe (1978: 118). Ah'med bavê Sîyabend e. Dêya Sîyabend di du salîya wî da rehmet dike û ji xeynî vê agahîyê di derheqê dêya wî da tiştek nehatîye gotin. Di varyanta Aras da jî tê gotin ku li Silîva nexweşîyek derdikeve û dê û bavê Sîyabend, xwişk û birayên wî tev dimirin û kes ji wan namîne. Sîyabend di heşt salîya xwe da tenê dimîne û dikeve ber destê ap û amojinê. Li vir jî di derheqê dêya Sîyabend da agahîyek nehatîye dayîn (2023: 7). Lewra em nikarin di derheqê têkilîya wan a dayik-kurî da tiştekî bibêjin.

Di destana Kerr û Kulikî da Kerr guhdarîya dêya xwe nake û ji bo anîna Bêcanê bi rê dikeve. Elî Emer Axa seh dike kû hespekî Hesê Sadiqê Gêsî heye û dixwaze wî hespî bi dest bixe. Ji bo anîna hespê keça xwe Perîşanê pêşkêş dike û dibêje kî Bêcanê ji min ra bîne ez ê keça xwe ya bedew bidim wî. Kulik dikeve binê vî barî. Dêya wî Werdek herçiqas nexwaze jî nikare kurê xwe ji bo mayînê îqna bike. Ew çax hinek şîret li kurê xwe dike ku serê wî nekeve belayê: "*Lawo, hûn diçin, pêşya cihêzê qîza megrin û medine ser karê xezala. Miqat bin. Sosik ava req-beqa nexwe*." (Cindî û Evdal, 2008: 111). Lê paşê tê dîtin ku Kerr û Kulik guhdarîya dêya xwe nakin. Kulik di rê da xezalek dibîne û wê xezalê digire û serjê dike. Paşî bi şev radizên û Sosik diçe ava req-beqa vedixwe û diwerime. Sosik ji ber ku ava pîs vedixwe êdî wekî berê nabe. Kulik dema Bêcanê direvîne heft kurên Hesê Dudê dikevin pey Kulik û şer dikin. Ji ber ku Sosik nexweş e Kulik nikare bi dilê xwe şer bike, têk diçe û tê kuştin (Cindî û Evdal, 2008: 113). Li vir em giringîya şîretên dayikan dibînin. Kulik li gor şîretên dêya xwe hereket nake û lewra tê kuştin. Lê di dawîya destanê da em dibînin ku ji bo dayikê herçiqas mirina Kulik zehmet be jî ew li alîyekî din ditirse ku Perîşan nebe bûka wê. Ew bi awayekî lez diçe ba Emer Axa û keça wî ji bo kurê xwe yê din Kerro dixwaze û tîne (Cindî û Evdal, 2008: 113). Li vir em dibînin ku statu ji bo lehengan pir giring e. Perîşan dema bibe bûka wan dê statuya wan a civakî bilind bibe û ew ê bibin xizmê axayê eşîrê.

Di destana Sêva Hecî da Mîr Mehmûd di xewnê da Sêva Hecî dibîne, gustîlkên xwe diguherînin û sozê didin hev. Mîr Mehmûd dema ji xew şîyar dibe û gustîlka di tilîya xwe da dibîne ji dêya xwe ra dibêje ez ê ji bo Sêva Hecî biçim T'uris Xemsê. Dêya wî naxwaze Mîr Mehmûd biçe û jê ra dibêje rêya T'uris Xemsê zehf dûr e, rêya heft qonaxan e lê Mîr Mehmûd dîsa li ser gotina xwe disekine û dibêje ez ê rêya heft qonaxan di rêya qonaxekê da biqedînim. Dêya wî radibe hespê wî gem dike, zîn dike, xurceke tijî zêr dide kurê xwe û paşê wî dişîne (Celîl û Celîl, 1978: 166). Xuya dike ku herçiqas dayik çûna kurê xwe nexwaze jî dîsa li ber wî nabe asteng û di çûna wî da dibe alîkar.

3.1.6. Jin Wekî Zarokê (Weled)

Jin wekî zarok di nav gelek destanan da derbas dibin. Çend ji wan destanan ev in: Siyabend û Xecê, Binefşa Narîn û Cembelîyê Kurê Mîrê Hekarîya, Dewrêşê Evdî, Kerr û Kulik, Stî û Ferx, Evdilrehman Axayê Zorbaşî, Sêva Hecî û Xelîl Beg.

Di nav jîyana pederşahî da tişta ku ji zaroka keç tê xwastin îteat e. Dê û bavê wê li şûna wê biryarên giring didin û ew jî dengê xwe nake. Bavê wê kê bixwaze keça xwe dide wî û ew keç jî qebûl dike. Di nav çanda kurdan da jî rewş bi vî awayî bûye. Keç ji halê xwe razî bûne (Bayezîdî, 2010: 147). Lê dema em destanên kurdî dinêrin em dibînin ku hin caran rewş diguhere û jin di biryarên bi wan ra eleqedar da dibin xwedî gotin û kes nikare wan bi darê zorê bide yekî ku ew naxwazin. Di destana Binefşa Narîn da dema Dewrêş Axa dixwaze bi Binefşê ra bizewice Fariz Beg ji keça xwe dipirse paşî biryar dide (Celîl û Celîl, 1978: 180; Cindî, 2016: 68-69). Binefş naxwaze û wê bi darê zorê nadin Dewrêş Axa. Di destana Sîyabend û Xecê da dê û bavê Xecê tune ne lê heft birayên wê hene. Dema Sîyabend dixwaze bi Xecê ra bizewice ji birayên wê Xecê dixwaze. Birayên Xecê: "*Herêye, me jî weke te, bedew, fêriz û p'elewan ne dîtye li dinê ye, Xua me ko bivê, me jî divêye*." (Celîl û Celîl, 1978: 136) dibêjin. Di varyanta Aras da jî bira fikra xwişka xwe dipirsin paşê biryara dayînê didin. Sîyabend ji birayê Xecê re: "*Filankes, ez çi ji we veşêrim çi ji Xwedê, ez ku hatim vir, min xûşka we dît, min ew heband. Bi qewlê Xwedê, bi edetê dunê, ez xûşka we ji xwe ra dixwazim*." Birayê mezin: "*Xwedê ku qeder kiribe emê çi bêjin, ma qey emê wê bidin xortekî ji te çêtir! Ez bi xûşka xwe ra xeber dim, heke ku dilê wê jî hebe, hay hay!..*" Bira ji Xecê dipirse û Xecê jî: "*Ezê xortekî ji Siyabend çêtir bibînim qey, ez jî dixwazim.*" (2023: 30) dibêje. Piştî erêkirina Xecê wê didin Sîyabend û giringîyê didin fikra xwişka xwe. Bê wê qerara zewaca wê nadin. Di destana Dewrêşê Evdî da bavê Edûleyê ji bo serkarîya artêşê keça xwe diavêje mazatê û Edûle dengê xwe nake û qebûl dike (Şirin, 2021: 45). Lê li vir divê ev jî bê zanîn ku Dewrêş û Edûle hezkirîyên hev in û di dawîyê da eger Dewrêş bi ser keve ew ê bigihîjin hev. Di varyanta Celîlan da (Celîl û Celîl, 1978: 281) Edûle dema dibîne ku bavê wî di tengasîyê da ye ew diçe û ji bavê xwe ra dibêje min biavêje ortê ku Dewrêş bê û serkarîya artêşê bike. Çinku serkarîya artêşê gelek dijwar e û kes newêre û naxwaze bike. Edulê ji Dewrêş bawer e û ew dizane ku dê Dewrêş ji bo wê bê û şer bike. Bavê

Edûlê Zor Temir Paşa xwastina keça xwe qebûl dike û li gor gotina keça xwe hereket dike. Li vir xuya dike ku zarokên keç hin caran di dayîna biryarên giring da cih girtine.

Di destanan da gelek caran keç ji bo xwastinên bavên xwe hatine pêşkêşkirin. Di destana Kerr û Kulikî da jî rewşeke weha heye. Emerê Simayîl Axa ji keça xwe Şemsîxan ra dibêje ku:

> Qîza min, tu ne xortekî pêşkêşî, bi fesalî, bi xizn û cemalî ku ez sîlehekî biavêjim milê te, ji bo ku tu terş û talanan ji min re vegerîne. Tu ne çekeke sipehî ye ku ez te bikim ber bejna xwe. Qîza min tu ne guleke ku ez bêhn bikim. Kîngê be jî te layîqî kurebavekî, ciwamêrekî bibe û bi ser oxira xwe de here. Hema niha rabe ser xwe, ji îşev çêtir tune ye, xeml û xêla xwe li bejn û bala xwe wergerîn, qîza min, fincaneke zêrê zeytûnî di destê xwe de deyne û di meclîsa bavê xwe de here û were (Cizîrî, 2020: 189).

Di dewama axiftinê da Simayîl Axayê Milî dixwaze ku yekî fîncana di destê Şemsîxanê da hilîne û biçe Cancana Elîsarê Gêsî jê ra bîne. Bav keça xwe ji bo hespekê diavêje mezatê. Li vir ya giring encam e. Yê ku biçe û bîne giring nîne bo wan çinku Şemsîxan dibêje yekî heftê salî be jî ez qayîl im. Em dibînin ku keç ji bo bavê xwe, xwastinên bavê xwe xwe nezir dike û dengê xwe jî dernaxîne û nabêje na! Ji ber ku ev hatîye hînkirin. Bav û bira ji bo keçan çi bixwasta ya rast ew bû û nabe ku keç dengê xwe bikin an jî bêjin em naxwazin (Bayezîdî, 2010: 147). Şemsîxan daxwaza bavê xwe bi cih tîne û diçe xemla bîst û pênc bûkan li xwe dike û tê civatê û li gor xwastina bavê xwe xwe pêşkêşî yekî dike ku biçe û wî hespî ji bavê wî ra bîne.

Di destanan da keç herçiqas zarokên beg û axayan bin jî ew dîsa bi karê malê ra eleqedar dibin. Diçin bêrîyê, kincan dişûn. Di destana Stî û Ferxî da berîvanên mala bavê Sitî tune bûne. Sitî sîtila xwe hil dide digel Ferxî diçe bêrîyê (Cindî, 2016:122). Sitî, her du xwişkên Sitî Naz û Zîn, Ferx hemû bi hev ra diçin rexê Çemê Xumaroyê ku balava xwe bikin (Kaplan, 2019: 193-194). Dema şivanê mala bavê Sitî dixwaze bi Sitî ra bizewice ewil bavê Sitî dibêje na lê paşê dibêje erê. Şivan ji bo teqezkirina dayînê kiras û derpêyê xwe dişîne ku Sitî bişû. Bavê Sitî ji Sitî şûştina kiras û derpêyê şivên dixwaze û ew jî bêdil dişû û wan ji bo şivên dişîne (Celîl û Celîl, 1978: 208).

Keç îtaetê bavê xwe dikin û bavê wan çi bixwaze ew bêdil bin jî dîsa dikin. Di destana Sêva Hecî da Sêva Hecî herçiqas wekî yekê dewlemend xuya bike jî ew dîsa bi karên malê ra eleqedar e. Sêva Hecî diçe nav pez û pez didoşe (Celîl û Celîl, 1978: 159). Dema qîz û bûk tên mala Sêva Hecî şê dişkînin Sêvê li ber destê wan diçe û tê, alikarîya wan dike (Celîl û Celîl, 1978: 167). Sêvê gelekî girêdayî bavê xwe ye. Ji xeynî bavê wê tu kesê wê tune. Dema Sêva Hecî û Mîr Mehmûd digihîjin hev Sêva Hecî ji bo bavê xwe qeytana Hemedanê dixwaze. Bavê wê yekê kal e û çavên wî nabînin. Eger qeytana Hemedanê bînin hem dê çavên wî vebin hem jî dê ew bibe xortekî çardeh salî. Sêva Hecî ji bo bavê xwe mehra xwe nade Mîr Mehmûd û dibêje piştî te qeytanê anî paşê ez ê mehra xwe bidim te (Celîl û Celîl, 1978:160). Em dibînin ku dilê Sêva Hecî dimîne û naxwaze bavê xwe di wî halî da bi tenê bihêle û here. Ew herçiqas hezkirîya Mîr Mehmûdî be jî dîsa bêyî dermanê bavê xwe pê ra nazewice.

Di destana Xelîl Begî da em dizanin ku Perîşan Xanim keça yekî dewlemend e. Ew dema kilaman diavêje ser Xelîl Begî û dibêje "*Konê mala bavê min ser konê xelkê, bîst pênc gava mestire*", "*Ezê derê k'oza mala bavê xwe vekim,/ Jê derdik'eve şesid berx, çarsid karê belî, gozel, çal*" (Celîl û Celîl, 1978: 224). Lê di destanê da em dibînin ku herçiqas xulam û carîyeyên wan hebin jî dîsa Perîşan Xanim diçe malê û malê dide hev. Ew nîvê mala bavê xwe dike dîwan û nîvê malê dike yalê malê. Dema Xelîl Beg diçe konê wan Perîşan Xanim ji xulaman ra nahêle, ew bi xwe dizgîna hespê Xelîl Begî digire, dikeve bin milê wî, wî dibe alîyê dîwanê ku rûne (Celîl û Celîl, 1978: 226).

Di destana Evdilrehmanê Zorbaşî da Feyrûz Xatûn an jî Pîroz lehenga jin e. Ew dema Evdilrehmanê Zorbaşî dibîne dilê wan dikeve hev û soz û qerara xwe dikin yek. Dema em ji alîyê malbatî ve lê dinêrin em dibînin ku Feyrûz Xatûn bavê xwe û birayê xwe qurbanê hezkirîyê xwe dike. Dema Evdilrehman behsa Xanûmanê Çirsî yê bavê Feyrûz Xatûnê dike Feyrûz Xatûn bavê xwe qurbana xwe û Evdilrehman dike (Cizirî, 2020: 119). Dema birayê Xatûnê Buzêd di şer da rastî Evdilrehman tê Xatûn ji Evdilrehman ra dibêje eger tu birayê min nekujî ne aferim ji te ra (Amêdî, 2013: 343). Di vê destanê da tê dîtin ku ji bo lehenga jin a giring saxî û silametîya hezkirîyê wê ye û li alîyê din qurbankirina bav û birayê wê, wê naêşîne.

3.2. ROLÊN MÊRANÎYÊ

3.2.1. Mêr Wekî Hezkirîyî

Di nav hemû destan û hikayeyên gelêrî yên bijartî da mêr wekî hezkirî derdikeve pêşberî me.

Di sîstema pederşahî da mêrê "bihêz" wekî kesekî ku micadele dike û ji bo gihîştina hezkirîyê hemû rêyan diceribîne derdikeve pêşberê me (Akbalık, 2012: 105). Di gihîştina hezkirîyê da asteng an malbata keça ciwan e yan jî mêrekî din e ku ji keça ciwan hez dike û wê dixwaze. Di her du rewşan da jî lehengê mêr divê têkoşînê bike. Li vir lehenga jin jî roleke giring dilîze çinku ew jî ji lehengê mêr hez dike û dixwaze bigihîjê hezkirîyê xwe.

Mêran gelek caran xwastine ku piştî nîşandana hêza xwe bigihîjin hezkirîya xwe. Leheng herçiqas jina hezkirî revandibe jî dîsa bê şerekî bi bav û birayê hezkirîyê ra nexwastîye biçe. Herçiqas derfeta revandina bê şer hebe jî lehengê mêr wisa nekirîye û bê şer wê derê neterikandîye û neçûye. Jina hezkirî çiqas hewil dabe jî dîsa nekarîye hezkirîyê xwe îqna bike ku bê şer birevin û herin. Dema Ebdulrehman Axayê Zorbaşî çûye û Pîroz Xatûn revandîye Pîroz Xatûnê xwastîye ku bê şer birevin û herin. Ebdulrehman Zorbaşî xwastina Pîroz Xatûnê qebûl nekirîye û jê ra gotîye ku: "*Bi serê bavê te kim, ez talanê bavê te jî bînim belkî hewara wa bê, da em şerekî li vê mêrgê bikin ku bê kê bi rex kê berdan, kî qels e, kî çî ye?"* (Amêdî, 2013: 341).

Di gelek destanan da lehengên mêr ewqas bedew in ku yên wan dibînin dibin bêhiş û dikevin erdê. Zîn dema cara ewil Memî dibîne dibêje Mem ewqas qeşeng e ku şewq û şemala wî ji her çar lembeyên odê zêdetir e. Zîn çawa Memî dibîne ne bi dilekî bi hezar dilî wî dihebîne. Ji qeşengbûna Memî, Zîn dike ku bikeve û xwe bi derî ve digire (Celîl û Celîl, 1978: 92). Dema Mem diçe li mala Hesen, Çeko û Qeretacîn dibe mêvan xelkê Cizîra Botan bi hatina wî agahdar dibin. "*Dibên merikî pir î çeleng e, mîna melekan e. Werqasa merîkî şêrîn e, li hev hatî ye, ko emsale wî tune li erda ne*." (Lescot, 1942: 122). Tên li ber derî û penceran temaşê Memî dikin. Mem ewqas bedew bûye ku dema çavê Çawişî li pêşîya mala Qeretajdîn lê dikeve hişê wî diçe û dikeve erdê. Piştî wî çawişî yekî din jî diçe û hişê wî jî ji bedewîya Memî diçe. Dema Qeretajdîn, Çekîn û Efrîn tên û Memî dibînin ew jî ji heybeta Memî şaş dimînin, heta wisa dibe ku sê roj û sê şevan bê navber diaxivin û ji bîr dikin ku xwarin bixwin. Dema

Qeretajdîn, Çekîn û Efrîn behsa bedewîya Memî ji Mîr Sêvdînî ra dikin Mîr Sêvdîn ji wan bawer nake. Qeretajdîn ji Mîr Sêvdînî ra dibêje dema Mem bikeve hundur tu yê ji ber bedewîya wî rabî ser pêyan lê Mîr vê yekê jî qebûl nake. Dema Mem dikeve hundur her kes radibe ser pêyan û Mîr jî radibe. Wekî nîşaneya rabûna wî Qeretajdîn desmala xwe dide binê Mîrî (Cindî û Evdal, 2008: 319- 324; (Celîl û Celîl, 1978: 103; Cindî, 2016: 38-40). Mîr li hemberî tu kesî ranebûye ser pêyan lê ji ber ku Mem ewqas bedew e li hemberî wî şaş dimîne û ew jî wekî her kesî radibe ser pêyan. Dema çavê Mîr li Memî dikeve ezman lê tê birîn û nikare biaxive û li ser hemdê xwe namîne (Kaplan, 2019: 140). Mîr ji bo Memî dibêje ku: "*Ko xelkê Cizîrê wî bibînin, wê gişkî aşiqê bibin, tevî jin û mêrane. Namûsa me wê bikeve ber lingane.*" (Lescot, 1942: 254). Dema li Baxçê Mîra rastî Mem û Bengîn tên ji bo bedewîya wan *"...ne bixwî, ne vexwî li bejn û bala wana binhêrî.*", "*zilamê weke Memo, dinîayê ne heye û ne çê dibe*." (Celîl û Celîl, 1978: 102, 103) tê gotin. Bedewîya lehengê hertim bi awayekî mubalaxayî hatîye gotin û ew wekî kesekî bêhempa û bêemsal hatîye dîtin.

Cembelî ji bo dîtina Binefşê diçe û dibe şivanê Derwêş Axa. Dema qerwaşa Binefşa Narîn tê û şivan dibîne aqil û hiş di serî da namîne. Ji bedewîya Cembelî qerwaş nîvê şîrê xwe dirêjîne û paşê diçe ba Binêfşê. Qerwaş ji Binefşê ra dibêje: "*Mi hê xortekî weke wî delal li dinîyayê nedîtîye. Ji eşqa wîna mi nîvê şîrê xwe rêtîye.*" (Celîl û Celîl, 1978: 185).

Di destana Zembîlfiroşî da gelek caran li ser bedewîya Zembîlfiroşî hatîye sekinîn. Zembîlfiroş bi bejn û bala xwe, bi xweşikbûna xwe bê qusûr bûye (Gernas, 1995: 83). Bedewîya Zembîlfiroş wekî bedewîya Ûsiv pêxember bûye (Celîl û Celîl: 1978: 191). Çawa ku tê zanîn Ûsiv pêxember bi bedewîya xwe ve tê nasîn. Zembîlfiroş jî ewqas bedew bûye ku dema behsa bedewîya wî kirine hertim wî şibandinê Ûsiv pêxember.

Di destana Sitî û Ferxî da dema xwişkên Sitî cara yekem Ferxî dibînin ne bi dilekî bi hezar dilî wî dihebînin. Dibêjin di bedewîya Ferxî da di dinyayê da kes tune ye. Her du xwişk ji bo Ferx kilaman dibêjin lê Ferx evîndarê Sitîyê ye û ew jî bi kilamkî ji wan ra dibêje, "*kula dilê min Sitîya Al e*" (Cindî, 2016:128).

Di destana Sêva Hecî da li ser bedewîya Mîr Mehmûdê Cindî tê sekinîn. Di nava ecnîya û insanan da zilamekî mîna wî bedew û delal tune ye. Mîr Mehmûd û Sêva Hecî layiqê hev in (Celîl û Celîl, 1978: 157).

Evîn lehengan dixe rewşeke wisa ku xwe wekî porkur û hêsîr dibînin. Mem dema biryara çûyînê dide bavê wî naxwaze lê Mem dibêje eger ez neçim ez ê ji kerba bibe'cim. Mem xwe dişîbîne Mecnûn û dibêje: "*Gulê ezim, rih'an tuyî, Leylê tuyî, Mecnûn ezim, Zînê tuyî, hêsîr, p'orkur Memo ezim*." (Celîl û Celîl, 1978: 97).

Di destanan da hin caran lehengên sereke bi şiklekî derasayî tên dinyayê. Di varyanteke destana Memê Alan da Mem bi awayekî derasayî ji dayik dibe. Li kêleka bajarê Muxurzemînê serayeke bi navê Ardawidê hebûye. Qîzekê heft sal li ber wê serayê maye. Rojekê ew qîz dibîne ku sê siwar ser behrê ra tên lê lingên hespê wan şil nabin. Ew siwar tên û ji qîzikê ra dibêjin em delîlê bext û mirazan in û ji bo te hatine. Qîz digel wan diçe. Dema li ser behrê ne qîz têhn dibe û ava behrê vedixwe. Wextê av vexwarinê kefa behrê dikeve dilê qîzikê û qîzik bi wê kefê ducanî dibe. Qizik vedigere ber qesrê û şaş û matmayî dimîne, dibêje ez yekê azeb im dê xelk çi bêje bo min. Gelek caran dixwaze xwe bikuje lê rih şêrin e. Piştî neh meh, neh seet û neh deqîqan zarokek jê ra çê dibe. Ew zarok wekî stêrkan ronahî dide û gelek bedew e. Qîzik nikare lê binêre, zarokê dipêçe û dide ber devê behrê. Al Paşa jî rojekê diçe ber devê behrê, wî zarokî dibîne û lê xwedî derdikeve (Cindî, 2016: 21-23). Destan bi vî awayî dest pê dike û em dibînin ku di jidayikbûna Memî da insûrên derasayî hene. Bi bûyerên dîrokî-dînî ra şibandin hatîye kirin. Bûyera Hz. Meryem ku berî zewacê ducanî dibe û Hz. Îsa jê ra çê dibe (Yağcı, 2023: 63-90) û bûyera Mûsa Pêxember ku dêya wî, wî dipêçe û ji Robara Nîlê ra berdide tîne bîra mirov. Di destanê da bi vî awayî hatîye xwastin ku bê zanîn lehengên sereke mirovên ji rêzê nîn in û di xwe da insûrên derasayî dihebînin. Taybetmendîyeke derasayî ya Memî jî ew e ku dema dixwaze agirê mala Qeretajdîn vemirîne van gilîyan ji agir ra dibêje:

"Herê agiro, ber kelêyo
Nav min û te da agir-şura Xwedêyo
Te ji xanmanê birangê min çi divêyo?
Herê agiro, bê nav û nefes

Bes xaniyê me ra bibaz
Şewata tu ser, usa jî ez.
Herê agiro, bê îtbaro
Te ne mal e, ne jî halo
Bese gur be tev şemalo
Ew Memê min î delal e
Ji ber xwe hilkişand dezmale
Avîte nava mêlît agire
Wê sehetê temirand yek care" (Cindî, 2016: 50-51).

Di varyanta Lescot da Hesen hem mala xwe dişewitîne hem jî kurê xwe Celal diavêje nav êgir ku Mîr ser wan ve bê. Mem dema dibihîze ku Hesen kurê xwe avêtîye nav êgir pir diqehire û li ewlîya û enbîyayan bang dike, dia dike û dikeve nav agir. Hinek derbas dibe û Mem ligel kurê Hesen Celal ji nav agirê derdikevin û tiştekî bi kurik nabe û ew agir jî vedimire. Her kes şaş û ecêbmayî dimîne li hemberî vê bûyerê (Lescot, 1942: 304). Xuya dike ku serleheng xwedîyê taybetmendîyên derasayî ye û diayên wî diqebilin. Piştî leyîstina setrencê Mem têk diçe û dixwazin wê biavêjin zîndanê. Beko zincîrek tîne û pê destê Memî girê dide. Mem pif dike zincîrê, ji devê wî agir derdikeve, hesin sor dibe, dihele û dikeve erdê, dibe mar. Beko dema wê marê dibîne ditirse û direve (Lescot, 1942: 320). Mem ewqas bi hêz e ku nikarin wî bi zincîrê jî girê bidin. Mem di zîndanê da xewnekê dibîne. Di xewna wî da ew li bajarê Mixribîyan li ser textê rûniştî ye. Dê û bavê wî, kokimên apên wî, Beglî û kurên giregiran li derûdora wî rûniştine. Kalê wî Emer Beg Şêxê Qureyşîyan jê ra dibêje ku keça Beko hinarek tijî axû kirîye, daye Zînê û ji te ra şandîye. Tu wê hinarê bixwî jî nexwî jî wextê te temam bûye û tu yê bimirî. Zîn jî dê hefteyek piştî te bimire û mirazê we ma dinyaya din. Mem ji xew hişyar dibe Zîn tê û jê ra wê hinara jehrkirî tîne lê xebera Zînê ji tiştekî tune. Mem xewna xwe ji Zîn ra dibêje, Zîn çiqas hêvî û lava dike jî Mem hinarê dixwe û rehmet dike. Li ser mirina Mem heft roj derbas dibin û Zîn jî rehmet dike (Lescot, 1942: 340-356). Em dibînin ku Mem ne mirovekî ji rêzê ye. Ew xwedîyê taybetmendîyên derasayî ye ku di xewnê da mirina xwe û Zînê dibîne. Çawa dibîne bi wî awayî her du jî dimirin. Motîfa xewnê di destana Kela Dimdimê da jî derbas dibe. Xanê Lepzêrîn/Çengzêrîn şevekê di xewnê da dibîne ku roj û heyv bi hev

ra têne mala wî. Xan gelek di bin bandora wê xewnê da dimîne û diçe ba melayekî ji bo şîrovekirina xewnê. Mela jê ra weha dibêje:

> Tu dê gencxaneyeke gelek mezin bibînî. Tu dê bişêy bi saya wê gencxanê heft salan şerê dewletê bikey. Mişext, mêrkûj û mêrxas dê li dora te kom bibin. Navûdengê te dê gelek belav bibît. Tu dê bimirî, lêbelê navûdengê te dê li dinyayê bimînit (Kaplan, 2019: 21).

Em dibînin ku serleheng xwedîyê taybetmendîyên derasayî ne û ew bi rêya xewnan ji paşerojê xeberdar dibin. Çinku xewnê Xanî li gor şîroveyê rast derdikeve û Xan heman tiştan dijî. Xan dema dikeve tegasîyê dia dike û diayên wî diqebilin. Şah ava kelê dide birîn û ehlê kelê bê av dimînin. Xan destê xwe vedike û ji bo barîna baranê dia dike. Herçiqas wextê baranê nebe jî baraneke xurt dibare û ehlê kelhê pir şah dibin (Kaplan, 2019: 74). Ji qebûlbûna diayan xuya dike ku serleheng mirovên ji rêzê nîn in. Xan dema dikeve tengasîyê name dinivîse û ji mîren Kurdan alîkarî dixwaze lê kes nayê hewara wî. Ew çax dêya Xanî jê ra dibêje "*Hewara te îlla ewliya û batinî û minasibên Xudê ne. Duayê bike da ew bêne hewara te*." (Kaplan, 2019: 79). Xan jî dia dike û Xudê diayê wî diqebilîne. Komeke batinîyan di sureta teyran da tên û alîkarîya Xanê Lepzêrîn dikin.

Taybetmendîyeke din a Memî ew e ku Mem ligel çi biaxive ew tişt bersîva wî dide. Di rêya Cizîra Botan da du rê derdikevin pêşberî Mem û Mem ji hespê xwe pirsa rêya rast dike û hesp jî bersiva wî dide. Mem di rê da rastî bilbilekî tê û digel bilbilî diaxive. Bilbil ji xeybê xeberdar e û Mem pirsa dawîya xwe dike. Bilbil dibêje tu yê negehî mirazê xwe û veger bo te çêtir e. Lê Mem dîsa bi ya xwe dike û ji rêya xwe venagere (Kaplan, 2019: 126-129). Li vir hem serleheng xwedîyê tabetmendîyên derasayî ye hem jî hesp û bilbil. Ew heywan hem rêya rastî dizanin hem jî ji paşerojê haydar in û ligel Mem diaxivin. Taybetmendîyeke derasayî ya din jî ew e ku Mem piştî mirinê di nav qebrê da diaxive. Piştî mirina Mem, Mîr diçe ser qebra Mem û silavên Zînê jê ra dibêje. Mem jî bersiva Mîr dide û ligel Mîrî diaxive (Kaplan, 2019: 176-177).

Dewrêş yek ji wan serlehengên xwedîyê taybetmendîyên derasayî ye. Ew dema digel gêsan şer dike bi sedan kesan dikujîne lê tiştekî bi wî ra nabe. Ew heta ku li ser pişta hespê xwe ye şerê xwe didomîne. Lê dema lingên hespê wî Hedman dikevin nav qulê cird û mişkan, lingên hespê dişikên û Dewrêş ji ser pişta hespê dikeve xwarê, siwarên gesî tên û wî didin ber xenceran. Leheng bi vî awayî jîyana xwe ji dest dide (Celîl û Celîl, 1978: 287). Em dibînin ku leheng herçiqas bi hêz bin jî dema tiştek tê serê hespê wan êdî ew jî nikarin ber xwe bidin û têk diçin. Yanî di lehengbûna wan da bandora hespê wan gelek zêde ye.

Sîyabend bi tena serê xwe hezar siwarên kurê mîrê şikakîyan dikûjîne. Ew dema siwaran dibîne ji Xwedê alîkarî dixwaze û Xwedê hêzeke mezin dide wî û ew li hember siwarên şikakîyan bê tirs şer dike û wan hemûyan dikuje (Celîl û Celîl, 1978: 143). Em dibînin ku taybetmendîyên derasayî di destana Sîyabend û Xecê da jî hene. Wekî din mirovekî bi tena serê xwe nikare li hemberî hezar kesan şer bike û wan hemûyan bikuje. Taybetmendîyeke din a Sîyabend ew e ku rêya heft rojan di rojekê da diçe (Aras, 2023: 17). Bê guman li vir divê behsa hespê wî jî bê kirin. Hespên lehengan hespên ji rêzê nîn in û ew rêyên dûr nêzik dikin. Hespê Sîyabend Hêşînbozê Sûrê jî hespeke wisa ye û rêyên dûr nêzik dike.

Di destana Sitî û Ferxî da Ferx xwedîyê gelek taybetmedîyên derasayî ye. Ew çawa ji dêya xwe ra dibe tiştên ecêp dibêje: "*Neh roj, neh mehê min t'emam bûne/ Li min çêbûn dest û rû ne/ Ez aşiqê Stiyê Silêman-begê bûme*." (Celîl û Celîl, 1978: 203). Dema dapîrok dixwazin navka wî bibirîn ji wan ra dibêje hûn ê destnimêja min bişkînin. Dapîrok matmayî dimînin û dibêjin ev ne însan e, cin e. Paşê Ferx dest bi kilamgotinê dike. Ew ji bo her mehê xwe kilamek dibêje û bi vî awayî heta neh mehê xwe dewam dike. Dapîrok ditirsin dibêjin ev yekî sihirker e û dixwazin ku ew bimire. Radibin wî dipêçin û diavêjin nav hewşa dewaran ku dewar pê lê bikin û bimire. Dema Ferxî dibin nav dewaran Ferx li wir kilamek diavêje ser heywanan û heywan hemû kom dibin û bi hilma xwe ew germ dikin û tiştekî jê ra nabe. Roja din dibînin ku Ferx çûye nav landika Sitîyê. Bav û dêya wî dibêjin teqez dê û bavê wî ew anîye, hêrs dibin lê dema bi şev nobet digirin ferq dikin ku kesî neanîye û ew ji alîyê Xwedê ve hatîye. Ferx dibe 8 salî bavê wî ew dide ber destê mela ku bixwîne. Ferx aciz dibe û dibêje eger ez ji bo mirina bavê xwe dia nekim tu rehetîya min ji destê bavê min tune ye. Ferx dia dike û bavê wî dimire. Paşê ferx ji bo mirina dêya xwe jî dia dike û Xwedê diayê

wî diqebilîne û dêya wî jî dimire (Amêdî, 2013: 52-60; Kaplan, 2019: 182-189). Dema Sitî û Ferx diçin ba bêrîvanan Sitî dikeve pey mîyekê lê nikare wê bigire. Li wir Ferx kilamek diavêje ser mîyê û mî dema kilamê seh dike disekine. Şivan dikeve pey Ferx ku wî bikuje lê ew bi xwe dimire. Ferx jî ditirse êdî venagere malê dibêje dê mamê min, min bikujîne. Ferx siwarê hespê bavê xwe dibe û berê xwe dide rêya Bexdayê. Xelîfê Bexdayê xalê wî bûye. Di rê da hespê wî pehînan li Ferxî dide û nahêle Ferx siwar be. Ferx li wir çend kilaman diavêje ser hespê paşê hesp dihêle ku Ferx siwar be. Ferx xwe digehîne çîyayê Şengalê lê di rê da berf û baran, mij û moran heye û Ferx rêya xwe şaş dike. Ferx dibêje eger ez kilamekî neavêjim ser vî mijî ew venabe û ez ê rêya xwe şaş bikim. Ferx kilam diavêje ser mijê û mij vedibe (Celîl û Celîl, 1978: 208-210). Em di van hemû mînakan da dibînin ku Ferx bi rêya kilamgotinê û diayê xwastinên xwe bi dest xistîye. Kilamên wî bandor li ser heywanan û hewayê kirîye û ew ji tengasîyê her carî xelas bûye. Ew yekî wisa bûye ku diayên wî qebilîne û dê û bavê wî mirine. Ev hemû taybetmendî taybetmendîyên ne ji rêzê ne û lehengê ji kesên din cuda dikin.

Di varyanteke din a Stî û Ferxî da leheng bixwe navê xwe didane. Ew hêj nû ji dayik bûye ji dêya xwe ra dibêje gazîyê mamê min, mîr û rûspîyan bike. Dema mîr û rûspî tên li ba wan ji mamê xwe ra dibêje te û bavê min we soz dabû hev divê tu Sitîya Al bidî Ferxê Alan (Cindî, 2016: 119). Ferx bi vî awayî hem nav li xwe dike û hem jî soza wan tîne bîra mamê xwe.

Di destana Zembîlfiroşî da wekî taybetmendîyeke derasayî mirov dikare li ser qebûlbûna diayên Zembîlfiroşî bisekine. Dema Xatûn daxwaza bihevrabûnê ji Zembîlfiroşî dike Zembîlfiroş qebûl nake û dixwaze xwe ji kelhê biavêje xwarê. Li wir Zembîlfiroş hewara xwe digehîne Xwedê û Xwedê Teala diayê wî diqebilîne. Emîn Cibrahîl Zembîlfiroş ji kelhê bi awayekî nerm datîne erdê (Amêdî, 2013: 187; Sadinî, 2011: 410). Dema Zembîlfiroş bi awayekî dest vala diçe mala xwe jina wî hêrs dibe û dibêje zarok birçî ne û li benda te ne. Zembîlfiroş ji jina xwe ra dibêje wan dîzikên me bide ser tenûrê dê Xwedê rizqê zarokên me bişîne. Dîzikan didin ser agirê paşê lê dinêrin ku hemû tijî xwarin in. Bi vî awayî dîsa diayê Zembîlfiroşî qebûl dibe (Celîl û Celîl: 1978: 196; Sadinî, 2011: 413). Dema Xatûn tê û dikeve nav cihê Zembîlfiroşî Zembîlfiroş ji dengê xalxalê wê ferq dike ku ew ne jina wî ye. Zembîlfiroş ji nav cihê xwe derdikeve û direve, diçe. Ew di rê da dia dike ku Xwedê rihê wî bistîne û Xwedê

diayê wî qebûl dike, Ezraîlê dişîne û emanetê xwe jê distîne (Amêdî, 2013: 188-189; Gernas, 1995: 90; Kaplan, 2020: 47). Di varyanteke din da Zembîlfiroş dema dibîne ku xilasîya wî ji destê xatûnê tune ye dia dike ku erd biqelişe û ew jî têkeve erdê (Xendekî, 1018: 115). Diayê wî diqebile û dikeve bin erdê. Piştî çûna wî xatûn jî dia dike ku bikeve bin erdê û biçe ba Zembîlfiroş, diayê xatûnê jî diqebile û her du dikevin bin axê.

Evîndar ji bo evîna xwe gelek caran fedakarîyên mezin dikin. Mem dê û bavê xwe yên kal berdide, mal û milkên xwe berdide, îtîbara xwe berdide û dikeve pêy Zînê. Ew di rêya gihîştina yarê da ji mirinê natirse û ji rêya xwe venagere. Mîr ji bo îtîbara xwe ji Zînê hêvî û lava dike ku Memî îqna bike û Mem çar rojan di zîndanê da bimîne. Zîn dema daxwaza mayîna çar rojên zîndanê ji Mem dike Mem ji bo xatirê Zînê qebûl dike û dibêje: "*Xatûn Zîn, ser xatira çavêd belek, zarê şirîn ez dê çil salan biçime zindanê da.*" (Kaplan, 2019: 169). Mem ji bo xatirê Zînê amade ye ku her tiştî bike. Mem dema digel Mîr û destebirayên xwe bêdil diçe şer dixwaze vegere û Zînê bibîne. Ji bo ku Mîr destûr bide lingê xwe bi şûr dibire, xwe birîndar dike û bi vî awayî destûra vegerê distîne (Lescot, 1942: 264). Mem ji bo dîtina Zînê zerarê dide canê xwe lê dîsa jî ji vê rewşê gazindan nake.

Di destana Sêva Hecî da Mîr Mehmûdê kurê mîrê Beraza ji bo Sêva Hecî gelek fedakarîyan dike. Ew ji bo ku xwe bigehîne Sêva Hecî ya hezkirîya xwe çil kîs pere li Dîyarbekirê belav dike ku bikare salixê Sêva Hecî bide. Lê tu kes li Dîyarbekirê salixê Sêva Hecî nade. Ew diçe Misirê û li wir jî çil kîs pere direşîne ku salixê Sêva Hecî bide lê li wir jî kes salixê wê nade. Mîr Mehmûd bê pere dimîne lê dîsa jî ji rêya xwe venagere û dibêje ez di vê rêyê da bême kuştin jî ez venagerim û dikeve pey Sêva Hecî (Cindî, 2016: 90). Dema Mîr Mehmûd xwe digehîne Sêva Hecî astengeke din derdikeve û divê ew qeytana Hemedanê peyda bike ku bikaribe digel Sêvê bizewice. Mîr Mehmûd ji bo qeytanê bi rê dikeve, xurceke zêr xilas dike, dibe yekî hêsîr û feqîr. Dikeve rewşeke wisa ku ji ser pişta hespê xwe dikeve xwarê û nikare xwe ji cihê xwe sist bike (Celîl û Celîl, 1978:160-161). Em dibînin ku lehengên evîndar bêtirs dikevin rêyan ku xwe bigehînin hezkirîyên xwe. Ew herçiqas di rê da perîşan bin jî dîsa ji rêya xwe venagerin. Fedakarîyeke din a di destana Sêva Hecî da fedakarîya şivanî ye. Navê şivanî mala Sêva Hecî Ahmed bûye. Ew yekî dewlemend bûye lê dema aşiqê Sêva Hecî dibe dikeve haleke perîşan. Bavê Sêvê ji bo keça xwe wekî şert qeytana

Hemedanê dixwaze lê dema kes peyda nake wê çaxê dibêje kî ji bo min heft sal şivantî bike ez ê keça xwe Sêvê bidim wî. Ahmed mal û milkê xwe berdide û ji bo Sêvê dibe şivanê mala wan. Dema Mîr Mehmûd rastî şivan belengaz tê dibêje tu berdêla şivantîyê çiqas pere distînî? Şivan weha bersiva wî dide:

> "Sîyaro, lo-lo, sîyarê t'enê,
> De tu bajo, rênga xwe nemîne,
> Herç'ê gava ç'e'vê min ç'e'evê Sêva H'ecê dikeve,
> Rojê sed zêrê zer, çixara mala bavê min namîne,
> Dilo me'rimo, dilo sêfîlo, tu xemsê dilanî." (Celîl û Celîl, 1978: 167).

Em dibînin ku hezkirîyan fedakarîyên gelek mezin kirine, dev ji mal û milkên xwe, statuyên xwe berdane û ji bo gihîştina hezkirîyên xwe bi şivantîyê razî bûne.

Mêrên evîndar ji bo gihîştina hezkirîyên xwe gelek caran bi ya xwe dikin û guhdarîya dê û bavê xwe nakin. Dema Dewrêş dixwaze ji bo bavê Edûlê Zor Temir Paşa şer bike bavê wî naxwaze çinku bawerîya wî bi Zor Temir Paşa nayê. Dewrêş evîndarê Edûlê ye û eger ji bo bavê wê şer bike dê Zor Temir Paşa keça xwe bide wî (Celîl û Celîl, 1978: 283). Dewrêş wekî mirovekî evîndar ji bo Edûlê guhdarîya bavê xwe nake û berê xwe dide warê Edûlê. Diçe di diwana Zor Temir Paşayî da rûdine, fincana qehwê ji destê Edûlê digire û vedixwe. Ew qehwe nîşaneya çûyîna şer e. Kî qehwê vexwe dê bibê dergistîyê Edûlê û serdarê artêşa Milan. Dewrêş dizane ev şer şerê çûn û nehatinê ye lê dîsa jî ji biryara xwe venagere. Ji bo Dewrêş mirina di rêya Edûlê da mirineke bi rûmet e (Filiz, 2021: 46).

Di hin destanan da hezkirîyên lehengên mêr ne yek tenê ye. Destana Sîyabend û Xecê yek ji wan destanan e. Dilê Sîyabend ewil dikeve keça Hesen Axa. Sîyabend li ber derîyê qesrê rûniştîye û dibîne ku Gulperîyê keça Hesen Axa "*Bînaye hîva çarde şevî, avê ko dixo, di gerdena wêda xuya dike. Tu t'ilîpantkê li e'nîya wê dixî, h'etanî binê pe'nîya wê reş û şîn dive. Bîna p'elekî berfa serê ç'îya sor û spî dike*." (Celîl û Celîl, 1978: 127) ye. Sîyabend ne bi dilekî bi hezar dilî ew dihebîne. Dibêje ez ê jê tasek av bixwazim, eger bide min ev tê wê me'nê ku dilê wê jî di min da heye. Gulperî

av nadê û gotinên nexweş jê ra dibêje. Sîyabend hêrs dibe û li Gulperî dide. Em dibînin ku lehengên evîndar dema nagehijin armanca xwe hêrs dibin û tiştên xirab dikin.

Sîyabend dema Xecê dibîne di dîtina ewil da jê hez dike. Xecê keçeke ewqas bedew e ku çawa Sîyabend wê dibîne evîndar dibe û dibêje "*hege sax be ji canê miraye, hege bimire ji boy e'rdêye.*" (Celîl û Celîl, 1978: 136). Em dibînin ku lehengên evîndar ewqas bi biryar in ku dibêjin ji xeynî mirinê tu tişt nikare bibe sedem ji bo gihîştina me. Li alîyê din lehengê evîndar bawerîya xwe bi destebirayê xwe nayne û dema ji bo amadehîya dawetê berê xwe dide Elcewazê ji rê vedigere û tê lingê destebirayê xwe Qeregêtran bi zincîrê girê dide ku Xecê nerevîne. Dema mijar hezkirî dibe, leheng bawerîya xwe bi tu kesî naynin. Sîyabend ji Qeregêtran ra dibêje ku:

"Qeregê'tran, bira, ît'bar nemaye li dinêye,
Ez ditirsim, ko berê min têk'eve rîya Elcewazêye,
Tu Xecê birevînî, ît'bara min li te nayêye,
Ko di dilê teda t'une reh'ma Xudêye,
Ezê lingê te têxime qeydêye,
Destê te têxime darê k'elemçêye,
Mifta qeydê û k'elemçê têxime cebeye." (Celîl û Celîl, 1978: 137).

Ji ber ku destebirayê Sîyabend di mêrxasî û pehlîwanîyê da ji Sîyabend kêmtir nebûye lewra ew tirs ketîye dilê Sîyabend (Aras, 2023:31). Ev kirina Sîyabend dibe sedem ku serê Qeregêtran bê jêkirin. Kurê mîrê şikakîyan bi hezar siwaran ve tê û her heft birayên Xecê dikujin, serê Qeregêtran jê dikin û Xecê direvînin û dibin.

Tolhildan taybetmendîyeke hevpar a lehengan e. Di destana Sîyabend û Xecê da Xecê ji Sîyabend ra dibêje here û heyfa birayên min hilîne, bikeve nava konê mîrê şikakîyan û rihê hemû jîndaran bistîne. Sîyabend guhdarîya Xecê dike û dikeve nava hezar konê mîrê şikakîyan û hemû jindaran dikuje, kesî nahêle (Celîl û Celîl, 1978: 143). Felek dijminê Sîyabend e û Sîyabend dikeve pey felekê. Ew dixwaze heyfa xwe jê bistîne û dibêje: "*Wele ew qasidê Xwedê be jî ez dev jê bernadim. Ezê lê bigerim, wê bibînim û heyfa xwe jê hilînim*." (Aras, 2023: 20). Sîyabend dibêje heta ez dijminê

xwe nebînim dilê min rehet nabe. Ew û destebirayê wî Qedê heta dawîya emrê xwe dikevin pey felekê.

Kulik yekî pir bixurûr e. Dema dixwaze ji bo Cancana Elîsarê Gêsî biçe Şemsîxan derdikeve pêşîya wî û dibêje neçe. Dibêje destê min bigire û min birevîne. Eger tu min narevînî jî li benda birayê min Birahîm û birayê xwe Kerro bisekine û tenê neçe. Lê Kulik qebûl nake û dibêje: "*Wekî ku ez ê Birahîmê birayê te û Keroyê birayê xwe bi xwe re bibim, ma wê gavê namûsa min çi ye*?" (Cizîrî, 2020: 192). Kulik alîkarîya tu kesî qebûl nake û wê jî wekî bênamûsîyekî dibîne. Dema Kulik xwe digehîne konê Elîyê Gêsî diçe cihê hespê. Li wir rastî jinxala xwe tê. Jinxala wî dixwaze alîkarîya Kulik bike û mifta cihê hespê dide wî lê Kulik qebûl nake û miftê diavêje erdê û ji jinxala xwe re: "*Jinxalê, heger tu mifta qeydê bide min, ma wê gavê namûsa min çi ye*?" (Cizîrî, 2020: 195) dibêje. Leheng dîsa alîkarî qebûl nake û wê alîkarîyê wekî bênamûsî dibîne.

Lehengên evîndar û sozdayî li ser soza xwe disekinin. Ferx jî li ser soza xwe ya ku daye Sitîyê disekine. Ferx dema welatê xwe û Sitî diterikîne diçe ba xalê xwe dimîne. Rojekê ew û kurxalên wî Merz û Merzeban bi hev ra diçin rav û nêçîrê. Li wir di Çîyayê Reş da Ferx rastî Gulendam Xatûnê tê. Gulendam Xatûn perîyek e û ji bo Ferxî li wî çîyayî dimîne. Gulendam Xatûn, Ferxî diceribîne, jê tiştan dipirse. Ferx bersivan dizane û di dawîyê da bi ser dikeve. Ew çax Gulendam Xatûn xwe dide nasîn û dibêje ez ji bo te li vir mabûm û divê mehra me bê çê kirin. Lê Ferx qebûl nake û naxwaze, dibêje ku: "*Ez te mar nakem. Ez bi jivan im. Ez sozdayê dotmama xwe Sitîyê me. Heta ez Sitîyê ji vê meselê agahdar nekem, ew qebûl neket, ez te mar nakem.*" (Kaplan, 2019: 201-205). Ferx bi vî awayî li ser soza xwe disekine. Ferx nameyek dinivîse û bi rêya qulingan mektûbê digihîjîne Sitîyê. Ew bi rêya nameyê serborîya xwe ji Sitî ra dibêje û destûra mehra Gulendam Xatûnê jê dixwaze. Name digihîje ber destê Sitî û Sitî nameyê dixwîne û ji Xwedê ra dia dike ku per û baskên wê çêbin û ew biçe ba Ferxî. Xwedê diayê Sitî qebûl dike û baskên Sitîyê çê dibin û Sitî diçe ba Ferxî. Ferx dema Sitîyê dibîne û weha dibêje:

Erê kotirê tu per neqşîn î
Nê tu Sitiya dotmama min î

Xwezî min ji xêr û miradêd Xudê da zanîba
Kanê tu hêj keç î an jî tu jin î (Kaplan, 2019: 207).

Dema Ferx van gotinan dike Sitî gelek aciz dibe û dibêje êdî dîtina min û te heram be, tu careke din min nabînî. Sitî ji wir diçe û Ferx jî ji gotinên xwe gelek poşman dibe û bêhiş dikeve erdê. Sê roj paşê hişê wî tê serê wî lê Ferx dibe wekî yekî heftê salî. Ser û rihên wî di yek şevê da wekî berfê spî dibin. Ferx diçe bajarê Sitî û dibihîze ku Sitî sê roj berê mirîye. Ew jî dia dike û Xwedê rihê wî distîne (Kaplan, 2019: 208-210).

Di varyanteke din a destana Sitî û Ferxî da dema leheng dizewicin Ferx ji Sitî tiştekî dipirse. Dibêje şivanê we ewqas ji te hez dikir gelo rojekê te maçî kir yan na? (Cindî, 2016: 137). Ev gotin zora Sitî diçe û Sitî wî diterikîne, diçe. Ferx ji gotinên xwe pir poşman dibe lê êdî bê feyde ye. Ferx dikeve rêyan, xwe şaş dike, aqil di serê wî da namîne û bi salan gund bi gund, bajar bi bajar digere. Kal dibe, porê wî spî dibe, rojekê dikeve gundê Sitî lê nizane ka gundê Sitîyê ye. Li wir zarok jê ra dibêjin Sitîya Silêman Beg mirîye tu jî here xêra wê belav dikin. Ferx ew çax tê digihîje ku ew gundê wan e û Sitî mirîye. Ferx xwe digehîne ser qebra Sitîyê. Ferx silav dide û Sitî silava wî digire, qebr vedibe, hev himbêz dikin paşê her du jî dimirin. Wan her duyan di nav heman qebrê da vedişêrin (Celîl û Celîl, 1978: 212-213; Cindî, 2016: 137-138). Em dibînin ku tenê gotineke şaş dibe sedema veqetîna lehengan, Ferx gotineke şaş dike û paşê heta dawîya emrê xwe bi rê dikeve û nagehije miraz û meqseda xwe.

Di destana Elo Şêxanî da dema bêbextî li Elo û Fatimê tê kirin Hesen Efendî li Elo dide û hemû bedena Elo reş û hêşin dibe. Fatimê rewşa Elo dibîne û soz dide û dibêje heta sax bim li vê dinyayê ez ji xeynî te ti kesî nastînim. Elo jî weha sozê dide Fatimê:

Lê, lê, lê, lê Fatimê,
Baxçe û bostanê bavê te bi dar kinêre,
Ezê sozekê li ber rebbê xwe bidim
Ji xîna te pêva ez jina naynim,
Ji tera bibime berxê nêre (Celîl û Celîl: 1978: 216-217).

Her du leheng bi vî awayî soz û qerara xwe dikin yek. Sal derbas dibin lê Elo dibe xundkarê Şamê û soza xwe ya dayî û Fatimê ji bîr dike. Piştî deh salan rojekê di xewn da Fatimê dibîne û paşê soza wî tê bîra wî. Elo nameyekê dinivîse û bi rêya başbazirgan nameyê ji Fatimê ra dişîne. Başbazirgan nameyê digihîjîne Fatimê û nameya Fatimê jî jê distîne û dibe. Di rê da başbazirgan dibêje xundkarê me çawa ji vê keçikê hez kirîye û di rê da mektûba wê dişewitîne. Başbazirgan dema diçe ba Elo jê ra dibêje Fatimê dane mêr û keç û kurekî wê hene. Piştî vê xeberê Elo Şêxanî diqehire, derd û kulê wî zêde dibin û dikeve nav cihan. Dikin û nakin Elo naaxive (Celîl û Celîl: 1978: 218). Li vir em dibînin ku başbazirgan Fatimê layiqê xunkarê Şamê nabîne û derewan dike. Li alîyê din jî hişê Elo Şêxanî dereng tê serê wî û piştî deh salan dikeve pey sozdara xwe. Ew dema seh dike ku Fatimê li ser soza xwe nesekinîye û bi yekî din ra zewicîye nexweş dikeve û ti tixtor nikarin wî sax bikin.

Mêrên evîndar bi piranî di xewnê da yekê dibînin û dibin evîndare wê kesê. Ew ji bo gihîştina wê welatê xwe, dê û bavê xwe, mal û milkên xwe diterikînin. Di destana Xelîl Begî da Xelîl Beg dema di xewna xwe da Gozel Xanima xwişka mîrê ereban dibîne bi rê dikeve û xwe digehîne wê (Cindî, 2016: 99-103).

Di destana Husên Axa Derbas da dema çavê Tahir Begî li Narincê dikeve xwarin di gewrîya wî da dimîne. Ew ji berdevkê xwe ra dibêje bipirse gelo zewicandî ye yan na. Dema Tahir Beg hîn dibe ku keça Husên Axa ye dibêje: "*Pa bi Xwedê ew bimirî ji axê re û bimînî ji vî canî re ye.*" (Amêdî, 2013: 251). Bi vî awayî aşiq di dîtina ewil da hez dike û ew bi biryar e ku ji xeynî mirinê ew ê Narincê bistîne. Dema bavê Narincê keça xwe dide Tahir Begî, Tahir Beg dibêje ewil barekî biavêje ser milê min, eger bikarim ji bin wî barî rabim paşê keça xwe bide min. Husên Axa jî ew çax weha dibêje:

> "Tahir Beg, ma ez ê çi bêjim. Hevt birayên wê hene, hevt jin û hesp û şûr û mertal û rim ji wa(n) re. Hevtê gamêş mazmazanê -*bêrîvan*- ji doşana malê re û hevtsed hêstirî Qermanî ji barkirina koçê re û hevt hezar lukê deva ji bavê wê re û hevtê barên xurma ji şîranîya wê re û hevt ser kîsê pera ji berdest û qewraş navmanê re û sê cara keça min berberî -*li ber*- zêra bikî, wekî min tiştek ji te

navê, heme ji bo xwe bi herwe -*belaş*- bibe, min tiştek ji te navê." (Amêdî, 2013: 252).

Tahir Beg diçe destê Husên Axa û dibêje ev tiştên ku te xwastin hemû jî ji destê min tê û li hev tên. Em dibînin ku mêrên evîndar naxwazin bi awayekî rehet bigihîjin hezkirîyên xwe. Ew hertim rêyên zor û zehmet dihilbijêrin. Tahir Beg jî bê şert naxwaze Narincê bi dest bixwe. Mîr Mehmûdê Kulavanî seh dike ku Husên Axa Narincê daye Tahir Begî. Ew radibe digel siwaran êrîşê mala Husên Axa dike. Narinc jî ji bo alîkarîyê nameyekê dinivîse û ji Tahir Begî ra dişîne. Tahir Beg çawa nameyê dixwîne digel hezar siwaran berê xwe dide şer, serê Mehmûdê Kulavanî jê dike û digihîje Narinca xwe (Amêdî, 2013: 256-260).

Di Gulperî da dema çavê seydayî li çavê Narincê dikeve agir dikeve dilê wî û ji xwe ra dibêje ez ê hêdî hêdî wê aş bikim û bi dest bixim. Ev hezkirin hezkirineke yekalî ye û Narinc ji seyda hez nake. Ew gelek caran bi zorî dixwaze xwe nêzikê Narincê bike lê Narinc nahêle û zor bela xwe ji destê seyda difilitîne. Narinc êdî ji bo dersê naçe ba seyda û seyda ji kirinên xwe poşman dibe, dibêje eger bê bihîstin ez ê rezîl bim. Çend rojan seyda bi çaveke din li Narincê nanêre lê dîsa nîyeta xwe xirab dike û dibêje ez ji bo wê bêm kuştin jî dîsa ez ê jê venegerim. Seyda piştî dersdayîna zarokan nahêle ku Narinc biçe û dibêje dersa te neqedîya. Ew dîsa dest dirêjî dike û Narinc tif dike rûyê wî (Amêdî, 2013: 379). Seyda herçiqas ji xirabbûna nîyet û kirinên xwe xeberdar be jî dîsa dev ji Narincê bernade û dikeve pey wê.

3.2.2. Mêr Wekî Hevjînî

Di nav destan û hikayeyên gelêrî da mêr wekî hevjîn kêm caran derbas dibin. Di nav destanan da Zembîlfiroş û Kelam Dimdimê ji bo hevjînbûna mêran destanên mînak in. Di nav hikayeyên gelêrî da Mîrza Axayê Rindikî û Têlî Eyşan, Senem Xanim û Hiseyn, Gulperî wekî mînak dikarin bên dayîn lê di van mînakan da jî hevjînbûna mêran pir kêm derbas dibe.

Di nêrina pederşahî da zewaca mêran a digel çend jinan rewşeke normal e. Herçiqas di polîgamîya mêran da sedemên cuda hebin jî sedema sereke hêz û desthilatîya mêran e (Arsoy, 2011: 71). Dema em li destanên kurdî dinêrin ên wekî poligam derbas dibin bi piranî axa, beg, paşa û mîr in. Ji ber ku hêz û desthilatdarîya

wan heye dibe ku ji yekê zêdetir hevjînên wan jî hebin. Ev rewş normal tê dîtin. Dema behsa wan hevjînan tê kirin îfadeyên wekî "hevjîna mezin", "hevjîna navîn", "hevjîna piçûk" tên bikaranîn. Di gelek cihan da navê wan jinan jî nayê gotin. Di Mîrza Axayê Rindikî da rewş bi heman awayî ye. Sê jinên Mîrza Axa hene û navê jinên wî nayên gotin. Dema behsa jinên wî tê kirin wekî "pîreka axayî ya mezin, ya piçûk, ya ortê" (Amêdî, 2013: 221-222) tê gotin.

Mêr, di bijartina hevjînê da azad bûne. Ew ji alîyê malbatên xwe ve bi zorî nehatine zewicandin. Lê li vir divê em li ser xalekê bisekinin. Dema wextê zewaca lehengê kur tê bavê wî hemû keç û bûkên herêmê dide komkirin ku kurê wî wan bibîne û yekê (dibe ku ji yekê zêdetir be) ji wan ji bo xwe hilbijêre. Lê bi piranî lehengê mêr li wan bijarteyan nanêre çinku di dilê wî da yeke din heye û lewra ew bi wan ra eleqedar nabe. Wekî mînak destana Memê Alan dikare bê dayîn. Bavê Mem Al Paşa dema dibihîze ku Mem aşiq bûye ji derûdora xwe ra dibêje "*Rabin, defa hewarê xin, gazî axa û beglera kin, bona ewana qîzêd xwe bişînin baxe torkirî*" (Cindî û Evdal, 2008: 310). Al Paşa hemû keç û bûkan dide komkirin ku Mem yek ji wan hilbijêre û pê ra bizewice. Li vê derê divê li ser xalekê giring bê sekinin. Hemû jinên bajêr ji bo lehengê mêr xwe dixemilînin û dixwazin bala wî bikişînin. Jinên zewicandî jî di nav da. Ew jî dixwazin bala Memî bikêşin lewra xwe dixemilînin, ji ber Memî ra derbas dibin lê hişê Mem li ser yeke din e û çavê wî kesî nabîne. Li vir jin û mêr ji hev cuda dibin çinku azadîya bijartina hevjinê tenê ji bo mêran derbasdar e, ji bo jinan heman tişt nikare bê gotin.

Mêr wekî hevjîn di destanan da bi du awayan derdikevin pêşberî me. Ya yekem, ew li hemberî hevjînên xwe rêzdar in û di dayîna biryarên giring da bi wan ra dişêwirin; ya duyem ew wekî nûnerên çanda pederşahî ne û qîmetê nadin fikr û ramanên hevjînên xwe (Bal, 2021: 113-114).

Di destanan da jinên lehengan zêde derbas nabin. Çinku serleheng bi piranî nagehijin hezkirîyên xwe û nazewicin. Lê di destana Kela Dimdimê da ku destanekê qehremanîyê ye û evîn zêdetir evîneke neteweyî ye û lehengê sereke Xanê Lepzêrîn wekî yekî zewicandî derdikeve pêşberî me. Ji gotinên wî dîyar dibin ku du heb jinên wî hene. Dema behsa wan dike weha dibêje: "*Xan dibêt jina mezine… Xan dibête jina*

berê..." (Kaplan, 2019: 84). Tenê bi rêya van hevokan em xeberdar dibin ku du jinên Xanî hebûne.

Di destana Zembîlfiroşî da Zembîlfiroş yekî zewicandî ye û zarokên wî hene. Ew girêdayê jin û zarokên xwe, dînê xwe ye. Dema Xatûn jê daxwaza bihevrebûnê dike ew qebûl nake û vê yekê bi dînê xwe û zewicandîbûna xwe ve girê dide (Xendekî, 2018: 112-115). Di varyantekê da Zembîlfiroş xwe wekî êzidî dide nîşan. Ew dema daxwaza Xatûnê red dike dibêje "*ez êzdî me tu surmanî*" (Celîl û Celîl: 1978: 195).

Di destana Zembîlfiroşî da Mîr mêrê Xatûnê ye. Dema Mîr pê dihese ku dilê jina wî ketîye Zembîlfiroşî wekî ceza wan her duyan diavêje zindanê. Mîr di zindanê da kêr diavêje ranê Zembîlfiroşî û wî birîndar dike (Cindî û Evdal, 2008: 392-393). Tê dîtin ku mêr bi tu awayî vê rewşê qebûl nakin. Ne mimkin e ku jina wan ji mêrekî din hez bike yan jî digel wî rabe û rûne.

Di Mîrza Axayê Rindikî û Têlî Eyşanê da dema Mîrza Axa Têlî Eyşanê direvîne jê ra weha dibêje: "*Ez te nadim bi hurî li erda û melaiketêt li ezmana/ Sê jinên min hene ji bona çavê reşbelek min berdane*" (Amêdî, 2013:232). Dema Ebdulhey Begê bavê Têlî Eyşanê pê dihese ku Mîrza Axa keça wî revandîye ligel siwarên xwe êrîşê Mîrza Axa dikin. Mîrza Axa ber xwe dide, leşkerên Ebdulhey Begî belav dike û Têlî Eyşanê li pişt xwe siwar dike û dibe. Mîrza Axa Têlî Eyşanê li xwe mehr dike (Amêdî, 2013: 232-234). Herçiqas sê jinên Mîrza Axa hebin jî dema bedewîya Têlî Eyşanê seh dike diçe wê direvîne û li xwe mehr dike paşê jî her sê jinên xwe berdide.

3.2.3. Mêr Wekî Bavî

Mêr wekî bav di Kerr û Kulik, Stî û Ferx, Evdilrehman Axayê Zorbaşî, Elo Şêxanî û Fatimê, Xelîl Beg, Husên Axa Derbas, Gulperî da derbas dibe.

Di avahîya malbatên pederşahî da bav di pozisyona desthilatdarê malê da ye. Di malekê da eger bav hebe yên din encax piştî destûra wî dikarin tiştekî bibêjin. Divê dê û zarok îteatê wî bikin. Lewra ya ku ji dayik û zarokan tê hêvîkirin ew e ku îradeya wî (bav) qebûl bikin û li hember wî teslimîyetê nîşan bidin.

Peywira bavê ya ku bi hêzê ve hatîye têkildarkirin ew e ku malbata xwe ji hemû talûke û xirabîyên derve biparêze. Wekî serokê malbatê divê debara malbata xwe bike. Bi vî awayî rêzdarî û desthilatdarîya wî ya di mal da çê dibe (Görücü Öner, 2021: 186).

Di gelek destanên kurdî da navê bavê lehengan derbas dibe. Al Paşa (Cindî û Evdal, 2008: 10;), Alan-beg, Alayî-beg (Celîl û Celîl, 1978: 95, 96) navê bavê Memî; Mîr Zêvdîn (Cindî û Evdal, 2008: 308) jî navê bavê Zînê ye. Di destana Kerr û Kulikî da navê bavê Kerr û Kulikî wekî Silêmîn (Aras, 2022: 14), Silêman (Cindî û Evdal, 2008: 109), Silêmanê Madî (Cizîrî, 2020:186); navê bavê Perîşan/ Şemsîxanê wekî Emer Axayê Zengûzêrîn (Aras, 2022: 19), Emerê Smaîl Axayê Milî (Cizîrî, 2020: 188), Elî Emer Axa (Cindî û Evdal, 2008: 109) derbas dibe. Di destana Dewrêşê Evdî da navê bavê Dewrêş wekî Evdî, navê bavê Edûlê jî wekî Zor Temir Paşa (Celîl û Celîl, 1978: 279, 282) derbas dibe. Di destana Cembelîyê Kurê Mîrê Hekarîya da navê bavê Binefşê wekî Fariz Beg debas dibe lê navê bavê Cembelî derbas nabe ew wekî mîrê Hekarîya tê binavkirin. Di destana Sîyabend û Xecê da navê bavê Sîyabend wekî Ah'med (Celîl û Celîl, 1978: 118) derbas dibe lê navê bavê Xecê derbas nabe. Di destana Sitî û Ferxî da navê bavê Sitî Xelîfe navê bavê Ferx jî wekî Hadî (Amêdî, 2013: 52-54; Kaplan, 2019: 182) ye. Di varyanteke din da navê bavê Sitî wekî Silêman Beg, navê bavê Ferxî jî Mistefa Beg (Celîl û Celîl, 1978: 203-204) derbas dibe. Di destana Xelîl Begî da navê bavê Perîşanê wekî E'mer-axa (Celîl û Celîl, 1978:222) derbas dibe. Di destana Husên Axa Derbas da navê bavê Narincê Husên Axa (Amêdî, 2013: 250) ye. Di hikayeya Gulperî da navê bavê Narincê Ehmed Beg (Amêdî, 2013: 376) e. Di Senem Xanim û Hiseyn da navê bavê Hiseyn wekî Mendul Axa (Kaplan, 2018: 141) derbas dibe. Di Mîrza Axayê Rindikî da navê bavê Têlî Eyşanê 'Ebdulhey Begê Mîrdasî (Amêdî, 2013: 222) ye.

Di destana Kerr û Kulikî da navê bavê Kerr û Kulik Silêmanî Madî ye. Ew ewil wekî yekî bêzarok derdikeve pêşberî me û Silêmanî Madî ji vê rewşê gazindan dike. Ew dixwaze kurên wî hebin ku kes nekare tinazên xwe pê bike. Lê paşê di nava destanê da em dibînin ku bi navê Kerr û Kulik du heb kurên wî çê dibin. Ji xeynî van agahîyan di derheqê bavê Kerr û Kulik û têkilîya wan a bav û kurî da tu agahî nehatîye dayîn (Cizîrî, 2020: 186-211). Li alîyê din navê bavê lehenga jin ku di varyantên destanê da Şemsîxan/Perîşan e wekî Emerê Simaîl Axayê Milî derbas dibe. Em di destanê da rastî têkilîya bav û keçê tên. Bav dixwaze Cancana Elîsarê Gêsî yan jî Bêcana Hesê Sadiqê Gêsî bi dest bixwe. Ew hesp pir navdar e û Emer Axa dixwaze bibe xwedîyê wê hespê. Emer Axa ji bo ku xwe bigehîne hespê keça xwe bi kar tîne û jê ra dibêje fincana qehwê li nav odê bigerîne, her kî wê qehwê vexwe û biçe wê hespê ji min ra bîne ez ê

te bidim wî. Keça wî daxwaza bavê xwe qebûl dike û xwastina bavê xwe bi cih tîne, bi vî awayî bûyer dest pê dike (Cizîrî, 2020: 186-211; Cindî û Evdal, 2008: 109-113). Keç di vê destanê da ji gotinê bavê xwe dernakeve û bavê wê çawa dixwaze ew jî wisa dike. Di vê destanê da bavê lehenga jin wekî yekî bihêz derdikeve pêşberî me û ew dixwaze hêza xwe zêdetir bike. Ji bo bihêzbûna xwe daxwaza hespeke navdar dike ku di bedela wê hespê da keça xwe pêşnîyaz dike. Yanî keça xwe ji bo armanca xwe wekî amûr bi kar tîne.

Di destana Sitî û Ferxî da dema Çîvalo tê û dixwaze bibe şivanê mala bavê Sitî bavê Sitî Xelîfe daxwaza Çîvalo qebûl dike. Şivan Çîvalo dibêje ez ê heft sal ji we ra şivantî bikim û hûn jî Sitîyê bidine min. Ewil Xelîfe şertê şivanî qebûl nake, çinku berî jidayikbûna Sitî û Ferxî wî û Hadî soz dabûn hev ku keç û kurê xwe bidin hev. Xelîfe dibêje ji keçên min Eyşok, Fatok, Naz û Qaz tu kîjanê bixwazî ez ê bidim te lê şivan qebûl nake û Sitîyê dixwaze. Xelîfe di dawîyê da teklîfa şivanî qebûl dike (Celîl û Celîl, 1978: 62). Li vir em dibînin ku bav bê xebera keçên xwe wan dide mêr. Ew ji şivan ra navê keçên xwe dihejmêre û dibêje tu kîjan bixwazî ez ê wê libê bidim te. Heman rewş ji bo xalên Ferxî jî derbasdar e. Xalê Ferxî Ûysifê Xanî ji Ferxî ra dibêje sê keçên min hene, Eyşok, Fatok, Nazok. Tu kîjan bixwazî ez ê wê bidim te. Lê ji ber ku Ferx evîndarê Sitîyê ye qebûl nake û naxwaze. Xalekî wî yê din jî dîsa heman gotinan dibêje. Mîr Zeynedînî xalê Ferxî ye û ew jî dibêje du keçên min hene. Qumrî û Zeyneb. Tu kîjan bixwazî ez ê li te mehr bikim lê Ferx wan jî naxwaze (Celîl û Celîl, 1978: 73, 77). Di vê destanê da sê bavên ku keçên wan hene derdikevin pêşberî me û her sê bav jî di dayîna keçên xwe da heman tiştê dikin. Bêyî xeber û daxwaza keçên xwe wan pêşkêşî mêran dikin û mêr jî di nav bijarteyan da kîjan bixwazin bi wê ra dizewicin.

Di varyanteke Sitî û Ferx da bavê Sitî mîrê Bexdayê ye û zêde giringîyê dide malê dinê. Dema yek tê û dibêje ez ê heft sal ji te ra şivantî bikim lê tu yê keça xwe Sitî bidî min, mîr bê xebera Sitî xwastina şivên qebûl dike. Herçiqas Sitî sozdara Ferxî be jî mîr dîsa keça xwe dide şivên. Dema şivan pê dihese ku Sitî û Ferx ji hev hez dikin dixwaze şivantîyê berde lê mîr qebûl nake. Ji bo ku şivanê wan neçe, ewil Ferxî ji mala xwe dike der û nahêle careke din Ferx biçe mala wan. Paşê dîsa şivan aciz dibe vê carê jî mîr kurên xwe dişîne ku Ferxî bikuje. Kurên wî naxwazin kurmamê xwe bikujin dîsa şivan aciz dibe û dibêje ez ê şivantîyê berdim û herim. Ji bo ku şivan neçe vê carê mîr

bixwe şûra xwe hildigire û diçe ku Ferxî bikûjîne (Cindî, 2016: 122-127). Herçiqas Ferx birazîyê mîr û sozdarê Sitî be jî dîsa qîmeta evîna wan li ba mîr bi qasî şivan tune ye. Mîr wekî bav li ser soza xwe nasekine û tu qîmetê nade fikra keça xwe.

Jina Silêman Beg piştî jidayikbûna Ferxî dibêje ku ew kur çawa ji dayik bûye li ser keça min kilam gotîye, dema mezin be em nikarin xwe jê xilas bikin; bavê wî mirîye û ew sêwî ye, ez ê çawa keça xwe bidim wî? Ya baş ew e ku ez wî bidim windakirin. Jina Silêman Beg ji qewraşekê ra dibêje here Ferx bigire û bavêje. Qerwaş jî Ferxî hildigire û dibe, diavêje nav zibilê. Dema dibe êvar gavanek rastî Ferxî tê û dibîne ku zarokekî pak e dibêje ez ê bibim mala xwe bila jina min xweyî bike. Çend roj berê zarokek ji jina gavên ra çê bûye lê ew zarok wekî Ferxî sipehî nebûye, lewra gavan dibêje em ê vî zarokî xweyî bikin û yê xwe biavêjin (Celîl û Celîl, 1978: 204-205). Em dibînin ku ji bo gavên a giring sipehîtîya zarokê ye. Ew dil dide ku zarokê xwe biavêje û yekî din xweyî bike. Li vir wekî bav gavanekî derdikeve pêşîya me ku ew dil dide zarokê xwe yê nû ji dayik bûye biavêje û şûna wî li yekî ji wî sipehîtir xwedî derkeve.

Di destana Evdilrehman Axayê Zorbaşî da bavê Feyrûz Xatûnê Xanûmanê Çirsî dema rastî Evdilrehmanî tê gelekî jê ditirse û naxwaze serê wî bê jêkirin. Jê ra dibêje: "*Ez ê qoçana senedan teslîmî te bikim ku li Heranê kes eleqa xwe ji te neyîne. Hespekî min î sor heye, malxerabo, dê ba ye û bav behrî ye. Qenc e, ew jî bila di bin te de be. Erê, tu box î û beran î, keçikek min heye bila her gav ji bo razana te be*." (Cizîrî, 2020: 122). Di vê destanê da dema bav dikeve tengasîyê ji bo saxîya canê xwe her tiştê xwe feda dike û heta keça xwe jî pêşkêşî lehengî dike. Ew ji bo saxîya canê xwe mal, milk û keça xwe feda dike.

Di destana Elo Şêxanî da navê bavê Fatimê Hesen Efendî ye. Ew ji alîyê sî û yek xulamên xwe ve tê xapandin. Li ser meseleya namûsê ew radibe li Elo Şêxanî dide û wî diavêje zindanê. Di destanan da em gelek caran dibînin ku ji bo namûsê mêr û jin tên birîndarkirin û kuştin. Dema Hesen Efendî dibihîze ku Elo keça wî Fatimê maçî kirîye pir hêrs dibe û dibêje meseleya namûsê nayê qebûlkirin (Celîl û Celîl: 1978: 214-215). Bav li vir ji xulamên xwe pir bawer e lewra ji Elo û keça xwe hîç napirse gelo tişta ku tê gotin rast e yan derew e.

Di destana Xelîl Begî da dema Xelîl Beg diçe mala Perîşan Xanimê bavê wî Emer Axa ne li mal bûye. Dema Emer Axa seh dike ku Xelîl Beg hatîye ewil ditirse dibêje dibe ku talanê me bive. Emer Axa tê û Xelîl Begî dibîne paşê ji êla xwe dipirse dibêje gelo em çi pêşkêşî Xelîl Begî bikin baş e? Ew jî dibêjin Xelîl Beg birazîyê Mehmûd Paşa, xwedîyê Kela Kevirî, axayê êla Zîlîya ye, ew hewceyê malê dinê nîne, eger nezewicandî be em ê Perîşan Xanimê pêşkêşî wî bikin. Emer Axa qebûl dike û dema ji Xelo dipirsin û dizanin ku Xelîl Beg azeb e Emer Axa ji Xelîl Beg ra dibêje: "*Xelîl-beg, tu ji wira h'eta vira ser ç'e'vê apê xwera hatî, min ji tera layîq dîtîye, P'erîşan-xanima qîza min p'êşk'êşî canê te kir*" (Celîl û Celîl, 1978: 226-227). Em dibînin ku jin dîsa tên pêşkêşkirin. Di vê destanê da jî bavê lehengê fikra wê napirse û keça xwe pêşkêşî Xelîl Begî dike.

Di varyanteke din a destana Xelîl Begî da dema Xeloyê mitirb diçe û Tîlî Eyşanê dixwaze ji ber ku Xeloyê mitirb xwe wekî Xelîl Beg dide nasîn bavê Tîlî Eyşanê keça xwe didê. Dema bavê Tîlî Eyşanê digel jina xwe diaxive jina wî dibêje ew Xeloyê mitirb e hatîye xwe wekî Xelîl Beg dide nîşan. Em ê wî biceribînin û bêjin bila heft sal ji me ra şivantî bike paşê em ê keça xwe bidinê, eger Xelîl Beg be şîvantî nake û ew ê here lê eger Xeloyê mitirb be ew ê şivantîyê qebûl bike. Bavê Tîlî Eyşanê guhdarîya jina xwe dike û şertê xwe ji Xeloyê mitirb ra dibêje û Xelo jî qebûl dike. Ew çax bavê Tîlî Eyşanê jî dizane ku ew Xelîl Beg nîne û Xelîl Begê xwedîyê çil xulaman şivantî nake (Kaplan, 2018: 127). Li vir bav dema biryareke giring dide digel jina xwe dişêwire û saya jina xwe rastîyê dibîne.

Di destana Husên Axa Derbas da dema çavê Tahir Begî li Narincê dikeve ne bi dilekî bi hezar dilî wê dihebîne û ji bavê wê daxwaza wê dike. Husên Axa ji Tahir Begî ra dibêje heft birayên Narincê hene ez bê wan nikarim qerar bidim. Husên Axa ji kurên xwe dipirse ew jî qebûl dikin û Husên Axa Narincê dide Tahir Begî (Amêdî, 2013: 251-252). Em dibînin ku di vê destanê da bav giringîyê dide fikrên kurên xwe lê ji bo keça xwe heman tişt derbasdar nîne. Ew fikra Narincê napirse û ligel kurên xwe biryara dayîna Narincê dide.

Di Gulperîyê da navê bavê Narincê Ehmed Beg e û Ehmed Beg jî mîrê Cizîrê ye. Wekî zaroka Ehmed Begî tenê navê Narincê derbas dibe. Ehmed Beg dema diçe hecê keça xwe teslîmê seydayî dike ku seyda wê hînî xwendin, tore, rêzan û paqijîyê

bike. Seyda çav berdide Narincê, dixwaze namûsa wê bilewitîne lê Narinc nahêle û berxwe dide. Dema seyda nagehije armanca xwe vê carê bêbextîyê li Narincê dike û li ser wê tiştên xirab ji bavê wê ra dibêje. Bavê Narincê jî guhdarîya seydayî dike, bawerîya xwe pê tîne û emir dide çend xulaman ku keça wê bikujin. Lê piştî salan dema rastîya bûyerê derdikeve holê bavê Narincê ji kirinên xwe poşman dibe û emir dide mêrkujan ku serê seydayî jê bikin (Amêdî, 2013: 376-387). Li vir em dibînin ku bav herçiqas başî û saxîya keça xwe bixwaze jî dema seyda bêbextî li keça wî dike ji keça xwe rastîya bûyerê napirse û rasterast biryara kuştina keça xwe dide. Ew bawerîya xwe bi seydayî tîne lê bi keça xwe nayne.

3.2.4. Têkilîya Bav û Kurî

Di nav destan û hikayeyên gelêrî yên bijartî da têkilîya bav û kurî pir kêm derbas dibe. Di Memê Alan, Dewrêşê Evdî, Sêva Hecî, Husên Axa Derbas û Senem Xanim û Hiseynî da kêm jî be têkilîya bav û kurî tê dîtin.

Lehengên kur di destanan da exlebî li dijî biryarên bavê xwe ne. Di destana Memê Alan da herçiqas bavê Mem dixwaze ku kurê wî ligel yekê ji welatê wan bizewice jî Mem qebûl nake û ji bo Zînê berê xwe dide welatekî wisa ku ne seh kirîye ne jî dizane. Bavê Memî herçiqas hewl bide ku wî ji rê vegerîne dîsa bi ser nakeve û Mem guhdarîya bavê xwe nake, bi rê dikeve û diçe.

Di destanan da bavê kal dixwaze ku hêz û dewlemendîya xwe bide kurê xwe. Bi vî awayî desthilatdarîya nêrza hebûna xwe didomîne. Herçiqas bavê Mem di vê mijarê da zext li Memî bike jî Mem guh nade bavê xwe, dev ji her tiştî berdide û dikeve pey Zînê.

Di destanan da dema bav dibihîsin ku kurê wan evîndar bûne gelek kêfxweş dibin. Bav di wê bawerîyê da ne ku êdî dê kurên wan bizewicin û nesla wan dewam bike. Li gor sîstema pederşahî zarokên kur ji bo berdewamîya neslê gelek giring in. Lewra zewaca zarokên kur sedema kêfxweşîyê ye. Dema Al Paşa dibihîze ku Mem aşiq bûye pir kêfxweş dibe û dibêje: "*Rabin, defa hewarê xin, gazî axa û beglera kin, bona ewana qîzêd xwe bişînin baxê torkirî*." (Cindî û Evdal, 2008:310). Di varyanteke din da jî Al Paşa weha dibêje: "*Herça bû jinêd di mêr, qîzêd azep, mêr û xort, sibê temam werine baxê min e Torkirî bilîzîn, kêf kin bi govend û qeyde, wekî Memê min dest bavêje kîjan jinê, yanê qîzê, ez ê wî ra bixwezim*." (Cindî, 2016: 27). Di sîstema

pederşahîyê da jin tên hilbijartin, mêr di nav hemû bijarteyan da kê bixwaze wê hildibijêre. Armanca bavê Memî jî ew e ku hemû qîzên welêt di baxê torkirî da kom bin û Mem yek ji wan hilbijêre. Mem diçe baxê torkirî û li wir rûdine, keç cot bi cot ji ber wê derbas dibin ku Mem yek ji wan biecibîne. Lê Mem di nav wan qîzan da Zînê nabîne êdî ew li yên din jî nanêre û hemû qîz bi awayekî destvala vedigerin malên xwe. Di varyanta Celîlan da dema bavê Mem Alayî-beg rewşa Memê evîndar dibîne pir xemgîn dibe û dibêje bi çi awayî dibe bila bibe ez ê salixê Cizîra Bota bidim. Bav ji bo kurê xwe amade ye ku wî ji tengasîya evînê xilas bike. Ew ji Mem ra dibêje ku: "*Memo lao, panzde roja îzin bide min, çiqa walat û bajarê bin e'mrê mida heye, ezê k'axaz reş û hêşîn bikim, bişînim. Remildar remê xo bavêjin, melle quranê xo binêrin, erke ko kesek salixdana Cizîra Bota bide min, bi malê dinîyaê be, bi şer be, bi çi kol i h'alê hebe, ezê ji kurê xora bînim*." (1978: 96). Li vir hezkirina bavî ji bo zarokî gelek berbiçav e. Ji bo bextewarîya kurê xwe Alayî-beg çi ji destê wî tê dike. Lê di dawîyê da salixê Cizîra Bota nadin û Mem dixwaze bikeve rê û here. Dema bavê wî ferq dike ku êdî nikare wî ji rê vegerîne van gotinan dibêje. "*Ya rebbî, li min negrî derdê kezebê derdekî zore, qewî dîsa ku ser deste. Memo lao, erge ko tu bi xebera me nakî û diçî, xudê bike, nebe miradê te û stîyokê di Botane*." (Celîl û Celîl, 1978: 98). Xuya dike ku bav herçiqas ji zarokên xwe hez bikin jî dîsa tu carî naxwazin ku kurên wan welatê xwe, dê û bavê xwe biterikînin û li pey jinekê herin.

Bav ji bo kurên xwe hemû hêzên xwe bi kar tînin. Dema Mem dixwaze li pey Zînê here bavê wî Al Paşa dibêje: *"...Ez ê ji te re bînim pêncsed xatûnêd bi carî.*" (Cindî, 2016: 30). Ew delîl dişîne nav bajêr û dibêje: "*Bila hemî qîzên delal û çeleng werin; bigrin dîlanan û govendane, belkî Mem yekê biecibîne û ji bîr bike hesreta Zîna Zêdane*." (Lescot, 1942: 58). Bavê Mem ewqas bihêz û amade ye ku Mem kî bixwaze dê jê ra bîne. "*Ez dê jinêd mêr bo te ji ber mêran derêxim*." (Kaplan, 2019: 124). Wate, eger Mem jineke zewicandî bixwaze dîsa bavê wî dê wê jinê ji ba mêrê wê hingire û ji bo Mem bîne. Armanca Al Paşa ew e ku kurê wî ji bo Zînê neçe û wî bi tenê nehêle. Ji ber ku Mem tekane zarokê dê û bavê xwe ye û li ber çavê wan gelek delal e lewra bavê wî amade bûye ku ji bo Memî her tiştî bike.

Bavê leheng ji bo pirsgirekên leheng serî li hemû rêyan didin. Lê dema çareyê nebinin êdî ew jî bi çûna kurê xwe razî dibin. Bavê Mem jî ji bo derdê Mem çi ji destê wî bê dike. Ew xeber dişîne ji şêx, meşayîx, mela û hekîman ra. Her yekî ji wan

hemayîl û nivîşt dinivîsin, dia dikin lê dîsa jî ji derdê Memî ra çare nabînin û derdê Memî roj bi roj zêdetir dibe. Bavê Memî dibîne ku çare tune ye û Mem roj bi roj xirabtir dibe êdî biryara xwe diguherîne û ji bo çûna Memî destûr dide. Ew dibêje ez naxwazim bibim sebebê kurê xwe (Lescot, 1942: 60-64).

Di Destana Dewrêşê Evdî da ji bo dayîna biryarên giring Dewrêş digel bavê xwe diaxive û ji bo çûna şer jê destûr dixwaze. Leheng naxwaze bê xebera bavê xwe biçe şer. Evdî Milhim naxwaze kurê wî ji bo Zor Temir Paşa şer bike. Ji ber ku di berî da Zor Temir Paşa soz daye Evdî û li ser soza xwe nesekinîye Evdî dibêje ku heman tiştê dê ji bo Dewrêşî jî bike, lewra naxwaze Dewrêş biçe şer (Celîl û Celîl, 1978: 282). Evdî Milhim evîndarê Rahmê ya xwişka Zor Temir Paşayî bûye. Ji ber ku Evdî êzîdî bûye Zor Temir Paşa ewil soz daye ku Rahmê bide lê paşê xwişka xwe nedaye wî. Wekî sedem jî gotîye ku hûn êzdî ne em misilman, nabe ku xwişka xwe bidim te. Dema heman tişt tê serê Dewrêş bavê wî naxwaze kurê wî biçe şer bike, çinku ji ber êzdîbûna wan ditirse ku Zor Temir Paşa Edûlê nede wî (Filiz, 2021: 44). Bav hertim ji bo kurên xwe tiştên herî baş dixwazin û ew naxwazin kurên wan bikevin derîyê tengasîyê. Dema Dewrêş fincana qehwê vedixwe û çûna wî teqez dibe bavê wî Evdî diçe ba Edûlê, xwe diavêje dest û pêyê wê û jê dixwaze ku Dewrêş ji rê vegerîne. Evdî dibêje ku ji Dewrêşî ra bêje dê û bavê te kal û pîr in, wan nehêle û neçe. Edûle diçe ba Dewrêşî û jê ra gotinên bavê wî dibêje lê Dewrêş bi tu awayî îqna nabe û ji rêya xwe venagere (Celîl û Celîl, 1978: 284). Em dibînin ku bav herçiqas çûna kurên xwe ya ji bo şer nexwazin jî dîsa kurên wan ji rê venagerin û ji bo gihîştina yara xwe ji çûnê natirsin.

Di destana Sîyabend û Xecê da navê bavê Sîyabend wekî Ah'med derbas dibe (Celîl û Celîl, 1978: 118) lê sê meh berîya jidayikbûna Sîyabend bavê wî dimire lewra em nikarin di vê destanê da behsa têkilîya bav û kurî bikin.

Di destana Kerr û Kulikî da navê bavê lehengan Silêmanî Madî ye. Ji xeynî vê agahîyê di derheqê têkilîya wan a bav û kurî da tu agahî nehatîye dayîn.

Di destana Sêva Hecî da navê bavê Mîr Mehmûdê Cindî derbas nabe. Lê dema Mîr Mehmûd di xewna xwe da Sêva Hecî dibîne û ji bavê xwe ra dibêje bavê wî li hember wî nabe asteng. Bavê wî ji Mîr Mehmûdî ra dibêje eger dixwazî here û Sêva Hecî ji xwe ra bîne (Celîl û Celîl, 1978: 158). Bav di vê destanê da li hemberî kurê xwe nasekine û piştgirîyê dide qerara wî.

Di destana Husên Axa Derbasî da (Amêdî, 2013: 251-252) dema Tahir Beg keça Husên Axa dixwaze Husên Axa digel kurên xwe dişêwire paşê biryara dayînê dide. Ew herçiqas dixwaze ku keça xwe bide Tahir Begî dîsa jî bê xebera kurên xwe, bi tena serê xwe qerar nade.

Di Senem Xanim û Hiseynî da navê bavê Hiseyn Mendul Axa ye. Dema Mendul Axa dibihîse ku Hiseyn nemêr e dixwaze alikarîya kurê xwe bike, dibêje Xwedê derd dane derman jî dane. Lê Hiseyn daxwaza alîkarîyê ya bavê xwe qebûl nake û malbata xwe diterikîne. Piştî heft salan xebera mirina Hiseyn tê. Mendul Axa û jina wî kal û pîr bûne û ji xeynî Hiseyn zarokên wan tune bûye. Dilê destebirayê wî Qehreman Axa pê diêşe û jê ra dibêje em bûka te li kurekî min mehr bikin, bila kurê min bibe wekî kurê te û li ba te bisekine. Ji ber naçarîyê Mendul Axa qebûl dike û Senem Xanimê didin kurê Qehreman Axayî (Kaplan, 2018: 142).

3.2.5. Têkilîya Bav û Keçê

Di destanên wekî Memê Alan, Dewrêşê Evdî, Binefşa Narîn, Kerr û Kulik, Stî û Ferxî da li ser têkilîya bav û keçê hatîye sekinîn.

Di destanan da têkilîya bav û keçê herçiqas li ser hezkirinê ava bibe jî, bav ji keçên xwe îtaetîya mutleq hêvî dikin. Keç divê ji gotinên bavê xwe dernekevin. Herweha namûsa keçan ji bo bavan pir giring e û divê keç di vê mijarê da baldar bin. Eger xirabîyek bê serê keçan û namûsa wan bilewite ew çax bav ji bo kuştina keçên xwe qerarê didin û di vê mijarê da bav pir hişk in. Ji bo vê rewşê Gulperî dikare wekî mînak bê dayîn. Bavê Narincê keça xwe emanetê seyda dike lê seyda çav berdide Narincê. Seyda ji bo bidestxistina Narincê serî li gelek rêyan dide lê bi ser nakeve. Ew di dawîyê da bêbextî li Narincê dike û ji bavê wê ra li ser namûsa keça wî gotinên xirab dibêje. Li vir meseleya namûsê dibe sedem ku bavê Narincê bê pirs û pirsyar qerara kuştina keça xwe dide. Li gor bav keça wî li namûsa xwe xwedî derneketîye û xwe lewitandîye. Di vê destanê da em dibînin ku herçiqas bav ji keça xwe hez bike jî dîsa ji gotinên seyda bawer dike û ji keça xwe rastîya bûyerê napirse. Dema mesele namûs be qerar dîyar e û kuştin e.

Di destana Memê Alan da wekî bav û keç Bekoyê Ewan û Zîn derbas dibe. Navê keça Beko Zîn e û ew dixwaze bi Memî ra bizewice. Dema Zîn bi hîleyan Mem dixapîne û dibêje ez Xatûn Zîn im Mem jî bawer dike û Zîna Bekoyî nîşan dike. Paşî

rastî derdikeve holê û Mem dizane ku ew keça Beko ye. Mem dixwaze nîşanê betal bike û betal jî dike. Lê Beko naxwaze û dibêje bivê nevê jî keça min ji bo Memo ye û min namûsa keça xwe daye Memo û eger Mem nîşanê betal bike dê her kes li ser me biaxive. Lê dîsa jî Mem nîşanê betal dike. Li ser betalbûna nîşanê Zîna keça Beko pir xemgîn dibe û digirî. Ew çax Beko ji keça xwe re: "*Keça min, mereqan neke. Dibêne min Beko. Min ew ehd bît, hindî ez sax bim Memo bi vê mirazê şa nabît. Heke Xudê li erşan nivîsîbît, ez dê li erdan betal bikem vê qederê.*" (Kaplan, 2019: 147) dibêje. Ew bi vî awayî keça xwe aş dike û di dawîyê da jî li ser ehd û soza xwe disekine û nahêle Mem û Zîn bigihîjin hev.

Bav dema dikevin tengasîyê keçên wan digihîjin hewara wan. Dema Zor Temir Paşa li hemberî êrîşa gêsan rêyekê digere keça wî Edûle digihîje hewara wî û rêyekê nîşanê bavê xwe dide. Edûle dibêje ji Dewrêşê Evdî alîkarî bixwaze û bavê wî jî wisa dike û ji Dewrêşî ra nameyekê dinivîsin (Celîl û Celîl, 1978: 281). Di hin destanan da eger zarokên kur tune bin zarokên keç derdikevin pêş û ew di dayîna biryarên giring da rol dileyîzin. Edûle jî ji bo bavê xwe zarokeke wisa ye. Ew di dayîna biryarên giring ên wekî şer da xwedî gotin e.

Di destana Binefşa Narîn da Derwêş Axa ji Fariz Beg daxwaza keça wê Binefşê dike. Fariz Beg dibêje heta ez digel her sê kurên xwe û keça xwe Binefşê neaxivim ez nikarim tiştekî bibêjim. Fariz Beg diçe ba zarokên xwe û meseleyê ji wan ra vedike. Kurên Fariz Begî qebûl nakin û dibêjin xwişka me çardeh salî ye, Derwêş Axa nehwêd salî. Wextekî Fariz Beg xûnî bûye û xwe li ba Derwêş Axa girtîye, lewra nexwastîye dîsa bar bike û biçe cihekî din. Wî ji Binefşê ra gotîye kincên peritî û qetîyayî li xwe bike, xwe pêxas bike û here avê, xwe kor û seqet bike belkî Derwêş Axa te bibîne û poşman be. Binefş gotinên bavê xwe qebûl nake û bi cih nayne. Ew jî bi malbatî mecbur dimînin ku bi şev konê xwe bar bikin û biçin cihekî din (Celîl û Celîl, 1978:180-181; Cindî, 2016: 69). Di vê destanê da em dibînin ku bav zordarîyê li keça xwe nake û giringîyê dide fikrên wê. Dema Binefş naxwaze bi Derwêş Axa ra bizewice bavê wê bi zorê ew nade û ji bo ku Derwêş Axa Binefşê bi darê zorê nerevîne konê xwe bar dikin û diçin warekî din.

Di destana Sîyabend û Xecê da navê bavê Xecê derbas nabe. Dema danasîna Xecê tê kirin tê gotin ku dê û bavê wê tune ye, heft birayên wê hene. Lê di varyanta

Celîlan da du caran (1978: 140, 148) wekî "Xeca Resûl" derbas dibe. Dibe ku navê bavê wê Resûl be.

Di destana Kerr û Kulikî da Emer Axa ji bo ku hespa Bêcanê yê navdar bi dest bixe keça xwe diavêje ortê û dibêje kî wî hespî ji min ra bîne ez ê keça xwe ya bedew Perîşanê bidim wî (Cindî û Evdal, 2008:110). Perîşan vê yekê qebûl dike û li dijî bavê xwe tiştekî nabêje. Li vir ji bo bêdengîya Perîşanê du sedem dikarin bên destnîşankirin. Yek sîstema pederşahî ye ku di dayîna biryarên giring da bav û bira çi bêjin ew tê qebûlkirin. Perîşan dibe ku ji ber vê yekê tiştekî negotîye û qebûl kirîye. Li alîyê din dibe ku dilê Perîşanê di Kulikî da hebûye lewra îtîraz nekirîye. Çinku di varyanta Cizirî da dema Kulik bi rê dikeve ew derdikeve pêşîya wî û dibêje neçe û min birevîne. Ew bawerîya xwe bi bavê xwe nayne û teklîfa revandinê dike lê Kulik qebûl nake (Cizîrî, 2020: 191-192).

Di destana Sitî û Ferxî da şivanek tê û dibe şivanê mala bavê Sitî. Şivan dibêje ez ê heft sal ji we ra şivantî bikim lê piştî heft salan hûn ê Sitîyê bidin min. Bavê Sitîyê herçiqas berîya jidayikbûna Sitî û Ferxî soz dabe birayê xwe jî dîsa li ser soza xwe nasekine û daxwaza şivên qebûl dike. Şivan soz dide û: "*Pezên te carekê cewî bîne, carekê berxê wî mê bin. Gur bixwin ez ê bidim, lingên wan bişkê ez ê bidim*." (Cindî, 2016:122) dibêje. Piştî van gotinan malê dinyayê li bavê Sitî kar dike û teklîfa şivanî bêyî xebera Sitî qebûl dike. Sitî herçiqas ji Ferx hez bike jî dîsa li hember qerara bavê xwe tiştekî nabêje û pasîv disekine.

3.2.6. Kur Wekî Zarokî (Weled)

Kur wekî zarok di nav destanên wekî Memê Alan, Siyabend û Xecê, Kerr û Kulik, Zembîlfiroş û Sêva Hecî da derbas dibin.

Gelek caran zarokên kur ew kes in ku ji bo evînê pişta xwe didin malbatên xwe û ji bo hezkirîyên xwe welatên xwe diterikînin. Ew li hember hemû israrê dê û bavê xwe yên extîyar dîsa jî ji bo keça ku di xew da dîtine û evîndar bûne welat, mal û milk, hebûnên xwe diterikînin û dikevin rêyên nedîyar. Leheng di rêya gihîştina hezkirîyê da dev ji gelek tiştan berdidin. Em ê li jêr cih bidin mînakên van destanan.

Di destanan da lehengên mêr pirî caran guhdarîya dê û bavê xwe nakin û li gor daxwaz û xwastinên xwe hereket dikin. Dema Mem dixwaze ji bo Zînê dê û bavê xwe yên kal û pîr bihêle û here dê û bavê wî naxwazin ew biçe. Çi jî dikin nikarin Memî ji

rêya wî vegerînin. Mem ji bo gihîştina Zînê guhdarîya dê û bavê xwe nake û berê xwe dide Cizîra Botan (Cindî, 2016: 30-31; Celîl û Celîl, 1978: 97-98).

Ji bo lehengên mêr evîna yara wan li ser evîna her tiştî ye. Ew ji bo hezkirîyên xwe terka her tiştî dikin. Tenê armanca wan gihîştina hezkirîyê ye. Di vê rêyê da çi hewce be dikin. Mem jî yek ji wan lehengan e. Ew li ber çavê dê û bavê xwe zehf delal e û tekane zarok e. Lê dema dibe evîndarê Zînê çavên wî êdî dê û bavê wî nabînin û wan diterikîne, diçe (Lescot, 1942: 64). Dewrêşê Evdî jî ji bo îhtîmala gihîştina hezkirîya xwe, xwe diavêje talûkê û guhdarîya bavê xwe nake. Herçiqas bavê wî nexwaze jî ew jî bo Edûlê diçe û serdarîya şerê dike (Celîl û Celîl, 1978: 283). Em dibînin ku eger di dawîyê da îhtîmala gihîştina hezkirîyê hebe leheng guhdarîya bavê xwe nakin, bavê xwe tenê dihêlin û rêya zor û zehmet hildibijêrin. Di destana Kela Dimdimê da ji ber ku mijar lehengî ye û Xan ji bo neteweya xwe şer dike û ew hertim guhdarîya dêya xwe dike û di dayîna biryarên giring da bi dêya xwe ra dişêwire (Kaplan, 2019: 21-118). Dêya Xanî li ser wî xwedî bandor e. Di destana Binefşa Narînê da di derheqê dê û bavê Cembelîyî da agahî nehatîye dayîn. Tenê em dizanin ku ew Mîrê Hekarîyê ye, ji xeynî wî behs nehatîye kirin (Celîl û Celîl, 1978: 177-189; Cindî, 2016: 66-85).

Sîyabend bê dê û bav li ber destê ap û jinapa xwe mezin dibe. 3 meh berî jidayikbûna wî bavê wî, di du salîya wî da jî dêya wî rehmet dike. Ew dema mezin dibe dibe zarokekî muzir. Ew di cihê xwe da nasekine, rehetî nade zarokên gundî. Gundî hemû jê gelek aciz in. Apê wî jî jê aciz dibe û wî ji mala xwe derdixîne. Dibînin ku Sîyabend hêj jî xirabîyê dike ew çax gundî diçin ba apê wî û dibêjin em ê tev da wî bikujin. Apê wî jî dibêje ku: "*Ez z'ef ji Gurî e'ciz bûme, kuştina Gurî li we h'elal be. K'î Gurî bikuje, bila hinek xûna Gurî bînin ez jî vexum*." (Celîl û Celîl, 1978: 122). Ji ber ku porê wî tune bûye lewma ji Sîyabendî ra "Gurî" gotine. Ew zarokekî ewqas nehewayî bûye ku her kesî diayê mirina wî kirîye û xwastine wî bikujin. Apê wî jî wekî gundîyan kuştina wî xwastîye. Di vê destanê da bavê leheng zû rehmet dike û ew di nav mala apê xwe da mezin dibe. Lewra dema em Sîyabendî wekî zarok dinirxînin em vê nirxandinê bi rêya têkilîya wî ya bi mala apê wî ra dikin. Ew wekî zarok yekî zehf nehewayî bûye lewra malbatê hertim jê gazindan kirîye.

Di destana Kerr û Kulikî da kur wekî zarok guhdarîya dêya xwe nakin. Dêya wan Werdek dema dibihîse ku dê zarokên wê ji bo anîna hespekî biçin nav êlê ereban ew naxwaze û hewl dide ku wan ji rê vegerîne. Lê zarokên wê Kerr û Kulik bi biryar in, guhdarîya dêya xwe nakin û diçin. Li cihekî dîsa em dibînin ku guhdarîya dêya xwe nakin û zerarê dibînin. Dêya wan dibêje bila hespê we ava golegenîya venexwe, eger vexwe ew ê nexweş bikeve. Ew dîqat nakin û hesp wê ava pîs vedixwe û nexweş dikeve (Cindî û Evdal, 2008: 141-144).

Zembîlfiroş kurê mîr e. Teled-weledê Mîr ew bûye. Lewra bi dil û delalî mezin bûye (Gernas, 1995: 83). Ew rojekê ji rav û nêçîrê vedigere û rastî qebrekê tê. Dema wê qebrê dibîne mirin tê bîra wî û dev ji mal û milkê dinyayê berdide. Herçiqas bavê wî dibêje were cihê min rûne, bibe hakimê vî welatî û xerc û xeracan kom bike jî dîsa Zembîlfiroş qebûl nake û diçe karê selikçêkirinê dike (Amêdî, 2013: 182). Zembîlfiroş biryarekê dide û bavê wî nikare kurê xwe ji wê biryarê vegerîne. Ew mal û milkê bavê xwe diterikine û bi keda destê xwe debara xwe dike.

Mîr Mehmûd kurê mîrê Beraza ye û ji bo Sêva Hecê ya ku di xewnê şevan da dîtîye dikeve rêyan û welatê xwe diterikine. Dê û bavê wî çiqas hewl bidin jî nikarin wî ji rê vegerînin, ew mal û milkên xwe dê û bavê xwe diterikine û dikeve pey Sêva Hecî (Celîl û Celîl, 1978: 166; Cindî, 2016: 89-90).

3.3. ZAYENDA MEKANÎ

Mekan jî wekî mirovan xwedî zayend in. Senifandina mekanan a nêrza û mêza vê nêrînê piştrast dike. Di pêkhatina vê rewşê da gelek faktoran roleke aktîf lîstine. Hin faktorên dîyarker ên di têkilîya navbera mekan û rolên zayenda civakî da dikarin weha bên rêzkirin: sîstema serdestîya mêran, dûrxistin/xwe li nedîtinê danîn, xwezayîkirin, duyemîntî, korbûna zayendê. Ev faktor di pêvajoya dirokî da gav bi gav çê bûne. Şert û mercên ku jin ji malê (cihên girtî/taybetî) derkevin û têkevin qadên gelêrî û wan qadan bi kar bînin, ji alîyê mêran û dewletê ve hatine dîyarkirin. Dewlet jî sîstemeke wisa ye ku ji alîyê mêran ve hatîye sazkirin. Lewra jin di derketina mekanên derve da azad nebûne. Çinku jin wekî sembola dewlet, civak, mêr, manewîyat û çandê hatine dîtin. Ev statuya jinan a sembolbûnê bûye sedem ku jin di her qadê da di bin kontrolê da bên girtin. Digel vê rewşê jin li gor zîhnîyeta pederşahî ne wekî kesayeteke xweser wekî milkê bav û mêran hatine hesibandin. Dema ji alîyê

mekanî ve bê nêrîn mekanên taybetî (Private Sphere) û gelêrî (Public Sphere) li hember hev hatine dabeşkirin. Cudahîya cihê taybetî û gişti li ser bingeha ramana Yewnanîya Kevnar hatîye afirandin. *Polîs* (cihê gelêrî) qada îdarî ya mêran; *oikos* (mal, xanî) nava malê ye û cihê jin û zarokan e. Dema mêr di qada gelêrî da dijîn qada jîyanê ya jinan hundurê malê ye û ew bi qadên taybetî ên wekî mal, malbat, zewac, xanî ra hatine têkildarkirin (Çakır, 2010: 37-38; Berktay, 2018: 38). Aîdîya jinan a bi van qadên taybetî ra ji alîyê nêrina femînîst ve hatîye rexnekirin û mêr di qada gelêrî da wekî insûrên zextê hatine dîtin (Arık, 2009: 176). Li gor Bhasînê mayîna jinan a di "mal"de bûye sedem ku ew nirx û pozisyona xwe ya navendî winda bikin. Dema karên mêran giringtir bûye li alîyê din cudahîya di navbera mêr û jinan da jî zêde bûye û sîstema pederşahî hîn xurttir bûye. Dikare bê gotin ku di qada taybetî û gelêrî da nirxên bingehîn dijberî hev in. Di qada taybetî da fedakarî, hezkirin, xweşbînî, û parastin xwedî qîmet in lê di qada gelêrî da xweperestî, êrîşkarî, çavsorî, reqabet tê dîtin. Yên femînîst cudahîya di navbera qada taybetî û gelêrî da rexne dikin û li hemberî vê cudabûnê derdikevin. Ew li hember vê dualîtîyê sekinîne û slogana xwe ya "*Ya şexsî polîtîk e*" gotine. Vê sloganê bala civakê kêşand ku jin di qada taybetî da rastî zextên cuda tên (2015: 22-49). Di tayînkirina sînorên qadên taybetî û gelêrî da nirxên li hemwelatîyan ra tên dayîn, bandoreke mezin dikin. Ev nirx li gor zayenda kesan diguherin. Li gor Pateman bi rêya newekhevîyên di qadên taybetî da di qadên gelêrî da di navbera mêran da wekhevî çê dibin. Cihêkirina wekî qadên taybet/ gelêrî dibe sedem ku newekhevîyên di qadên taybetî da xuya nekin (Çakır, 2019: 45).

Dubendîyên ku hîyerarşîyên wekî jin/mêr, hilberîn/ji nû ve hilberîn, kargeh/mal dihewînin di têgihîştina mekanan da bandor dikin (Dündar Türkkan û Yıldız, 2022: 1478). Divê ev dualîtî bi temamî ji hev cuda neyên hesibandin. Ev dualîtî bi awayekî dînamîk bandor li hev dikin û hev zêde dikin (Acıl, 2018: 26). Helwesta dualîtî ya zîhnîyeta nêrza têgihên wekî hiş, çand, nêrza û gelerî bi mêran re; têgihên wekî laş, xweza, mêza, taybetî bi jinan ra girê dide. Li alîyekî li mêran rolên wekî biryarder, azad, rasyonel têne barkirin lê li alîyê din jin bi qalibên wekî pasîv, bende, bêaqilane têne sînordarkirin. Ev parvekirina newekhev a hêzê di mekanan da jî xwe dide der (ji Altındal, 2017 vgh. Karakaya, 2023: 30). Mekan dikarin wekî taybetî û gelêrî bêne fikirîn (Saygılıgil, 2013:210). Fikra ku derve aîdê mêran û hundur jî aîdê jinan e di esasê xwe da cudahîya qadên gelêrî û taybetî piştrast dike (ji Ardener, 1981 vgh.

Alkan-Kormaz & Allmer, 200: 114). Ev dabeşkirina mekanî tiştekî dîrokî ye. Mala ku di pênaseyan da wekî cihê taybet derbas dibe wekî cihê jinan tê dîtin; cihê ku derveyê malê ye wekî cihê gelêrî derbas dibe û aîdê mêran e. Ev dabeşkirin dikare wekî dabeşkirineke heteroseksuel bê nirxandin (Deniz, 2020: 238). Cihên taybetî ew cih in ku xwedîyê wan hene û mirovên din nikarin xwe bigehînin wan deran, ew der sînorkirî ne. Li alîyê din cihên gelêrî ew cih in ku li derveyê cihên taybetî dimînin û cihên hevpar in. Cihên taybetî yanî mal û malbat ji bo jinan hatine veqetandin û jin di derveyê têkoşîna xwenîşandana cihên gelêrî da mane (Akbaş Arpacı, 2019: 6-10).

Çawa ku her mirov xwedî zayend e dikare bê gotin ku her mekan jî xwedî zayend e. Cudahîyên civakî û cihî hev nîşan didin. Çawa ku civak avahîyeke homojen nîne heman rewş ji bo mekanê jî derbasdar e. Ji bo cihên bizayend tiwaletên jin û mêran, herem û hemam dikarin wekî mînak bên dayîn. Bi heman awayî parkên zarokan, dibistan, aramxane mînakên wan cihan in ku li gor temenê hatine cudakirin. Cihên ku li gor dîn hatine cudakirin mizgeft, dêr, îbadetxane, peristgeh in. Bizayendbûna mekanê bi qasî ku axiftinê ve girêdayî ye ewqas jî bi pratîkên mekanî ve girêdayî ye. Têkilî û pratîkên civakî mekanan ava dikin lê yên ku teşe didin têkilî û pratîkên civakî jî mekan bixwe ne (Schick, 2016: 99-101). Di navbera mekan û însanê da têkilîyeke dualî heye. Bi rêya vê têkilîyê mekan ji stabîlbûnê derdikeve. Ji ber vê yekê divê ne tenê ji alîyê şeklî ve ji perspektîveke têgihîştinî ve jî li mekanê bê nêrîn. Ji ber ku her çend mekan fîzîkî be jî di heman demê da xwedîyê alîyên çandî, civakî, bîrdozî ye û bi bawerî, hiş, bîr, aîdbûn, têkilîyên civakî û zayenda civakî ra di nav têkilîyeke nêz da ye (Oral, 2023: 143).

Mirov dema aîde mekanekî be xwe kêm hîs nake. Avahîya pederşahî bandor lê kirîye ku mêr girêdayî derve jin jî girêdayî malê bin. Çi jin çi mêr dema ew ji sînorên dîyarkirî derdikevin tên vederkirin. Ji wan tê xwastin ku di nav qadên xwe da bimînin. Mêr herçiqas li derve di bin desthilatdarîya sazî û kesan da jî bin dema diçin malê dixwazin li wir hikumranîya xwe ava bikin. Civaka pederşahî mêran wekî xwedîyê malê yê esil dibîne. Jin jî kesa ku girêdayî mal û mêrê xwe ye. Di civakên nêrza da ji ber ku jin tên kêmxistin û paşguhkirin lewra cihên wan wekî malên teng û tarî hatîye dîyarkirin. Bereksê vê, qadên gelêrî yên ku ji bo mêran hatine veqetandin ronî û fireh in (Tatlı, 2020: 117).

3.3.1. Mekanên Nêrza

Mekanên gelêrî (Public Sphere) yên derveyî malê wekî mekanên mêran tên dîtin. Ew wekî nûnerên çand û şaristanîyê têne hesibandin. Ji ber vê yekê karên mêran wekî afirandina çand û şaristanîyê, sîyasetkirinê hatîye dîyarkirin. Ev çalakîyên mêran ji ber ku di qadên gelêrî da tên kirin li ber çav in (Gedik, 2019: 303-304).

McDowell dema taybetmendîyên nêrza û mêza dide ber hev taybetmendîyên nêrza weha rêz dike: derve (outside), kargeh (work), giştî (public), xebat (work), hilberan (production), hêz (power), serbixwetî (indepence); taybetmendîyên mêza: şexsî (private), hundur (inside), xanî (home), bindestî (dependence), nebûna hêzê (lack of power), xerc (consumption) (2003: 12). Ji taybetmendîyên nêrza yên hatine rêz kirin jî tê fêm kirin ku kargeh û qadên gelêrî her wekî cihên aîdê mêran tên dîtin. Dema taybetmendîyên pederşahî yên van deran bê fikirîn iqtidara nêrza bi awayekî aşkera tê dîtin.

Connerton dema karên jinan ên ji sedsala 19. vir ve rêz dike wan bi nava malê ve sînordar dike; mêr bi danûstandinê ra mijul dibin û ji ber vê yekê kolan aîdê mêran in. Dema li kolanan jinek tê dîtin tê şîrove kirin ku hevjînê wê nikare debara malê bike. Lewra mêran ji vê rewşê hêz girtine û wan li hember jinên ku li kolanan dîtine tevgerên nebaş kirine. Tê dîtin ku kolan ji bo jinan cihên ewle nînin (2011 vgh. Saygılıgil, 2013: 212). Di cihên desthilatdarîya mêran da wisa tê fikirîn ku divê bedena jinan di bin kontrolê da be. Ev rewş dibe sedem ku jin li van cihan rehet nebin. Bi vi awayî ew cih ji bo jinan vediguhere qadeke xeternak a ku divê jin li wir micadele bikin (Akbaş Arpacı, 2019: 36).

Di nav destan û hikayeyên gelêrî da wekî mekanên nêrza dîwan/dîwanxane, ode, qada şer, cihê rav û nêçîrê derbas dibin.

Mêr di destan û hikayeyên gelêrî da exlebî di qadên gelêrî û vekirî da derdikevin pêşberî me. Dîwan, herçiqas wekî cihekî girtî xuya bike jî di destanan da wekî cihekî nêrza cih girtîye. Ew gelek caran wekî cihekî ku mêr kom dibin û biryarên giring didin derbas dibe. Ne guncaw e ku jin di dîwanan da rûnin, çinku ew cihekî nêrza ye û cihê jinan li wir tune ye. Ji xeynî dîwanê mêr exlebî yan li qadên şer û yan jî li nêçîrê tên dîtin. Lewra mêr di jîyana rojane da xwedîyê mekanên vekirî û fireh bûne.

Di destanan da mêr bi piranî di qesrê da di nav odeyekê da derdikevin pêşberî me. Ew odeya mîr an jî axayî ye û li wir dîwanê dadinin. Xwarin û vexwarin, sohbet, dayîna biryarên giring, mazûvanîya mêvanan hemû di wê odêyê da tê çêkirin. Herçiqas ode wekî cihekî girtî/mêza xuya bike jî berî qern û jîyana modern ew der wekî cihekî nêrza derbas dibe. Mem dema diçe Cizîra Botan li odeya Mîr li dîwanxaneyê rûdine û li wir wî mêvan dikin (Celîl û Celîl, 1978: 107). Odeyên mêr û jinan cuda ne û jin di odeyên mêran da ligel wan rûnanin û nasekinin. Dema Mem tê û li mala Qeretajdîn dimîne her kes li hemberî bedewîya Mem hişk dibe û disekine. Qeretajdîn dixwaze Sitîya jina wî jî bedewîya Memî bibîne û lewra ji xulaman ra dibêje bila Sitî bê û li ba me xwarina me amade bike. Ew çax xulam: "*Nê ez xulam! Metbex heye, tenûr heye, şûla jinan huzura mêvanan da çi ye?*" (Kaplan, 2019: 138) dibêjin. Ji gotinên xulamî jî dîyar dibe ku jin naçin odeya mêran û ligel mêran rûnanin.

Herçiqas ode wekî cihê jinan bê binavkirin jî di destanan da xuya dike ku ew wekî cihê mêran, cihekî nêrza derbas dibe. Ev ode wekî dîwanxane jî derbas dibin. Ew der ji bo mîr, axa û began hem ji bo derbaskirina wextê tê bikaranîn hem jî biryarên giring ên wekî şer li wir tên dayîn. Di destana Dewrêşê Evdî da dema gêsî ji bo Zor Temir Paşa nameyekê dişinin Zor Temir Paşa hemû egîd û pehlewanan di odê da kom dike û ji wan ra nameya gêsîyan dixwîne (Celîl û Celîl, 1978: 280-281). Di destana Cembelî û Binefşa Narîn da Derwêş Axa her kesî li odê kom dike û piştî belavbûna wan nîyeta xwe ji bavê Binefşê ra aşkera dike (Celîl û Celîl, 1978: 179; Cindî, 2016: 67-68). Sîyabend ber bi konê mala bavê Xecê ve diçe û li wir dikeve dîwanxaneyê. Dîwanxaneya wan bi çît û perde bûye (Cindî û Evdal, 2008: 567). Em dibînin ku di konên mezin da bi piranî cihê jin û mêran bi perdeyan hatine veqetandin.

Di destana Kerr û Kulikî da biryarên giring di odêyên kon/dîwanxanêyê da tên dayîn. Dema Şemsîxana keça Simaîl Axayê Milî ji bo bavê xwe xwe pêşkêş dike her kes li odê bûye. Ew dibêje ku kî fincana di destê min da hilde û here Cancana Elîsarê Gêsî ji bavê min ra bîne ez a wî me (Cizîrî, 2020: 190; Aras, 2022: 26). Tê dîtin ku ode yan jî dîxwanxane cihekî nêrza ye û mêr li wir rûdinin. Jin tenê ji bo armancekê demeke kêm li wir disekinin û dîsa ji wir derdikevin. Jin di odeyên mêran da wekî mêran hertim cih nagirin û xuya nakin.

Di destana Sitî û Ferxî da wekî cihê nêrza ode derbas dibe. Dema şivanê Silêman Beg ji bo xwastina Sitî diçe ba Silêman Begî ew di odêyê da runiştî bûye (Celîl û Celîl, 1978: 207). Ode dikare wekî dîwanxane jî bê pênasekirin. Ew der aîdê mêran e û beg, paşa û axa li wir rûdinin, diaxivin, xwarinê dixwin û biryarên giring li wir didin. Dema Ferx li şivanê mala bavê Sitî dide, şivan ji bo gilîyê diçe dîwanxanêyê û ji Xelîfe ra dibêje Ferxî ez gelek kuta me, eger weha be ez ji we ra şivantî nakim (Kaplan, 2019: 192). Xelîfe naxwaze ku şivan biçe lewra dibêje ez ê ligel Ferxî biaxivim. Di heman destanê da jinan nekarîbûne bi awayekî rehet bikevin dîwanên mêran. Dema Ferx ji dêya xwe ra dibêje here gazîyê mîr û rûspîyên wî bike bila bêne ba min dêya wî weha dibêje: "*Lawo, eva çi wext e, bavê te ez anîme, min rêya dîwana mîrê Bexdayê qe nedîye, ez şerm dikim herime dîwana wî.*" (Cindî, 2016: 118). Dêya Ferx herçiqas nexwaze biçe jî ji ber israrên Ferx bi awayekî xef diçe dîwanê û xwe digehîne mîrî.

Di destana Evdilrehmanê Zorbaşî da wekî cihê nêrza ode (dîwan) derbas dibe. Axa û xelkê êlê li wir disekinin û biryarên giring li wir distînin. Li odêyê cihên jinan yanî cihên mêza bi perdê ve hatîye veqetandin (Amêdî, 2013: 336).

Di destana Elo Şêxanî da wekî cihê nêrza ode û qehwexane derbas dibe (Celîl û Celîl, 1978: 213-214, 217).

Yek ji wan cihên nêrza cihê rav û nêçîrê ye. Mîr û ravker tev bi hev ra diçin rav û neçîrê û li wir wext derbas dikin (Kaplan, 2019:149). Jin li cihê rav û nêçîrê xuya nakin û ew der ciheke mêza nîne. Ferx digel kurmamên xwe diçe rav û nêçîrê (Kaplan, 2019: 201). Di destana Zembîlfiroşê da Zembîlfiroş digel wezîrê bavê xwe gelek caran diçe nêçîr û seyranê (Gernas, 1995: 83). Di destana Kela Dimdimê da Xanê Lepzêrîn û Şah bi hev ra diçin nêçîrê (Kaplan, 2019: 23). Di Gulperîyê da çavê nêçîrvanê di nêçîrê da li Narincê dikeve û dibêje "*ev jinik paşa bî, qereç bî, ez ê li vî canî mar kim*." (Amêdî, 2013:380). Di destana Xelîl Begî da jî Xelîl Beg ji xulamê xwe Xelo ra dibêje rabe hespan gem bike, zîn bike em ê herin çîyayê Sibhangolê nêçîrê, belkî em xezalekê bikujin (Celîl û Celîl, 1978: 223). Dîsa di heman destanê da wekî cihê nêrza dîwanxane derbas dibe. Xelîl Beg dema diçe mala Perîşan Xanimê, Perîşan Xanim dikeve binê milê wî û wî dibe dîwanê (Celîl û Celîl, 1978: 226). Di şeva daweta wan da mêr di diwanê da rûdinin û Tilî Eyşan/Perişan Xanim jî li odeyeke din disekine. Dişînin pey

Tîlî Eyşanê ku bê dîwanê lê Tîlî Eyşan naxwaze biçe û dibêje ez ê çawa herim di dîwana mêran da rûnim (Kaplan, 2018: 130). Em dibînin ku dîwan/dîwanxane cihekî nêrza ye û jin bi awayekî rehet nikarin beşdarê wê derê bibin.

Di destana Husên Axa Derbasî da wekî cihê nêrza ode derbas dibe. Tahir Beg dema diçe û dibe mêvanê Husên Axa ew li odê rûdinin û ji wan ra xwarinê tînin odê. Di odê da perde heye û cihê jinan hatîye veqetandin (Amêdî, 2013: 251).

Di Gulperîyê da wekî cihên nêrza ode û dîwan derbas dibin. Dema keçelok diçe ku çîroka xwe ji wan ra bêje Ehmed Beg ligel seydayan li odêyê/dîwanê rûniştine (Amêdî, 2013: 385, 387; Kaplan, 2018: 100).

3.3.2. Mekanên Mêza/Femînen

Cihê jîyanê yê jinan bi mal û odêyê ra sînorkirî ye. Ev qad wekî *qada taybetî* (Private Sphere) hatîye binavkirin. Tevlîbûna jinan a li derveyê qadên taybetî û sedemên bikaranîna van qadan ji alîyê tehakûma nêrza ve tê dîyarkirin. Ji ber vê yekê jîyana jinan a malê ji alîyê mêran ve; jîyana jinan a derveyê malê jî ji alîyê tehakûma nêrza ve tê dîyarkirin. Jin jîyana xwe ya derveyî malê bi awayekî sînorkirî dijîn. Her çîqas jin bikarin xwe bigehînin derveyî malê jî ji ber stereotîpên zayenda civakî ew li van deran nikarin bi mêran ra xwedîyê mafên wekhev bibin. Çinku hem di mal da hem jî li derve xwedîyê hêzê mêr in. Jîyana jinan a derveyê malê tê tengkirin û sînordarkirin çinku ew wekî aîdê cihên girtî tên dîtin lê berovajî vê mêr cihên vekirî zêdetir bi kar tînin. Digel vê rewşê jin di warê hest, raman û axiftinê da di bin dorpêçê da ne. Jîyana xebatê ya jinan bi Şoreşa Pîşesazîyê dest pê dike. Jîyana jinan a ku bi malê ve sînordarkirî bû bi jîyana wan a xebatê ra ji alîyê mekanê ve berfireh bûye. Bi vî awayî jin hem di mal da hem jî di mekanên nêrza da tên dîtin. Ev rewş bûye sedema guherîna wê nêrînê ku jinan bi malê ra sînordar dike (Oral, 2023: 144-145). Jinan bi taybetî di serdema piştî 1950î da rolên giştî-aborî girtin ser milên xwe. Ji ber ku jinan di heman demê da erkên xwe yên malê jî bi cih anîn, ev rewş ji bo jinan bû sedema jîyaneke dualî (Gedik, 2019: 303).

Çîyawazîya xweza-çand wekî sedema derêxistina jinan a ji qadên gelêrî tê nîşandan. Bedena jinan ji ber taybetmendîyên wan ên zayînê ligel xwezayê wekhev tê dîtin. Lewra wekî karê jinan mayîna di nav mal û malbatê da û anîna zarokan hatine dîyarkirin. Sedema îhmalkirina jinan a di çalakîyên bi mekanê ra eleqedar da exlebî

ew e ku ew di cihên girtî yanî malê da disekinin û karên xwe li wir çê dikin. Rolên zayendî yên bi jinan ra hatine têkildarkirin zextê li jinan dikin û ji bo jinan têketina qadên gelêrî tê astengkirin (Gedik, 2019: 303-304).

Ölçer Özünel di xebata xwe ya *Masal Mekânında Kadın Olmak* (Jinbûn di Mekana Çîrokê da) li ser têkilîya jin û mekanê weha dibêje: ji bo jinan mekana taybetî nava malê, mekana navîn pencere, mekana gelêrî derveyê malê ye. Pencereya ku mekana navîn e, cihê di navbera nava malê û dinyaya derve da ye (2006: 33). Di destanan da pencere gelek caran derbas dibe. Zehfî jî lehengên jin li ser pencerê disekinin. Di destana Memê Alan da dema Mem û Mîr setrenc dilîzin Zîn li ser pencerê disekine û temaşê wan dike. Çi wextê çavê Mem li Zîna li ser pencerê dikeve êdî hişê wî diçe, nikare baş bilîze û di dawîyê da ji Mîr wî têk dibe (Kaplan, 2019: 164; Celîl û Celîl, 1978: 113; Lescot, 1942: 316-318). Em dibînin ku dema setrenc tê lêyîstin Zîn nikare biçe ba wan, çinku cihê ku setrenc tê lêyîstin cihekî nêrza ye û ji bo jinan guncaw nîne. Jin encax bi rêya pencerê beşdarê wan dibin û li wan dinêrin. Di destana Zembîlfiroşê da jî Xatûn dema ji pencereya qesrê temaşê derve dike Zembîlfiroşî dibîne (Celîl û Celîl: 1978: 190; Amêdî, 2013: 182; Cindî û Evdal, 2008: 388) û wî dihebîne. Piştî vê dîtinê Xatûn ji carîyeyên xwe ra dibêje gazî Zembîlfiroşî bikin û wî binin ba min.

Di nav destan û hikayeyên gelêrî da wekî mekanên mêza ode, di odeyan da cihên bi perdeye hatîye veqetîn, mutbex, bêrî, berav, serkehnî derbas dibin.

Di destanên kurdî da lehengên jin bi piranî di cihên mêza da derdikevin pêşberî me. Ew di cihên ku ji bo wan hatine veqetandin da bi karên mutbex û xweyîkirina zarokan ra mijûl bûne. Ji ber jîyana koçberî û nîvkoçberîyê jin ji bo bêrîyê ji mal derketine. Ji ber ku ev kar jî bi karê malê ra eleqedar e bêrî dikare wekî cihê mêza/femînen bê destnîşankirin. Jin di cihên nêrza yên wekî dîwanê û meydana şer da pir kêm tên dîtin. Lewra jin di mekanên teng û tarî da cih girtine.

Di destana Evdilrehman Zorbaşî da cihê jinan jî mêran jî wekî ode derbas dibe. Lê ji bo cudakirina cihê jinan di nav odêyê da bi perdeyê cihê wan hatîye veqetandin. Jin dema xwastine ku tiştekî bibêjin, li pişt perdeyan daxwazên xwe gotine (Amêdî, 2013:336).

Di destana Zembîlfiroşê da wekî cihekî mêza odeya Xatûnê derbas dibe. Xatûn di qesrê da li odeya xwe ye û carîyeyên wê jî li ba wê ne.

Di destanan da cihê ku jin li wir xuya dikin exlebî bi karê jinan ra eleqedar in. Me di berî da jî gotibû bi karê malê ra jin eleqedar dibin. Herçiqas karê bêrîyê li derveyê malê bê kirin jî ew kar kareke mêza ye. Jin exlebî li wir xuya dikin. Di hikayeya Bêrîvanê da Perîşan diçe bêrîyê û li wir Cewze Begî dibîne (Celîl û Celîl, 1978: 449). Di destana Cembelîyê kurê mîrê Hekarîya da Dewrêş Axa Binefşê direvîne û dibe. Cembelî dikeve pey şopa Binefşê û xwe digehîne mala Dewrêş Axa û dibe şivanê mala wan. Rojekê qewraşa Binefşa Narîn diçe bêrîyê û çavê wê li Cembelî dikeve. Cembelî ewqas qeşeng e ku hiş û aqil di serê qewraşê da namîne û şîrê xwe dirêjîne. Qewraş diçe ba Binefşa Narîn û behsa qeşengbûna şivanî dike û Binefş jî meraq dike û roja din ew bixwe diçe bêrîyê (Celîl û Celîl, 1978: 185). Em di vê destanê da dibînin ku herçiqas Binefşa Narîn jina axayekî be jî dîsa diçe bêrîyê. Di destana Sêva Hecî da Sêvê diçe bêrîyê, serê mîyê digire, şivanê wan wê dibîne û evîndarê Sêvê dibe (Cindî, 2016: 92). Ji van mînakan jî dîyar dibe ku bêrî hem ji bo qewraşan hem jî ji bo keç û jinên axa û began wekî cihekî mêza derbas dibe û em jinan wekî bêrîvan li bêrîyê dibînin.

Berav dikare wekî ciheke mêza bê destnîşankirin. Ji ber ku cilşûştin, balav wekî karê jinan tê dîtin û mêr tu carê naçin balavê nakin. Di destana Sitî û Ferxî da em li gelek caran dibînin ku lehengên jin diçin beravê û kincan dişon (Kaplan, 2019: 194, 206; Amêdî, 2013: 68).

3.3.3. Mekanên Rûbirûbûnê

Li gor Başgöz keç û kurên pir bedew û ciwan ên ber zewacê bi awayekî nepayîn rastî hev tên. Di encama hevdîtinê da bi awayekî xurt û azwer ji hev hez dikin û girêdayî hev dibin. Gihîştin ji bo lehengan pir hêsan nabe. Ew nikarin yekser bizewicin, astengî dikeve navberê û leheng hev winda dikin. Encax di dawîyê da digihîjin hev û dizewicin (1998: 85-90). Herçiqas ev taybetmendîyên ku ji bo hikayeyên gelêrî tên gotin bo destanan derbasdar bin jî di destanan da cudahîyeke weha heye: exlebî lehengên destanan nagehijin hev û çîrok bi mirina lehengan bi dawî dibin (Subaşı, 2024: 106).

Di nav destan û hikayeyên gelêrî da wekî mekanên rûbirûbûnê xewn, baxê torkirî, li ber derîyê konan, kanî û serêkanî derbas dibin.

Baxê torkirî cihekî giştî ye û hin caran ji bo hilbijartina jinan tê bikaranîn. Bavê Memî ji bo ku Mem bo zewacê yekê hilbijêre hemû keç û bûkan di baxê torkirî da dide komkirin (Cindî û Evdal, 2008:310; Cindî, 2016: 27-29). Hemû keç û bûk xwe dixemilînin û diçin baxê Torkirî ku Mem wan bibîne û biecibîne. Ew der gelek caran bi nîyeta hilbijartina jinan hatîye bikaranîn.

Mem û Zîn ewil di odeya Memî da hev dibînin, cihê ewil a hevdîtinê ode ye (Celîl û Celîl, 1987: 91-93; Cindî û Evdal, 2008: 308; Lescot, 1942: 22-44). Cihê duyemîn ku Mem û Zîn hev dibînin Baxçê Keyfê ye. Zîn her hefte roja înê diçe nav Baxçê Kêyfê ku Mem bê û hev bibînin. Ew li wir cara duyem hev dibînin û kilaman diavêjin ber hev û dikevin kêf û henekan (Kaplan, 2019: 143-145, 149). Mem û Zîn li Kanîya Qestelê jî hev dibînin (Lescot, 1942: 210). Cihekî din a hevdîtina Mem û Zînê baxê Torkirî ye. Mîr ji gelê xwe ra dibêje em ê sibê herin rav û nêçîrê û bila Mem jî ligel me bê. Lê Zîn naxwaze Mem biçe û jê ra dibêje ji wan ra bêje ez nexweş im û neçe nêçîrê, pişti ew çûn em ê herin baxê Torkirî û ji xwe ra kêf bikin. Mem jî wisa dike û naçe nêçîrê. Piştî çûna Mîr û yên din Mem û Zîn diçin baxê Torkirî û li wir bi hev ra wext derbas dikin (Cindî, 2016: 45-47).

Binefş dema diçe bêrîyê Cembelîyî dibîne. Ji ber ku Cembelî cilên şivantîyê li xwe kirîye û ji zû da wî nedîtîye Binefş ewil Cembelîyî nas nake. Dema ku Cembelî xencerê zîvî ji kalan derdixîne ew çax Binefş wî nas dike û gelek şah dibe. Li wir Binefş û Cembelî dikevin henek û laqirdîyan (Celîl û Celîl, 1978: 186; Cindî, 2016: 80-81).

Di destana Sêva Hecî da leheng cara yekem di xewnê da hev dibînin û aşiqê hev dibin. Mîr Mehmûdê kurê mîrê Beraza dema di xewnê da Sêva Hecî dibîne gustîlkên hev diguherînin û soz didin hev. Bi heman awayî Sêva Hecî jî Mîr Mehmûdê kurê mîrê Beraza di xewnê da dibîne û aşiqê wî dibe (Celîl û Celîl, 1978: 157-158). Cara duyem leheng hev di nava çadira Sêva Hecî da dibînin (Cindî, 2016: 89-94). Li gor varyanteke din (Celîl û Celîl, 1978: 159) piştî hevdîtina wan a di xewnê da cara duyem ew li berîyê hev dibînin. Sêva Hecî diçe nav pez û pez didoşe. Mîr Mehmûd jî

xwe li cihekî vedişêre lê paşê derdikeve û diçe ba Sêvê. Ew bi vî awayî cara duyem hev dibînin.

Xewn yek ji wan cihan e ku leheng hev cara yekem dibînin. Exlebî leheng hezkirîyên xwe di xewnê da dibînin an jî aşiqê wî/ê kesê/a ku di xewnê da dîtine dibin. Lê di destana Sîyabend û Xecê da rewş diguhere. Sîyabend destebirayê xwe Qeregêtranî di xewnê da dibîne û Qereqetran jî Sîyabendî di xewnê da dibîne (Celîl û Celîl, 1978: 131-132). Dema Sîyabend û Qeregêtran rastî hev tên behsa xewna xwe dikin û Qeregêtran weha dibêje: "*Filankes, li dara dunê kesî heta niha pişta min neanîye erdê. Di xewnê da kalekî ji min ra gotibû ku her bi tenê destebirakê te yê axretê, Sîyabendê Silivî wê pişta te bîne erdê. Dibe ku tu ew bî*?" (Aras, 2023: 18). Sîyabend jî behsa xewna xwe dike û dibêje min jî tu di xewna xwe da dîtibû û bi vî awayî dibin destebirayên hev.

Di destana Xelîl Begî da Xelîl Beg û Perîşan Xanim cara yekem hev di xewnê da dibînin (Cindî, 2016: 99-100) û gustîlkên xwe diguherînin (Celîl û Celîl, 1978: 223). Wekî cara duyem dema Xelîl Beg ji bo nêçîrê Perîşan Xanim jî ji bo seyranê derdikevin derve û di rê da rastî hev tên. Perîşan Xanim dizane ku ew Xelîl Beg e lê Xelîl Beg wê nas nake. Li wir bi awayekî kilamkî bi hev ra diaxivin û Perîşan Xanim wî dawetê mala xwe dike (Celîl û Celîl, 1978: 223-225).

Xewn di destana Sîyabend û Xecê da xaleke giring e. Sîyabend zarokekî bê dê û bav e û li ber destê apê xwe û jinapa xwe mezin dibe. Ew gelekî neheqîyê lê dikin û Sîyabend ji ber wan direve û diçe. Ew dikeve pey feleka xwe ya xirab, dibêje ez ê felekê bibînim û pê ra şer bikim. Sîyabend rojekê xewnekê dibîne:

Di xewê da kalek hate xewnê.
Got, "Rabe ser xwe Sîyabendê Silê!
Tê bibî palîwankî mezin û çê
Navê teyê bela be li her derê
Min te ra anye Hêşînbozê Surê,
Qaşa Zîn daye Lahorê Qetlê
Qedera te nivîsîye ser devê şûrê,
Netirse ji însanê rûyê dinê!

Hevza xwe bike ji heywanê çolê!
Tu yê bibî destebirakê Qedê,
Jê ra dibên Qedegêtranê Salê.
Birakê te kurê Hemê û Zemê (Aras, 2023: 14).

Xewna Sîyabend rast derdikeve. Dema ew çavê xwe vedike hespekî dibîne. Ew kalê ku tê xewna wî Xizir e û gelek caran di destanan da Xizir digihîje hawara lehengan. Ew wan ji paşeroja wan xeberdar dike û tiştên ku dibêje rast derdikevin. Lewra xewn di destanan da insûreke muhîm e.

Sîyabend cara ewil Xecê li ber konê wan dibîne. Ew Xecê pir diecibîne û dilê wî dikeve Xecê (Cindî û Evdal, 2008: 567). Ewil dibêje gelo ev xewn e yan rast e. Paşî dizane ku ne xewn e û ne bi dilekî bi heft dilan Xecê dihebîne. Xecê jî li bejn û bala Sîyabendî dinêre ew jî ne bi dilekî bi heft dilan wî dihebîne (Aras, 2023: 26). Di destana Sîyabend û Xecê da wekî cihê wan ê gihîştinê Çîyayê Sîpanê Xelatê dikare bê destnîşankirin. Sîyabend Xecê ji destê kurê mîrê Şikakîyan direvîne û berê xwe didin Sîpanê Xelatê. Ev çîya hem dibe cihê gihîştina wan hem jî cihê veqetîna wan (Celîl û Celîl, 1978: 142-148; Cindî û Evdal, 2008: 562-566). Çinku her du hezkirî li wir rihê xwe teslîm dikin.

Di Mîrza Axayê Rindikî û Têlî Eyşanê da wekî cihê hevdîtina lehengan konê mala bavê Têlî Eyşanê derbas dibe (Amêdî, 2013: 225).

Kanî û serê kanîyan gelek caran bûye cihê hevdîtina lehengan. Dema bavê Sitî Ferxî ji mal dike der Ferx diçe ba xalê xwe Ûsiv dimîne. Sitî bê Ferx idare nake û ligel xwişkên xwe diçe serê kanîyê ku Ferxî bibîne. Ew li wir hev dibînin (Cindî, 2016: 127).

Di destana Evdilrehmanê Zorbaşî da wekî cihê hevdîtina lehengan odeya Feyrûz Xatûn/Pîroz Xatûnê derbas dibe. Dema Evdilrehman Zorbaşî diçe û xwe digehîne Hespê Sor hesp bi zincîrekê ve girêdayî bûye. Evdilrehmanê Zorbaşî dikeve pey zincîrê û dibîne ku zincîr di odeya Pîroz Xatûnê da bi texta ku li ser razaye ve hatîye girêdan. Li wê odê leheng cara yekem hev dibînin û di dîtina ewil da ji hev hez dikin (Amêdî, 2013: 339; Cizîrî, 2020: 116).

Di destana Elo Şêxanî da cihê hevdîtina lehengan odeya Elo Şêxanî ye. Dema Fatimê xwe digehîne Elo, ew di nav cihan da ye, nexweş e û bi tu kesî ra naaxive (Celîl û Celîl: 1978: 220). Piştî Fatimê xwe dide nasîn Elo sax dibe û digihîjin hev.

Di destana Zembîlfiroşî da cihê ewil ê hevdîtinê yê lehengan odeya Qedîmxasê ya li qesrê ye. Cihê duyemîn mala Zembîlfiroşî ye. Dema Zembîlfiroş di nav cihê xwe da radizê Qedîmxas diçe nav cihê wî û li wir dîsa hev dibînin. Cihekî din ê hevdîtina wan li serê çîyayekî ye. Li wir Zembîlfiroş û sê horî di nav kulîlkan da bi hev ra digerin û Xatûn jî diçe ba wan (Celîl û Celîl, 1978: 189, 194). Cihê dawî jî zindan e. Dema Mîr pê dihese ku dilê Xatûnê ketîye Zembîlfiroş wan diavêje zindanê (Cindî û Evdal, 2008: 393) û her du leheng li wir dîsa hev dibînin.

Di Gulperîyê da Narinc û axayê Behdînan li ser kanîyê hev dibînin. Dema çavê axê li Narincê dikeve her wekî barekî zêr bibîne şah dibe. Di dilê xwe da dibêje ev jinik paşa jî be, mirtib jî be ez ê li xwe mehr bikim (Amêdî, 2013: 380). Axa pê ra dizewice û roj bi roj hezkirina wî zêdetir dibe.

Di hikayeya Bêrîvanê da leheng di bêrîyê da hev dibînin (Celîl û Celîl, 1978: 449). Şêx, Perîşanê direvîne ê û Cewze Beg jî dikeve pey wan. Cewze Beg ji bo ku bikaribe xwe nêzikê Perîşanê bike dibe duajoyê mala şêx. Rojekê dema Perîşan diçe bêrîyê Cewze Beg û Perîşan li wir hev dibînin û plana xwe ya revê çê dikin.

3.4. STEREOTÎPÊN DI DERHEQÊ JIN Û MÊRAN DA

Civak jin û mêran wekî du komên cuda disenifîne û daxwaza hin taybetmendîyan ji wan dike. Ev taybetmendî wekî "*stereotîpên zayenda civakî*" tên binavkirin (ji Franzoi, 1996 vgh. Y. Dökmen, 2021: 32). Hestyar, pasîf, zeîf, bendewar wekî taybetmendîyên jinan; li alîyê din bihêz, cesûr, hêrsoyî, erîşkar û serbixwe wekî taybetmendîyên mêran tên dîtin (Oğuz, 2019: 17). Divê mêr hişk, jin nerm; mêr bihêz jin zeîf; mêr serbixwe, jin bendewar; mêr rasyonel, jin hestyar bin (Demir, 1997: 111-112). Sandra Lipsitz Bem derûnnasek e û wisa difikire ku zayend bi awayekî civakî tê avakirin. Bem, berî ku "*teorîya şemaya zayendê*" bi pêş bixe "*envantera rola zayendê*" bi pêş dixe. Ew di xebata xwe ya 1974an da taybetmendîyên jinane weha rêz dike: xwîngerm, dilovan, kêfxweş, zarokwarî, dilnerm, femînen, nazîk, bêdeng, zimanşirîn, famker, hestyar, xwîngerm, îtaetkar. Li gor xebatê jin zû tên xapandin, ew ji zarokan hez dikin û ji bo hewcedarîyên mirovên din baldar in. Di nav taybetmendîyên mêrane

da êrîşkar, hêrsokî, jixwebawer, bihêz û serbixwe hene. Ew ji talûkeyan natirsin û nêrînên xwe diparêzin (Prentice û Carranza, 2002: 269-270). Lê li vir divê neyê jibîrkirin ku li gor teorîya Bem jinanetî û mêranetî du nasnameyên cuda nîn in. Ew wan wekî parçeyek ji spektrumê dibîne ku taybetmendîyên hem jinanetî û hem jî mêranetîyê dihewînin (Zukauskas, 2024).

Stereotîpên zayenda civakî jinan di qadên teng û tarî da hepis dike lê mêr di qadên fireh û vekirî da cih digirin. Di civakên pederşahî da mêr li gor jinan jîyaneke aram û ewletir dijîn. Jin neçar dimînin ku di qadên teng û girtî da bijîn lê li alîyê din qadên jîyanê yên mêran li gor ên jinan firehtir in. Wekî encama vê rewşê jin hin caran ketine şiklê mêran û bi vî awayî qadên jîyana xwe firehtir kirine. Bi vî awayî xetereyên bi laşê jinan ra eleqedar kêm zêde ji holê rabûne (Arsoy, 2011: 77). Di nav destanên kurdî da mînakên vê rewşê hene. Di destana Sîyabend û Xecê da Ereb Zincar jin e lê kincên mêran li xwe kirîye û wekî mêran li ser hespê gerîyaye û şer kirîye. Ewil dema Sîyabend û Qeregêtran wê dibînin wekî zilam behsa wê dikin. Di navbera wan şer çê dibe û ev şer sê roj û sê şevan dewam dike lê kes zora kesî nabe. Di dawîya şêrê wan da dema Sîyabend Ereb Zincarê diavêje erdê û kêrik derdixîne ku serê wê jê bike ew çax Ereb Zincar ji pêsîra xwe kezîyên xwe derdixîne û dibêje ez qîza mîrê cina me (Celîl û Celîl, 1978: 134-135). Leheng heta wê çaxê jinbûna xwe vedişêre û xwe wekî mêr dide nîşan. Dîsa di destana Kerr û Kulikî da dema Kerr û Kulik ji bo Bilêcana Elîsarê Gêsî rê dikevin Perîşan dixwaze dêya wan Werdekê ji çûna wan xeberdar bike. Perîşan gazî carîyekê xwe dike û jê ra dibêje bila şivanê me bê cem min. Dema şivan tê cem wê Perîşan hinek zêr dide şivan û jê ra dibêje: "*Here nêrîyekî serjê bike, postê wî û hûr û pizûrê wî ji min ra hilde bîne!*" (Aras, 2022: 32). Şivan daxwaza Perîşan Xanimê bi cih tîne û Perîşan jî postê nêrî li qewraşê dike ê hûrê nêrî jî ziwa dike û li serê wê qewraşê dipêçe. Qewraş bi wî awayî dikare biçe û xwe bigihîne Werdeka dêya Kerr û Kulikî ji bo ku wê ji çûna zarokên wê xeberdar bike. Di vê destanê da em dibînin ku derketina derve ya jinekê ne hêsan e. Ew piştî ku wekî mêrekî kincan li xwe dike dikare bi awayekî rehet derkeve derve û peywîra xwe bi cih bîne. Dîsa di heman destanê da Werdek jî kincên mêran li xwe dike û siwar dibe, dikeve pey zarokên xwe. Dema xwe digehîne wan Kerr û Kulik dêya xwe nas nakin çinku kincên mêran li ser bûne (Aras, 2022: 38).

Em di destanan da gelek caran dibînin ku beyî xebera lehenga jin ew ji alîyê bav û birayê xwe ve tên dayîn. Li vir mêr di statuya biryardayînê da ne. Ev jî pasîvîzekirina jinan dide nîşan. Jin gelek caran ji bo mêran hatine qurbankirin. Dema Mem û Mîr setrencê dilîzin û Mem şerta xwe weha dibêje: "*Mîrim, madem wesa rûyêd min ji te reş in. Min zanîye te xwişkek heye. Heke min ji te bir, tu dê xwişka xwe bideye min*." Mîrî got: "*Ser serê xwe dê qurbana te bikem*." (Kaplan, 2019: 164). Mîr careke din dîsa dibêje ku: *"... xwişkekê ne ez dê sed xwişkan qurbana Memo bikem*." (Kaplan, 2019: 167). Ji axiftinên Mîrî jî xuya dibe ku qîmeta fikrê jinan zêde tune ye. Eger bav û birayên wan bixwazin dikarin qurbana mêrên bîyanî bikin. Li vir ji qurbanbûnê mebest ew e ku ez xwedî gotin im û mafê min heye xwişka xwe bidim yekî. Hin caran jin bixwe jî bi gotinên xwe xwe bêqîmet dikin. Dema Mîr diçe ba xwişka xwe Zîn ku jê tiştekî bixwaze Zîn dibêje ku: *"... ez ew ax im ewa tu li ser digeri...*" (Kaplan, 2019: 168). Ev gotin û rewş û qîmeta jinan kêm dike. Ji xwe ev kevneşopî di nav kurdan da ji berî ve heye. Mele Mehmûdê Bayezîdî di pirtuka xwe ya Adat û Rusûmatnameê Ekradîye da ji bo zewaca keçan heman tiştan dibêje:

> Keç û jinên kurdan bi xwe bi nefsa xwe ne di destê xwe de ne. Bila ku bav û birayê keçê eger ew dane mirovekî keç nikare qebûl neke. Bixwaze nexwaze keç dê wî mirovî bistîne. Bila keç bi wî xortî razî û xweşhal jî nebe. Ev adet e ne şerî'et e. Ji ber şerm di nav kurdan de û pir 'eyb e ku bav û bira keçan bidin, ew jî bibêjin ku em nastînin" (2010: 147).

Di destana Xelîl Begî da dema Xelîl Beg dikeve pey Gozel Xanimê û diçe Erebîstanê birayê Gozel Xanimê sedema hatina wan dipirse. Xelîlê Çawiş dibêje Xelîl Begê birazîyê Sert Mehmûd Paşa ji bo xatirê Gozel Xanima xwişka te hatîye. Ew çax Mîrê ereban jî dibêje ku: "*De, dibê, ku hatîye, qîzek e ez ê bi qurbana wî kim*." (Cindî, 2016: 102-103). Mirê ereban bi vî awayî xwişka xwe Gozel Xanimê bê pirs û pirsyar dide birazîyê Sert Mehmûd Paşa. Di dayîna Gozel Xanim da bêguman statûya Xelîl Begî bandoreke mezin e. Ew ji malbateke bi nav û deng e û çawa diçe û dixwaze hezkirîya xwe ya xewna şevan didin wî.

Di destana Kela Dimdimê da jî rewş heman e. Dema Xanê Lepzêrîn ji xwe ra kelhê çê dike Şah wekî dîyarîya kelhê keça xwe Xan Perîyê dide kurê Xan Ebdal Begê: "*Xano! Min keça xwe Xan Perî da Ebdal Begê. Bila eve dîyarîya min ya kelê bî*t." (Kaplan, 2019: 45). Ev dîyarî gelek xweşê Xan diçe û daweta kurê xwe Ebdal Beg û Xan Perîyê çê dike. Em dibînin ku bêyî daxwaz û xwastina keçan bavê wan wekî dîyarî wan dane xelkê. Ji ber ku di sîstema pederşahî da mafê jinan tune ye ku bibêjin ez naxwazim yan jî ez filankesî dixwazim lewra bav û birayên keçan şûna wan biryar didin û keçan didin mêr.

Di destana Dewrêşê Evdî da Zor Temir Paşa ji bo şerê li hember tirkan û Gêsan dixwaze alîkarî ji Dewrêşê Evdî bixwaze lê nikare vê yekê rasterast bike. Ew keça xwe ya bedew Edûleyê diavêje mazatê û dibêje di vê şerê da kî serdarîya me bike ez ê keça xwe bidim wî (Filiz, 2021: 45). Jin di vê destanê da roleke giring dileyîze. Ew ji bo dîyarkirina pêşengekî şerî tê bikaranîn û pêşengîyê kî qebûl bike ew ê Edûleyê bistîne yan jî Zor Temir Paşa dê keça xwe bide wî kesî.

Hesen axa ji kirinên Sîyabendî ditirse û aqilmendan li odeyê kom dike. Aqilmend jê ra dibêjin "*Gulp'erîyê jêra bişeyne balê ye/ Eger dilê wî bigre Gulp'erîyêye/ Ê bibe ze'vê te, serê te wê reh'et bibe li malêye*." Hesen Axa gazî keça xwe dike û dibêje: "*Rabe, xemla xwe li xwe ke, here odêye/ Em binhêrin çi wê çê bibe li vêderêye*." Gulperî xwe dixemilîne û hêdî hêdî ber bi odeya Sîyabend ve diçe. Jê ra dibêje: "*Herê Sîyabendo, dilê min li-bêye/ K'erem bike, veke derîyê odêye/ Çawa dilê te mi divêye/ Dibê, mi jî wisa te divêye/ Ez û te emê têk'evine k'êf û h'enekê di dinêye."* Sîyabend bersiv dide: "*Herê lê, lê, lê, dilê min lîyane/ Bila bavê te ji xwe ra neke xem û xîyalane/ Bes, înca ez û te xuîşk û birane.*" (Celîl û Celîl, 1978: 130-131). Li vir gelek xalên giring hene. Yek ji wan dîsa bavekî keça xwe ji bo silametîya xwe pêşkêşî mêrekî dike û ew keç jî bê îtîraz qebûl dike. Em dizanin ku di rastîyê da Gulperî jê hez nake û di berî da dema Sîyabend jê av xwastibû av nedabû wî. Lê dema bavê wê tiştekî weha jê dixwaze ew dengê xwe nake. Ev jî pasîvbûna jinan dide nîşan. Bav û bira li şûna wan biryar didin û ew jî qebûl dikin. Lê li alîyê din jin xwe pêşkêşî mêrekî dike û mêr jî wê red dike. Ev jî xaleke giring a din e. Sîyabend yekî bixurur e û daxwaza Gulperîyê qebûl nake çinku di berî da Gulperîyê jî ew red kiribû. Em dibînin ku ji bo silametîya mîr, axa û began, ji bo silametîya erd û neteweyan jin gelek caran ji bo mêrên bihêz û egîd tên pêşkêşkirin. Sîyabend piştî Gulperîyê E'reb Zincarê jî red dike.

E'reb Zincar qîza mîrê cinan e. Wê ehd kirîye ku kî wê di şer da biavêje erdê ew a wî ye. E'reb Zincar û Sîyabend şer dikin lê Sîyabend nizane ku ew qîz e. E'reb Zincar kincên mêran li xwe kirîye. Sîyabend wê diavêje erdê û kêra xwe derdixîne ku serê wê jê bike E'reb Zincar pêsîra xwe diqetîne û kezîyên xwe dide nîşan. Ew ji Sîyabend ra dibêje: "*Ez qîza mîrê ciname/ Min adek da li ber rebbê jorîye/ Ewê ko mi bavêje, ez jêrame*." Sîyabend: "*Tu dîya minî, tu xua minî, li ser rûyê dinêye*." (Celîl û Celîl, 1978: 134-135) dibêje. Sîyabend careke din teklîfa jineke din qebûl nake û wê red dike. Piştî van gotinan E'reb Zincar jî tevlê wan dibe û dibin sê destebira (!).

Qîmeta hest û fikrên jinan tune ye. Ew layiqê wî şivanî hatine dîtin ku dê ji bo mala bavê wan heft salan şivantî bike. Li vir ji jinan daxwaza wan nayê pirsîn û gelek caran jî jin li hember vê rewşê îtîraz nakin, dengê xwe nakin û bi qedera xwe razî dibin. Dibe ku ew di wê bawerîyê da ne ku dê rizgarkerekî bê û wan ji wê rewşê rizgar bike û birevîne. Lê eger fikreke weha ya jinan hebe jî dîsa em nabînin ku lehengên jin ji bo "xelasbûna xwe ya ji wê zewacê" kedekê didin. Di destana Sêva Hecî da bavê Sêvê soz dide şivên ku eger heft sal ji wan ra şivantî bike dê Sêvê bide wî. Lê Mîr Mehmûdê kurê mîrê beraza dikeve pey Sêvê, wê dibîne, hil dide û diçe (Cindî, 2016: 95). Di destana Stî û Ferx û Xelîl Begî da jî bavê lehenga jin li hember şivantîya heft salan soza keçdayînê dide.

Li gor stereotîpên zayenda civakî divê mêr li pey jinan herin û ji bo gihîştina evîndarê divê mêr ked bidin. Eksê wê dema jin bikevin pey mêran ev tişt ji alîyê gel ve xweş nayê dîtin. Di evîndarîyê da divê hertim ê ku ked dide, şer dike, berxwe dide mêr bin. Di destana Memê Alan da ev stereotîp xuya dike. Gava kevok Zînê dihingirin û dibin nav cîyê Memî haja her duyan jî ji tiştekî tune ye. Li wir Mem gava Zînê di nav cihê xwe da dibîne dibêje: "*Zînê, mêr pêy jina digerin, yan jin pêy mêra? Mêr digerin, got û Zînê rabû ser xwe*" (Cindî û Evdal, 2008: 308; Cindî, 2016: 26). Piştî hevdîtina ewil a Mem û Zînê şeş meh derbas dibin û Zîn li benda hatina Memî disekine. Zîn tu xeberê ji Memî nastîne û poşman dibe ku ewqas wext li benda Memî sekinîye. Li gor Zînê divê Mem li pey wê bihataya. Zîn: "*Ma ew nizane ko ez jinek im, tu caran jin nagerin li welatan, li pê mêrane. Adetê dinê ew e ko mêr digerin li pê jinane* (Lescot, 1942: 124) dibêje. Li vir xuya dike jin jî mêr jî di wê bawerîyê da ne ku divê jin li pey mêran neçin. Ev tevger tevgereke nêrza ye û divê mêr li pey jinan herin. Lê di hin cihan da em dibînin ku eger leheng yekî dewlemend û navdar be jin ji bo ku bên

ecibandin dikevin pey wî lehengî. Dema bavê Mem Al Paşa delîl dişîne û dibêje bila hemû qîz û bûk li baxê min kom bin û Mem kê hilbijêre ez ê wê ji bo Memî bixwazim, ew çax hemû qîz û bûk xwe dixemilînin û diçin baxê Al Paşayî. Qîz li derûdora Memî digerin û jê ra helbestan dixwînin ku Mem yek ji wan hilbijêre (Cindî, 2016: 27-28). Herçiqas ev rewş li gor stereotîpên zayenda civakî neyê hêvîkirin jî li vir mirov dikare bêje ku statuya lehengan li ser tevgerên jin û mêran bandor dike. Eger ew Mem nebûya û kesekî ji rêzê bûya gelo dîsa jî dê qîz û bûk li derûdora wî bicivîyana? Dê malabata qîzan ji bo xemilandina qîzên xwe heywanên xwe bifirotana û kincan bistana? Bê guman ev rewşa derî adet bi statuya Mem ve eleqedar e. Ji ber ku di dilê Mem da Zîn heye lewra ji wan hemûyan ra dibêje hûn wekî xwişk û dêya min in. Bi vi awayî ew keçên xemilandî bi awayekî destvala vedigerin malên xwe.

Li gor stereotîpên civakî divê mêr bi hêz bin û hestyar nebin. Girîn û zeîfbûn wekî taybetmendîyên jinan tê dîtin. Li gor nêrîna civakê divê mêr negirîn û girîn karê jinan e. Mêrên ku digirîn gelek caran hatine rexnekirin û civakê tinazên xwe li wan kirîye (Orhan, 2024: 13). Lê di hin destanan da rewş diguhere û mêr jî digirîn. Piştî hevdîtina ewil a Mem û Zînê serê sibê dema Mem hişyar dibe û gustîlka Zînê di tilîyê xwe da dibîne digirî û bi destmala Zînê rondikên xwe paqij dike (Kaplan, 2019: 124). Dema Mem berê xwe dide Cizîra Botan û terka welatê xwe dike bavê wî digirî (Cindî û Evdal, 2008: 312; Celîl û Celîl, 1978: 97). Heta bav û dêya Mem ewqas digirîn ku wekî ava aş û kanîyan. Paşê hişê wan diçe û dikevin erdê. Di dawîyê da ji ber girînê çavê wan kor dibin (Celîl û Celîl, 1978: 98). Ev girîn hem ji bo tenê mayînê ye hem jî ji tirsê ye. Tirsa çûnûnehatinê. Çinku welatê ku Mem berê xwe dayê nayê zanîn û ev nedîyarî jî dibe sedema girîna bavê wî. Piştî Bavê Memî Mem jî digirî le sedema girîna wî cuda ye. Mem di rê da piştî sê rojan ferq dike ku lingê hespê wî Bor bi qeydan hatîye girêdan û hema hema qeyd gihaye hestîyan (Cindî û Evdal, 2008: 315). Mem dema rewşa lingê hespê xwe dibîne digirî, hem ji bo hespê digirî hem jî ji tirsa negihîştina Cizîra Botan. Mem dema li ser pirê rastî Zîna xwişka Bekoyê Ewan tê dîsa digirî (Cindî û Evdal, 2008:318). Vê carê ji poşmanîyê digirî. Ew dibêje dibe ku ev Zîn be, ew Zîna ku min terka dê û bavê xwe kir û ez ketime pêy. Mem di dilê xwe da dibêje yên wekî wê li bajarê min gelekî hebûn. Zîna xwişka Beko di bedewîyê da wekî Zîna serleheng bedew nîne û ev rewş jî Memî ditirsîne. Li vir xuya dike ku bedewî ji bo lehengên mêr xaleke giring e. Lê hespê Mem digihîje hewara Memî û jê ra dibêje

ev Zîna xwişka Bekoyê Ewan e. Mem careke din dîsa digirî lê vê carê ji bo hespê xwe Bor digirî. Hespê Mem ketîye bîrê, zikê wî werimîye û di ser da Beko ava golegenîya daye Bor. Mem dema rewşa hespê dibîne digirî. Mem dixwaze digel Bor biaxive Bor xeyîdîye û pê ra naaxive. Li ser wê yekê Mem zêdetir digirî (Cindî û Evdal, 2008: 325). Mem dema digihîje Cizîra Botan û qesr û qonaxan dibîne, wan qesr û qonaxan dişîbîne yên xwe, dê û bavê wî yên kal û pîr tên bîra wî û Mem digirî (Lescot, 1942: 108, 118). Dema xebera mirina Mem tê Hesen nikare xwe û digirî. Hesen digel bira û siwaran vedigerin û tên Cizîra Botan. Hesen dara şînê ya Memî dibîne û dîsa digirî. Dema Sitî girîna Hesen dibîne dibêje: "*Xwelî li serê we be ko hon jî dibêjin em peya ne/ Ma hon jî hatine û digirîne mîna jinan e./ Îro çend roj in meyîtê Memî maye di binê zindanane.*" (Lescot, 1942: 352-354). Ji van gotinên Sitî jî dîyar dibe ku girîna mêran xweş nayê dîtin û girîn wekî îşê jinan tê qebûlkirin.

Em di destana Dewrêşê Evdî da jî rastî girîna mêran tên. Siwarên gêsan nameyekê dinivîsin û ji Zor Temir Paşayî ra dişinin, dibêjin em ê hicûmeke mezin biavêjin ser Kîkan û Milan. Zor Temir Paşa pir ditirse û gazî hemû giregir û pehlewanên Kîkan û Milan dike û ji wan ra mektûbê dixwîne. Ew hemû giregir û pehlewan melûl dibin, ditirsin û hêdî hêdî digirîn (Celîl û Celîl, 1978: 281). Em dibînin ku dema mêr ditirsin digirîn. Herçiqas girîn wekî karê jinan jî bê dîtin mêr jî digirîn. Dema Dewrêş nameya Edûlê ji bavê xwe ra dixwîne û dixwaze here şerê bavê wî Evdî digirî (Celîl û Celîl, 1978: 282). Sedema girîna wî jî ew e ku bawerîya wî bi Zor Temir Paşayî nayê û dibêje Zor Temir Paşa li ser soza xwe nasekine û Edûleyê nade te.

Di destana Binefşa Narînê da dema birayên Binefşê û siwarên Derwêş Axa şer dikin bavê Binefşê Fariz Beg û Binefş di nav konê da ji bo birayên Binefşê digirîn. Du heb birayên Binefşê tên kuştin û yek ji wan tenê dimîne. Dema yê sax mayî tê ba Fariz Beg û Binefşê ew jî digirî (Celîl û Celîl, 1978: 182).

Di destana Zembîlfiroşî da dema Zembîlfiroş rastî qebrekî tê û ji mirinê haydar dibe diçe mala xwe bi girîn secde dike. Ew biryar dide ku dev ji mal û milkên dinyayê, mîrîtîyê berde û di rêya Xwedê da bi keda destê xwe bixebite û bijî (Gernas, 1995: 84). Dema Zembîlfiroş di qesrê da tê girtin nizane dê çi bike. Ew dixwaze biçe mala xwe lê dergevanan derîyê qesrê dadane û Xatûn jî nahêle ku Zembîlfiroş biçe. Zembîlfiroş

derdikeve serê kelhê û li jor û jêr dinêre, kelogirî dibe û ji halê xwe ra digirî (Cindî û Evdal, 2008: 391; Sadinî, 2011: 407).

Di hikayeya Gulperî da bavê Narincê dema di dîwanê da ji serpêhatîya keça xwe xeberdar dibe digirî (Amêdî, 2013:386). Ew ji kirinên xwe poşman dibe û êdî dizane ku seyda bêbextî li keça wî kirîye.

Di sîstema pederşahî da xwedî zarok bûn tiştekî pir muhîm e. Hem ji bo berdewamîya neslê û hem jî ji bo mal û milkê xwe dixwazin zarokên wan hebin, bi taybetî jî zarokên kur. Di serê destana Memê Alan a varyanta Lescot da bi navê Elî Beg, Emer Beg û Elmas Beg sê bira hene û ev her sê bira jî navser in. Emrê wan di navbera şêst û şêst û pênc da ye lê zarokên wan tune ne. Ew jî hewara xwe digehînin Xwedê û digirîn (1942: 2-4). Bajarê Mixribê di destê van her sê birayan da ye. Ew jî digirîn û dibêjin em ê bimirin dê malê me ji xelkê ra bimîne. Li vir bêzarokbûn dibe sedema girîna mêran. Giringîya zarokan di destana Kerr û Kulikî da jî xwe dide der. Silêmanî Madî dema diçe dîwana Emerê Simaîl Axayê Milî li wir tinazên xwe pê dikin û ew jî gelek aciz dibe. Silêmanî Madî dema diçe mala xwe ji jina xwe ra dibêje: "*Ne ez bim ne jî axatîya min be. Axatîya min serê min û heft bavê min bixwe! Di rojeke wilo de ku kurê min hebûna, wê di rojeke wilo de bi kêrî min bihatana. Wê bi kêrî min û heyfekê, wê bi kêrî min û derbekê bihata."* (Cizîrî, 2020: 187). Em dibînin ku zarokên kur ji bo bavan pir giring in. Bav bi saya wan xwe bihêztir hîs dikin û eger hewcedarî çêbe kur heyfa bavê xwe dihilînin.

Di destana Sîyabend û Xecê da dema Hesen Axa û siwarên wî tên ku Xecê birevînin destebirayê Sîyabendî nahêle û bi wan ra şer dike. Lê ji ber ku destê wî bi zincîrê ve hatîye girêdan nekarîbûye bi dilê xwe şer bike û ev jî dibe sedema girîna wî (Aras, 2023: 35). Sîyabend dema ji Elcewazê vedigere û diçe konê Xecê dibîne ku destebirayê wî Qeregêtran hatîye kuştin. Berî çûyînê Sîyabend dest û lingê Qeregêtran bi qeydê girê dide ku ew Xecê nerevîne. Ew bawerîya xwe bi destebirayê xwe naîne û dibe sebebê mirina wî. Dema dibîne ku Qeregêtran hatîye kuştin li ser disekine û digirî. Sîyabend dema li ba Qeregêtran mektûba Xecê dibîne û dixwîne dîsa digirî (Celîl û Celîl, 1978: 138-139; Aras, 2023: 39).

Di destana Kerr û Kulikî da dema Kulik bi xalên xwe ra şer dike birîndar dibe. Kerro diçe û heyfa wî distîne û şeş xalên xwe dikuje. Tenê xalekî wan dimîne. Kerro

dixwaze wî jî bikuje lê Kulik naxwaze û dibêje bila dêya me bêkes nemîne û nesla wan dewam bike. Piştî van gotinan Kulik wesîyeta xwe dibêje. Ew çax Kerro û xalê wan ê piçûk li ser Kulikî digirîn (Aras, 2022: 66).

Girîna jinan li gor stereotîpan tiştekî pir normal e. Çinku li gor stereotîpên zayenda civakî divê jin hestyar û zeîf bin. Ew dikarin bi awayekî hêsan bigirîn. Dema Mem diçe Cizîra Botan û qonaxekê dibîne wê qonaxê dişibîne qonaxa xwe û dê û bavê wî tên bîra wî. Mem hestyar dibe û digirî. Ticarê kal dema dibîne ku Mem digirî jê ra dibêje: "*Lawecan, te xêr e? Girî îşê pîrekan e*." (Lescot, 1942: 108). Ji gotinên ticarê kal jî dîyar dibe ku girîn îşê jinan e û girîna mêran xweş nayê dîtin. Wekî din dema Mem diavêjin zindana kevirî Zîn pir xemgîn dibe, du roj carek nan dixwe û hertim digirî (Cindî û Evdal, 2008: 336-339; Lescot, 1942: 326). Ew piştî mirina Mem naxwe û venaxwe mîna tavên baranê hêstiran dibarîne (Lescot, 1942: 356). Dema malbata Memî xebera mirina Mem dibihîsin dikin hewar û gazî. Şîneke giran didanin û pir digirîn. Keç û bûkên wan gulîyên xwe dibirin, diavêjin ser cilên Memî (Lescot, 1942: 364). Kevneşopîya kezîbirînê di nav kurdan da gelek berbelav e. Dema kesekî ku zehf jê tê hezkirin bi taybetî kesekî ciwan dimire jin, keç û xweh gulîyên xwe jê dikin û li ser gora wî li kêlekên wî dialiqînin (Bayezîdî, 2010: 144-145). Di destana Dewrêşê Evdî da dema xebera mirina Dewrêş tê Edûle digirî û xelk dibêje heqê wê ye girîn, bila bigirî (Celîl û Celîl, 1978: 288). Em dibînin ku girîna jinan wekî tiştekî pir normal tê dîtin û ew ji alîyê gel ve nayên rexnekirin. Dema Hesen Axa diçe ku Xecê birevîne li wir serê her heft birayên Xecê jê dike û Qedê jî birîndar dike. Xecê dema halê wan dibîne digirî û dilorîne (Aras, 2023: 36). Wextê kurê mîrê şikakîyan tê ku Xecê birevîne Xecê ji Sîyabend ra nameyekê dinivîse û li ser nameyê stêrkan dibarîne (Celîl û Celîl, 1978: 138). Dema Sîyabend Xecê direvîne diçin li ser Çîyayê Sîpanê Xelatê konê xwe vedidin li wir birayên Xecê û destebirayê Sîyabend tên bîra Xecê û Xecê digirî (Celîl û Celîl, 1978: 142; Cindî û Evdal, 2008: 569). Xecê dibêje: "*Ew mala bavê min a belavkirî, heft birayên min ê kuştîyên serjêkirî, ew bedena Qedê ya bi tîran pirtîpirtîkirî… Ditirsim bi ser da evana Sîyabend jî li vir bikujin, bi destê min bigirin, min dîsa paşda hildin bibin…*" (Aras, 2023: 47). Xecê li vir hem ji bo pêşerojê digirî hem jî ji bo paşerojê. Paşeroja nedîyar. Tirsa kuştina Sîyabend û birina wê Xecê digirîne. Careke din jî dema Sîyabend ji serê Sîpanê Xelatê dikeve û birîndar dibe Xecê ji halê wî ra digirî (Celîl û Celîl, 1978:146). Di destana Kerr û Kulikî da dema Kulik

tê kuştin û Birahîmê Cibiltînî laşe wî hildigire û dibe ba Şemsîxanê hewar û girîna Şemsîxanê digihîje asîmanan (Cizîrî, 2020: 200). Dema bavê Sitî Ferx ji mal dike der Sitî dikeve nav odêyê, derîyê xwe digire û bi şev û roj ji bo Ferxî digirî (Cindî, 2016: 128). Ferx dema biryara çûnê dide û ji Sitî xatiran dixwaze Sitî dîsa digirî (Kaplan, 2019: 196). Di destana Evdilrehmanê Zorbaşî da dema Evdilrehman Pîrozê û Hespê Sor direvîne dibêje heta ez şerekî li hember Xanê Çursî nekim ez ji van deran naçim. Pîroz dike û nake nikare Evdilrehmanî ji bo çûnê îqna bike. Siwarên Xanê Çursî ji bo şer tên û li pêşîya wan jî Buzêdê birayê Pîrozê heye. Dema çavê Pîroz li birayê wê dikeve digirî (Amêdî, 2013: 342). Lê dema mijar dibe şer û hezkirin evîndar bi piranî hezkiryên xwe hildibijêrin û bav û birayên xwe qurbanê hezkirîyên xwe dikin. Pîroz jî di şerê navbera bira û hezkirîyê xwe da hezkirîyê xwe hildibijêre û ji Evdilrehman ra dibêje: "*Eger tu wî nekujî ne aferim ji navê te re*." (Amêdî, 2013: 343). Li vir em dibînin ku tenê derdê jina hezkirî ew e ku hezkirîyê wê sax û silamet be û ew bê wî nemîne. Di dewama destanê da Pîroz careke din dîsa digirî û Evdilrehman sedema girîna wê dipirse û dibêje eger tu poşman bûyî ez ê te teslîmê malbata te bikim lê Pîroz dibêje ku:

> Ne wele ne poşeman im, wê royê ez bi te qayil nebûma, çima ez ê di gel te bihatama. Xwedê mi bikî qurbana serê te, Ebdulrehman Axa. Na wele koma siwara dibinim, ditirsim Xwedê nekî tiştek bi te bê, ez rebena Xwedê pişt te re çawa bikim? (Amêdî, 2013: 345).

Ji van gotinên Pîroz jî dîyar dibe ku ew bi awayekî xweperest tevdigere û lewra mirina bav û birayê wê xema wê nîne. Di destana Zembîlfiroşî da Zembîlfiroş xwe bi zorî ji destê Xatûnê xilas dike û ji kelhê diavêje erdê. Ew bi awayekî destvala diçe mala xwe. Dema jina wî Elê dibîne ku Zembîlfiroş destvala hatîye digirî û dibêje va du roj in tu çûyî û dê zarokên me ji birçîbûnê bimirin (Cindî û Evdal, 2008: 391-392). Dema Xatûn pê dihese ku Zembîlfiroş çûye ew jî radibe digirî û dikeve pey Zembîlfiroşî (Cindî û Evdal, 2008: 392). Di destana Xelîl Begî da Xelo diçe ba Mehmud Paşa, bêbextîyê dike û jê ra dibêje birazîyê te Xelîl Beg li ser navê te Perîşan Xanimê xwastîye lê bixwe pê ra zewicîye. Dema Mehmûd Paşa vê bûyerê seh dike pir hêrs dibe, diçe ligel Xelîl

Beg setrenc dilîze û wî dibe. Wekî şert jî Xelîl Beg bi stûnê ve dide girêdan ku mêrxasîya wî biceribîne. Mehmud Paşa Xelîl Begî bi stûnê ve dide girêdan û qalpaxa serê wî dibire û mumekê di mejîyê Xelîl Begî da şûna çirayê digirtîne. Dema Perîşan Xanim halê Xelîl Begî dibîne jê ra kilaman dibêje û digirî (Celîl û Celîl, 1978: 232, 233). Di hikayeya Gulperîyê da dema seyda bêbextîyê li Narincê dike û bavê Narincê jî biryara mirina wê dide. Xulam Narincê dibin çolê lê wê nakujin. Narinc li çolê bi tenê serê xwe dimîne û digirî (Amêdî, 2013: 380). Di Senem Xanim û Hiseynî da Hiseyn nameyekê dinivîse û ji Senem Xanimê ra dişîne. Di nameyê da behsa mirina Hiseynî tê kirin. Senem Xanim dema nameyê dixwîne digirî û xwe li erdê dide (Kaplan, 2018: 142).

Dema Mem û Zîn cara ewil hev dibînin nizanin gelo ew der cihê kî ye. Mem ji Zînê ra dibêje tu hatî odeya min; Zîn jî ji Memî ra dibêje ev der odeya min e û tu hatî odeya min. Li ser van nîqaşan dibêjin em ê gazî qewraş û carîyeyên xwe bikin. Yên kê bersiv bide ode odeya wî/e ye. Ji bo pêşengîyê Mem "*Jin ko hene darê şkestîne, bila e'wol dora te be, tu gazî qewraş û cêrîyê xo bike."* (Celîl û Celîl, 1987: 92) dibêje. Li vir xuya dike ku jin ji alîyê mêran ve çawa zeîf û guneh tên dîtin. Wateya gotina pêşîyan ya ku Mem bi kar tîne bi vî awayî derbas dibe: "*Ji ber ku jin ne bi destê xwe ne, mirov nikare bi soz û qewlê wan bawer bibe û bi sozen wan ve pişta xwe girê bide*." (Oncu, 2020: 109). "*Yanê jin zeîf hatine afirandin*." (Bingöl, 2014: 166). Li hin deran jî mêr bawerîya xwe bi jinan naynin û dibêjin jin pêbawer nîn in. Mem jî di wê fikre da ye û dibêje:

Tu caran emel nabe bi jinane,
Dilê wan î mîna tayê kerengan e,
Ba kî derê bixwaze, wê da dibe bi rojane
Hele ezê ban kim, binhêrim dike tu şorane (Lescot, 1942: 212).

Li Kanîya Qestelê dema Mem û Zîn rastî hev tên Mem dixwaze rûyê Zînê bibîne û daxwaza taseke avê ji Zînê dike. Zîn dibêje eger ez rûyê xwe vekim û avê bidim te dê her kes me bibîne û dê bibe sedema xwînrijandinê. Zîn ditirse bibe sedema rewşeke xirab:

> "Di berê da, xelkê kêmanî xistine derê me jinane, dibêjin: Jin parsîya kêm in, dibin ser hev de û rûreşîya dê û bavane.", "Em jin qismê parsîya xwar in, hergav dibin ser hevda serê peyane. Serê xwedîyê xwe berjer dikin di nav xelkane." (Lescot, 1942: 218-220).

Zîn li vir stereotîpên zayenda civakî nîşan dide û dibêje jin tiştên nerast çê dikin û dibin sedema rûreşîyê. Dikare bê gotin ku ev rewş hinek jî bi namûsê ra girêdayî ye. Li gor wan Mem yekî bîyanî ye û nabe ku jineke digel bîyanîyek biaxive û rûyê xwe nîşanê wî bide. Li gor fikra Zînê eger wan di wê halê da bibînin ev rewş dibe şermeke mezin. Lê Mem Zînê îqna dike, Zîn taseke av dide Mem û her du li Kanîya Qestelê rûdinin. Dema gelê bajêr wan di wî halî da dibînin şûrê xwe dihingirin û ber bi wan ve diçin. Lê Çeko nahêle û dibêje parastina namûsa me mîran neketîye stuyê we, eger hûn destê xwe dirêjê Mem bikin ez ê destê we jêkim. Li ser van gotinan ebeboz dibêjin namûsa wan me eleqedar nake û vedigerin malên xwe (Lescot, 1942: 232-234). Li vir em dibînin ku jin di gelek cihan da xwe kêm dibînin, bawerî jî yek ji wan cihan e. Zîn bi rêya gotinên pêşîyan "Jin parsûya xwar e/in"[7] (Oncu, 2020: 126; Aydoğdu, 2020: 119) dibêje ku bawerî bi jinan nabe. Jin li ser gotinên xwe nasekinin û ew bêbextîyan li mirov dikin. Di Gulperîyê da bikaranînek bi vî awayî heye. Dema seyda di rê da destdirêjahîya Narincê dike Narinc destûr nade û seyda jî wê bi kuştina kurê wê ve tehdît dike. Narinc dîsa ji qerara xwe venagere û dibêje: "*Bikuje, fermana Xwedê ye, ez jin in darê şikestî me, nikarim bi te, lê bira Xwedê bihêle*." (Amêdî, 2013: 385). Narinc ji alîyê hêzê ve xwe zeîf dibîne û hewara xwe digehîne Xwedê. Zeîfbûna jinê di Mîrza Axayê Rindikî û Têlî Eyşanê da jî derbas dibe. Di navbera Mîrza Axa û Têlî Eyşanê da nîqaş çê dibe û Têlî Eyşan ji Mîrza Axa dixeyîde û dixwaze vegere mala bavê xwe. Lê paşê Mîrza Axa dibêje: "*De bavo ew pîrek e darê şikestî ye/ Ne min bextê*

[7] Her gotineke pêşîyan xwedî çîrokek an jî serpêhatîyekê ye. Serpêhatîya vê gotinê jî weha ye: Rojekê jin û mêrek li mal rûniştine û li ser afirîna mirovan sohbet dikin. Mêr ji jina xwe dipirse: "Gelo jin bê kêmasî hatine afirandin an mêr?" Jin jî dibêje: "Jin bê kêmasî hatine afirandin." Mêr diqehire û dewam dike: "Ma tu nizanî ku jin ji parsûya mêran hatine afirandin û lewma gel derbarê wan da dibêje: Jin parsûya xwar e û bi jinan bawerî nabe. Jinik li mêrê xwe vedigerîne û dibêje: "Na weleh, ew ne wisa ye. Ji ber ku Reb cara yekê mêr afirandîye, gelek kêmasî û qisûrên wî hebûne, lê ji ber ku jin piştî ceribekê û cara duyem hatîye afirandin, Xwedê ew kêmasîyên ku kirine hevîrê mêr, ji hevîrê jinê derxistine û ew bê kêmasî û bi hostatîyeke hê balatir afirandîye." Mêr dibîne ku mejî û fama jinê bê qusur dixebite zanî ku nikare bersivan bide jina xwe radibe û ji mal derdikeve. Çend guhertoyên vê gotinê pêşîyan: "Jin heye parsûya xwar e, pira rizî ye, bê îtîbar e. Jin ku heye parsûya xwar e. Kulfet heye parsûya xwar e. Parsûya jinan xwar e, loma îtîbara wan tune ye. Parxaneke jinan kêm e, îtîbar boy jinê tune." (Oncu, 2020: 126-127).

vê keçikê reş kirîye." (Amêdî, 2013: 231). Mîrza Axa ji ber ku Têlî Eyşanê revandîye xwe sucdar hîs dike û naxwaze malbata wê û derûdor bi çavekî nebaş lê binêrin. Ji ber ku di revandinê da yên ku tên sucdarkirin exlebî jin in.

Fedakarî zêdetir wekî taybetmendîyeke jinan tê dîtin û ji jinan tê xwastin. Lê hin caran lehengên mêr jî fedakarîyên gelek mezin dikin. Dema Mem dikeve derîyê tengasîyê destebirayê wî Qeretajdîn fedakarîyeke gelek mezin dike û wî ji tengasîyê xilas dike. Mem û Zîn di baxê Torkirî da li ba hev in û Mîr û yên din bi ser wan ve tên. Eger Zînê li ba Mem bibînin ew ê şereke mezin derkeve çinku nabe ku berî zewacê jin û mêr bi hev ra wext derbas bikin. Mem Zînê di bin kurk/qapûtê xwe da vedişêre ku kes wê nebine. Ew kezîyên Zînê bi xef nîşanê destebirayê xwe dide ku jê ra rêyekê bibîne. Qeretajdîn ji bo xelasbûna wan koşka xwe dide ber agirê. Her kes ber bi agirê ve diçe û bi vî awayî Mem û Zîn ji wê rewşa xeternak xelas dibin (Cindî, 2016: 49-50; Kaplan, 2019: 155). Di varyanta Lescot da dema Hesen koşka xwe dişewitîne Mîr dixwaze here lê Beko nahêle. Vê carê Hesen Kurê xwe yê piçûk Celalî diavêje nav agirê, Sitî dike qîrîn paşê Mîr ber bi agirê ve diçe û Mem û Zîn ji wê rewşa xirab xilas dibin (1942: 298). Hesen ji bo Mem fedakarîyeke wisa mezin dike ku hem ji mal û milkên xwe dibe hem jî ji kurê xwe. Fedakarîyek din a di destana Memê Alan da derbas dibe fedakarîya her sê birayan e. Hesen, Çeko û Qeretacîn sê bira ne û Mem xwe li mala wan digire. Ev her sê bira ewqas ji Mem hez dikin ku dibêjin ew ji me çi bixwaze em ê ji bo padîşahê Mixribîyan bikin. Hesen dibêje eger dilketîya Mem jina min Sitî be herçiqas dêya zarokên min be jî ji îro bi şûn da Sitî wekî xwişka min e. Çeko dibêje eger ji bo Zîna qelendayîya min hatibe bila Zîn jê ra helal be û êdî Zîn wekî xwişka min e. Qeretacîn, birayê piçûk jî dibêje eger ji bo jin an jî destgirtîyê we nehatibe ji bo çi hatibe ez ê bikim (Lescot, 1942: 164-166). Li vir em dibînin ku destebirayên Mem ewqas jê hez dikin ku dayîna jin û destgirtîya xwe dahî qebûl dikin.

Fedakarîya jinê di Destana Kela Dimdimê da bi awayekî aşkera xuya dike. Xan dema ji bo şerê dawî amadehîyê dike dibêje: "*Piştî em hatin kuştin dê jin û keçên me bo kê bin?*" Jin jî dibêjin: "*Piştî we, me maldarî heram bît.*" Hin jinên kelê ji bo ku nekevin destê eceman jehr dixwin û xwe dikujin. Hinek ligel dergûşên xwe xwe ji kelhê diavêtin xwarê û dimirîn. Ev fedakarîya jinan dilê Xan diêşîne (Kaplan, 2019: 87). Jin ji bo ku nekevin destê neyaran xwe dikujin û namûsa xwe bi vî awayî diparêzin.

Di destana Binefşa Narinê a varyanta Cindî da dema Dewrêş Axayê kurapê Binefşê daxwazîya Binefşê dike malbata Binefşê wê nade û ji ber tirsa axê warên xwe diterikînin. Ew diçin li Çîyayê Tewrîzê û li ba Cemîl Begê kurê mîrê Hekarîyê bi cih dibin. Cemîl Beg[8] konê wan dibîne û diçe ba Binefşê û jê pirsa rewşa wan dike. Binefş jî yeko yek her tiştî jê ra dibêje. Binefşa Narîn dibêje bavê min û heft birayên min niha ji bo min bi Dewrêş Axa ra şer dikin. Cemîl Beg cihê şerê dipirse û diçe alîkarîya wan. Piştî şer diqede birayên Binefşê dibêjin divê em tiştekî pêşkêşî Cemil Beg bikin. Binefş jî dibêje: "*Bira, dilê min dibêyo/ Madem ew Cemîl Begê kurê mîrê Hekarî ye/ Ew ne motacê malê dinê yo/ Eger pêşkêş didinê/ Ez pêşkêşa wî me*" (Cindî, 2016: 72). Binefş bi vî awayî fedakarîyeke dike û xwe pêşkêşî Cemîl Beg dike. Di heman varyantê da Cemîl Beg jî fedakarîyeke mezin dike. Dema Dewrêş Axa Binefşê direvîne û dibe, Cemîl Beg dikeve pey Binefşê û diçe warê Dewrêş Axayî. Ew li wir heft salan şîvantîya mala Dewrêş Axayî dike. Li gor edetê wan heta heft salên bûkan temam nebin bûk naçin bêrîyê. Cemîl Beg ji bo dîtina Binefşê heft salan ji wan ra şivantî dike (Cindî, 2016: 81) û li benda dîtina Binefşê dimîne.

Di Senem Xanim û Hiseynî da jî em rastî fedakarîya jinê tên. Hiseyn Senem Xanima jina xwe, dê û bavê xwe diterikîne û diçe. Senem Xanim piştî çûna Hiseyn hem wekî keça malê hem jî wekî kurê malê dixebite û heft salan li benda Hiseyn dimîne (Kaplan, 2018: 142). Ew piştî çûna Hiseyn mala xwe, xesû û xezûrê xwe naterikîne û li ba wan dimîne.

Di varyantên destana Memê Alan da dema milyaket biryarê didin ku Mem û Zînê bînin ba hev dibêjin em ê Zînê bibin odeya Memî. Sedema wê jî weha dibêjin: "*Heke em Memo bibeyne bajarê Cizîrê danîne oda Xatûn Zînê bextê jinan gelek nîne belkî belayekê li serî bînît. Ya baş ew e em Zînê rakeyn danîne bajarê Mexrebzemînê oda Memo.*" (Kaplan, 2019: 120). Di dayîna biryara milyaketan da namûs jî xwedî bandor e wekî stereotîpên zayenda civakî. Mêr dema digel jinekê xuya bikin gelek caran ev nabe problem lê dema jinek digel mêrekî berî zewacê xuya bike ev dibe problemeke mezin. Milyaket jî ji vê rewşê xeberdar in û ji bo ku Zîn nekeve derîyê tengasîyê vê rêyê hildibijêrin.

[8] Di varyanta Hecîyê Cindî da navê Cembelîyê mîrê Hekarîyan wekî Cemîl Beg derbas dibe. (2016: 71).

Di sîstema pederşahî da jin ji alîyê mêran ve tên hilbijartin û mafê mêran heye ku ji yekî zêdetir jinê hilbijêrin û pê ra bizewicin. Jin jî ji halê xwe razî ne û gelek caran dengê xwe nakin. Duyemîntî li jinan hatîye barkirin û jin vê rewşê êdî wekî tiştekî normal dibînin. Mezinên wan ji bo wan çi bixwazin ew dengê xwe nakin û ji halê xwe razî ne (Bazidî, 2010: 147, 186). Zîna Beko dema dixwaze Memî bixapîne bi ser nakeve û Mem dizane ew keça Beko ye. Ew çax Zîna Beko teklîfa duyemîntîyê dike û dibêje piştî te Zîna Zêdan bir tu yê min jî wekî ya duyem bi xwe ra bibî bajarê xwe. Mem jî qebûl dike û dibêje: *"... ji peyakî ra zewaca du jinan hêsan e.*" (Lescot, 1942: 80-82). Bi vî awayî li hev tên. Di destana Sêva Hecî da jî em dîsa teklîfa duyemîntîyê dibînin. Gulçîçeka Dila dixwaze bi Mîr Mehmûd ra bizewice lê Mîr Mehmûd hezkirîyê Sêva Hecî ye û ji bo gihîştina wan jî divê Mîr Mehmûd qeytana Hemedanê bibe û teslîmê bavê Sêvê bike. Gulçîçeka Dila qîza mîrê cina ye, ew li xwe sîhr dike û diçe wê qeytanê dibîne û tîne. Lê ew jî bi şert tîne. Gulçîçeka Dila ji Mîr Mehmûd ra dibêje ez ê qeytana Hemedanê bînim lê dema te Sêva Hecî mehr kir tu yê min jî mehr bikî. Ew bi vî awayî li hev tên (Celîl û Celîl, 1978: 162-163; Xendekî, 2018: 110-111). Piştî ku qeytana Hemedanî tîne û li çavê bavê Sêva Hecî didin çavê wî vedibe û dibe wekî xortekî bîst salî. Mîr Mehmûd jî hem Sêva Hecî û hem jî Gulçîçeka Dila li xwe mehr dike.

Gelek caran di şibandinên kêmdîtinê da jin tên bikaranîn. Di destana Evdilrehmanê Zorbaşî da dema Osman Axayê Deqorî Evdilrehmanê Zorbaşî dike serokê çil xulamê xwe wê rewşê dişibînin "jina ku hewî bê ser". Xulam "*dûrî kerema guhdaran wî em xistin dewsa pîrekan*" (Cizîrî, 2020: 107) dibêjin. Li vir piçûkxistina jinan heye. Evdilrehmanê Zorbaşî dema dibe serokê wan xulaman xulam dikevin bin kontrola Evdilrehmanê Zorbaşî. Jin jî di sîstema pederşahî da di bin kontrola mêran da ne lewra ew çil xulam jî bûne wekî jinan û Evdilrehman Zorbaşî jî wekî hewîyê hatîye ser serê wan. Tu kes bi hatina hewîyê kêfxweş nabe.

Li gor stereotîpên zayenda civakî şerm kirin wekî taybetmendîyeke jinan tê dîtin û ev taybetmendî li mêran nayê. Jin divê şermok bin. Hesen ji Memî ra dibêje here Kanîya Qestelê û kurê behrê Bozê Rewan av bide. Ji ber ku keçên bajêr hemû li wir kom bûne Mem dibêje ez şerm dikim. Hesen jî: *"... şerm karê pîrekan e... Memo, eger te ji hinan hez kir, destê te ji te ra ye, fedî ne karê mêran e.*" (Lescot, 1942: 202) dibêje. Yanî divê mêr şermok nebin. Dîsa dema Mem li Kanîya Qestelê digel Zînê

rûdine Çeko tê û wan dibîne. Mem pir şerm dike û di dilê xwe da deh caran dibêje: "*Xwezî erd veqelişîya, ez têketama teweka heftane.*" (Lescot, 1942: 238). Ji ber ku Zîn qelendadîya Çeko ya sê salan bûye Mem gelek şerm kirîye. Zîn jî bi heman awayî gelek şerm dike û dibêje jinên bajarê em di wî halî da dîtin, xwezî erd qelişîya û ez têketima bin heft tebekan. Zîn ditirse ku navê wê û Mem bi awayekî xirab bikeve ser zimanan. Di destana Sîyabend û Xecê da piştî mirina Sîyabend birayên Xecê tên û Xecê dibin warê xwe. Di rê da Xecê difikire û dibêje: "*Ezê bi çi rûyî herim nava êlê, cem bûk û zeva. Dive wextekê ez, qîz û bûk xeverdin, wê ewê elîfê bidin rûyê min.*" (Cindî û Evdal, 2008: 572). Ji ber ku Xecê di roja daweta xwe ya bi kurê mîrê ereban ra digel Sîyabend revîyaye û çûye şerm dike ku biçe nav êla xwe. Ji şerma xelkê naçe nav êlê û vedigere ser Çîyayê Sîpanê Xelatê û xwe diavêje ba Sîyabendê xwe û ew jî li wir dimire.

Cesaret, yek ji stereotîpên zayenda civakî ya mêran e. Divê mêr bêtirs bin. Mem ji bo dîtina Zînê dixwaze ji şer vegere û lewra xwe birîndar dike. Ew bi vî awayî ji çûna şer difilite û diçe ba Zînê. Lê dema Zînê dibîne jê ra dibêje: "*Ji bona ko bigihême te, min destê xwe avête qulpê derewane, Li stoyê xwe danî kirasê tirsokane. Lingê xwe da ber devê şurane.*" (Lescot, 1942: 270). Hezkirî ji bo ku hezkirîya xwe bibîne serî li derewan dide û xwe wekî tirsonek dide nîşan.

Cesaret di destana Kela Dimdimê da xaleke bingehîn e. Rojekê Şah û Xan bi hev ra diçin nêçîrê. Di rê da şêrek rastî wan tê û Şah dixwaze mêrxasîya Xanî biceribîne. Ew ji Xan ra dibêje here wî şêrî ji bo min bikuje û dilê wî ji min ra bîne. Xan natirse û diçe ba şêrî. Xan destê xwe yê çepê li levenan dipêçe û şêr destê wî gez dike. Xan bi destê rastî şêr digire û kurê xwe Ebdal Beg siwar dike û tîne ba Şah. Şah ecepmayî dimîne. Li wir şêr destê wî yê çepê jê dike lê Xan bi destê xwe yê rast zikê şêrî diqelişîne û dilê wî derdixîne û teslîmê Şahî dike (Kaplan, 2019: 23-25). Şah piştî vê bûyerê ji mêrxasîya Xan zêdetir bawer dike û ji bo destê wî yê çepê destekî zêrîn dide çêkirin. Ji wê rojê bi şûn da edî jê ra "Xanê Lepzêrîn/Çengzêrîn" dibêjin. Heta tê gotin ku Xwedê rih daye wê destê û ji berî çêtir bûye. Ev jî bûyereke derasayî ye û Xan xwedîyê taybetmendîyên derasayî ye. Serleheng bi vî awayî ji azmûneke zehmet derbas dibe û lehengîya xwe, mêrxasîya xwe dide nîşan. Mînakeke din a cesareta Xan di wextê topberdana kelhê ya Şahî da xuya dike. Şah digel artêşa xwe ya mezin tê û top berdide kelhê. Dema Ebdal Begê kurê Xanî artêşa Şahî dibîne ji leşkerên Ecem pir

ditirse. Xan ji kurê xwe ra dibêje ku: "*Kurê min, ev ordîye hinde boş û qerebalix nîne. Ecem hîleyêd leşkerî diken. Xîvetêt wan qelekî xakî ne. Hema wesa diken da em bitirsin. Tu qet mereqê neke, eve hemî têra babê te naken.*" (Kaplan, 2019: 65). Li vir mirov şahîdê bêtirsîya Xanî tê. Ew mêrxasek e û ji ordîyeke mezin jî natirse, ji xwe bawer e. Ev jî taybetmendîya lehengan e. Ew ji tu tiştî natirsin û xwe bi paş ve nakêşin.

Dewrêş mêrxas û egîdekî kurdan e. Ew ji bo evîn û doza xwe ji bo şer pêşengîyê dike û bêtirs vê berpirsîyarê hildigire ser milên xwe. Herçiqas ew di dawîya şer da bê kuştin jî di encamê da kurd li hember ereb û tirkomanan bi ser dikevin û wan ji herêma Milan derdixînin û Dewrêş dibe lehengekî neteweyî (Cizîrî, 2020: 267- 275).

Cembelî yekî egîd, fêriz û pehlewan e. Dema dibîne ku birayê Binefşê bi tenê serê xwe bi Derwêş Axa û siwarên wî ra şer dike xîreta wî qebûl nake û ew jî diçe alîkarîya birayê Binefşê (Celîl û Celîl, 1978: 182). Serleheng bê tirs in û di şer da qehremanîya xwe nîşan didin. Dema Cembelî diçe û Binefşê direvîne Derwêş Axa pê dihese û digel du siwarên xwe dikeve pey wan. Derwêş Axa rastî wan tê û dibîne ku Cembelî hatîye û Binefşê direvîne jê ra dibêje ku: "*Lao, Binefşê xweş h'elal be li te, mi hê mêrekî weke te, bi zirav nedîtîye*." (Celîl û Celîl, 1978: 189). Em dibînin ku dijminê lehengê jî bêtirsîya Cembelî dizane û qebûl dike. Cembelî di destanê da jîr û jêhatîbûna xwe îspat dike. Dema Dewrêş Axa Binefşê direvîne Cembelî kurê mîr e û ew jî dikare artêşekê amade bike û biçe bi darê zorê Binefşê ji destê Dewrêş Axa xilas bike. Lê ew vê rêyê tercih nake. Ew qehremanîya xwe îspat dike û bi tenê serê xwe diçe û Binefşê ji destê Dewrêş Axa direvîne (Filiz û Aykaç, 2022: 554).

Sîyabend ewqas zerarê dide gundîyan ku êdî gundî dikevin pey kuştina wî. Sed û pencî xortê Silîvanî kom dibin û ber bi cihê Sîyabendî ve diçin. Sîyabend ji wan natirse, dikeve nava wan û di nav seetekê da wan hemûyan dikuje. Piştî şeş rojan destûr dide ku dê û bavê wan xortan bên û zarokên xwe bibin (Celîl û Celîl, 1978:122-123). Sîyabend dema dibihîze daweta Xecê û kurê mîrê ereban e dibêje: "*Xecê dizîka va birevînim. Na, ezê herim orta dawetê, ezê Xecê aşkela birevînim. Xecê, tu yê herkê aşkele bêyî, ezê te bivim, herke na, ez te navim. Ez mêrê dizîye nînim*." (Cindî û Evdal, 2008: 562). Lehengên sereke hertim kesên bêtirs in. Sîyabend jî yek ji wan lehengên bêtirs e. Ew tena serê xwe li hember sed û pencî kesan şer dike û wan hemûyan dikuje. Sîyabend dema Xecê ji destê kurê mîrê Şikakîyan direvîne kurê mîrê Şikakîyan bi

hezar siwaran ve tê û şer dikin. Sîyabend hewara xwe digehîne Xwedê û li ser hespê xwe wan hemû siwarên şikakîyan dikuje (Celîl û Celîl, 1978: 143). Di destanê da behsa destebirayê Sîyabendî, Qedê tê kirin. Ew jî bi qasî Sîyabend mêrxas û egîd e. Sîyabend dema ji bo amadehîya dawetê diçe Elcewazê bawerîya xwe pê nayne û dibêje dibe ku ew Xecê birevîne û bibe. Şik dikeve dilê wî û destê Qedê bi zincîrê girê dide û paşê ji bo amadehîya dawetê diçe. Di wê navberê da parsekek ji Hesen Axayî ra xeber dibe. Hesen Axa dema seh dike ku Xecê dane yekî radibe hezar esker top dike û diçe. Wî jî wextekî Xecê xwastibû lê Xecê nedabûnê. Hesen Axa bi hezar eskeran ve tê konê Xecê û şer dikin. Qedê bi destê xwe yê zincîrkirî ve heta berêvarê bi wan ra şer dike. Hesen Axa dema dibîne ku nikarine Qedê ew jî ji dûr ve tîr berdidin û bi vî awayî Qedê birîndar dikin (Aras, 2023: 35). Em dibînin ku Qedêyê destebirayê Sîyabend jî mêrxasekî ye û bi destê zincîrkirî berxwe dide û şer dike. Piştî rewandina Xecê Sîyabend dikeve pey wê û li mala pîrekê bi cih dibe. Ew jinika pîr ewil Sîyabendî nas nake û dema behsa Sîyabendî dike dibêje: "*Bi salixê dibên ku di dunê da ji Sîyabend mêrxastir kes tune.*" (Aras, 2023: 41). Xuya dike ku mêrxasîya Sîyabend di nav gel da belav bûye û yên wî nedîtine jî behsa mêrxasîya wî dikin. Koma siwarên dawetê Zînê ji bo Hesen Axa dibin û Sîyabend xwe digehîne wan. Ew nîvê siwaran dikuje, nîvê din jî xwe xelas dikin, direvin û diçin. Yên ku direvin bi saya lingên hespên xwe canê xwe xilas dikin (Aras, 2023:45). Li vir dîsa qehremanîya Sîyabend bi awayekî aşkera xuya dike. Çinku ew tenê serê xwe li hember hemû koma siwarên dawetê şer dike û bi ser dikeve. Careke din em dîsa rastî şerê di navbera Sîyabend û Hesen Axayî da tên. Sîyabend û Xecê direvîn û diçin serê Sîpanê Xelatê bi cih dibin. Hesen Axa û siwarên wî dikevin pey wan û rastî Sîyabend û Xecê tên. Sîyabend dîsa bêtirs dikeve nava wan û ji xeynî yên revîyane hemûyan dikuje. Ew di dawîyê da xwe digihîne Hesen Axa û bi derbekî serê wî jê dike û wî dixe erdê. Sîyabend li meydanê tu kesî sax nahêle (Aras, 2023: 48).

Di destana Evdilrehmanê Zorbaşî da dema çil xulamên Osman Axayê Deqorî bêbextîyê li Evdilrehmanî dikin, Osman Axa wekî ceza dixwaze wî bişîne pey keç û hespê Xanûmanê Çirsî. Evdilrehman ji bo destnîşankirina mêrxasîya xwe dixwaze her çil xulam jî pê ra biçin û bibînin gelo ew mêrxasekî çawa ye (Cizîrî, 2020: 109-110). Ji ber ku bawerîya Evdilrehman bi xulaman nayê û dizane wan bêbextîyê lê kirine dibêje bila ji min dûr nebin ku dîsa bêbextîyan li min nekin û qehremanîya min bila bi

çavê serê xwe bibînin. Ji xwe nav û dengê wî li her derê belav bûye. Tirsa wî ketîye dilê insanan. Hin kes dibêjin Evdilrehman dehbeyekî bê rûh û bê serî ye, hin kes dibêjin bi heft serî ye, hin kes dibêjin guhekî wî lihêf e yek doşek ye (Cizîrî, 2020: 112), hinek dibêjin sê serî ye, hinek dibêjin serhesin e, mirovan dixwe, jin ji bo ku zarokên wan razên zarokên xwe bi navê wî ditirsînin (Amêdî, 2013: 336, 339). Xanûmanê Çirsî di xewna xwe da Ebdulrehmanê Zorbaşî dibîne. Ew di xewnê da serê Xanî jê dike û Xanûmanê Çirsî bi tirs ji xew radibe, ji birazîyên xwe alîkarî dixwaze ku wî ji Ebdulrehmanê Zorbaşî biparêzin (Cizîrî, 2020: 113-114). Evdilrehmanê Zorbaşî ji xwe bawer e. Dema digel siwarên Xanûmanê Çirsî bi tenê serê xwe şer dike weha dibêje:

> "Ez Evdilrehman im,
> Erda ku ez lê bim, her gav ez box û beran im,
> Ez betil im, ez pêlewan im.
> Ez ê qesabê serê Xanûmanê Çirsî me,
> Siwarê Hespê Sor im,
> Kilê çavê Feyrûz Xan im…" (Cizîrî, 2020: 129).

Evdilrehman li ser xwe ra tu egîd û pelêwan nabîne. Ew bi egîd û mêrxasîya xwe di nav gel da dibe yekî efsanewî. Ew dema Feyrûz Xatûn û Hespê Sor bi dest dixe dikare vegere nav deqorîyan lê ew wisa nake û dibêje heta ez digel siwarên Xanûmanê Çirsî şer nekim ez naçim. Ew çûna bê şer wekî bênamûsîyê dibîne lewra heta ku şer nake wan deran naterikîne (Cizîrî, 2020: 125; Amêdî, 2013: 342).

Di Bêrîvanê da xebera revandina Perîşanê digihîje Cewze Begî. Cewze Beg dibêje ji bo komkirina siwaran wext tune, ez ê herim bibim şivanê şêx belkî bikarim dergistîya xwe bibînim û birevînim. Cewze Beg radibe diçe nav êla şêx û dibêje ez ji xwe ra rencberîyê digerim. Şêx jî dibêje duajoyek ji me ra hewce ye û divê tu heft sal ji bo me bixebitî. Cewze Beg qebûl dike û dibe duajoyê wan (Celîl û Celîl: 1978: 448). Leheng ji bo gihîştina dergistîyên xwe serî li rêyên cuda didin. Di nav van rêyan da ya ku herî zêde tê bikaranîn şivantî ye. Çinku bi rêya şivantîyê leheng nêzikê hezkirîyên xwe dibin û dikarin bi rêya bêrîyê wê bibînin. Dema Cewze Beg xwe digehîne Perîşanê

biryara revê didin. Bi şev li hespê siwar dibin ku biçin lê Cewze Beg çûneke bi vî awayî naxwaze û dibêje:

> "Ê, ev yeka dibe bêbextî, wekî ez dizîva te bivim, wê bêjin, Cewze-beg hat, dizîkava dergîstîya xwe hilda bir. Ezê herim, cahabê bidim şêx, bêjim: Ez Cewze-begê mîrê êla hekarame, mi hat, dergîstîya xwe bir, îjar t'eze tu mêrî, pey min k'eve, t'eze ji min P'erîşanê bistîne." (Celîl û Celîl: 1978: 450).

Cewze Beg diçe ji şêxî ra dibêje û şêx jî amadehîya xwe dike û dikeve pey wan. Di rê da rastî hev tên û Cewze Beg lê dixe serê şêxî difirîne. Di vê destanê da jî leheng rêya zehmet hildibijêre û dibêje heta ku şer nekim dergistîya xwe nabim. Ew yekî bixurûr e û naxwaze ku xelk bêje hat û dizîka ve bir. Ji ber van sedeman leheng dixwazin piştî şer hezkirîyên xwe bi dest bixin.

Di destana Kerr û Kulikî da Kulik yekî ji xwe bawer e. Dema ji bo Şemsîxanê dikeve rê û ji bo Cancana Elîsarê Gêsî diçe, di rê da Lekoyê Mitirb jê ra dibêje em vegerin lê ew qebûl nake. Ew dibêje ez yekî mêrxas û bêtirs im:

> "Lawo deme sed car deme,
> Tu şahîyeke li dewsa xeman,
> Mitala meke ez axayê te me,
> Rojê giran ez li xwe ewlê me,
> Ez ji qama xwe zêde me,
> Ez im lawo ez im,
> Ez ribateke beqefes im,
> Rojê bûyerên giran,
> Ji meydana şer,
> Ez ne direwim û ne dibezim." (Cizîrî, 2020: 193).

Ji van gotinên Kulik jî dîyar dibe ku ew ji xwe bawer e û ji rêya xwe venagere. Serlehengên destanan divê bi awayekî qehremanîya xwe bidin nîşankirin. Ew exlebî ji bo xwenîşandinê şer dikin û bi ser dikevin. Ji xwe yên ku ji şer ditirsin an jî direvin

nabin qehreman. Lewra ev jî dibe bahane ji bo qehremanan ku bêtirs biçin, şer bikin û di dawîyê da jî bigihîjin miraz û meqsedên xwe. Kulik dema Cancana Elîsarê Gêsî ji tewlê derdixîne û dibe pê dihesin û dikevin pey wî. Elîsarê Gêsî emir dide ku heft eşîrên Teyan ji bo şer xwe amade bikin. Heft siwarên mala Dodê tên û Kulik li hemberî wan hem şer dike hem jî dixwaze ku Cancanê bigehîne Simayîl Axayê Milî. Elîsarê Gêsî dibîne ku nikarin Kulikî zevt bikin ew çax emir dide ku seglawîyê di bin Kulikî da bidin ber riman. Seglawî didin ber şûr û riman û Kulikî jî li meydanê dikujin (Cizîrî, 2020: 196-200). Li vir em dibînin ku Kulik ji bo hesp û jinekê tê kuştin. Lê divê mirov li ser giringîya hespê jî bisekine. Ew alîkarên xwedîyê xwe ne û dema ew dimirin xwedîyê wan jî dimire. Di destana Dewrêşê Evdî da jî dema lingê hespê Dewrêş dikeve nav qulê mişkan lingê hespê dişikê û paşê Dewrêş tê kuştin. Di destana Kerr û Kulikî da jî piştî seglawî tê kuştin Kulik jî tê kuştin. Qedera hesp û lehangan bi hev ra girêdayî ye. Kerro dema dibihîze ku Kulik mirîye diçe û bi siwarên Elîsarê Gêsî ra şer dike. Kî derdikeve pêşîya wî dikuje û gelek zarokan sêwî, jinan bî dihêle. Ew rastî kîjan siwarê bê wî ji ser pişta hespê tîne xwarê. Paşê berê xwe dide Girê Mogê, serê Emerê Simaîl Axayê Milî jê dike û axatîya xwe li êlê îlan dike û Şemsîxanê li xwe mehr dike (Cizîrî, 2020: 210-202). Kerro jî wekî birayê xwe Kulikî mêrxas e. Ew bi tena serê xwe şer dike û axatîya xwe îlan dike. Di varyanta Arasî da dema Kulik tê kuştin Kerro bi Elîsarê Gêsî û birayên wî şer dike. Ew şeş birayan dikuje û yek tenê dimîne. Kerro dixwaze wî jî bikuje lê Kulik nahêle û dibêje bila xalekî me bimîne û ziryeta dêya me neqele. Kerro ji bo xatirê Kulik xalekî xwe nakuje. Kerro dema ji Kulik ra behsa şerê dike dibêje min êla ereban belav kir û kes ji wan li meydanê nema. "*Jinên wan derketin, laçikên xwe avêtin ber lingê hespê min. Min guh neda laçikên jinan, şeş xal kuşt evê hanê jî hesir girt anî.*" (Aras, 2022: 65). Di nav kevneşopîya kurdan da laçik sembola lihevanînê ye. Îro hêj jî peywîra laçikê bi heman awayî dewam dike. Wekî ku tê zanîn di nav edetên kurdan da dema şerek biqewime û jinek bê û laçika xwe biavêje nava wê şerê ew şer disekine (Bayezîdî, 2010: 146). Vê rewşê di gotinên pêşîyan da jî cih girtîye û tê gotin ku: "*Deh mêr têne kuştinê, jin laçika xwe diavêjine orta şeran, şer disekine.*" (Oncu, 2020. 53). Lê li vir em dibînin ku "laçika jinan" jî nekarîbûye Kerro bide sekinandin.

Di varyanta Cindî û Evdal da dema Kulik hespa Bêcan hildigire û tîne Kerro jê ra dibêje êdî em herin lê Kulik qebûl nake û dibêje tu ne birayê min î. Tu mêrekî çawa

yî? Heta ez Hesê Sadiqê Gêsî nekujim ez ji van deran naçim (Cindî û Evdal, 2008: 112). Kulik hespê tîne lê naxwaze bê şer biçe. Ji bo destnîşankirina mêrxasîya xwe dixwaze şer bike û bi ser bikeve. Kerro hêrs dibe û dibêje heta tu neyê kuştin nayêm hewara te. Kulik tê kuştin paşê Kerro diçe hewara birayê xwe. Em dibînin ku serlehengên mêr hertim rêya zehmet hilbijartine. Van xwastine ku piştî şer û kuştinan serfirazîyan bi dest bixin. Li gor erf û edetên civakî eger yekî talanê yekî bê şer bir û revî çû ew dibe wekî dizîtîyê (Aras, 2022: 56). Kulik nexwastîye navê dizîtîyê li xwe bike û lewra li benda şerê sekinîye.

Di varyanta Aras da em rastî mêrxasîya dêya Kerr û Kulikî tên. Werdeka dêya Kerr û Kulikî berî zewacê wekî qîzeke mêranî û jêhatî derbas dibe. Ew bi palîwanîya xwe bi nav û deng bûye. Wê bi kîjan palîwanê ra gulaş girtibe pişta hemûyan bi erdê ve zeliqandîye. Gelek kesan xwastine ku pê ra bizewicin lê Werdek ehd kirîye ku kîjan xortê ku di gulaşê da pişta wê li erdê xist Werdek dê wî bistîne. Silêmîn jî xortekî mêrxas û ji xwe bawer e. Dema Werdek jihatîbûna wî dibîne dixwaze pê ra gulaşê bigire. Silêmîn qebûl dike lê Werdek şerta xwe dibêje: "*Herhal haya te pê heye, gulaşa min bê şert nîne. Heke te pişta min anî erdê, ezê te bistînim, bibim helalîya te. Lê ku ez te bavêjim erdê, dilê min çi bixwaze ezê wî bînim serê te.*" (Aras, 2022: 9). Silêmîn qebûl dike gulaşê digrin. Werdek gelek ber xwe dide lê di dawîyê da Silêmîn Werdekê bilind dike û diavêje erdê. Werdek li ser soza xwe disekine û bi Silêmîn ra dizewice. Li vir divê bê destnîşankirin ku hêz, mêrxasî, jêhatîbûn herçiqas wekî taybetmendîyên mêran bên dîtin jî di nav civakê da hin jinên wisa jî hene. Werdek yek ji wan jinan e ku li dijî stereotîpên zayenda civakî wekî jineke mêrxas bi nav û deng bûye. Taybetmendîyeke din a Werdekê jî ew e ku ew bixwe mêrê xwe hildibijêre. Di sîstema pederşahî da jin ji alîyê mêran ve tên hilbijartin lê li vir rewşeke dijê wê heye. Li vir jin jî bihêz e û ew jî hildibijêre. Wekî din şert danîna Werdekê Guleya Fileh û leca Evdalê Zeynikê û Gulê tîne bîra mirov. Gulê ehd dike ku kî di leca dengbêjîyê da wê bibe dê pê ra bizewice. Gulê qîza keşîşê filla bûye. Ew dengbêja Surmelî Mehmet Paşa bûye û gelek navdar bûye. Evdalê Zeynikê jî medhê wê seh dike. Rojekê Evdal dibihîze ku li Xamûrê dawetek heye û Surmelî Mehmet Paşa û Gulê jî li wir in. Evdal jî radibe diçe wê dawetê. Li wir Evdal û Gulê dikevin lecê. Sê roj û sê şevan distrên û di dawîyê da Gulê destê xwe li ber Evdal datîne û dibêje: "*Evdal haza ku tu şairî û şairekî bê emsalî. Ez xweyê pirsa xwe me. Te ji min bir, heke ku tu qebûl bikî, ez ê te*

bistînim, lê belê ez ê dîsa li ser dînê xwe bimînim, ez ji dînê xwe venagerim." (Aras, 2013: 51). Evdal teklîfa Gulê qebûl nake çinku ew zewicandî bûye û zarokên wî hebûne. Lê ew medhê Gulê dide û dibêje heta niha kesî ewqas li hember min berxwe nedabû (Aras, 2013: 44-51). Di destana Sitî û Ferxî da jî mînaka şertdayînê heye. Gulendam Xatûn perîyek e û li Çîyayê Reş dimîne. Ev perî xidama Silêman Pêxemberê bûye. Dema Silêman Pêxember rehmet dike Xwedê wê perîyê dibe Çîyayê Reş û dibêje tu yê li benda Ferxê Hadî bimînî. Dema Ferx diçe Çîyayê Reş û rastî Gulendam Xatûnê tê Gulendam Xatûn gelek tiştan jê dipirse û wî diceribîne. Şertê Xatûnê ew e ku eger Ferx bersivan bizane dê pê ra bizewice eger nezane dê serê wî jêke. Ferx bersiva hemû pirsan dizane û Gulendam Xatûn êdî bawer dike ku ew Ferx bixwe ye. Gulendam Xatûn dibêje Xwedê Teala ez bo te hêştime, piştî mirina Silêman Pêxember heta niha ez li benda te bûm, dê mehra min û te bê birîn. Ferx naxwaze wê mehr bike çinku wî soz daye keçmama xwe Sitîyê (Kaplan, 2019: 210-205). Li vir di her sê mînakan da em dibînin ku jin û mêr ferq nake ya/ê ku bihêz e dikare biryara zewaca xwe bide û kî bixwaze bi wî/ê ra dizewice. Yên bihêz in dikarin şertê zewaca xwe bidin. Bi heman awayî di destana Sêva Hecî da jî mînaka şert dayînê heye. Dema Mîr Mehmûd û Sêva Hecî digihîjin hev Sêva Hecî dibêje ez mehra xwe nadim te. Wekî sedem jî dibêje bavê min yekî sed salî ye û çavên wî nabînin, ji xeynî min jî tu kesî wî tune ye. Sêva Hecî dibêje bavê min gotîye ez ê te bidim yekî ku qeytana Hemedanê ji min ra bîne. Ew ê qeytana Hemedanê li çavê xwe bide, dê çavên wî vebin û ew ê bibe wekî xortekî çardeh salî. Sêva Hecî jî dibêje eger tu qeytana Hemedanî bînî ez ê te bistînim (Celîl û Celîl, 1978: 160). Em dibînin ku jinan ji bo gihîştina hezkirîyên xwe ji mêran zêdetir şert danîne.

ENCAM

Destan û hikayeyên gelêrî wekî gelek metnên edebî yên din di bin bandora civak, netewe, wext, çand û derûdorê da dimînin. Piştî van hemû bandoran ew teşe digirin û halê wan ê dawî çê dibe. Lewra dema tehlîlek li ser destan û hikayeyên gelêrî bê çêkirin nabe ku di vê tehlîlê da civaka ku jê derketine bê paşguhkirin. Civak bandoreke mezin li ser mirovan dike û di jîyana mirovan da roleke sereke dilîze. Rol û stereotîpên zayenda civakî ji alîyê civakê ve tên dîyarkirin û kontrola wê dîsa di destê civakê bixwe da ye. Ji endamên civakê tê xwastin ku li gor rol û stereotîpên zayenda civakî tevbigerin û bijîn. Civak di vê mijarê da hişk e û îteateke mitleq dixwaze. Bi rêya vê xebatê me xwast ku em bibînin gelo lehengên destan û hikayeyên gelêrî çiqas li gor rol û stereotîpên zayenda civakî jîyane?

Di vê xebatê da armanca me ya sereke ew bû ku em şopên zayenda civakî di destan û hikayeyên gelêrî yên kurdî da bigerin. Ji bo vê armancê me *Rêbaza Çawahînî* (Qualitative Method) bi kar anî û sêzdeh heb destan û çar heb hikayeyên gelêrî yên kurdî hilbijart. Destanên kurdî yên ku ji bo vê xebatê hatine hilbijartin ev in: Memê Alan, Dewrêşê Evdî, Kela Dimdimê, Zembîlfiroş, Sîyabend û Xecê, Binevşa Narîn û Cembelîyê Kurê Mîrê Hekarîya, Kerr û Kulik, Xelîl Beg, Sitî û Ferx, Sêva Hecî, Evdilrehman Axayê Zorbaşî, Elo Şêxanî û Fatimê, Husên Axa Derbas; hikayeyên gelêrî yên ji bo vê xebatê hatine hilbijartin jî ev in: Gulperî, Mîrza Axayê Rindikî û Têlî Eyşan, Bêrîvanê, Senem Xanim û Hiseyin. Di hilbijartina van destan û hikayeyên gelêrî da qaîdeya me ew bû ku naveroka wan ji mijarên cîyawaz ên wekî lehengî, evîn, dîrok, dîn pêk bên û varyantên wan hebin. Ev destan û hikayeyên gelêrî yên yên hatine hilbijartin bi rêbaza "*tehlîla rabêjî*" (discourse analysis) û "*tehlîlaza rabêjî ya rexneyî*" (critical discourse analysis) hatin vekolîn. Em ê li jêr bi awayekî gelemperî li ser encamên vê lêkolînê bisekinin.

Dema mijar dibe zayenda civakî xebat zêdetir berê xwe didin *jinan*. Di xebata me da em tenê li ser jinan nesekînin, digel jinan mêr jî bûn mijara xebata me û me ew jî li gor rol û stereotîpên zayenda civakî nirxandin. Ji xeynî jin û mêran me berê xwe da mekanî jî û em li ser zayenda mekanan jî sekinin.

Di vê xebatê da ewil bi awayekî gelemperî li ser zayenda bîyolojîk, zayenda civakî, cudahîyên di navbera zayenda bîyolojîk û zayenda civakî da, rol û stereotîpên

zayenda civakî, teorîyên bi çêbûna zayenda civakî ra têkildar, femînîzm, pêl û teorîyên femînîzmê, patrîyarkayê hate sekinin û di derheqê van mijaran da agahîyên teorik hatin dayîn. Di beşeke din a xebata me da li ser destan û hikayeyên gelêrî hate sekinîn û wehkevî û cudahîyên di navbera van her du cureyan da hatin rêz kirin û paşê jî kurteya destan û hikayeyên gelêrî hate dayîn. Di beşa sereke ya xebatê da mijarên me rolên bi jin û mêran ra têkildar, zayenda mekanê, stereotîpên jin û mêran bûn û em bi awayekî hûrgilî li ser van mijaran sekinin.

Di destan û hikayeyên gelêrî da bedewîya lehengên jin ên sereke bi awayekî mibalaxakirî derbas dibe. Ew, ewqas bedew in ku gelek kes bidestxistina wan dixwaze lê ew qayîl nabin. Ew li benda hezkirîyên xwe yên xewnê şevan in lê di vê bendemayînê da pirî caran bi awayekî pasîv xuya dikin. Ew ji bo gihîştina hezkirîyên xwe ked nadin û kedê ji hezkirîyê xwe dixwazin. Divê hezkirîyên wan ji welatên dûr bi rê bikevin, li hember hemû astengîyan ber xwe bidin û bigihîjin jina hezkirî. Di dawîya ewqas zehmetîyan da jina hezkirî dê bibe *xelat* ji bo lehengê mêr. Lê heta ku mêrê hezkirî bigihîje gelek caran jina hezkirî ji alîyê kesên din ve tê revandin an jî ji bo dayîna kesên din li ser wê soz tê dayîn. Di meseleya zewaca jinan da ew hatine pasîvîzekirin û bav û birayên wan li şûna wan biryar dane û hin caran jî ew pêşkêşî mêran kirine. Di van hemû rewşan da jinan dengê xwe nekirine û ji halê xwe razî bûne. Dema bavê lehengên jin xwastine ku hespên navdar bi dest bixin an jî warê xwe ji dijminan biparêzin keçên xwe bi kar anîne û ew avêtine mezadê. Keçan jî guhdarîya bavê xwe kirine û piştî xemilandinê çûne nav dîwanê û li benda rizgarkerekî mane. Lê divê ev xal neyê jibîrkirin ku rizgarker dibe ku kalekî 70 salî be yan jî xortekî 20 salî. Her kî dibe bila bibe jin razî ne û îteatkar in. Jin hin caran ji bo dewlemendîya bavan bûne amûr. Li ser navê wan ji bo şivantîya heft salan ji şivanan ra soz hatîye dayîn. Kî ji bo bavê wan şivantî bike dê li hember keda xwe bigihije wê. Di van hemû rewşan da pasîvbûna jinan bi *têgihîştina qederparêz* ra têkildar e û ev têgihîştin xwe di zewaca wan a bi şivên ra û pêşkêşkirina wan a ji bo mal û milkê da dide der. Ya ku di envantera rola zayendî da ji jinan tê xwastin pasîvbûna wan e û di destanan û hikayeyên gelêrî da jî rewş bi heman awayî ye. Ew hem bi gotinên xwe hem jî bi tevgerên xwe, xwe qurbanê malbat û civakê dikin. Meseleya qurbankirinê ji xeynî qurbankirina jinan bi awayekî din jî derbas dibe. Jinên hezkirî ji bo saxî û silametîya hezkirîyên xwe malbatên xwe qurbanê hezkirîyên xwe kirine. Xecê heft bira û donzdeh pismamên xwe

qurbanê Sîyabend; Feyrûz Xatûn bavê xwe qurbanê Evdilrehmanê Zorbaşî û Telî Eyşan jî bav, bira, pismam û hemû êlê qurbanê Mîrza Axa dike. Di van qurbankirinan da bêguman tirsa tenêtîyê heye. Eger hezkirî bimire dê jina evîndar bi tena serê xwe bimîne û negihîje miraz û meqseda xwe. Lewra mirov dikare şiroveyeke weha bike ku ew bi rêya saxî û silametîya hezkirîyê xwe, garantîya xwe jî dike.

Statuya jinan a civakî piştî zewac û dayikbûna wan bi taybetî bi anîna zarokên kur zêdetir dibe. Çinku zarokên kur temînata paşerojê ne. Civak li hember dayikan zêdetir rêz digire û qîmetê dide wan. Lê dîsa jî eger berawirdkirinek di navbera dê û bavan da bê kirin bêguman dayik dîsa di paş da dimînin. Di destanan da navê bavê lehengan gelek caran derbas dibe lê navê dêya lehengan pir kêm derbas dibe. Dayik di destan û hikayeyên gelêrî da bi piranî wekî "dêya leheng" yan jî "jina axê" derbas dibin. Jina axê ya yekem, jina axê ya mezin, jina axê ya biçûk û wd. Di nav sêzdeh destan û çar hikayeyên gelêrî da navê dayikan tenê di nav sê heban da derbas dibe, ew jî: Eyşê Welat dêya Dewrêşê Evdî, Werdek dêya Kerr û Kulikî, Le'lîxan dêya Xanê Çengzêrîn e. Pasîvbûna jinan piştî dayikbûna wan jî dewam kirîye û gelek caran lehengên destan û hikayeyên gelêrî guhdarîya dêya xwe nekirine. Di sîstema pederşahî da wisa tê qebûlkirin ku nesl bi rêya mêran dewam dike û yê bi serdest mêr in lewra jî jin di paş da mane û di statuya duyemîntîyê da ne. Jixwe eger ê serdest mêr nebûna çima jinan kincê mêran li xwe kirina û paşê derketina derve? Jin dema derdikevin derve ji qadên jîyana xwe (mal, xanî) derdikevin û dikevin qadên mêran. Qadên mêran ji bo jinan cihên ewle nîn in lewra jinan serî li rêyên din dane û dema derketine derve kincên mêran li xwe kirine. Di Werdeka dêya Kerr û Kulik û Ereb Zincarê da em rastî mînakên vê rewşê tên. Li vir divê li ser xaleke giring bê rawestan. Ev jinên ku kincên mêran li xwe kirine di nav destanan da nehatine rexnekirin berevajî pesnê wan hatîye dayîn û ji alîyê wêrekbûn û cesaretê ve medhê wan hatîye kirin. Li alîyê din heman medh û pesin ji bo wan mêrên ku wekî jinan hereket dikin nehatîye kirin. Mêrên hestyar wekî jinan hatine dîtin û rexnekirin. Rol û stereotîpên jinane dema di mêran da hatîne dîtin civak aciz bûye û li hember vê rewşê sekinîye. Gelo çima şibandina mêran tê pesinkirin lê şibandina jinan tê rexnekirin?

Di destan û hikayeyên gelêrî da bedewîya mêran ji jinan kêmtir nîn e. Ew ewqas qeşeng bûne ku ne tenê jinan dema mêran jî ew dîtine heyran û şaş mane. Ji ber ku mijar serlehengbûna wan e divê ev kesên ji rêzê nebin. Lewra di qeşengî, bihêzî,

bêtirsî, egîdîya wan da mibalaxa hatîye kirin û ew ji kesên rêzê hatine cudakirin. Jixwe eger kesên ji rêzê bûna ew ê nebûna serleheng. Li gor stereotîpan divê mêr bihêz û bêtirs bin. Lehengên mêr ên destan û hikayeyên gelêrî jî bi vî awayî derbas dibin. Ew mal û milkên xwe diterikînin û berê xwe didin welatên nedîyar. Ev rêwîtî tenê ji bo jina hezkirî ye ku gelek caran ew tenê di xewnê şevan da hatîye dîtin. Armanca jina hezkirî bûye sedem ku serlehengên mêr bikevin rêyên dûr û zehmet. Jina hezkirî ji bo wan xelat e. Lehengên mêr kêm caran gihîştine hezkirîyên xwe, gelek caran piştî gihîştinê leheng mirine. Lehengên mêr hertim rêya zehmet hilbijartine û nexwastine bi awayekî hêsan bigihîjin miraz û meqsedên xwe. Wan xwastîye ku lehengbûna xwe nîşanê derûdorê bikin paşê bigihîjin jina hezkirî. Ji bo vê armancê hin caran xwe xistine bin barên giran hin caran jî şerên mezin kirine. Ev şer an li hember rakîbên din bûne yan jî bi dijminan ra. Ev şer bi cesareta lehengan ra têkildar e û civak jî ji wan cesaretbûnê dixwaze û leheng jî li gor civakê tevdigerin.

Li gor stereotîpên zayenda civakî mêr azad jin jî girêdayî ne. Di destan û hikayeyên gelêrî da jî rewş bi heman awayî ye. Mêr di dayîna biryarên giring da azad bûne û guhdarîya malbat an jî hezkirîyê nekirine lê heman rewş ji bo jinan derbasdar nîne. Bav û birayên wan an jî hezkirîyên wan şûna wan biryar dane û wan jî îteat kirine. Ew exlebî girêdayî van kesan bûne.

Civak ji jinan îteat ji mêran jî desthilatdarî dixwaze. Divê jin berî zewacê îteatê bav û birayên xwe piştî zewacê jî îteatê mêrê xwe bikin. Di destan û hikayeyên gelêrî da jî rewş heman awayî ye û jin îteatkar bûne. Bav, bira û mêrê wan çi gotibin wisa kirine û ji halê xwe razî bûne. Mêr di destan û hikayeyên gelêrî da bi awayekî desthilatdar derbas bûne û wan çawa xwastibe wisa bûye. Di dayîna biryarên giring ên bi jin, zarok û welat ra têkildar da mafê gotinê ya mêran bûye û wan jî îteateke mitleq xwastîye.

Li gor stereotîpan divê mêr li pey jinan herin, nabe ku jinek bikeve pêy meran. Ev rewş ji alîyê civakê ve tê rexnekirin û bi çavekî nebaş li wan jinan tê nêrîn. Di destan û hikayeyên gelêrî da jî rewş bi heman awayî bûye, herçiqas lehengan di xewnê şevan da hev dîbin û ji hev hezkiribin jî dîsa yê ku ji bo gihîştinê bi rê dikeve, mal û milkên xwe, welatê xwe, dê û bavê xwe diterikîne mêr in. Jin di cihê xwe da li benda

lehengî disekinin. Nabe ku jinek ji bo hezkirîyê xwe malbata xwe biterikîne û bikeve pey wî kesî.

Girîn wekî taybetmendîyeke jinan derbas dibe û girîna mêran xweş nayê dîtin. Lê di vê mijarê da rewşekê dijî stereotîpên zayenda civakî heye û mêr jî gelek caran digirîn. Di destan û hikayeyên gelêrî da em li gelek cihan rastî vê rewşê tên ku mêr digirîn û girîna wan tê rexnekirin. Girîn wekî karê jinan tê pênasekirin û dema mêrek digirî wî dişibînin jinan. Lê di vê şibandinê da piçûk û zeîfdîtin heye. Divê mêr bihêz be û li wekî jinan negirî (!). Li alîyê din girîna jinan pir normal tê dîtin û tu kes wan rexne nake, heta dema ew digirîn *bigirî, mafê te ye girîn* tê gotin.

Fedakarî herçiqas wekî taybetmendîyeke jinan derbas bibe jî mêran jî gelek fedakarî kirine. Fedakarîya wan zêdetir di mijara evîna wan da bûye. Wan ji bo hezkirîyên xwe dev ji mal û milkên xwe berdane û ketine rêyên dûr û dirêj. Ew gelek caran ketine rewşên xirab, feqîr bûne yan jî şivantî kirine. Tenê armanca wan gihîştina hezkirîyê bûye. Herçiqas derfetên wan hebûne ku di nav dewlemendîya xwe da bimînin û digel kesên din bizewicin jî lê wan wisa nekirine û fedakarîyên mezin kirine. Tenê ji bo gihîştina yarê berdana mal û milk, malbat, kirina şivantîyê fedakarîyên mezin in.

Li gor stereotîpan divê jin şermok bin. Di destan û hikayeyên gelêrî da li gelek cihan behsa şerma jinan tê kirin. Gotinên wekî "*Şerm karê pîrekan e, fedî ne karê mêran e"* vê rewşê piştrast dike.

Qehremanî û egîdî wekî taybetmendîyên mêran derbas dibin. Ew bi hezaran siwaran ra şer dikin û di yek carê da bi dehan kesan dikujin. Di destanan da qehremanîya lehengên mêr di nav gel da belav dibe û ew bi nav û deng dibin. Lê hin caran jî em rastî qehremanîya lehengên jin jî tên. Werdeka dêya Kerr û Kulik û Ereb Zincara ku paşê dibe destebiraya(!) Sîyabend mînakên jinan in. Lê li vir divê em li ser xalekê bisekinin, ji ber ku ev her du jin bihêz û qehreman in mafê wan heye ku hevjînên xwe hilbijêrin û ji bo zewacê xwe şert danin. Di gulaşê da kî ji wan baştir be ew ê bi wan ra bizewicin. Daxwaza wan ew e ku digel mêrên bîhêz û egîd bizewicin. Ew nayên hilbijartin, bi xwe hildibijêrin. Ev rewş li gor stereotîpên zayenda civakî ne normal e çinku divê jin pasîv bin û bên hilbijartin.

Zayenda mekanan heye û ew wekî mekanên nêrza û mêza hatine veqetîn. Mekanên gelêrî, cihên vekirî û derveyê malê wekî *mekanên nêrza*; mekanên taybet, cihên girtî û nava malê wekî *mekanên mêza* hatine binavkirin. Di binavkirineke weha da bê guman bandora sîstema pederşahî heye û peywirên jin û mêran li ser cihên wan ên mayînê bandor kirine. Ji ber şert û mercên jîyana civakî di destan û hikayeyên gelêrî da cihên ku derbas dibin sînorkirî ne û kêm in. Lê dîsa jî dikare bê gotin ku mekanên di destan û hikayeyên gelêrî da derbas dibin xwedî zayend in. Dîwan/Dîwanxane herçiqas wekî cihekî girtî xuya bike jî ew cihekî nêrza ye û aîdê mêran e. Cihê jinan di dîwanan da tune ye û ew li wir digel mêran rûneniştine. Ji xeynî dîwanxaneyê cihên nêrza yên di destan û hikayeyên gelêrî da derbas dibin meydanên şer û nêçîrê ne. Jîyana jinan a di mal da ji alîyê mêran; a li derve ji alîyê tehekuma nêrza ve tê dîyarkirin. Ew di nav kon an jî odeyan da li pişt perdeyan in. Cihên jinan bi perdeyê hatine veqetîn û ew herçiqas di serayan da jî mabin dîsa cihên wan dîyarkirî û aîdê wan bûye. Ew hin caran derketine derve lê ev derketin jî bi karên wan ên malê ra eleqedar e. Dema derketine derve yan çûne bêrîyê yan jî çûne balavê. Lewra bêrî û berav wekî cihên mêza derbas dibin. Ji bo cihên rasthatina/hevdîtina lehengan baxê torkirî, xewn, ber derîyê konan, kanî û serêkanî dikarin wekî mînak bên dayîn.

ÇAVKANÎ

Acıl, B. B. (2018). *Antik Yunan Klasik Dönemi'nde Cinsîyetlendirilmiş Mekân*. Yayınlanmamış Yüksek Lisans Tezi. İstanbul: İTÜ. Sosyal Bilimler Enstitüsü.

Açа, M. (1998). *Kazı Körpeş-Bayan Sulu Destanı Üzerinde Mukayeseli Bir Araştırma*. Teza doktorayê ya çapnebûyî. Konya: Selçuk Üniversitesi.

Akbalık, E. (2012). *Anadolu Sahası Türk Halk Hikâyelerinde Toplumsal Cinsiyet Rolleri ile Kadılar*. Teza doktorayê ya çapnebûyî. İÜ. Sosyal Bilimler Enstitüsü.

Akbaş Arpacı, E. (2019). *Kadın Bedeni, Mekân ve Hareket*. Yüksek Lisans Tezi. İstanbul: İÜ Sosyal Bilimler Enstitüsü.

Akkaş, İ. (2019). Cinsiyet ve Toplumsal Cinsiyet Kavramları Çerçevesinde Ortaya Çıkan Toplumsal Cinsiyet Ayrımcılığı. *Ekev Akademi Dergisi*. 97-118.

Akman, E. (2009). *Melikşah ile Güllühan Hikayesi (İnceleme- Metinler)*. Ankara: Gazi Kitabevi.

Aktay, E. (2019). *Ayfer Tunç'un Romanlarında Toplumsal Cinsiyet*. Yüksek Lisans Tezi. Balıkesir: BÜ. Sosyal Bilimler Enstitüsü. Sosyoloji Anabilim Dalı.

Akyıldız Ercan, C. (2014). *Cinsiyetin Toplumsal Roldeki Yeri Elfriede Selinek'in Seçilmiş Romanlarında Kadınlık*. Konya: Çizgi Kitabevi.

Alkan Korkmaz, S., Allmer, A. (2000). Mekânın DNA'sı: Toplumsal Cinsiyetin Mekânsal Kalıplarının Sorgulanması. *Kadın/Woman*. 14 (1), 107-133.

Alptekin, A. B. (2011). *Halk Hikâyelerinin Motif Yapısı*. (5. Baskı). Ankara: Akçağ Yayınları.

Altan Arslan, Ş. (2000). *Ders Kitaplarında Cinsiyetçilik*. Ankara: Başbakanlık Kadının Statüsü ve Sorunları Genel Müdürlüğü.

Amêdî, S. B. (2013). *Folklora Kurdî*. Dîyarbekir: Lîs.

Aras, A. (2022). *Kerr û Kulik*. (Çapa Duyem). Stenbol: Nûbihar.

Aras, A. (2023). *Siyabend û Xecê*. (Çapa Sêyem). Stenbol: Nûbihar.

Arat, N. (2010): *Feminizmin ABC'si*. İstanbul: Say Yayınları.

Arık, H. (2009). Kahvehanede Erkek Olmak: Kamusal Alanda Erkek Egemenliğin Antropolojisi. A. Alkan (Der.). *Cins Cins Mekân*. (168-201). İstanbul: Varlık Yayınları.

Arsoy, N. (2011). *Türk Masallarında Ataerkillik*, *Toplumsal Cinsiyet Ayrımcılığı ve Kadın*. Yüksek Lisans Tezi. Kars: KÜ. Sosyal Bilimler Enstitüsü. Türk Dili ve Edebiyatı Anabilim Dalı.

Artun, E. (2004). *Türk Halk Edebiyatına Giriş*. İstanbul: Kitabevi.

Aslan, M. (2009). Kürt Kadınının Toplumsal Statüsü. Di nav *Uluslararası Kürt Kadın Kongresi* da (78-84). Hakkâri: Hakkâri Üniversitesi Yayıncılık.

Atlı, H. (2024). Destanên Kurdî Ji Aliyê Taybetmendîyên Dirûvî ve. *Şarkiyat*. 16(01). 488-501.

Attı, H. (2013). *Lêkolîneke Folklorî li ser Destana Mem û Zînê*. Yüksek Lisans Tezi. Mardin: MÜ. YDE. Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalı.

Avcil, C. (2019). *The Transformation of Religious, Ethnic and Gender Identities of Kurdish Women in Turkey: The Case of Ağrı*. Doctoral Thesis. Ankara: AYBÜ. Institue of Social Sciences. Department of Political Science and Public Administration.

Ayata, A., Gölgelioğlu, Ö. (2011). Siyaset ve Katılım. Y. Ecevit, N. Karkıner (Ed.). *Toplumsal Cinsiyet Sosyolojisi*. (65-83). Eskişehir: Anadolu Üniversitesi Yayını.

Aydoğdu, A. (2020). Gotinên Pêşiyan. (Çapa 3.). İzmir: Na.

Aytemiz, B. U. (2016). Edebiyat ve Toplumsal Cinsiyet. *Toplumsal Cinsiyet Tartışmaları*. (51-66). Ankara: Dipnot Yayınları.

Baba, M. O. (2001). *Halk Edebiyatı Terimler Sözlüğü*. İstanbul: Heyamola Yayınları.

Bal, M. H. (2021). *Âşık Şevki Halıcı'dan Derlenen Halk Hikâyelerinde Toplumsal Cinsiyet Rolleri*. Yüksek Lisans Tezi. Hatay: HMKÜ. Sosyal Bilimler Enstitüsü.

Baş, T. ve Akturan, U. (2008). *Nitel Araştırma Yöntemleri: NVivo 7.0 ile Nitel Veri Analizi*. Ankara: Seçkin Kitabevi.

Başak, S. (2013). Toplumsal Cinsiyet. *Sosyolojiye Giriş*. İ. Çapcıoğlu, H. Beşirli (Ed.). Ankara: Grafiker Yayınları. 211-242.

Başgöz, İ. (1998). Türk Halk Hikayelerinin Yapısı. S. Cengiz (Wer.). *Folklor/Edebiyat*. S. 14. (85-98).

Bayhan, V. (2013). Beden Sosyolojisi ve Toplumsal Cinsiyet. *Doğu Batı*. 16 (63). Ankara: Doğu Batı Yayınları. 147-164.

Beauvoir de S. (1989). *The Second Sex*. H. M. Parshley (Wer). New York: Vintage Books.

Berktay, F. (2014). *Tek Tanrılı Dinler Karşısında Kadın Hristiyanlık'ta ve İslamiyet'te Kadının Statüsüne Karşılaştırmalı Bir Yaklaşım*. (5. Baskı). İstanbul: Metis Yayınları.

Berktay, F. (2018). *Tarihin Cinsiyeti*. İstanbul: Metis Yayınları.

Bhasin, K. (2015). *Toplumsal Cinsiyet "Bize Yüklenen Roller"*. K. Ay, Z. Sarıhacıoğlu (Wer.). İstanbul: Kadınlarla Dayanışma Vakfı Yayınları.

Bingöl, A. (2014). *Gotinên Pêşiyan û Biwêj*. Îzmîr: Weşanên Na.

Blommaert, J. ve Bulcaen, C. (2000). Critical Discourse Analysis. *Annual Reviews Anthropol.* 29. 447-466.

Bora, A. (2005). *Kadınların Sınıfı Ücretli Ev Emeği ve Kadın Öznelliğinin İnşası*. İstanbul: İletişim Yayınları.

Boratav, P. N. (1945). *İlk Romanlarımız Folklor ve Edebiyat Dergisi II*. Ankara: Bilgesu Yayıncılık.

Boratav, P. N. (1988). *100 Soruda Türk Halk Edebiyatı*. (5. Baskı). İstanbul: Gerçek Yayınevi.

Boratav, P. N. (2012). *Halk Hikayeleri ve Halk Hikayeciliği*. (4. Basım). İstanbul: Tarih Vakfı.

Bourdieu, P. (2015). *Eril Tahakküm*. B. Yılmaz (Wer.). İstanbul: Bağlam Yayıncılık.

Broverman, I. K. ûyd. (1972). Sex-role stereotypes: A current appraisal. *Journal of Social Issues*. 28(2). 59-78.

Butler, J. (2014). *Cinsiyet Belası Feminizm ve Kimliğin Altüst Edilmesi*. B. Ertür (Wer.). İstanbul: Metis Yayıncılık.

Bütün, M. (2011). *Toplumsal Cinsiyet Eşitliği Perspektifinden Çocuk Bakım Hizmetleri: Farklı Ülke Uygulamaları*. Uzmanlık Tezi. Ankara: Başbakanlık Kadının Statüsü Genel Müdürlüğü Yayınları.

Celîl, O û Celîl, C. (1978). *Zargotina Kurda I*. Moskova: Naûka.

Cindî, H. (2016). *Folklora Kurmanciyê*. Çapa 2. Amed: Lîs.

Cindî, H. û Evdal, E. (2008). *Folklora Kurmanca*. Stenbol: Avesta.

Cizîrî, Ş. (2020). *Edebîyata Devkî û Şer*. Dîyarbekir: Lîs.

Connel, R. W. (1998). *Toplumsal Cinsiyet ve İktidar*. C. Soydemir (Wer.). İstanbul: Ayrıntı Yayınları.

Çakır, S. (2010). Mekânın Kadınlar Açısından Kurgulanışına Kuramsal ve Tarihsel Süreç İçinde Bakmak. A. Akpınar vd. (Der.). *Kadın ve Mekân*. (133-149). İstanbul: Turkuvaz Kitap.

Çakır, S. (2019). *Erkek Kulübünde Siyaset*. İstanbul: Sel Yayıncılık.

Çakmak, F. ve Bilişli, Y. (2019). İdeoloji, Söylem ve İletişim Çalışmalarında Ruth Wodak. *Anadolu Üniversitesi Sosyal Bilimler Dergisi*. 19(2). 99-124.

Çelik, H. ve Ekşi, H. (2013). Söylem Analizi. *Marmara Üniversitesi Atatürk Eğitim Fakültesi Eğitim Bilimleri Dergisi*. 27(27). 99-117.

Çelikten, H. (2021). Destandan Halk Hikâyesine Geçişte Değişen Kutsalla İrtibatlı Yardımcı Kahraman Tercihi. *Uluslararası Halkbilimi Araştırmaları Dergisi*. 4(6). 107-121.

Çetin, A. (2017). *Türk Sinemasında Yoksulluk Temsilleri: 1960-1975 Dönemi*. Teza doktorayê ya çapnebûyî. Mersin: MÜ. SBE. Sosyoloji Anabilim Dalı.

Çobanoğlu, Ö. (2004). "Hikaye", *Türk Dünyası Edebiyat Kavramları ve Terimleri Ansiklopedik Sözlüğü.* C.3. Ankara: AKM Yayınları.

Çobanoğlu, Ö. (2015). *Türk Dünyası Epik Destan Geleneği*. Ç. 4. Ankara: Akçağ.

Çolak, G. (2020). *Toplumdilbilimi Toplumsal Cinsiyet ve Dil*. (2. Baskı). İstanbul: Bilge Kültür Sanat.

Demez, G. (2005). *Kabadayıdan Sanal Delikanlıya Değişen Erkek İmgesi*. İstanbul: Babil Yayınları.

Demir, Ö., Acar, M. (1992). Sosyal Bilimler Sözlüğü. İstanbul: Ağaç Yayıncılık.

Demir, Z. (1996). *Modern ve Postmodern Feminist Akımlar*. Yüksek Lisans Tezi. Kırıkkale: KÜ. Sosyal Bilimler Enstitüsü. Kamu Yönetimi Anabilim Dalı.

Demir, Z. (1997). *Modern ve Postmodern Feminizm*. İstanbul: İz Yayınları.

Demirbaş, M., Yağbasan, R. (2005). Sosyal Öğrenme Teorisine Dayalı Öğretim Etkinliklerinin, Öğrencilerin Bilimsel Tutumlarının Kalıcılığına Olan Etkisinin İncelenmesi. *Uludağ Üniversitesi Eğitim Fakültesi Dergisi*. 18(2). 363-382.

Deniz, A. (2020). Bedenden Mekâna Taşan İktidra Özdönüşümsel Bir Bakış. *Türkiye'de Feminist Yöntem*. E, Erdoğan. û N, Gündoğdu. (Amd.). (222-250). İstanbul: Metis Yayınları.

Dikici, E. (2016). Feminizmin Üç Ana Akımı: Liberal, Marxist ve Feminizm Teorileri. *The Journal of Academic Social Science Studies (*43). 523-532.

Direk, Z. (2012). *Zaman ve Başka*. Ö. Gözel (Wer.). İstanbul: Metis Yayınları. 7-44.

Doğan, G. (2009). *Söylemin Yorumlanması*. Ankara: ODTÜ Yayıncılık.

Doğan, M. (2005). *Büyük Türkçe Sözlük*. İstanbul: Pınar Yayınları.

Donovan, J. (2016). *Feminist Teori*. A. Bora, M. Ağduk Gevrek, F. Sayılan (Wer.). İstanbul: İletişim Yayınları.

Doyuran, L. (2018). Medyatik Bir Çalışma Alanı Olarak Eleştirel Söylem Çözümlemesi (Televizyon Dizileri örneğinde). *Erciyes İletişim Dergisi*. 5 (4). 301-323.

Duymaz, A. (2014). 120. Yılında Halk Hikayeleri Araştırma Tarihine Bir Bakış. *AKAD*. 2 (3). 1-23.

Dündar Türkkan, V. ve Yıldız, P. (2022). 90'dan günümüze Türk sinemasında toplumsal cinsiyet ve mekân. *Turkish Studies*, 17(6), 1473-1499.

Ecevit, Y. (2011). Toplumsal Cinsiyet Sosyolojisine Başlangıç. Y. Ecevit, N. Karkıner (Ed.). *Toplumsal Cinsiyet Sosyolojisi*. (2-30). Eskişehir: Anadolu Üniversitesi Yayını.

Erdoğan Toker, M. (2010). *Toplumsal Cinsiyet Eşitliğinin Sağlanmasında Medya Okur Yazarlığının Rolü*. Ankara: Kadının Statüsü Genel Müdürlüğü.

Ersoy, N. (2000). *Semboller ve Yorumları*. İstanbul: Zafer Matbaası.

Fairclough, N. û Wodak, R. (1997). Critical Discource Analysis. T. V. Dijk (Ed.). *Discourse Studies: A Multidisciplinary Introduction*. London: Sage. 258-284.

Feldman, R. S. (1998). *Social Psychology*. New Jersey: Prentice Hall.

Filiz, M. Ş. (2021). *Destana Dewrêşê Evdî*. Wan: Peywend.

Filiz, M. Ş. (2023). *Roman Diliyle Kürtler*. Wan: Peywend.

Filiz, M. Ş. û Aykaç, Y. (2022). Analîza Motîfên Destana Cembelî û Binevşa Narîn Li Gor Kataloga Stith's Thompson. di nav *II. Uluslararası Zap Havzası Sempozyumu Kültürel Miras ve Sözlü Gelenek* (545-562). Hakkari: Hakkari Üniversitesi Yayınları.

Firestone, S. (1993). *Cinselliğin Diyalektiği*. Y. Salman (Wer.). İstanbul: Payel Yayınları.

Foucault, M. (1990). *The History of Sexuality*. Cilt I. R. Hurley (Wer.). New York: Vintage Books.

Gaag, N. V. D. (2018): *Feminizm*. B. S. Aydaş (Wer.). İstanbul: Sel Yayıncılık.

Gedik, E. (2019). Mekânın Cinsiyeti: Mekân ve Toplumsal Cinsiyet İlişkisi. D. A. Arslan (Ed.). *Sosyal Bilimler Akademik Araştırmalar Kitap 3* (299-311). Ankara: Paradigma Akademi.

Gernas, A. (1995). *Zembîlfiroş*. Stockholm: Weşanên Roja Nû.

Giddens, A. (2012). *Sosyoloji.* C. Güzel. (Yay. haz.). İstanbul: Kırmızı Yayınları.

Gilman, C. P. (2002): *The Home: It's Work and Influence*. Oxford: Altamira Press.

Gökçe Zengin, F. (2016). *Karadeniz Fıkralarına Toplumsal Cinsiyet Açısından Yaklaşım*. Yüksek Lisans Tezi. Samsun: OMÜ. Sosyal Bilimler Enstitüsü. Kadın ve Aile Araştırmaları Anabilim Dalı.

Gölcük, E. (2011). *Ataerkil Sistem Bağlamında Toplumsal Cinsiyet Rolleri ve Namus Kavramı ve Bu Kavramlar Analizinde Yazılan 'Makas' Filmi*. Yüksek Lisans Tezi. İstanbul: KHÜ. Sosyal Bilimler Enstitüsü. Film ve Drama Bölümü.

Görücü Öner, S. (2021). *Hatice Meryem'in Hikâye ve Romanlarında Toplumsal Cinsiyet Rollerinin İncelenmesi*. Yüksek Lisans Tezi. İstanbul: İAÜ. Lisansüstü Eğitim Enstitüsü.

Gül Ünlü, D. (2018). *Kişilerarası İletişim Sürecinde Toplumsal Cinsiyet Kimliğine İlişkin Kalıpyargıların Belirlenmesi*. Teza doktorayê ya çapnebûyî. İstanbul: İÜ. Sosyal Bilimler Enstitüsü. Halkla İlişkiler ve Tanıtım Anabilim Dalı.

Günay, V. D. (2013). *Söylem Çözümlemesi*. İstanbul: Papatya Yayıncılık.

Güngör, B. (2020). Söylem Yaklaşımı Üzerine Bir Kavram Çalışması ve Eleştirel Söylem Analizi. *Kritik İletişim Çalışmaları Dergisi*. 2. 1-12.

Güriz, A. (2011). *Feminizm Postmodernizm ve Hukuk*. (2. Baskı). Ankara: Phoenix Yayınları.

Hança, B. B. (2012). Tanım mı Tarif mi? Halk Hikâyesinin Tanımlanması Meselesi. *The Journal of Academic Social Science Studies*. 5(8). 693-699.

Hooks, B. (2012). *Feminizm Herkes İçindir Tutkulu Politika*. E. Aydın, B. Kurt, Ş. Özgün, A. Yıldırım (Wer.). İstanbul: Bgst Yayınları.

Hughes, C. (2002). *Key Concepts in FeministTheory and Research*. London: Sage Publications.

Kan, G. (2022). *Kürtçe Romanda Anlatıcı Perspektif ve Söylem*. Teza doktorayê ya çapnebûyî. Diyarbakır: DÜ. SBE. Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalı.

Kaplan, L. (2018). *Di Çîrokên Hîzanê da Motîda Dê*. Teza Lîsansa Bilind a Çapnebûyî. Van: YYÜ. YDE. Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalı.

Kaplan, L. (2020). Li gorî Çar Epîzotan Berawirdkirina Çar Varyantên Destana Zembîlfiroş. *Nûbihar Akademî*, 13(7), 33-50.

Kaplan, Y. (2019). *Beyt û Destanên Kurdî*. Stenbol: Nûbihar.

Karaaslan, C. (2019). *Anonim Türk Masallarında Toplumsal Cinsiyet Bağlamında Kadın*. İstanbul: MÜ. Sosyal Bilimler Enstitüsü. Radyo, Televizyon ve Sinema Anabilim Dalı. İletişim Bilimleri Bilim Dalı.

Karakaya, P. (2023). *Türkiye'de Denizcilik Sektöründe Kadınlar ve Cinsiyetlendirilmiş Mekân Deneyimleri*. Yayınlanmamış Yüksek Lisans Tezi. İstanbul: İÜ. Sosyal Bilimler Enstitüsü, Kadın Çalışmaları Anabilim Dalı.

Kavuncu, A. N. (1987). *Bem Cinsiyet Rolü Envanteri'ni Türk Toplumuna Uyarlama Çalışmaları*. Bilim Uzmanlığı Tezi. Ankara: HÜ. Sosyal Bilimler Enstitüsü.

Kaya, D. (2007). *Ansiklopedik Türk Halk Edebiyatı Terimleri Sözlüğü*. Ankara: Akçağ.

Kayaoğlu, A. ve Kırel, Ç. (2019). *Sosyal Psikoloji II*. Ünlü, S. (Ed.). Eskişehir: Anadolu Üniversitesi Yayınları.

Kayhan, F. (1999). *Feminizm*. İstanbul: BDS Yayınları.

Keskin, N. (2019). *Folklor û Edebiyata Gelêrî*. İstanbul: Avesta Yayınları.

Kılıçoğlu, E. B. (2016). *Ayla Kutlu'nun Çocuk Edebiyatı Ürünlerinde Toplumsal Cinsiyet Rolleri*. Yüksek Lisans Tezi. Kırklareli: KLÜ. Sosyal Bilimler Enstitüsü.

Köşgeroğlu, N. (2010). *Toplumsal Cinsiyet Ekseninde Kadın/ Kalın Duvar İnce Zar*. Ankara: Alter Yayıncılık.

Kurt Topuz, S. (2019). Toplumsal Cinsiyet ve İktidar. Altunoğlu, A. (Ed.). *Toplumsal Cinsiyet Çalışmaları*. Eskişehir: Anadolu Üniversitesi Yayınları.

Lescot, R. (1942). Textes Kurdes II Memê Alan. Beyrouth: Institut Français De Damas Collection De Textes Orientaux.

Lindsey, L. L. (2005). *Gender Roles*. New Jersey: PearsonEducation.

Lippman, W. (1922). *Public Opinion*. New York: The Macmillan Company

Makas, Z. (2002). *Türk Halk Hikâyelerinde Zaman*. İzmir: Akademi Kitabevi.

Marshall, G. (2005). *Sosyoloji Sözlüğü*. O. Akınhay, D. Kömürcü. (Wer.). Ankara: Bilim ve Sanat Yayınları.

Mele Mehmûdê Bayezîdî (2010). *Adat û Rusûmatnameê Ekradiye*. Lêkolîn J. Dost. Stenbol: Nûbihar.

Meyerowitz, J. (2014). A History of Gender. *Oxforf University Press on behalf of the American Historical Association*.113(5). 1146-1356.

McDowell, L. (2003). *Gender, identity and place: Understanding feminist geographies*. University of Minnesota Press Minneapolis.

Michel, A. (1984). *Feminizm*. Ş. Tekeli (Wer.). İstanbul: Kadın Çevresi Yayınları.

Mies, M. (2011). *Ataerki ve Birikim Uluslararası İşbölümünde Kadınlar*. Y. Temurtürkan (Wer.). Ankara: Dipnot Yayınları.

Mill, J. S. (2017). *Kadınların Köleleştirilmesi*. A. Özcan (Wer.). İstanbul: Bilge Kültür Sanat.

Miller, P. H. (2017). *Gelişim Psikolojisi Kuramları*. Ankara: İmge Kitabevi.

Millett, K. (2011). *Cinsel Politika*. S. Selvi (Wer.). (3. Baskı). İstanbul: Payel Yayınevi.

Mukrîyanî, M. (2018). *Folklora Ronahîyê*. Stenbol: Weşanên Wardozê.

Notz, G. (2012). *Feminizm*. S. D. Çetinkaya (Wer.). Ankara: Phoenix Yayınevi.

Oğuz, A. (2019). *Feminizm, Postkolonyal Feminizm ve Toplumsal Cinsiyet. Buchi Emecheta'nın The Bride Price Adlı Romanı*. İstanbul: Çizgi Kitabevi.

Oğuz, G. Y. (2002): *Toplumsal Yaşamda Kadın*. Eskişehir: Anadolu Üniversitesi Yayınları.

Oncu, M. (2020). *Di Gotinên Pêşiyên Kurdan de Jin*. Wan: Weşanên Sîtav.

Ong, Walter J. (2020). *Sözlü ve Yazılı Kültür*. (7. Basım). İstanbul: Metis.

Onur, B. (1997). *Gelişim Psikolojisi Yetişkinlik- Yaşlılık- Ölüm*. (4. Baskı). Ankara: İmge Kitabevi Yayınları.

Oral, C. (2023). Türk romanında mekânın cinsiyet algısı üzerindeki etkisi. *Bitlis Eren Üniversitesi Sosyal Bilimler Dergisi*, 12 (2), 142-155.

Orhan, Ş. (2024). *Zayenda Civakî û Di Civaka Kurdan De Rewşa Jinan*. Teza Mastirê. Mûş: MAUN. Enstituya Zanistên Civakî.

Ölçer Özünel, E. (2006). *Masal Mekânında Kadın Olmak*. Ankara: Gelenek Yayıncılık.

Önal, E. G. (2019). *Türk Toplumunda Toplumsal Cinsiyet Rolleri Bağlamında Gelin Olmak (Kırıkkale İli Örneği)*. Kırıkkale: KKÜ. SBE. Sosyoloji Anabilim Dalı.

Özçatal, E. Ö. (2011). Ataerkillik, Toplumsal Cinsiyet ve Kadının Çalışma Yaşamına Katılımı. *Çankırı Karatekin Üniversitesi İktisadi ve İdari Bilimler Fakültesi Dergisi*. 1 (1). 21-39.

Özkazanç, A. (2018). *Feminizm ve Queer Kuram*. (2. Baskı). Ankara: Dipnot Yayınları.

Özsöz, C. (2008). Kültürel Feminist Teori ve Feminist Teorilere Giriş. *Sosyoloji Notları*. 6. 51-55.

Öztürk, E. (2011). *Feminist Teori ve Tarihsel Süreçte Türk Kadını*. İstanbul: Rağbet Yayınları.

Özveri, D. (2009). Feminist Teorinin Gelişim Sürecinde Uluslararası İlişkilere Bakış Üzerine Kısa Bir Değerlendirme. H. Çomak (Ed.). *Uluslararası İlişkilere Giriş: Teorik Bakış*. Kocaeli: Umuttepe Yayınları.

Palmer, R. E. (2008). *Hermenötik*. İ. Görenler (Wer.). İstanbul: Ağaç Kitabevi Yayınları.

Pilpil Yöney, G. (2013). İspanyolcada Dilsel ve Toplumsal Gerçekçilik Analizi. *Dil Dergisi*. 161., 50-71.

Prentice, D. A û Carranza, E. (2002). What Women and Men Should Be, Shouldn't Be, Are Allowed To Be and Don't Have To Be: The Contents of Prescriptive Gender Stereotypes. *Psychology of Women Quarterly*. 26(4). 269-281.

Punch, K. F. (2011). *Sosyal Araştırmalara Giriş Nitel ve Nicel Yaklaşımlar* (2. Baskı). D. Bayrak, H. B. Arslan, Z. Akyüz. (Wer.). Ankara: Siyasal Kitabevi.

Ramazanoğlu, C. (1998). *Feminizm ve Ezilmenin Çelişkileri*. M. Bayatlı, F. Berktay. (Wer.). İstanbul: Pencere Yayınları.

Reed, E. (2012). *Kadının Evrimi Anaerkil Klandan Ataerkil Aileye-I*. (3. Basım). Ş. Yeğin (Wer.). İstanbul: Payel Yayınları.

Reed, E. (1982). *Kadının Evrimi Anaerkil Klandan Ataerkil Aileye-II*. Ş. Yeğin (Wer.). İstanbul: Payel Yayınları.

Reed, E. (1995). *Kadının Evrimi Anaerkil Klandan Ataerkil Aileye-II*. (2. Basım). Ş. Yeğin (Wer.). İstanbul: Payel Yayınları.

Reichl, K. (2002). *Türk Boylarının Destanları*. M. Ekici (Wer.). Ankara: TDK.

Roder, A. (2019). *Li Gorî Teoriya Queer û Femînîzmê Zayenda Civakî di Destana Memê Alan de*. Teza Lîsansa Bilind. Mêrdîn: MAU. Enstituya Zimanên Zindî yên li Tirkîyeyê.

Sadinî, M. X. (2011). *Feqiyê Teyran Jiyan, Berhem û Helbestên Wî*. (Çapa Pêncan). Stenbol: Nûbihar.

Samur, A. (2012). *Destana Zembîlfiroş û Gulxatûnê*. Teza Lîsansa Bilind. Mêrdîn: MAU. Enstituya Zimanên Zindî yên li Tirkîyeyê.

Sancar, S. (2016). *Erkeklik: İmkânsız İktidar*. (4. Baskı). İstanbul: Metis Yayınları.

Saydam, M. B. (2011). Deli Dumrul'un Bilinci. İstanbul: Metis Yayınları.

Saygılıgil, F. (2013). Mekânın Cinsiyeti. *Sosyal ve Beşeri Bilimler Dergisi*. 5(1), 209-218.

Saygılıgil, F. (2016). *Toplumsal Cinsiyet Tartışmaları*. Ankara: Dipnot Yayınları.

Segal, L. (1992). *Ağır Çekim Değişen Erkeklikler Değişen Erkekler*. İstanbul: Ayrıntı Yayınları.

Serhedî, M. (2018). *Folklora Hawarê*. Stenbol: Weşanên Wardozê.

Sevim, A. (2005). *Feminizm*. İstanbul: İnsan Yayınları.

Schick, I. C. (2016). Mekânın Cinsiyeti Vardır. E.E. Dinçer ve A. Can (Ed.). *Kentsel Yaşam ve Sürdürebilirlik*. (93-106). İstanbul: Esenler Belediyesi Şehir Düşünce Merkezi Şehir Yayınları.

Smith, B. G. (2024). *Dünya Tarihinde Kadınlar.* M. Öztürk (Wer.). İstanbul: İletişim.

Spies, O. (1941). *Türk Halk Kitapları*. B. Gönül (Wer.). İstanbul: Rıza Coşkun Basımevi.

Stone, A. (2007). *An Introduction to Feminist Philosophy*. Cambridge: Polity.

Subaşı, K. (2022). Dêw û Formên Wan Di Folklora Kurdî De. Sh. Valî & K. Subaşı (Ed.). Di nav *Mîtos û Edebîyat* da (165-203). Stenbol: Nûbihar. https://doi.org/10.55253/2022.nubihar.1100092

Subaşı, K. (2023). Fesad û Bêbext di Trajedîya Evînê da: Weku Nimûne Destanên Evînî yên Mejûyî. *Mukaddime*. 14(Özel Sayı 1). 148-176. https://doi.org/10.19059/mukaddime.1243035

Subaşı, K. (2024). Ji Mîtolojîyê Ber Bi Tarîxê û Ji Lehengîyê Ber Bi Evînê Destan Weku Çemkeke Sîwan Di Vegêrana Gelî Da. *Şarkiyat*. 16(01). 105-116. https://doi.org/10.26791/sarkiat.1425264

Şimşek, E. (1987). *Arzu ile Kamber Hikayesi Üzerine Mukayeseli Bir Araştırma*. Yüksek Lisans Tezi. Elazığ: FÜ. Sosyal Bilimler Enstitüsü.

Taş, E. (2018). *Kırgız Türklerinin Sözlü Anlatılarında (Destan, Masal, Halk Hikâyesi) Toplumsal Cinsiyet ve Kadın İmajı*. Yüksek Lisans Tezi. Nevşehir: NHBVÜ. Sosyal Bilimler Enstitüsü.

Taş, G. (2016). *Feminizm Üzerine Genel Bir Değerlendirme: Kavramsal Analizi, Tarihsel Süreçleri ve Dönüşümleri*. Akademik Hassasiyetler. 3(5). 163-175.

Tatli, M. (2020). *Barış Bıçakçı'nın Romanlarında Toplumsal Cinsiyet Bağlamında Erkeklik İnşası*. Yüksek Lisans Tezi. Ardahan: ARÜ. Lisansüstü Eğitim Enstitüsü.

Telsiz, M. (1996). Adölesan-Ebeveyn İlişkilerinde Anne ve Baba Rolleri. *Kadın Araştırmaları Dergisi*. İstanbul: İstanbul Üniversitesi Kadın Sorunları Araştırma ve Uygulama Merkezi. Yayın No: 8.

Turan, N. (2011). *Türkiye'de Erkek Hemşire İmgesi*. Uluslararası İnsan Bilimleri Dergisi. 8(11). 16-30.

Türkmen, F. (2018). *Âşık Garip Hikâyesi: İnceleme-Metin.* Ankara: Akçağ Yayınları.

Uluocak, Ş., Gökulu, G., Bilir, O., Etizer Karacık, N., Özbay, D. (2014). *Toplumsal Cinsiyet Eşitsizliği ve Kadına Yönelik Şiddet*. Ankara: Paradigma Akademi Yayınları.

Van Dijk, T. (2001). "Critical Discourse Analysis". D. Schriffin, D. Tannen ve H. E. Hamilton (Ed.). *The Handbook of Discourse Analysis*. Massachusetts: Blackwell Publishers. 352-371.

Van Dijk, T. (2002). The Interdisciplinary Study of News as Discourse. K. N. Jensen ve N. W. Jankowski (Ed.). *A Handbook of Qualitative Methodologies For Mass Communication Research*. Londra- New York: Routhledge. (108-120).

Van Dijk, T. (2003). Söylem ve İdeoloji: Çok Alanlı Bir Yaklaşım. B. Çoban, Z. Özarslan. *Söylem ve İdeoloji: Mitoloji, Din, İdeoloji*. İstanbul: Su Yayınları.

Van Floton, L. (2024). *Çeviri ve Toplumsal Cinsiyet*. A. Kerimoğlu Bulut (Wer.). Stenbol: Everest.

Vargel Pehlivan, P. (2017). Toplumsal Cinsiyet Bağlamında Kuramsal Yaklaşımlar: Bir Literatür Taraması. *İstanbul Ticaret Üniversitesi Sosyal Bilimler Dergisi*. 16 (31). 497-521.

Vatandaş, C. (2011). Toplumsal Cinsiyet ve Cinsiyet Rollerinin Algılanışı. *İstanbul Üniversitesi Sosyoloji Konferansları*. İstanbul.

Vatandaş, S. (2020). Toplumsal Cinsiyet Rolleri ve Kalıpyargıları Bağlamında Kadının Medyada Metalaştırılması. *Adıyaman Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü Dergisi*. 13(36). 747-784.

Walby, S. (2016). *Patriyarka Kuramı*. H. Osmanağaoğlu (Wer.). Ankara: Dipnot Yayınları.

Walters, M. (2009): *Feminizm*. H. Gür (Wer.). Ankara: Dost Kitabevi Yayınları.

Wodak, R. (Ed.). (1997). *Gender and Discourse*. Londra: Sage Publications.

Wollstonecraft, M. (2012). *Kadın Haklarının Gerekçelendirilmesi*. D. Hakyemez (Wer.). İstanbul: Türkiye İş Bankası Kütür Yayınları.

Xendekî, R. (2018). *Folklora Roja Nûyê*. Stenbol: Weşanên Wardozê.

Yağcı, H. (2023). Hadis Kaynaklarında Hz. Meryem. H. Temiztürk ve H. İ. Delen (Ed.). *Hz. Meryem*. (63-90). İstanbul: Ensar Neşriyat.

Yapıcı, A. (2016). *Toplumsal Cinsiyet Din ve Kadın*. İstanbul: Çamlıca Yayınları.

Yaşın Dökmen, Z. (2021). *Toplumsal Cinsiyet Sosyal Psikolojik Açıklamalar*. (11. Basım). İstanbul: Remzi Kitabevi.

Yıldırım, E. (2018). Toplumsal Yapının Aynası Olarak Sinema: Söylem ve Eleştirel Söylem Analiz Yöntemlerine Göre Ayla Filminin Çözümlemesi. *İNİF E-Dergi*. 3(1). 234-243.

Yılmaz, İ. (2016). *Vekolînek li ser Çîroka Zembîlfîroş*. Teza Lîsansa Bilind. Muş: Zanîngeha Muş Alparsanê. Enstituya Zanistên Civakî.

Yıldırım, D. (2000). "Ergenekon: Erkin Kün Mü?". *Türk Dili Araştırmaları Yıllığı Belleten 1997*. 129-167.

Zukauskas, R. (2024). Gender schema theory. *Salem Press Encyclopedia*. 3p.